K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# BI RÊBAZA REXNEYA FEMÎNÎST LÊNERÎNEK LI ROMANÊN JINÊN KURD

Songül DOĞAN

15711023

Şêwirmend

Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# BI RÊBAZA REXNEYA FEMÎNÎST LÊNERÎNEK LI ROMANÊN JINÊN KURD

Songül DOĞAN

15711023

Şêwirmend

Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2018

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim ve Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum " Bi Rexneya Femînîst Lênerînek Li Romanên Jinên Kurd" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Raporum sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Raporumun …3… yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

14.08.2018

Songül DOĞAN

# KABUL VE ONAY

Songül DOĞAN tarafından hazırlanan **"Bi Rêbaza Rexneya Femînîst Lênerînek Li Romanên Jinên Kurd"** adındaki çalışma 07/09/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İmza]

[Doç. Dr. Hayrullah ACAR] (Başkan)

[İmza]

[Dr. Öğretim Üyesi Abdurrahim ÖZMEN] (Üye)

[İmza]

[Dr. Öğretim Üyesi Mustafa ASLAN] (Üye)

# PÊŞGOTIN

Nivîsandin ji bo jinan pêvajoyeke zehmet e. Jin bi nivîsandinê re li nasnameya xwe digere û ew bi xwe dest bi avakirina dîrok û jiyana xwe dike. Bi pênûsa jinê re qalib û klîşeyên di edebiyata mêrserwer ên li ser zayendiyê û jinê ji nû ve diguhere. Jin bi nivîskariyê re êdî ji rola xwendekara edebiyatê û objeya edebiyatê derdikeve, dibe him xwendekar him jî nivîskara edebiyatê û bi vê re jî di edebiyatê de dibe subje. Rexneya edebiyata femînîst derfetê dide ku bi berhemên edebî yên nivîskarên jin re meriv rewşa jinê ya di nava civakê de û dinyaya wê ya ku di van berheman de xuyanî dibe ji nêz ve bibîne.

Di vê xebatê de me hewil da ku di pênç romanên jin de karakterên jin û babetên ku bi wan re derketine pêş, pirsgirêkên jinan û nêrîna nivîskarên jin a li jinê bên diyarkirin. Karakterên jin ên di van romanan de, têkiliyên wan ên bi mêran re, bi civakê û malbatê re, hest û fikrên wan, daxwaz û pirsgirêkên wan, nêrîn û tevgerên wan di heman demê de rewşa jinan ê di nava civak û edebiyatê de nîşan dide. Xwendin û lêkolînên li ser romanên nivîskarên jin ji bo vê têkildayîna bi jinê re derfeteke girîng dide. Bi vê xebatê re him me ev derfet bi dest xist him jî me hewil da ku jin û nivîskariya jinê bi awayek akademîk û rexneyî têkeve nava edebiyata kurdî. Îro mijara zayenda civakî û femînîzmê di gelek qadên zanistî, çandî û hûnerî de bi rêbazeke navdisîplîner cihê xwe digire. Ji bo xebatên lêkolînî û edebiyata kurdan jî pêdivî bi mijara zayend û desthilatdariyê heye. Di edebiyata me de (devkî û nivîskî) ziman û nêrîneke mêrane heye ku bingeha xwe bi çand û civaka baviksalar girtiye. Her wiha jinên ku bi edebiyatê re eleqadar in jî di bin vê tesîrê de mane lewma di xwendevan û nivîskarên jin de ev tesîr tê dîtin. Ligel vê, jinên ku bi hişmendiya jinane tevdigerin û dixwazin kod û tesîrên mêrane yên di nava edebiyatê de deşîfre bikin û edebiyatê ji bin vî barî derxînin jî hene. Di vê xebatê de armanca me jî li ser vê deqê ye. Ji mêj ve bal û meyla me li ser rewşa jinên kurd û edebiyata wan heye, ev xebat bû derfet ku em vê mijarê lêbikolin.

Di dayîna biryara mijara vê xebatê û nivîsandina destpêka wê de ji bo piştgirî, fikir û keda wî ez spasdarê mamoste Remezan Alan im. Ji bo alîkarî, xwendin, nirxandin û sebra ku bi vê xebatê re bi min re danî spasiyên xwe pêşkêşî şêwirmendê xwe Dr. Mustafa Aslan dikim. Her wiha ez spasdarê endamên juriyê Dr. Hayrullah Acar û Dr. Abdurrahîm Özmen im ku di parastina tezê de bi nirxandin û rexneyên xwe teza min bi qewet kirin. Ji bo xwendin nirxandin û rexneyên Di warê bikaranîna têgehan û şêwra li ser qada teorî û rexneyê ji bo ked û guhdariya wî sapasdarê hevalê xwe Şengul Oxir im. Spasdarê malbata xwe me ku di van du salên nivîsandina vê tezê de hêvî û piştgirî dane min. Her wiha di temînkirina çavkaniyên vê xebatê ji bo alîkariya wî û sebra ku min re danî spasdarê hevalê xwe İlhan Doğan im. Ev xebat bi hest û hebûna jinan hate nivîsandin lewma spasdarê her jina ku di vê xebatê de çavên min bi wan ket û min ji wan îlham û hêz wergirt.

Songül DOĞAN

Mêrdîn 2018

# KURTE

Ev tez li ser edebiyata jinên kurd û romanên wan hatiye nivîsandin. Di vê tezê de bi rêbaza rexneya femînîst, pênç romanên nivîskarên jin ên kurmanc ji aliyê karakterên jin ve hatine analîzkirin. Bi van analîzan re mebest ew e ku rewşa jinên kurd, bi rêya romanên jinên kurd re, bi nêrîneke femînîst bê xwendin. Bi vê xebatê re me hewil da ku em nêrînên nivîskarên jin ên di derbarê jinê de dahurînin û rewşa jinên ku di nava pergala baviksalar, di bin pêkûtiyên mêrane û saziyên mêrserwer de hatine bindestkirin derxînin holê.

Di romanên nivîskarên jin ên ku daxilî vê xebatê bûne de karakter bi piranî jin in û mijarên van romanan li ser pirsgirêkên jinê, zayenda civakî, baviksalarî, perwerdehî, nasnameya netewî û jinaniyê ye.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di qismê destpêka xebatê de mijar û girîngiya xebatê, mebest, sînor, rêbaz, pirsgirêk û astengiyên xebatê hatine diyarkirin. Di beşa yekem de li ser dîroka femînîzmê, cure û pêlên wê hate sekinandin. Di dawiya vê beşê de cihê jinên kurd ê di nava femînîzmê de hate nîqaşkirin. Di beşa duyem de, li ser rexneya edebiyata femînîst û bêdengiya rexneya li ser berhemên jinên kurd hate sekinandin. Di beşa sêyem de, karakterên jin ên di pênç romanên nivîskarên jin û babetên ku di van romanan de derketine pêş hatin analîzkirin. Di encama vê xebatê de hate dîtin ku ligel hin kêmasiyan, edebiyateke jinên kurd heye.

**Peyvên Sereke:** Edebiyata Jinên Kurd, Nivîskarên Jin, Femînîzm, Rexneya Edebiyata Femînîst, Pergala Baviksalar, Zayenda Civakî.

# ÖZET

Bu tez Kürt kadınlarının edebiyatı ve romanları üzerine yazılmıştır. Bu tezde feminist eleştiri yöntemiyle, Kürt kadın yazarların beş romanı kadın karakterler bakımından analiz edilmiştir. Bu analizlerdeki amaç Kürt kadınlarının durumunu kürt kadınlarının romanları yoluyla, feminist bir bakışla okumaktır. Bu çalışmayla kadın yazarların kadına dair bakışını analiz etmeye çalıştık ve kadınların ataerkil sistem, eril baskı ve erkek egemen yapıların içinde ezildiğini ortaya çıkarmaya çalıştık.

Bu çalışmaya dâhil olan kadın yazarların romanlarında karakterler çoğunlukla kadındır ve bu romanların konuları kadın sorunları, toplumsal cinsiyet, ataerkillik, eğitim, ulusal kimlik ve kadınlık üzerinedir.

Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Çalışmanın giriş kısmında çalışmanın konusu ve önemi, amaç, sınırlılık, yöntem ve zorlukları belirlenmiştir. Birinci bölümde feminizmin tarihi, çeşitleri ve dalgaları üzerine durulmuştur. Bu bölümün sonunda kürt kadınlarının feminizm içindeki yeri tartışılmıştır. İkinci bölümde, feminist edebiyat eleştirisi ve kürt kadınlarının eserlerine yönelik eleştirinin sessizliği üzerine durulmuştur. Üçüncü bölümde, kadın yazarların beş romandaki kadın karakterleri ve bu romanlarda öne çıkan hususlar analiz edilmiştir. Bu çalışmanın sonucunda görüldü ki bazı eksikliklere rağmen, Kürt kadınlarının bir edebiyatı vardır.



**Anahtar Kelimeler:** Kürt Kadın Edebiyatı, Kadın Yazar, Feminizm, Feminist Edebiyat Eleştirisi, Ataerkil Sistem, Toplumsal Cinsiyet.

# ABSTRACT

This thesis was written on the literature and novels of Kurdish women. In this thesis, five novels of Kurdish women writers have been analyzed in terms of female characters through the method of feminist criticism. The purpose of these analyzes is to read the status of Kurdish women through the novels of Kurdish women, with a feminist perspective. In this study, we tried to analyze the views of women writers on women and we also tried to reveal that women have been crushed in patriarchal system, masculine oppression and male-dominated structures.

In the novels of women writers included in this study, the characters are mostly women and the subjects of these novels are on women's issues, gender, patriarchy, education, national identity and femininity.

This study consists of three parts. In the introduction part of the study, the subject and importance of the study, purpose, limitation, methods and difficulties were discussed. In the first chapter, history, types and waves of feminism are emphasized. At the end of this chapter, the place of Kurdish women in feminism is discussed. In the second chapter, feminist literary criticism and the silence of criticism about the works of the Kurdish women were emphasized. In the third chapter, female characters of five novels written by women writers and outstanding issues in these novels have been analyzed. As a result of this study; it is obvious that despite some shortcomings, there is a literature of Kurdish women.

**Key words:** Kurdish women literature, Women writer, Feminism, Feminist literary criticism, Patriarchal system, Gender.

# NAVEROK

PÊŞGOTIN ..... I

KURTE ..... III

ÖZET..... IV

ABSTRACT ..... V

NAVEROK ..... VI

KURTEBÊJE ..... X

DESTPÊK..... 1

1. MIJAR Û GIRÎNGIYA XEBATÊ ..... 3

2. MEBEST..... 4

3.SÎNORÊN XEBATÊ ..... 5

4. PIRSGIRÊK Û ASTENGIYÊN XEBATÊ ..... 7

5. RÊBAZ..... 8

**BEŞA YEKEM**
**DI NAVA DÎROKÊ DE PÊŞVEÇÛNA FEMÎNÎZMÊ**

1.1. Femînîzm û Sê Pêlên Femînîst ..... 10

1.2. Cûreyên Femînîzmê..... 16

1.2.1. Femînîzma Liberal..... 17

1.2.2. Femînîzma Marksîst..... 18

1.2.3. Femînîzma Radîkal ........ 20
1.2.4. Femînîzma Sosyalîst ........ 22
1.2.5. Femînîzma Postmodern ........ 26
1.3. Femînîzm û Jinên Kurd Ên Bakur ........ 28

**BEŞA DUYEM**
**DI EDEBIYATÊ DE FEMÎNÎZM Û EDEBIYATA JINÊN KURD**

2.1. Rexneya Edebiyata Femînîst ........ 36
2.2. Rêbaza Rexneya Femînîst ........ 39
2.2.1. Bi Navenda Xwendevan Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Nivîskar ........ 40
2.2.2. Bi Navenda Nivîskar Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Jinê ........ 41
2.3. Edebiyata Jinên Kurmanc: Ligel Berhemên Jinan, Bêdengiya Rexneya Femînîst ........ 44

**BEŞA SÊYEM**
**DI ROMANÊN JINÊN KURD DE KARAKTERÊN JIN**

3.1. ZARÎFE DEMÎR - *KELA BILIND* ........ 50
3.1.2. Karakterên Jin ........ 51
3.1.2.1. Zelîşê. ........ 51
3.1.2.2. Berfînê ........ 53
3.1.2.3. Ezîme ........ 56
3.1.2.4. Siltanê ........ 56
3.1.2.5. Zerîn ........ 57

3.2. ÇÎDEM BARAN - *LERIZÎNÊN TENÊTIYÊ* ................................................ 59
3.2.1. Karakterên Jin ......................................................................59
3.2.1.1. Şevîn .................................................................................. 59
3.2.1.2. Dayika Şevînê. ..................................................................... 64
3.2.1.3. Leyla.................................................................................... 65
3.2.1.4. Rojbîn ya jî Stêra ................................................................ 65
3.2.1.5. Pîrê...................................................................................... 67
3.3. GULGEŞ DERYASPÎ – *XEZAL*. .............................................................. 68
3.3.1. Karakterên Jin ........................................................................... 69
3.3.1.1. Xezal ................................................................................... 69
3.3.1.2. Newal................................................................................. 73
3.3.1.3. Dayika Xezalê.................................................................... 73
3.3.1.4. Sibhiye Xanim .................................................................... 75
3.3.1.5. Çavşînê .............................................................................. 75
3.3.1.6. Sewqê ................................................................................ 76
3.3.1.7. Gulbinevş. ......................................................................... 77
3.4. YILDIZ ÇAKAR – *GERÎNEKA GUERNICAYÊ*......................................... 80
3.4.1. Karakterên Jin....................................................................... 80
3.4.1.1. Lîsa ya jî Abîde ..................................................................80
3.4.1.2. Dayê Şaxê ......................................................................... 86
3.5. AYNUR ARAS - *LEYLANA KESK*......................................................... 88
3.5.1. Karakterên Jin ......................................................................... 89
3.5.1.1. Keskê.................................................................................. 89

3.5.1.2. Delal........................................................................................ 95

3.5.1.3. Gulî ........................................................................................ 95

3.5.1.4. Dayika Guliyê ......................................................................... 97

3.5.1.5. Senem........................................................................................97

3.5.1.6. Jina Hemîd .............................................................................. 99

3.6. NIRXANDINA BABETÊN DI VAN ROMANAN DE DERKETINE PÊŞ........ 100

3.6.1. Jin û Femînîzm ............................................................................ 101

3.6.2. Jin û Civaka Baviksalar ............................................................... 105

3.6.3. Jin û Evîn ...................................................................................... 107

3.6.4. Jin û Rewşa Dudilî . ....................................................................... 109

3.6.5. Jin, Dayiktî û Xesûtî........................................................................ 110

3.6.6. Jin, Perwerdehî û Kar.................................................................... 113

3.6.7. Jin û Şîdet. ...................................................................................... 115

3.6.8. Jin, Bêcihûwarbûn û Pirsgirêkên Netewî .................................... 116

3.6.9. Jin û Nivîs ....................................................................................... 117

3.6.10. Rewşa Hundirîn a Karakteran . ................................................ 117

3.6.11. Jin û Zarokatî................................................................................. 120

ENCAM........................................................................................................ 122

ÇAVKANÎ ..................................................................................................... 126

# KURTEBÊJE

**amd.:** amadekar

**bnr.:** binêrin

**brh.:** berhevkar

**c.:** cild

**ç.:** çap

**dnd.:** di nav…de

**hb.:** heman berhem

**hg.:** heman gotar

**hr.:** heman rûpel

**ht.:** heman tez

**hwd.:** her wekî din

**j.:** jimar

**r.:** rûpel

**rr.:** ji rûpela…heta rûpela…

**trans.:** transkirîpsiyon

**wer.:** wergêr

**weş.:** weşan/weşanên

**yd.:** yên din

# DESTPÊK

Femînîzm, weke têgeh û tevgereke fikrî di sedsala 19. de li Fransa û Hollandayê derket, piştre derbasî Îngîlîstanê û Emerîkayê bû. Heta sedsala 20. li gelek welatên dinayayê belav bû û hate naskirin. Bi tevgera femînîst re jin bi dû mafên xwe ketin û dengê xwe dan dinyayê. Bi pêşketina tevgerên jinan û femînîzmê re hat ferqkirin ku divê hemû beşên zanistî û civakî jinûve bên lêkolînkirin. Piştî ku jin ketin nav gelek qadên civakê, ji aliyê edebiyatê ve jî hatin xuyanîn. Di nav teorî û rexneya edebiyatê de qadeke nû şênber bû; "edebiyata jinê". Femînîstan berê xwe dan berhemên edebî yên ku heta niha bi pirranî ji pênûsa nivîskarên mêr ve hatibûn nivîsin. Femînîstên ku bi edebiyatê re mijûl bûn berhemên nivîskarên mêr ango edebiyata mêrane ji nû ve li bêjinga xwe xistin. Li berhemên nivîskarên mêr dinêrîn bê ka di van berhemên mêran de kodên zayenda civakî çawa hatine ristin, cihê jinê yê di nava civakê de çawa hatiye dayîn, jin bi çi zimanî û çawa hatine şayesandin? Ew ne tenê ketin pey deşîfrekirina edebiyata mêran, herwiha li ser berhemên nivîskarên jin ên ku kêm be jî heta niha hatibûn nivîsandin û di wan berheman de jî li kodên hişmendiya jinane, tesîra civaka baviksalar ên ku di naverok û zimanên nivîskarên jin de wan de rengvedabûn û nivîskariya wan, xistin bin merceka xwe. Li ser mêtiya zimanê berhemên jinan û feraseta jinaniyê yê ku di van berhemên wan de dihatin xuyanîn rawestiyan.

Nivîsandina roman û çîrokan di edebiyata modern a kurdan de, di sedsala 20. de şax daye. Her çiqas nîqaş û gengeşeyên li ser hê domdar bin jî, yekem çîroka kurdî (ya modern) *Çîrok*[*] (1913) *y*a Fuad Temo, yekem romana kurdî jî *Şivanê Kurmanca*[1] (1935) ya Erebê Şemo tê qebûlkirin. Piştî van sal û berhemên destpêkê, her ku çû hejmarên çîrok û romanan zêde bûn û grafîka wê zêdebûnê berdewam e. Çend îstîsna ne tê de dema em li afirînerên van berheman dinêrin em li rastî zayendekê tenê tên ku ew jî bê guman zayenda "mêr" e. Yanî ku meriv behsa dîroka edebiyata kurdî û nivîskariyê dike ew dîrok xwe bi zayenda mêr re bel dike. Elbet ev

[*] Ev çîrok di Rojî Kurd de weke çîrokeke nîvcomayî hatiye weşandin. Fûad Temo, "Çîrok", dnd. *Di Sedasaliya Wê De Rojî Kurd*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013, r. 155-156.

[1] Ereb Şemo, *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2015.

rewşa edebiyata mêrane ne tenê rastiya edebiyata kurdan e, di edebiyata hemû neteweyan de, heta li welatên ku pêşengtiya edebiyata modern kirin (wek fransizan, îngîlîzan, elmanan, îspanyolan) jî nivîskarên edebiyatê mêr bûn. Herçiqas di berhemên edebî yên mêran de wesf û pesnê jinê hebe jî, seba ku xwediyê wan ne jin bûn, aliyê wê yê objektîf qels ma û em ji dinyaya jinê bêxeber man. Heta van deh pazdeh salên dawî hê nû em di qada çîrok û romanê de li rastî nivîskarên jin tên.

Jinên kurmanc ji aliyê folklora kurdî ango edebiyata devkî ve xwedî hebûneke bingehîn in. Ji lorikên zarokan, destan û çîrokan, ji mamik û duayan bigrin heta bi kilam û zêmaran gelek cureyên folklorê di bin temsîliyeta jinê de dihat dîtin. Di nav kurdan de jin, wek xwediyê çanda civaka xwe, domkara ziman û çandê, sembola hiş û nirxên neteweyî tê dîtin. Di nav edebiyata devkî û folklora kurdî de cihê jina kurd her tim cihê pesindayinê ye. Gava ku behsa jina kurd tê kirin ji qehremantiya wan, fedakarî, jîrektî, dilsozî, dengbêjî û hwd. aliyên erênî dibe mijarên lêkolînan. Ev aliyên ku bi wan pesnên jinên kurd tê kirin li aliyekê, di rastiya nava civakê de cihê jinê çi bû, çawa bû û jinan bi xwe çi digotin? Bi ya me ev mijar hê jî bi xumam e. Her çiqas çend berhemên folklorîk yên li ser jinên kurd derketibin û hin xebatên lêkolînî hatibin kirin jî bi ya me gelek aliyên şêlî hene û divê ev lêkolîn ji aliyê jinan ve bi hişmendî û zanînek jinane ve bên lêkolînkirin.*

Jinên kurd ji aliyê nivîsandina çîrok û romanan ve di serdema modern de bi derengmayînekê derbasî qada edebiyatê bûne. Sedemên vê derengmayînê li gor şert û mercên siyasî, aborî û civakî cur bi cur in lê di bingeha wan a sereke de serdestî û desthilatdarî heye. Heta salên 90î jî nivîsandina bi kurdî li Tirkiyeyê qedexe bû lewma nivîsandina bi zimanê dayikî encax li welatekî din pêkan bû. Desthilatdariya dewletê ya li ser kurd û zimanê kurdî ne tenê ji bo jinan e elbet, lê jin ji aliyekê din ve jî di bin desthilatdariya mêrên civaka xwe ya feodal û oldar de ji du aliyan di bindestiyeke giran de ne. Ji aliyê perwerde û pêşketinên civakî jî jin ne xwediyê îmkanên maddî bûn û ne jî xwediyê nasnameyek azad bûn. Lewra jin heta van salên

* Li ser jinên kurd ên di nava civak û folklorê de hin berhemên ku hatine dayîn ev in: Rohat Alakom, *Di Folklora Kurdî de Serdestiyek Jinan*, weş. Avesta, Stembol, 2013. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara, 2002. Mehmet Bayrak, *Osmanlı'da Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara, 2010. Mehmet Bayrak, *Kuşatmayı Yaran Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara, 2015. Hazal P eker, *Kürt Kadını –Amazonlar-*, weş. Evrensel Basım Yayın, Ankara, 2015.

dawî ku hê jî tesîra wê berdewam e, girêdayî adet û fêhmên berê, êsîrê feraseta baviksalariyê bûn. Xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê li derekê, zarokên keç ên kurd bi derengî dest bi xwendin û nivîsandina dibistanên li Tirkiyeyê kirin. Ji aliyekê ve kêmbûna dibistanan ên li gundan, ji aliyê din ve hişmendiya malbatên feodal û oldar rê li ber xwendina zarokên keç digirtin. Lê tablo bi tevahî ne reş e; lewma li gund û bajarên ku derfetên xwendinê lê hebûn, malbatên ku bi hişmendiya perwerdehiyê û wekheviya keç û kurikan tevdigeriyan zarokên xwe yên keç jî dişandine dibistanan. Di derbarê xwendin û nivîsandina zarokên keç û kur û çûna wan a dibistanan de îstatîstikên di destên me de tune ne lê em kêm zêde ji civaka xwe dizanin ku, di nava malbatên kurdan de bi piranî ne wekheviyek di navbera zarokên keç û kur de heye. Çawa ku di nava civakê jin li gor mêran, di asteke jêrtir de tên dîtin, di nava malbatê de jî heman dîtin heye lewra tesîra xwe li qada perwerdehiyê jî daye. Jin li gor piraniyê mêrên ku di dibistanên bilind de xwendine ji aliyê perwerdehî û pîşekariyê ve li paş mane. Ji ber van sedeman û sedemên erdnigarî, netewî, siyasî, aborî û hwd. jinên kurd ji derfetên nivîskariyê dûr ketin û bi derengî dest bi nivîskariyê kirin. Ligel van rastiyan ku em behsa edebiyata jinê û nivîskariya wê ya bi zimanê kurmancî bikin, elbet wê kêmasî zêde bin. Lê ji aliyê din ve jî bi hêvî û rehetî em ê bikaribin behsa berhemên ku ji nav van zehmetiyan derketine bikin.

## 1. MIJAR Û GIRÎNGIYA XEBATÊ

Mijara vê xebatê rexneya femînîst û nivîskariya jinên kurd e. Bi mijara xebatê re têkildar di vê xebatê de teoriya femînîst û mijarên bi pirsgirêka jinê re girêdayîne di nava xebatê de cih girtine. Ev xebat ne tenê li ser jinan e û mijara xebatê ne tenê bi jinan re têkildar e. Ji ber ku tadeyî û pêkutiyên li ser jinê bi her qadê re girêdayî ye û di nava jiyanê de her kes heye, mijara xebatê ji bo her zayendê ye.

Qada edebiyatê, ji bo ku jin pirsgirêkên xwe ragihîne tevahiya gel û jinên din amûreke girîng e. Elbet wezîfeya edebiyatê ne ew e ku rewşa civakê ya sosyolojîk rave bike lê bivê nevê ligel meseleyên şexsî û estetîkî, civakek û meseleyên civakî tesîra xwe li ser nivîskar û berhemên wî/wê datîne. Îcar ku em bên ser edebiyata jinê, gelek caran em dibînin ku naveroka berhemê ji aliyê rewşa civakî û tadeya li ser jinê ve endîşeyên estetîkî û edebî li paş xwe hiştiye. Dema em bala xwe didin edebiyata devkî ango folklora kurdî jî meriv vê meselê baş dibîne. Di gelek lorik, dûrik û

kilamên ku ji aliyî jinan ve hatine gotin de em li rastî zehmetiyên wan, tadeya ji bav û birên wan, ji mêr û xesûyên wan, derdên xwedîkirina zarokên wan, keda wan a mal û karên din tên. Di gotinên wan de gazind û keserên wan tim li ber guhên me ne. Gotineke dayikên me heye ku dibêje "ji ber derdan, meriv pirbêj dibe." Ev gotina wan belkî jî mebesta me bi kurtî rave dike. Lê bi analîza van romanan de em ê bêdengiyekê jî bibînin ku wê ew bêdengî berevajî vê gotinê me bibe ber bi fikreke din: "Ji ber derdan meriv bêdeng dibe." Belê, em dikarin bibêjin ku edebiyat ji bo jinan bêhnvedanek bû. Bêhnvedaneke ku bi gotinên lihevhatî, nivîsên xemilandî, xuliqîbin. Lê îro bi edebiyata nivîskî ji bêhnvedanê wêdetir çûye û divê biçe.

Di xebat û lêkolînên li ser jinan de tiştê ku weke paradoksekê bi me tê xuyanîn ew e ku, ev mesele û xebat gelek caran ji aliyê nivîskar û lêkolînerên mêr ve hatine kirin. Meriv dikare bibêje ku bi zêdeyî gotar û xebatên ku li ser jinê hatine nivîsin ne ji aliyê jinan bi xwe hatine lêkolînkirin an nivîsandin. Li ser jinên kurd û edebiyata wan berhem û gotarên nivîskarên wek Rohat Alakom, Mehmet Bayrak, Haşim Ahmedzade, İbrahim Seydo Aydoğan hene. Lê ji xêncî Handan Çağlayan (ku xebatên wê jî bi zimanê tirkî ne) û hin gotarên jinan ku di kovaran (kovara Wêje û Rexne, Zarema) de hatine weşandin, xebatên bi kurdî û zanistî yên lêkolînerên jin tune ne. Ev yek jî bi xwe weke nakokiyekê tê xuyanîn. Bi ya me ev xebat, ji aliyê lêkolînerên femînîst, xwendevan û nivîskarên jin bên kirin wê mesele çêtir bê diyarkirin û çareserkirin.

Xebatên li ser edebiyata nûjen li Bakur, di van salên dawî de, bi saya çend enstîtuyên ku li Tirkiyê hatine avakirin, kovarên akademîk û yên din bi awayekî akademîk û zanistî bi pêş ve diçin. Lê dema em li xebatên li ser nivîskarên jin dinêrin em li valahiyeke mezin rast tên. Ev rewş jî bi ya me gelek kêmasî û yekaliyan derdixe. Lewma em vê xebatê ne tenê wek tercîhekê, weke peywîrekê dibînin û bi vê girîngiyê li mijara xebatê dinêrin.

## 2. MEBEST

Di vê xebatê de mebesta me ew e ku; bi peywenda rexneya femînîst em li ser romanên jinên kurd û edebiyata wan bi hurgîlî rawestin. Bi xwendina romanên jinên kurmanc re, em ê binêrin bê ka dinyaya jinê ya ku di nivîsê de der bûye çawa ye;

bêdengiya jinê ya bi salan di berhemên wan de dengekî çawa derxistiye; karakterên jin ên di van romanên nivîskarên jin de çawa hatine şayesandin, ew karakter xwediyê sekneke çawa ne û têkiliyên wan ên bi mêr û civakê re, bi malbatê û bi xwe re çawa ne; karakterên jin xwediyê biryarê xwe ne yan na, wek "biker" hatine danîn an hêj ne xwediyê îradeyekê ne; temayên li ser zayenda civakî, pergala baviksalariyê, jin, dayik, evîn, zewac û perwerdehiyê kîjan in? Di van berheman de hişmendiya jinane tê xuyanîn? Gelo di van romanên ku jinan bi qelemên xwe lê kirine sêwirandinek çawa heye; ji aliyê civakî, şexsî, siyasî, zayendî, û hwd. ve jin xwediyê dinyayeke çawa ne; di vê nêzîkatiyê de em ê hewl bidin bê ka şert û mercên siyasî, civakî, aborî perwerdeyî, çandî û hwd. tesîrek çawa li ser nivîskariya jinên Bakur daniye û ev tesîr çawa di dinyaya metnên wan de derbûne; tecrûbeyên wan yên li ser jiyanê û civaka zayendperest çi ne; meriv dikare di xwendina van berhemanan de fikreke hevpar ya jinê, ya herî girîng jî ev pirs e ku gelo meriv dikare behsa edebiyateke xweser ya jinên kurmanc bike?

Bi van pirsan re em ê hewl bidin ku romanên jinên kurmanc bi hûrgilî analiz bikin û binirxînin. Ligel rexneyên ku em ê li ser van berheman bikin, em ê li ser pirsa hebûna edebiyata jinên kurd* jî nîqaşan bikin û xwe bigihînin encamekê. Em ê bi rêya van berheman re di neynika nivîskarên jinên kurd de li civaka kurdan binêrin. Lewra gelek caran wekî gotineke jiberkirî tê gotin ku, edebiyat neynika civakê ye! Lê gelo edebiyateke ku qelem/kelama jinê tê de nexuyanî be wê civak çawa tê de bi zelalî xuyanî be? Heta niha me di neynika nivîskarên mêr de (di berhemên wan de) li civakê û hêmanên civakî dinêrî lê bi ya me ev nêrîn tenê bi aliyekê ye û ji bêterefiyê jî dûr e. Bi ya me edebiyat encax dema ku nivîskariya jinê tê de xurt be dikare bibe neynika civakê.

## 3. SÎNORÊN XEBATÊ

Xebata me wê li ser romanên jinên kurmanc ên Bakurê Kurdistanê, di navbera salên 2008 - 2016an de be. Li gor agahiyên ber destan, beriya 2008an li Bakur romanên jinên kurmanc nehatine çapkirin. Sedemên sînorkirina vê tezê ev in: Li ser edebiyata jinê, femînîzmê û zayenda civakî mijuliyet û eleqeyek me heye û pêdiviya edebiyata kurdî jî bi zelalkirina van mijaran heye.

* Di vê xebatê de wê tenê romanên jin ên ku bi zaravayê kurmancî hatine nivîsandin bên analîz kirin. Lê ji vir û pêve em ê di vê xebatê de peyva jinên kurd bi kar bînin.

Bi qeneata me, berhemên nivîskarên jin encax bi nêrîn, xwendin û rexneya jinê ve bikaribe xwe derxe pêş û cihê xwe bibîne. Dema ku berhemeke jinê ji perspektîfên jineke din bê dîtin wê demê cihê xwe di edebiyateke femînîst de digire. Bi vî awayî hiyerarşiya di navbera lêkolîner û mijarê de kêm dibe û samîmiyeta xebatê xurt dibe.

Cografyaya kurdan ji ber ku di nav çar sînorên dewletên serdest de maye meriv nikare ji aliyê dîrokî, rewşa civakî, polîtîk û hwd. xebateke bi rêk û pêk li ser kurd û kurdî bike. Berê xebatê illeh bi sînor dibe û rewşa kurdên li her çar perçeyan encameke din derdixe. Ji ber ku her perçe li gor dewleta ku tê de maye reng û berê xwe ji ya din cuda kiriye. Ji aliyê din ve pirbûna zaravayên kurdî jî van kêşeyan zêdetir dike. Lewma ev xebat bi romanên nivîskarên jinên kurd ên bakur hatiye sînor kirin. Him ji alî rewşa jinên li vir û him ji aliyên civakî, polîtik û sosyolojîk ve em ê bêhtir bikaribin şahidiya cografyaya Bakur bikin. Zimanê kurdî li Bakur heta salên 90î jî di bin gef û qedexeyên komara Tirkiyê de bû lewma ji aliyê nivîsandina bi zimanê dayikê û edebiyatê ve tu pêşketinek ne pêkan bû. Di van salên dawîn de Bakur ji alî edebiyata kurdî de bi pêş dikeve û berhemên jinan jî hêdî hêdî zêde dibin. Li Bakur ji xêncî zaravayê kurmancî, zaravayê kirmanckî jî heye lê heta niha em li rastî romaneke jin a ku bi kirmanckî hatiye nivîsandin nehatine.

Di vê tezê de em ê li ser romanên pênç nivîskarên jin rawestin: Zarîfe Demir, *Kela Bilind*[2] (2008); Gulgeş Deryaspî, *Xezal*[3] (2013); Çidem Baran *Lerizînên Tenêtiyê*[4] (2012); Yildiz Çakar, *Gerîneka Guernicayê*[5] (2016); Aynur Aras, *Leylana Kesk*[6] (2016). Digel ku romana Eqîde Tok ya bi navê, *Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê*[7] du romanên Çidem Baran; *Li Peravên Torê Torên Evînê*[8], *Li Du Siya Sêwiran*[9] û romana Gulgeş Deryaspî, *Tariya Bi Tav*[10] jî hebin, ji ber ku naveroka van romanan mijara xebata me eleqedar nedikir, me ev roman li derveyî xebatê hiştin.

---

[2] Zarîfe Demir, *Kela Bilind*, weş. Apec, Stockholm, 2007.
[3] Gulgeş A. Deryaspî, *Xezal*, weş. J&J, İstanbul, 2013.
[4] Çidem Baran, *Lerizînên Tenêtiyê*, weş. Ronahî, Amed, 2012.
[5] Yıldız Çakar, *Gerîneka Guernicayê*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2016.
[6] Aynur Aras, *Leylana Kesk*, weş. J&J, İstanbul, 2016[7] Eqîde Tok, *Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê*, weş. Aram, İstanbul, 2016.
[8] Çidem Baran, *Li Peravên Torê Torên Evînê*, weş. Ronahî, Amed, 2011.
[9] Çidem Baran, *Li Dû Siya Sêwiran*, weş. Ronahî, Amed, 2014.
[10] Gulgeş A. Deryaspî, *Tariya Bi Tav*, weş. Do, İstanbul, 2010

# 4. PIRSGIRÊK Û ASTENGIYÊN XEBATÊ

Berî her tiştî, ji bo vê xebatê, ji aliyê çavkanî û mînakên akademîk ên ku ji bo me bibin referans pir kêm bûn. Xebatên ku heta niha li ser jinên kurd hatine kirin bi piranî xebatên folklorî û siyasî ne. Lê xebatên ku bi nivîskarî û edebiyata jinên kurd re têkildar in bi çend gotaran sînordar in. Elbet ku meriv li kaniya edebiyata binêre xebatên li ser jinê, zayenda civakî û rexneya femînîst pir zêde ne lê dema ku mijar dibe kurd û kurdî mesele diguhere û dibe gilokek bê serî. Ma gelo edebiyateke jinên kurd hebû, femînîzmeke wan hebû, dîrokek wan hebû?.. Divê ji kû de bê destpêkirin, behsa zimaneke çawa, tarîxeke çawa, cografyayekî çawa bê kirin?.. Ev û gelek pirsên din bi serê xwe pirsgirêk û zehmetiyên li ber me zêdetir dikin.

Ji ber ku dîrokçeyek li ser femînîzma jinên kurd tune ye ji aliyê kronolojik û berhevkirina agahiyan de zehmetî derdikevin. Ligel ku hin komik, rêxistin û kovarên jinên kurd avabûne jî xebatên analîzker û berhevkar li ser wan çênebûne. Seba vê jî agahiyên di destên me de, parçe parçe û kêm in. Bi zehmetiyên vê xebatê re me pêdiviya bi dîroka jinên kurd jî ferq kir.

Di vê xebatê de ji aliyê ziman jî hin pirsgirêk derketin. Lewra di kurdî de literaturek, ferhengek li ser femînîzmê, edebiyata rexneya femînîst, tune ye; berhemên ku di van mijaran de li kurdî hatine wergerandin tune ne. Ji ber vê jî di aliyê bikaranîna hin peyvan de me hesasiyetek li gor zimanê kurdî û literatureke rexneya femînîst bijart. Weke mînak, di şûna peyvên "pederşah, pederşahî" de me peyvên "baviksalar, baviksalarî" maqûl dît û wiha bikar anî.

Li ser edebiyata femînîst ya jinên kurd berhemeke ku ji bo xebata me bibe rêber tune ye. Xebatên lêkolînî li derekê, di aliyê peydakirina romanên nivîskarên jin ên ku wê di vê xebatê de bibin keresteyên bingehîn jî astengî hebûn. Weke mînak, romana Zarife Demir ya bi navê *Kela Bilind* li cem tu weşanxaneyên kurdî yên li Bakur, kitêbxaneyên şaredariyan û nivîskaran tunebû. Heta gelekan ne navê romanê bihîstibûn û ne jî haya wan ji xwediyê vê romanê hebû. Axirê me ev roman li gel xwendevaneke jin peyde kir. Ev roman di sala 2007an li Siwêdê, ji weşanên Apecê derketibû û xuya ye ku pir zû hatibû jibîrkirin. Zarîfe Demir ligel ku yekem romannûsa jin a kurd e, heta niha li ser wê tu agahî me nedîtine, em li rastî hevpeyvîneke wê ya jî sohbeteke wê nehatine û ya herî balkêş ligel lêpirsînan jî em bi ser şopa wê venebûn.

# 5. RÊBAZ

Em ê di vê xebatê de weke rêbaz *bi navenda nivîskar rexneya femînîst a berê wê li jinê ye* bi kar bînin. Ev rêbaz di nava metodolojiya rexneya edebiyata femînîst de cih digire.[11] Di vê rêbazê de berhemên nivîskarên jin girîng in. Em ê bi rêya karakterên jin û pirsgirêkên jinên di van romanan de, nivîskariya jinên kurd û nêzîkatiya wan a li jinan bi çavekî rexneyî dahurînin. Xebatên femînîst, di nav zanistiyên civakî ji xeynî edebiyatê bi gelek beşên din, wek dîrok, antropolojî, civaknasî, siyaset û felsefeyê re eleqeder e lewma em ê di xebata xwe de bi qasî pêdivî û eleqeya xwe serî li disîplînên din yên akademîk bidin.

Di xebatên akademîk de ji bo bêterefiya xebatê xira nebe û xebat, nekeve bin tesîra fikrên lêkolîner, nivîskar xwe ji meylên şexsî dûr dixe. Lê ji bo xebatên femînîst, rêgez û sînorek hişk nîne. Her çiqas li ser vê meselê hin îtîraz û alozî hebin jî, bi giştî meyla ku tê qebûlkirin li ser azadiya lêkolînerên femînîst e. Elbet qest, ji vê azadiyê ne ew e ku lêkolîner çi bixwaze bibêje; mesele ew e ku lêkolînera femînîst di pêvajoya xebatê de dikare nasnameya xwe ya jinê bi bîr bîne, fikr û tecrûbeyên xwe daxilî xebatê bike.

Her wiha rêbaza rexneya femînîst, di heman demê de di nava rêbaza xwîner-navendî de ye. Seba van jî di vê xebatê de em ê bi van îmkanan carna rengê xwe diyar bikin.

Di vê xebatê de ji bo rêbaz û metodolojiya rexneya edebiyata femînîst me ji berhema Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*; Josephine Donovan, *Feminist Teori,* Eunkyung Oh, *Feminist Eleştiri Bağlamında XX. Yüzyıl Türk ve Kore Romanında Kadın,* sûd wergirt.

Di xebata me de ev berhem weke çavkaniyên sereke ji me re bûn alîkar. Di beşa yekem de em ê çarçoweya teorîk peşkeş bikin. Ji ber ku di edebiyata me de xwendina femînîst hê mijareke xalî ye û lîteratur, ziman û qaîdeyên li ser edebiyateke jinê tune ye em ê cih bidin teorî û tevgera femînîzmê û hin cureyên wê. Piştre em ê li ser jinên kurd û femînîzmê hin agahiyên ku me berhev kirine ragihînin

[11] Di beşa duyem ya vê xebatê de bi hurgilî em ê li ser vê rêbazê bisekinin

Di beşa duyem de, em ê li ser rexneya edebiyata femînîst û rêbazên vê rexneyê rawestin. Piştre jî em ê li ser edebiyata jinên kurd û bêdengiya rexneya edebiyata jinê nîqaşekê vekin û pirsên xwe bikin.

Di beşa sêyem de axirê em ê dahurandina 5 romanên nivîskarên jin bikin. Di van romanan de karakterên jin ên sereke û jinên ku di romanan de derbas dibin wê bên analîz kirin. Bi rêya van karakterên jin re em ê di derbarê nêrîn û nêzîkatiyên nivîskaran rexneyên xwe bikin û dîtinên xwe eşkere bikin. Bi analîza van romanan em ê lê bigerin bê ka di dinyaya van romanan de nivîskarên jin texeyyûlek an rastiyek çawa rêsandine; dinyaya nivîskarên jin ên di van romanan de çawa ye; di van berheman de peyam û tecrûbeyên xwe ji jinan re şandine yanî gazî jinan kirine; ji aliyê zayenda civakî, pirsgirêkên jinê, zayendîtiyê, zanistê, perwedehiyê, siyasetê ve dîtin û fikrekên wan ên ku di van romanan de derbûne çi ne? Wê ev bên tesnîfkirin. Bi babetên sereke yên ku di van romanan derketine pêş û rewşa jinê ya li dor van babetan wê bên dayîn. Wekî din di navbera nivîskarên van metnan de mijarên hevpar û cuda çi ne; di kîjan aliyan de digihêjin hev û ji kîjan aliyan ve ji hev cihê dibin; gelo meriv bi van berheman re dikare behsa edebiyateke jinên kurd bike? Em ê hewl bidin ku di nava xebata xwe de van pirs û nîqaşan bibersivînin.

# BEŞA YEKEM

# DI NAVA DÎROKÊ DE PÊŞVEÇÛNA FEMÎNÎZMÊ

Di vê beşê de em ê cih bidin têgeh û pênaseyên li ser femînîzmê, dîroka femînîzmê, pêlên wê û cureyên femînîzmê. Em ê li ser van yek bi yek rawestin û di dawiyê de em ê li ser jinên kurd û têkiliya wan a bi femînîzmê re nîqaşan bikin.

## 1.1. Femînîzm û Sê Pêlên Femînîst

Femînîzm, ji *femîne* (jin) latînî tê û di zimanê frensî de weke têgeh cihê xwe bi *femînîzm* ê girtiye. "Tê îdîa kirin ku, têgeha femînîzmê cara ewil di sala 1837an, di utopyaya ramanwerê bi navê Charles Fourier de, ji bo parastina ku jin û mêr di civakekê wekhev û azad bijîn, hatiye bikaranîn."[12] Li ser wateya femînîzmê gelek pênaseyên femînîst û lêkolîneran hene. Ev pênase ji ber hin nêzîkatiyên cuda ve ne wek hev bin jî, bingeha wan ji heman kaniyê tê. Yek ji wan pênaseyên femînîzmê, pênaseya dû dirêj ya Collin e ku bi me jî maqûl tê û wiha ye: "Femînîzm: Tevgereke wilo ye ku nîvê mirovahiyê eleqeder dike lê ne avakerek wê (ne jin ne mêr), ne doktirînek wê yê ku meriv serî lê bide, ne rêya wê yê herî rast, ne nûnerên wê yên xwediyê otorîteyekê, ne partiyek, ne endamên wê yên fermî, ne stratejiyên wê yên ku ji berê ve hatibin diyarkirin, ne axa wê, ne jî temsîlîyetek wê yê ku xwe bispêre lihevhatinekê heye û di nava van rewşên ku biryar li serê nayên dayîn de, bê sekin biryaran diyar dike. Tevgereke civakî û siyasî ye ku di roja me de terza nêzîkatiya xwe û şêweya jêpirsînên xwe li hemû dinyayê ferz dike. Tevgerek e: binavkirineke di cih de "tevgera jinê". Objeyek ku nasnameya wê nayê diyarkirin."[13] Nivîskar bi vê pênase û şîroveyê de esas di vê îddayê de ye ku, guzergehek diyar, sînoreke li ber çav û rast, ji bo femînîzmê tune ye, ew dikare li her deverî jî be, lê ciheke wê yê sabît û sekna wê tune ye lewra ew tevgereke dînamîk e. Meriv dikare bi kurtehî bibêje ku femînîzm ya jî tevgera femînîst, li hemberî serweriya nêrî û hemû cureyên desthilatdariyê, têkoşîna li ser azadiya jinê û mafên ku hatine bindestkirin diparêze.

---

[12] Çiğdem Yazıcı, "Felsefede Toplumsal Cinsiyet ve Feminizm", dnd. *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları* (amd.) Feryal Saygılıgil, weş. Dipnot, Ankara, 2016, r. 67.
[13] Françoise Collin, Iréne Kaufer, Feminist Güzergah, wer. Gülnur Acar Savran, weş. dipnot, Ankara,2016, r. 21.

Li welatên Ewropî, Emerîka û Ingîlîstanê, bi serdema ronakbûnê û piştî Şoreşa Fransizan (1789), fikrên li ser, wekhevî, azadî, biratî, neteweyî û edaletê bi pêşketin û bi gihîştina van fikran re lêgerînên nû, tevger û teoriyên nû derketin. Di nava atmosfer û lêgerînek wilo de jinên ku ji serdama navîn û feodal ve di nava pergala baviksalariyê, serdestiya ola Xristiyaniyê (Xristiyaniya ku di bin yekdestiya dêran û papayan de mabû) de gelek bobelat û zilm dîtibûn, hêdî hêdî rabûn ser pêyan û ew jî ketin nav lêgerîn û daxwazên wekhevî û azadiyê. Meriv dikare bibêje ku dawiya sedsala 18. bû fersendek ji jinên rojavayê dinyayê re ku weke zayendeke bindest bi dû maf û nasnameya xwe bikevin. Berhema ewil ku destkeftiyek ji van salan e, *A Vindication of the Rights of Women* (1792) (Kadınların Haklarının Doğrulanması) ya nivîskara îngilîz Mary Wollstanecraft e. Di vê berhemê de Wollstanecraft, wekhevî û newekheviya di navbera jin û mêran tenê di nava civakê de dibîne lewra di xwezaya jin û mêran de wekheviyek heye.[14] Ev berhem ji bo xebat û berhemên din ên li ser femînîzmê bû destpêkeke nû. Beriya vê sedsalê, li Ewropaya serdema navîn de, ji ber rêveberiya qiraliyetê, dêrên katolîk, baweriyên xurafî û pergala feodal jin di nav lêgerînên xilasiyê de bûn û hin jinên ku li ser navê jinan daxwaza mafên wekheviyê dikirin hebûn ku yek ji van Marie de Jars de Gournay e. Di sala 1622an de Marie de Jars de Gournay, nivîsekî bi navê "Wekheviya Jin û Mêran" diweşîne. Di vê nivîsê de dibêje ku, her du zayend (jin û mêr) ne di ser her hev re ne û wekhev in.[15]

Ji van pênase û şîroveyên jinên feminîst derdikeve holê ku hê di serê ewil de îtîraza jinan ji bo hiyeyarşiya di navbera jin û mêran de bû. Jinan weke mêran daxwaza desthilatdariya li ser mêran nekirine, wan di serê ewil de dawxaza wekheviya mafan kirine.

---

[14] Gülnur Savran, "Feminizmler", dnd. *Feminizm Kitabı Osmanlı'dan 21. Yüzyıla Seçme Metinler* (amd.) Hülya Osmanağaoğlu, weş. Dipnot, Ankara, 2015, r. 177.

[15] Didem Şerbetçi, *Postkolonyal Feminizm Bağlamında Küresel Kızkardeşlik Kavramının İncelenmesi*, Teza Mastirê ya çapnebûyî, Zanîngeha Adnan Menderes, Enstîtuya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Têkiliyên Navneteweyî, Aydın, 2013, r. 13. Di jêrenota vê rûpelê de di derbarê Gournayê de ev agahî hene ku me hêjayî nivîsandinê dît: Ev nivîskara femînîst ya ku wek Maria de Gournay jî tê nasîn, di navbera salên 1565-1645an li Fransayê jiyan kiriye. Zirkeça Montaigne ye û wek nivîskareke ku fikrên li ser pêş femînîzmê bi pêş xistiye tê qebûl kirin.

Dîroka tevgerên femînîst piranî bi sê pêlan tên kategorîkirin. Ev yek ji bo ku nîqaşên li ser femînîzmê yên destpêkê hêsan bike û li gor pêşketinên dîrokî ya tevgera femînînîst perspektîfekê derbixe tê tercîhkirin. Elbet hemû lêkolînvanên femînîst vê rêbazê qebûl nakin û xetên tûj naxin nava sal û pêşketinan. Yek ji van femînîstan Donovan, ligel ku kategorîkirina pêlên femînîst fonksyonel dibîne, balê dikşîne ser aloziyên wê. Dibêje ku "pêla yekem" ne pêla ewil ya femînîzmê ye lewra di sedsalên 15. , 16. û 17. de pêlên femînîst hene.[16]

Qesta Donovan û lêkolînvanên femînîst ên ku li dij dabeşkirina dîrokî ya li ser pêlên femînîzmê derketine ji tesîra dîrokî û paşxaneyeke dûr ya jinan e. Bi ya wan beriya bikaranîna peyva femînîzmê û destpêka sedsala 18. yanî beriya van dîrokên eşkere û kategorîkirî, jin di sedsalên berê de jî di bîra bindestiya xwe de bûn û bi mijarên li ser mafê jinan û tadeya li ser wan re mijûl dibûn. Gava meriv di nava van fikran de li mesela bi tarîxkirina pêlên femînîzmê dinêre bi ya me jî guman li ser mijarê çêdibe. Ji ber ku tevgerên weke femînîzmê ango jinan û hin tevgerên civakî nêrîneke pozîtîvîst û sînorên wê diyarkirî nikarin li wan bên bar kirin. Lê gava meriv ji aliyê giştî û dînamîkên girseyî ve li meselê binêre, bi dîrokkirin û dabeşkina pêlên femînîzmê bi me maqûltir tê. Pêlên femînîzmê, girseyên zêde û dînamîk ku êdî dengê wan di serdemên modern de bi bilindahî derdikevin nîşan didin. Di van pêlan de xuyanîbûnek, tevgereke girseyî û dînamîzmek li gor ruhê zemanê têdeyî heye. Ji aliyê xebatên zanistî ve jî kategorîkirina van pêlan hêsaniyekê dide mijara femînîzmê û fêmkirina wê. Heta niha piraniya xebatên li ser femînîzmê bi van sê pêlan tên dayîn û dabeşkirin. Lewma em ê jî di vê xebatê de weke piraniya xebatên heyî tevbigerin. Em ê bi kurtehî behsa van sê pêlên femînîzmê bikin û dûre jî em ê cureyên femînîzmê di nava salên ku derketine pêş re binirxînin.

Pêla yekem a femînîst, li gor rengê wê yê modern ji salên Şoreşa Emerîkayê (1776) û Şoreşa Fransayê hetanî salên 1960an didome. Di vê pêlê de daxwazên jinan zêdetir li ser mafên hemwelatîbûnê bûn. Ji bo wekheviya jin û mêran yên di nava kamûyê, saziyên dewletê de hebe çalakî û protestoyan dikin, daxuyanîyan didin.

[16] Josephine, Donovan, *Feminist Teori*, wer. Aksu Bora, Meltem Ağduk Gevrek, Fevziye Sayılan, weş. İletişim, İstanbul, 2014. r. 15.

Mijarê wan yên sereke; ji bo jinan jî mafê dengdayînê û hilbijartinê, mafê semyanîyê, di perwerdehiyê de fersendên wekhev (wekheviya ji bo xwendekarên jin û mêr) mafê karkirina bi heq bûn. Belê ev daxwaz ji dewletê dikirin lê li ser meseleyên baviksalariyê û desthilatdariyê nesekinîne. Di van salan de di nava qadên kamûyê de cih nedidan jinan û di her aliyê civakî, malbatî, perwerdehî, tenduristî û hwd. newekheviyek hebû. Lewma jî jinên femînîst yên vê pêlê pêşî daxawazên van mafan kirine. Lê ji aliyên din ve ev daxwazên femînîstên vê pêlê ji ber ku zêdetir xîtabî jinên burjuva û ji aliyê aborî û halxweşiyê yên di nav çîna navîn de bûn wek femînîstên lîberal hatin binavkirin. Weke detayekê em vê agahiyê neqil bikin ku di dîroka dinyayê de yekem girêva rojiya mirinê ji nav femînîstên vê pêlê derketiye.[17]

Destkeftiyên pêla yekem a femînîst herî zêde piştî Şerê Cîhanê ya duyem li gelek welatan bi dayina mafê karkirinê, dengdayîn û hilbijartinê û mafê semyaniyê rengveda. Qadên qamûyê yên ku jin tê de nebûn, ji jinan re vebûn û newekheviyên di navbera jin û mêran ên di van qadan de bi awayek fermî hatin rakirin.

Pêla duyem a femînîst bi salên 1960î re dest pê dike. Di vê pêlê de ji aliyekê nîqaşên wekvehiyê, ji aliyeke din jî nîqaşên li ser cudatiyê bi pêş ketine. Di van salan de bi bandora fikrên sosyalîst re jinên femînîst ketin nava lêgerînên nû yên li ser mafên jinê. Piştî salên şer û tevliheviyên dinyayê tevgerên Marksîst/sosyalîst fikrên nû afirandin û bi têsîra van fikran jinên ku destkeftiyên pêla yekem kêm û çewt didîtin dest bi daxwaz û çalakiyên nû kirin. Gelek femînstên ku di bin têsîra vê serdemê û fikrên sosyalîst de bûn çareseriya van pirsgirêkên jinê jî di şoreşa jinê de ditînin. Li gorî wan pêdiviyên jinan ji wekheviyê jî wêdetir bi azadiya wan hebû. Femînîstên vê pêlê weke "Femînîstên Radîkal" dihatin binavkirin. Li gorî wan mafên ku hatibûn dayîn tenê ji aliyê qada kamûyê bû, lê di aliyê qada taybet de problemên kûr û girîngtir hebûn. Cihê ku mafê jinan hatibû desteserkirin ne tenê di qadên kamûyê de bûn lê zêdetir di nava malê ku jê re "qada taybet" dihat gotin de bûn. Bi nêzîkatiya "tişta/ê taybet polîtîk e" jinan xwest ku ew cihê (mal û hemû girêdanên bi malê re) ku ji aliyê mêran mehrem dihat dîtin û jin mehkûmî malê dikirin deşîfre

[17] Ayşe Düzkan, "İkinci Dalga Feminizm" dnd. *İstanbul Amargi Feminizm Tartışmaları*, (amd.) Esen Özdemir, Sevgi Bayraktar. weş. Amargi, İstanbul, 2011, r. 177.

bikin. Bi ya wan jin di nava malê de, bi pirsgirêkên malî ve dihatin mehkûmkirin û ew mal wek cihê serdestiya mêr bû, lewma jinan xwest ku ev taybetiyên polîtîk bin û di nava qada kamûyê de cihê van nîqaşan vebin. Bi van fikir û tevgeran re jinên femînîst, komikên biçûk avakirin û tecrûbeyên xwe bi hev re parvekirin yanî ew tiştên ku taybet û mehrem dihat dîtin derbasî qadên kamûyê kirin. Bi van komikan re civînên bi navê "Bilindkirina Hişmendiyê" hatin lidarxistin û fikra "xwişkên jin" di encama van civînan de derket. Li tevahiya cîhanê jin di bin pêkutî, zilma mêran û desthilatdariya mêr serwer de bûn, ji bo vê jî divê ku femînîzm bang li hemû xwişkên jin bike û tevgerên femînîst yên nû û cuda derkevin.

Li Emerîkayê jî Tevgera Mafên Mirovan û Tevgera Wekheviya Reşikan îlhamek li ser têkoşîna azadiya jinan danî. Di sala 1975an û 1985an de Neteweyên Yekbûyî, di derbarê pirsgirêkên jinê li Mexico City, Kopenhag û Nairobiyê sê konferansên navneteweyî li dar xistin û di van konferansan de biryarek wilo hate dayîn:

"Femînîzm, li ser pirsgirêk û berjewendiyên jinên ku ji herêmên cuda, çîn, netew û qewmên cuda hatine, derbirîna polîtîk e. (...), ji bo ku xîtabî jinên cuda, pêdivî û pirsgirên wan ên cuda bikin, divê pênaseyên ji bo jinan û ji aliyê jinan ve hatibin kirin hebin û hene".[18] Weke ku ji encamên van konferansan jî diyar dibe, di van salan de nîqaşên li ser jinên din yên cîhanê û femîzma wan bibe rojeva wan û li dor van nîqaş û kêşeyan dest bi xebatên nû yên li ser çaresiriya wan dikin.

Bi salên 1960î re li welatên Ewropa, Emerîka û Îngilistanê pêşketinên teknolojiyê li ser femînîstan bandorek çêkir û jinan bi xwendinê re xwe di aliyê zanista tenduristiyê de bi pêş xistin. Femînîstên Pêla Duyem bi pêşketinên tenduristî û perwerdehiyê re doza mafê dayikbûnê kirin û mafê kurtajê bi dest xistin. Dermanên zarok anînê derketin û jinan bi saya van kontrola zayînê xistin destên xwe.

[18] Margaret Walters, *Feminizm*, wer. Hakan Gür, weş. Dost. Ankara, 2009. r. 136.

Di vê pêlê de metnên jinan û nivîskariya wan hate dahurandin û berhema Simone de Beauvoir ya *Zayenda Duyem*[19] bi gotina "Mirov ji diya xwe jin çênabe, mirov dibe jin" mohra xwe danî. Bi vê dirûşmê re De Beauvoir balê dibe ser zayendiyê, ji ber ku rolên zayendî ne bi bîyolojiyê re bi civakê re çêdibin û jin bi van rolên çêkirî, yên ku civakê ava kirine dibin zayenda duyem. Yanî mesele ne di zayendiyê de lê di civaka zayendparêz de ye. Têgeha *zayenda civakî (gender)* di van salan de ji bo femînîstan rexbeteke girîng dît lewra bi saya analîzên li ser vê têgehê mesela jinê û nêzîkatiyên zayendîparêzî berfirehtir hatin ravekirin. Digel ku dema De Beauvoir ev berhem nivîsand ne femînîst sosyalîstek bû, (di sala 1949an yanî beriya 1960an tê weşandin) di nav pêla sêyem a femînîst de ciheke girîng girt û di nava çend salan de bi gelek zimanan hate wergerandin.[20] Di vê berhema xwe (Zayenda Duyem) de De Beauvoir jinê weke zayendeke bindest û duyem, bi kûrahî û felsefî dadihurîne. Femînîstên vê pêlê li ser metnên edebî yên mêran jî dest bi xebatên rexneyî û nû kirin. Mebesta wan bi van xwendinan ew bû ku, di metnên nivîskarên mêr de nêzîkatiyên li hemberî jinê û rengvedanên nêrîna mêr û zayenda civakî ji nû ve bixwînin.

Pêla sêyem, di serê salên 1990î de, bi rexneyên li ser pêla duyem re derket. Nîqaşên wan zêdetir li ser *curbicurî û cudayetiyê* bûn. Li gor femînîstên pêla sêyem, tevgera femînîst ya pêla duyem xîtabî jinên çîna navîn, jinên spî û yên heteroseksuel dikir lewma cudatiya di navbera çîn û nîjadiyê de pişguh dikirin. Li gor femîstên pêla sêyem tadeyî û pêkutiyên li ser jinê li gorî neteweyî, erdnigarî, dîrokî û gelek sedemên cur bi cur diguhere. Tevgera pêla sêyem balê dikşînin ser nasnameyê, cudatiyan û heyberên herêmî. Nêzîkatiyên ewrosentrîk rexne dikin û dixwazin ku

[19] Di vê berhemê de Beauvoir, li ser zayendiyê kûr dibe. Bi ya wê zayendî, jidayikbûnê ve tê, lewma bîyolojîk e û li beramberî wê ya jin heye ya jî mêr. Zayenda civakî (gender), rolên ku civak dide zayendê yanî biryara rolên jinbûn û mêrbûnê civak diyar dike lewma jî zayendî, pênaseyek guherbar e. Navê vê berhema Simone de Beauvoir cara ewil bi firensî bi navê *La Deuxième Sexe* derdikeve. (1949) Ev berhem li gelek welatan belav bûye û bi gelek zimanan wergerên wê hene. Berhem li Tirkiyê ji weşanên Payelê di salên 70'yî de, bi serenavê *Kadın* bi sê cildan hatiye weşandin: Simone De Beauvoir, *Kadın "İkinci Cins" Genç Kızlık Çağı*, wer. Bertan Onaran, c. 1, ç. 7, weş. Payel, İstanbul, 1993; *Kadın, "İkinci Cins" Evlilik Çağı*, wer. Bertan Onaran, c. 2, ç. 8. weş. Payel, İstanbul, 2010; *Kadın "İkinci Cins" Bağımsızlığa Doğru*, wer. Bertan Onaran, c. 3, ç. 8, weş. Payel, İstanbul, 1993.

[20] Düzkan, hg, r. 178.

tevgera femînîst ji navenda Rojava derxînin û li nav tevahî jinên cîhanê belav bikin. Lê li gor Uma Narayan femînîzm, ne tiştekî ku ew ji Rojava hînî wê bûye; ew ji tecrûbe û şahidiyên xwe yên di nava têkiliyên baviksalar de hînî femînîzmê bûye. Lewma bi ya wê ji ber ku neteweparêzên herêmî naxwazin bi pirsgirêkên xwe yên baviksalariya herêmî re rû bi rû bibin, rexneyên femînîst yên herêmî wek îcadeke Rojava dibînin û biçûk dixin.[21]

Di nav xebatên edebî yên pêla sêyem de ji teoriyê zêdetir çîrokên şexsî li pêş in lewma wek cureyek femînîzma "tu bi xwe çêke" ye.[22] Di vir de kirpandina tecrûbe û jiyana takekesî heye. Jin serpêhatî û bûyerên xwe, jiyan û tecrûbeyên ku ji nava jiyanê dibînin bi qîmet dibînin. Bi nêrîna vê pêlê re cudabûn û rengîniya jinan derkete pêş. Bi gotina Bell Hooks êdî "Femînîzm ji bo herkesî ye"[23] û herkes dikare bi cudahiya xwe têkeve nava femînîzmê û temsîliyeta xwe di wir de bibîne.

## 1.2. Cûreyên Femînîzmê

Bi geşbûn û belavbûna pêla sêyem re, cureyên femînînîzmê jî ketin nava rojeva cîhanê. Cureyên femînîzmê zêde ne weke; Femînîzma lîberal, femînîzma radîkal, femînîzma Marksist, femînîzma sosyalîst, femînîzma postmodern, femînîzma binyadger û postbinyadger, femînîzma psîkanalîtîk, femînîzma çandî, femînîzma lezbîyen, femînîzma Dinyaya Sêyem gelek cureyên wê hene. Her cureyeke femînîzmê li ser bingeha pirsgirêkên jinan û çareseriya wan nêrîn û rêbazên xwe li pêş dixin. Di vê xebatê de em ê li gor kronolojiyê li ser Femînîzma lîberal, femînîzma Marksist, femînîzma radîkal, femînîzma sosyalîst û femînîzma postmodern rawestin.

---

[21] Yazıcı, h.g. r. 73.
[22] Donovan, h.b. r. 384
[23] Gotina "femînîzm ji bo her kesî ye" navê berhema Bell Hooks bixwe ye. Hooks di vê berhema xwe de balê dide ser rengînî û cudahiya jinan û bi ya wê tevgerara femînîst, ji bo jinan, mêran û herkesî ye. Ji bo herkesî divê bi pêşve biçe ji ber ku tevgera femînîst, hewil dide ku dawiyê li zayendpestiyê bîne. Ji bo agahiyên berfirehtir bnr: Bell Hooks, *Feminizm Herkes İçindir Tutkulu Politika*, wer: Ece Aydın, Berna Kurt, Şirin Özgün, Aysel Yıldırım, weş. bgst, İstanbul, 2016.

### 1.2.1. Femînîzma Liberal

Femînîzma lîberal, mîrateya serdema Ronakbûnê ye û bingeha xwe ji fikra polîtîk ya lîberalîzmê digire. Li gorî fikra lîberal, feraseta jin û mêr ji aliyê fikrên aqilane (rasyonel) ve weke hev e. Di vê serdema Ronakbûnê (ya jî serdema aqiliyê) de fikra "mirov xwediyê mafên xwezayî û jêneger in û hikûmet nikarin li hember van mafan derkevin" him di Danezana Serxwebûna Emerîkayê (1776) him jî di Danezana Mafên Mirovan yên Fransayê (1789) de cî girt.[24] Bi van danezîn û pêşketinan re hêviyên li ser wekheviya jin û mêran bi femînîstên vê serdemê re zêde dibûn. Helbet di van salan de jinên ku ji gotinên mafên mirovan bi guman jî bûn hebûn. Mary Astell di nivîsek xwe de dibêje, "heger serweriya teqez ji bo dewletê ne pêwîst be, çima di nava malbatê de pêwîst tê dîtin? Û heger hemû mirov ji zayînê ve azad bin, çima hemû jin xulam çêdibin? Çunkî li gor ku jin îtaetkerên daxwazên kêfî, nediyar û hevnegitî yên mêran in, ma ev ne xulamtî ye lê çi ye?"[25] Lê ji aliyê din ve teorisyenên lîberal ên mêr mafên xwezayî aîdê mêran didîtin û dema behsa mirovan dikirin, mirov bi zayenda mêr pênase dikirin. John Locke yê ku mafên xwezayî ji bo hemû mirovan didît diparast jî wek tevahî mêrên lîberal, jin di bin stara mêrên xwe û aîdî malê didît[26]. Ligel ku hin jin ji vê serdema Ronakbûnê û mafên mirovan bi şik bûn û ji pêkutiyên mêr ne razîbûn jî, tevgerên jinên femînîst li gor ruhê vê serdemê bi dû doza mafên xwe yên wekheviyê de bûn. Femînîstên lîberal dixwestin ku di nava qadên kamuyê de çi mafên ku ji mêran re vekirî bûn, ji bo wan jî bên dayîn. Li gorî wan mêr û jin ji aliyê aqil û hişmendiye ve weke hev in lê divê ku jin ji aliyê perwerdehiyê ve xwe li pêş bixin ku bigihêjin zanîna mêran lewma jî mafê xwendin û perwerdehiyê berî her tiştî didîtin. Eger jin bixwînin wê him bigihêjin zanînê û him jî wê bibin xwedî kar û ji bin mineta aborî ya mêr rizgar bibin.

Femînîstên liberal, çareseriya wekheviya jin û mêran di guhertinên zagonî, mafên zagonî û perwerdehiyê de ditînin. Bi sedemên ku femînîstên lîberal, bi kûrahî li ser pirsgirêkên jinê yên bingehîn nesekinîne û nêzîkatiyên civaka zayendîparêz baş fêm nekirine ji alî femînîstên din hatine rexne kirin.

---

[24] Donovan, hb. r. 22.
[25] Fatmagül Berktay, *Kadın Olmak Yaşamak Yazmak*, weş. Pencere, İstanbul, 1998, r. 84.
[26] Donovan, hb. r. 26.

### 1.2.2. Femînîzma Marksîst

Piştî nîveka sedsala 19. nîqaşên li ser femînîzma liberal û li dor çareseriyên ku femînîstên liberal ji bo pirsgirên jinan danîbûn, nîqaşên pêkanîna tecrubekirina wan dest pê bûn. Bi van nîqaşan re, rê ji derketina femînîzma markîst re vedibe.[27] Femînîstên marksîst ne di wê baweriyêdene ku bi maf û reformên zagonî pirsgirêkên jinan bên çareserkirin; belkî hinekî kêm bibin lê ne pêkane ku ji holê rabin. Li gor wan di nava civaka çînî de jin bibin çîneke xweser jî bi çareseriyên femînîstên liberal kêşeyên jinan çareser nabin. Çunkî di civaka çînî de derfetên wekheviyê ne mimkun e û sedema bindestiya jinan jî pergala kapîtalîst e.[28] Li gor femînîstên Marksîst jin, weke hemû çînên bindest ancax bi şoreşeke sosyalist dikarin ji pergala kapîtalîzmê û serdestiya mêrane rizgar bibin.

Bingeha femînîzma Marksîst ji fikir û teoriyên Marks û Engels pêk tê. Li gor femîstên marksist, sedema bingehîn a newekheviya zayendan pirsgirêka çînî ye û çareseriya rewşa jinê xwe dispêre dahurîna têkilên maddî.[29] Femînîstên marksîst, pirsgirêka bindestiya jinê, ne di zayendiyê de lê di pirsgirêka çînî de didîtin. Lewra bi ya wan, koletî û bindestî di serdema kapîtalîzmê de, li ser amûrên hilberînê û teşeyê milkiyetê ava dibe. Marks, li ser kêşeyên jinan û femînîzmê bi taybetî nexebitiye lê fikren wî yên li ser jin û malbatê, teoriyên li ser ked, hilberîn û aboriyê ji bo femînîstan tesirek xurt daniye. Lewra gelek femînîstan fikir û teoriyên Marks û Engels li gor mijarên jinan adapte kirine. Li gor marksîstan ked, ji aliyê sermayedaran ve di pergala kapîtalîst de, ji destên xwediyê kedê (proleter) hatiye dizîn, lewra ew kedxwarên civakê ne. Femînîst jî, ligel vê fikrê, li ser pirsgirêka jinê disekinin; li gor wan jin ji aliyê mêran ve hêj beriya tarîxê, ji serdema civaka baviksalar û vir de, di bin tadeya mêran de ne. Mackinnon, têkiliya femînîzm û Marksîzmê wiha dinirxîne: “Ji bo marksîzmê ked çi be, ji bo femînîzmê jî zayendî ew e. Ew tişta ku bi tevahî yê însên be lê ji wî hatibe qurquçandin û stendin.”[30]

[27] Ayşe Sevim, *Feminizm*, weş. İnsan, İstanbul, 2005, r. 63
[28] Zekiye Demir, Modern ve Postmodern Feminizm, weş. Sentez, İstanbul, 2014, r. 56
[29] Joanne Naiman, *Marksizm ve Feminizm İki Ayrı Kuram*, wer. Saadet Özkal, Stenbol, 1988, r. 17.
[30] Catharine A. MacKinnon, *Femînîst Devlet Kuramına Doğru*, wer. Türkan Yöney, Sabri Yücesoy, weş. İletişim, İstanbul, 2015, r. 1

Marksîst, rizgariya çîna proleter û têkbirina pergala kapîtalîst bi şoreşa sosyalîzmê ango bi desthilatdariya proleteryayê mimkun dibînin; femînîst jî wilo dibînin ku eger şoreşa zayenda jinê pêk were, jixwe pirsgirêkên civakî çareser dibin lewra, çareseriya pirsgirêkên civakî encax bi çareserkirina pirsgirêka zayenda civakî re mimkun dibe. Femînîstên Marksîst, ji aliyekê bêyî ku li berjewendiyên xwe yên çînî, aborî bigerin, ji bo ku jin in ji bo mafên jinan; ji aliye din ve jî ji bo mafên karkiran têdikoşin. Marksîst jî, femînîst jî doza mafên ku hatine dizîn dikin. Teoriya Marksîzmê helbet ji ya femînîzmê kevintir û kûrtir e û tevgera femînîzmê bi hêz û hêviya doza marksîzmê derketiye. Lê pirsgirêka jinê, beriya teoriya marksîstan tê; mesela wan ne bi pergala kapîtalîst re derket, lê bi wê re pêşket û teşeyeke din girt. Marks, sedema hebûna çînan di têkiliyên hilberînê yên civakî de dibîne û hişmendiya çînî yê proleteryayê dinirxîne. Li gorî Marks, yê ku îdeolojiya serwer ya civakê diyar dike kapîtalîzm e, lewra hemû amûrên hilberînê yên civakî di bin destê wê de ye. Femînîstên Marksîst îddîa dikin ku di nava pergala kedxwar de jin ji mêran zêdetir tên çewisandin û sedema vê yekê jî *biyanîbûn* e.[31] Çawa ku bi pergala kapîtalîst re, çîna proleter ji keda xwe tên dûr xistin biyanî dibin, jin jî bi pergala kapîtalîst re, ji keda xwe tên dûr xistin û dibin biyaniyê karê xwe. Biyanîbûn, yek ji wan encamên kapîtalîzmê ye ku mirov dike biyaniyê kar û keda xwe. Jinên ku di nava karên malê de tenê dimînin, him ji civakê dûr dikevin, him tu qedr û qîmetê keda wan ên di karên malê û xwedîkirina zarokan de nayê dîtin.

Mackinnon, hin aliyên wek hev yên marksîzm û femînîzmê wiha nîşan dide; Marksîzm û femînîzm her du jî li ser bingeha desthilatdar ya civakî û lêpariya ne wekhev dadihurin lewma her du jî dozîneyên desthilatdar in. Her du jî dozîneyên ne wekhev yên civakî ne. Di civakên ne wekhev de zayendî û ligel wê wek peywendiya di arezûya zayendî û pêwenda bi xwînê, wek nirx û ligel wê hêrsa bidestxistina milk û teşeyên milkî, beriya civakê, perçeyek ji dinyaya sirûştî, eslî ya jî efsûnî an jî hovber tê dîtin. Weke ku marksîzm, nirxên civakî wek hilberînê pêşkeş dike, femînîzm jî arezûyê, bi civakê re têkildar, ji bo pergalên ne wekhev yên civakî pêwîst dibîne, lê bi şert û mercên tarîxî jî girê dide.[32] Femînîstên Marksîst, bawerî bi

[31] Demir, hb. r.57
[32] MacKinnon, hb. r. 2

îdeolojiya Marks û Engels dianîn û çareserkirina pirsgirêkên jinan jî di xilasiya ji kapîtalîzmê didîtin.

### 1.2.3. Femînîzma Radîkal

Teoriya femînîzma radîkal, di dawiya salê 1960an û serê salên 1970an, ji aliyê komek jinên ji tevgera berê (jinên ku di salên 1960an de di nav çalakiyên polîtîk yên li ser mafên jinan û dijberî şer de bûn) ve bi esasî li New York û Bostonê hat bi pêşxistin.[33] Femînîstên radîkal û tevgera wan di pêla duyem de derketine, ji ber vê jî, ji bo femînîzma radîkal pêla femînîst ya duyem jî tê bikaranîn. Femînîzma radîkal heta salên 1970yî zêdetir li nav welatên Îskandînav belav dibe lê piştî salên 70yî navenda wan dibe Emerîka. Femînîzma Marksîst zêdetir li Ewrûpayê, femînîzma Lîberal jî zêdetir li Emerîkayê belav dibe.[34]

Wekî me li jorê dît, femînîzma lîberal bi fikrên lîberalîzmê, femînîzma Marksîst jî bi fikrên Marksîst tevdigeriyan lê ligel ku tevgerên çep têsîrek li ser femînîstên radîkal danîbin jî, ew ne ji nav bizaveke yekane û polîtîk derketine. Lewma meriv dikare bibêje ku femînîzma radîkal ne ji teoriyê lê ji çalakiyê avabûye. Ev yek jî rengê femînîzma radîkal ciyawaz û resen dike.

Li gor femînîstên radîkal newekheviya di navbera jin û mêran de ji cudatiya wan ya bîyolojîk dihat. Cudatiya di navbera jin û mêran de biyolojik e û bingeha têkiliyên civakî ji vê cudahiyê pêk tê.[35] Di dîrokê de karbeşiya ewil di navbera jin û mêran de derket, lewra têkiliyên desthilatdar ên ku ji ber vê karbeşiyê derketiye jî cudahiya yekem a çînî derxistiye.[36] Bi îddaya wan çîna ku ewil hatiye çewisandin jî jin in. Li gor femînîstên radîkal pêkutiya li ser jinê berî her tiştî ji saziya malbatê derdikeve lewra di nava malê de desthilatdariya mêr heye û jin di bin vê desthilatdariyê de dimînin. Marksîst saziya malbatê domkarê pergala kapîtalîst, femînîstên radîkal jî domkarê pergala baviksalariyê dibinin. Lewra li gor wan divê saziya malbatê ji holê rabe. Femînîstên radîkal sedema tadeya li ser jinan di

[33] Donovan, h.b. r. 265
[34] Erkan Dikici "Feminizmin Üç Ana Akımı: Liberal, Marxist ve Radikal Feminizm Teorileri" https://www.jasstudies.com/Makaleler/1376569194. 13.03. 2016
[35] Demir, hb. r. 64
[36] Savran, h.g. r. 186

baviksalariyê de dibînin. Li gorî wan baviksalarî (bi rêya saziya malbatê), berbelavî hemû aliyên jiyanê bûye û serweriya mêr zêde bi pêş ketiye. Bi ya wan pergala kapîtalîst ji holê rabe jî heya ku saziya malbatê hebe wê bakviksalarî bidome. Ji pêşengên femînîstên radîkal Millet vê rewşê wiha eşkere dike: "Pergala baviksalariyê, rehên xwe ewqasî berdaye ku, hîma şexsiyetên ku di her du zayenda de ava kiriye, ji pergaleke polîtîk wêdetir, di rewşa fikir û şêweyek jiyanê de ye."[37] Femînîstên radîkal li ser pêşketinên teknolojî û biyolojiyê disekinin. Li gorî Firestone ji bo ku şoreşa femînîst pêk were divê ku teknolojî di xizmeta biyolojiya jinan de be lewma divê jin dest deynin ser amûrên jinûve-hilberînê û bi vê teknolojiyê ji qedera xwe ya biyolojik rizgar bibin.[38] Bi îddîaya wê, eger mêr jî bikaribin zarokan bînin wê adalet çêtir pêk wer e. Jin jî bi saya teknolojiyê wê çêkirina zarokan zêdetir têxin bin kontrola xwe, kengî bixwazin û bi çi awayî bixwazin wê wilo zarokan bînin û ku nexwestin jî divê ji bo vê mêr nikaribin zorê li wan bikin. Femînîstên radîkal, pirsgirêkên jinan zêdetir bi biyolojiya wan ve girêdidin. Bi ya wan eger amûrên teknolojiyê bi pêş bikevin, wê malzarokên çêkirî, dola ji tûpê û gelek derfetên din ên ku jinan mecbûrî zarok anînê nekin bi pêş bikevin û bi van re jî wê jin ji qedera ku ji nava (zik, rehîm) wan ava dibû xilas bibin. Hin femînîstên radîkal li ser vê mesela biyolojiya jinan zêde disekinîn, lewra derdê jinan ji ber zikê wan (biyolojî) didîtin û çareyên alternatif yên ji zikê wan re hêviyên mezin bûn. Li gor femînîstên radîkal dayikbûn di encama civakbûnê de derketiye lewma ji bo jinan dayikbûn ne pêdiviyek e. Daxwaza dayikbûnê bi rêya medya û saziyên din bi civakbûnê re hatiye empozekirin.[39] Piraniya van femînîstan saziya zewacê red dikirin. Bi ya wan di zewacê de jin zêdetir dibin êsîr û xulamên mêr û baviksalariyê. Çimkî di nava malê de mêr xwe wek semyanê malê dibîne û her tişt li gor biryara mêr/bav teşe digre. Bi saziya zewacê re him xwe ji bo dayiktiyê û xwedîkirina zarokan, him jî ji bo karên malê û xizmeta mêr mecbur dibînin. Bi ya wan zewac dihêle ku pergala baviksalariyê xurttir bibe û bidome. Rizgariya jinê di serî de bi redkirina saziya zewacê re derbas dibe.

---

37 Kate Mıllett, *Cinsel Politika*, wer. Seçki Selvi, weş. Payel, İstanbul, 2011, r. 109

38 Donovan, hb. r.278

39 Ji bo agahiyên zêdetir bnr: Demir hb. r. 66-67

Daxwaza femînîstên radîkal ji jinan ev e: Ligel hemû cudahiyên xwe yên olî, çandî, netewî, dîrokî û hwd. divê hemû jin li hemberî pergela baviksalariyê li her deverê cîhanê bi rêxistin bibin û bibin yek.

### 1.2.4. Femînîzma Sosyalîst

Tevgera femînîzma sosyalîst, bi pêla duyem re derket û heta niha jî têsîra xwe, nexasim jî li ser qada edebiyatê de didomîne. Femînîzma sosyalîst senteza femînîzma Marksîst û radîkal e. Femînîstên Marksîst sedemên pirsgirên jinan di civaka çînî de dibînin û vê meselê bi termîlojiya Marks û Engels ya ku bingeha wê aborî û çînî ye dibînin. Ligel vê femînîstên radîkal jî meselê bi tenê di bingeha baviksalariyê de dibînin lewma ev nêzîkatî jî kêm û qels e.[40] Ji ber van kêmasiyan femînîstên sosyalîst derketin û rexneyên xwe yên di derbarê femînîzma Marksîst û radîkal eşkere kirin.

Femînîstên sosyalîst, fikrên femînîstên liberal, radîkal û Marsistan ji hin aliyan ve rexne dikin. Li gor femînîstên lîberal, mafên jinan yên ku bi yên mêran re wekhev, di nava pergala kapîtalîst de, bi reforman re dikare bên bidestxistin. Li ser vê sêwra wan, femînîstên sosyalîst, ew wek “femînîstên burjuva” bi nav kirin û fikrên wan red kirin. Femînîstên radîkal jî, newekheviya jin û mêr di cudahiya bîyolojiya wan de didîtin. Li gor femînîstên radîkal, bingeha serweriya mêran ya li hemberî jinê, ji cudahiya wan ya bîyolojîk dihat. Cudahiya biyolojik, ji mêj ve bû sebeba pergala baviksalar û serdestiya mêr. Femînîstên sosyalîst girîngiyê didin fikra radîkalên femînîst yê li ser pergala baviksalariyê, lê di navbera baviksalariya radîkal û sosyalîstan de cudahiyek bingehîn heye: femînîstên sosyalîst “baviksalarî” bi bingehek maddî û avanî, femînîstên radîkal “baviksalarî” wek fikrekî ya jî rastiyeke ku her roj û li her deverî jin di bin tadeya mêran de bin didîtin.[41] Bi ya femînîstên sosyalîst, dozîneyên femînîst yên ku heta niha derketine nikarin newekheviya di navbera jin û mêran de rave bikin û çareseriya wê bibînin. Ji ber vê jî, wan dozîneyên

---

[40] Sezgi Balcı, *Feminist Eleştiri Yöntemiyle Ayla Kutlu’nun Öyküleri Üzerine Bir Araştırma,* Teza masterê ya neçapbûyî, Eskişehir Osmangazi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Eskişehir, 2011, r. 52

[41] Demir, hb. r. 74

femînîstên radîkal û femînîstên marksîst danîn berhev, ew li bêjinga xwe xistin û bi wan fikran, yên ku baş û bi serketî didîtin, bingeha dozîneya xwe ava kirin.

Femînîstên sosyalîst, pirsgirêka jinê him di nêzîkatiyên zayendî him jî di yên çînî de dibînin û rizgariya jinê jî, di têkbirina pergala baviksalar û kapîtalîst de mimkun dibînin. Femînîstên sosyalîst ji ber ku pêşanî didan faktorên zayendî û sûbvektîf, dahurînên xwe di tadeya ku jinê li ser xwe herî zêde hîs dikir, di warê du joravaniyê de kûr dikirin; warê zayendîtî û saziya malbatê: "Mafê ku mirov zayendiya xwe, bi xwe diyar bike, tercîha anîna zarokan ya jî wextê zayînê, her wiha tercîha zewacê û terciha têşeya têkiliyên xwe diyar bike, him ji bo jinê, him jî ji bo rizgariya homoseksuel û lezbiyenan mafên navendî yên girîng in."[42] Ew, sedemên bindestiya jinê him di warê aboriyê de, him jî di zayendiyê de, di nav şertên maddî de dikolin.

Marksîzm, têkiliyên însên, di hilberînên însên, yên di nav jiyana civakî de, ji nû ve di nava têkiliyên giştî de dadihurîne. Dahurînên têkiliyên zayendî jî di nava vê de bi cih dike. Lê femînizm dozîneyek wilo ye ku, pêşaniyê dide têkiliyên di navbera zayendan de û têkiliyên din yên însên piştî van, di bin van de dinirxîne. Teoriya marksîst, bindestiya jinê di pêşketina pergala kapîtalîst de dibîne, lewma jî çareseriya wê di meseleya çînî û aboriyê de, guherîna xwediyê ked-semyaniyê de dibîne lê tiştekî ji bîr dike; li civakên beriya pergala kapîtalîst de çima jin dîsa bindest û di bin siha mêr de bûn rave nake. Dîsa li civakên ku di şoreşa sosyalîst de derbas bûn; Yekîneyên Sowyetê, Kuba û li Çînê çima jin di bin zilma mêran de bûn? marksîzm van rave nake.[43] Femînîzma sosyalîst rexneya herî tûj bi van pirsan ji marksîstan re dike. Li gor wan şêweyên hilberîner guherîbin jî, di hişmendiya zayendî de veguhertin pêk nehatine. Ehrlich, bi pirsên xwe vê meselê kûrtir dike (bersivê van pirsan nîn in): "Çima li dewletên sosyalîst, di asta biryardayinan de hejmara jinan ewqasî kêm in? Karên malê kî dike? Çima lezbîyenî û hevzayendiya mêran di bin zextê de ye? Gelo zarokên dewletên sosyalîst li gor rolên zayendî di nav civakê de cih digrin? Gelo di hemû beşên kar de jin bi awayek wekhev tên temsîlkirin?

[42] Naiman, h.b. r. 28.
[43] Donovan, h.b. r. 159

Dahatiyên wê bi yên mêran re wekhevin? Di mesela zayendî û zêdebûnê de azadiya bijartinê heta çi astî di bin ewletiyê de ye? Kî di van mijaran de biryarê dide – serokatiya mêr an ya jinê li pêş e? Bi kurtasî, eger li welatên sosyalîst avaniya baviksalarî dom dibe, sedema wê çi ye?"[44] Clara Zetkîn jî li ser heman pirsgirêkê disekine û di derbarê vê mijarê de wiha dibêje: Ligel ku şoreşa polîtîk (Şoreşa Sosyalîst) pêk hatiye hê jî li ser hest û tevgerên mirovan bermayiyên civaka berê bi aweyeke xurt serdest e û ev rewş ne tenê bi mêran re, bi jinan re jî heye. [45] Zetkîn di vir de rexneyên xwe dibe ser sekna jinan bixwe jî. Zetkîn, ligel ku jineke sosyalîst bû kêmasiyên sosyalîzmê ya di derbarê şoreşa jinan de gelek caran dianî ziman û her tim banga wê li ser domkirina şoreşê bû. Bi ya wê çareseriya van kêmasiyan encax bi xurtkirina şoreşa sosyalîst mimkin bû.

Mijarên teorîya femînîstên sosyalîst û hewldanên wan yên destpêkê zêdetir li ser komika malbatê, karên malê û mezinkirina zarokan bû. Çareserkirina van mijaran ji bo wan, di nav pergala kapîtalîst de girîng bûn û lezgînî dixwestin. Marks, di kitêba xwe ya ku di sala 1843yan weşiyabû "*Yahudilik Sorunu Üzerine*" de ev nêrîna xwe; "Devera ku milk lê serwer dibe, têkiliyên însên û têkiliyên jin û mêr vediguherin bazirganiyê" yekem car gotibû. Li gor Marks, jin tên kirîn û firotin. Bi giştî jî, pêwendiya mêr a raste rast bi jinê re, pêwendiyeke siruştî ye.[46] Di pergala kapîtalîst de hemû têkiliyên însên vediguherin têkiliyên metayî û ew jî dibe meseleya bazirganiyê.

Kitêba Engels ya bi navê "Ailenin Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökenî"[47], ji bo teoriya femînîzmê û femînîstên sosyalîst, zemîneke esasî digre ku Engels bi tezên di vê kitêba xwe de li ser komunîstiya dayiksalariyê, ya beriya tarîxê, disekine. Civaka dayiksalar, ku li wir hukmê dê di ser yê bavî de bû, di nava salan de veguherî û derbasî serweriya civaka baviksalar bû; li gor Engels sedema vê, di pêşketinên

---

44 Donovan, hb. r. 172.

45 Clara Zetkin, "II. Uluslararası Komünist Kadınlar Konferansının Görevleri Üzerine", dnd. *Kadın Sorunu Üzerine Seçme Yazılar & Clara Zetkin Üzerine,* (brh.) N. Krupskaya, W. Pieck, wer. İsmail Yarkın weş. İnter, İstanbul, 1996, r. 87.

46 Nivîskar di vê berhemê de him li ser fikrên Marks en di derbarê jinê de şîroveyên xwe dibêje, him jî bi teoriya Marksîst li ser jinê û rewşa wê dahurandinên xwe dike. Ji bo agahî û têgihiştineke berfireh bnr: Lise Vogel, *Marksist Teoride Kadın*, wer. Mine Öngören, weş. Pencere, İstanbul, 1990, r. 47.

47 Friedrich Engels, *Ailenin Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökeni*, wer. Kenan Somer, weş. Sol, Ankara, 2010

aborî, avabûna semyana taybet û derketina metayan bû. Femînîstên sosyalîst zêdetir li ser cihê jinê yê di nav malê û karê malê de disekinîn û di nava pergala kapîtalîst de, li ser diyarkirina rola malê ya civakî dixebitîn. Bi pêşveçûna fikrên femînîstên sosyalîst re, li ser teoriyên Marksîst zêdetir kûr bûn û xwestin ku aliyê wê yê li ser jinê pêşve bibin. Sosyalîst li ser van pirsan disekinîn; têkiliyên di navbera pergala kapîtalîst û jinê çi ye, çawa ye, qada hilberînê û jinûve hilberînê yê ku ne tenê aliyê jinê yê bîyolojîk digre dest (Marksîstan zêdetir aliyê wê yê maddî û bîyolojîk dadihurandin), lê karên jinê yên malê bi awayek fonksiyonel wê cihê wan çi be? Marksîst û femînîst li ser van pirsan yekalî difikirin û sosyalîstên femînîst ên wek; Lîse Vogel, Angela Davîs, Susan Sontag ji bo van nîqaşan bi berfirehî bi pêş ve bibin şîroveyên nû kirin. Nîqaşên li ser keda li hundirê malê di sala 1969an bi berhema Margaret Benston ya bi navê *The Political Economy of Women's Liberation* (Polîtîkaya Aboriyê Ya Rizgariya Jinan) re hat destpêkirin.[48] Benston, wê keda ku li malê tê dayîn wek bermayiya "beriya kapîtalîzmê" dibîne û binê wê xêz dike ku di biniya kapîtalîzmê de, yên ku hilberîna nirxê bikaranînê didomînin jin in, ku ev nirxê bikaranînê yên bi destê jinê tên hilberandin ji hêla malbata wan ve tê mezaxtin.[49] Piştî gellek nîqaş û gengeşeyan, femînîstên sosyalîst, ligel ku hê jî hukmê mêr û serweriya wî bi esaseke maddî di nav pergala kapîtalîzmê de dibînin, di dahurînên xwe yên vê taliyê de digihêjin fikra ku beriya pergala kapîtalîst dest pê bike jî baviksalarî hebû û jin dîsa di bin çewisandina mêran de bûn. Di bingeha maddî ya serweriya mêr (ji civaka baviksalar, heta serdema kapîtalîzmê) de çewisandina keda jinê û hilberînên wê yên di nava karên malê de heye. Bi pergala kapîtalîzmê re teşeya wê guherî û zêdetir bi pêş ket. Her çiqas derfetên jinê, mafên wê yê ku dikaribe di karên derve de weke mêrekî bixebite çêbûbê jî, di nava malê de û hetta di cihê karê li derve jî dîsa di bin kontrola mêr de ye. Femînîstên sosyalîst vê carê jî li ser mafên ku qaşo ji bo jinan hatibûn dayîn re nîqaşan dikin ku yek ji wan dîsa li ser keda jinê yê li malê ye. Li gor wan piştî ku jin tevli hilberînên civakî yên li derveyî malê bûn jî keda wan nedihat dîtin lewra ewan him karê malê dikirin û him jî di nava civakê de tev li pêvajoya hilberînê dibûn û bi vê yekê re du caran tade li wan dibû.

[48] Donovan h.b. r. 151.
[49] Neql. Donovan h.b. r. 152.

### 1.2.5. Femînîzma Postmodern

Femînîzma postmodern, di salên 1990î derdikeve û heta destpêka sedsala 21. re bi pêşketina pêla sêyem a femînîzmê re populer dibe.[50] Hin femînîst li hemberî postmodernîzmê derdikevin û wê ji bo jinan wek kemîneke nû dibînin, lê bi ya hin femînîstên postmodern, gelek têgehên ku di nava postdmodernîzmê (mînak; reddiyeta totalîtarîzmê, pragmatîzm, xwecihî, piranîparêzî, îzafîtî, reddiyeta dualîzmê, têkiliya desthilatdarî û zanînê) de xurt dibin û nîqaşên li ser jiyana nû (dunyaya sêyem) ji bo femîzmê û kêşeya zayendê pêşiya jinan û felsefeyekê vedike. Hekman ji bo têkiliya femînîzm û modernîzmê dibêje ku; zehmete ku meriv femînîzmeke postmodern formule bike lê ku meriv vê çaxa nû bide ber çavên xwe dibe mecbûriyetek. Him femînîzmê him jî postmodernîzmê tesîrek kûr li ser seyra lêkolînên rewşenbîriyê kiriye û hê jî ev tesîr berdewam e.[51] Bingeha femînîzma postmodern ji postmodernîzm, bûnewerî, femînîzma bûnewer (egzistansiyalizm), binyadgerî, postbinyadgerî û femînîzma Frensî tê.[52] Femînîstên postmodern cudatî û cihêrengiya di navbera kom û mirovan û ya di navbera jinan de rewşeke erênî dibînin û li ser mijara cudatiyê disekinin. Li gor rexnegira edebiyata femînîst Maggie Humm jî, postmodernîzm nirxeke zêde dide dîtbariyê û teşebbuseke zêde mêrane ye. Lihevhatina wê û femînîzmê zehmet e lê divê bê dîtin ku postmodernîzma femînîst rêyeke nû jî ava dike.[53] Mijareke din ya di navenda fikrên femînîstên postmodern de cih digre jî bikaranîna ziman e. Him postmodernîzm him jî femînîzm li hemberî dualîzma modernîzmê derdikevin û hiyerarşiya di navbera hin têgehên wek biker/obje, rasyonel/îrasyonel, çand/siruşt de rexne dikin.[54] Li gor femînîstên postmodern dualîzma peyvên dijber di heman demê de dijberiya jinê dike. Wek mêr/ jin, dê/bav, ruh/beden, di van peyvan de peyvên duyem dijberiya peyvên yekem dike. Ji bo van dualîzmên dijber ku zimanê mêrane û dinyaya nêrî nîşan dide ev femînîst

---

[50] Donovan, h.b. r. 383.
[51] Susan J. Hekman, *Toplumsal Cinsiyet ve Bilgi*, wer. Bekir Balkız, Ümit Tatlıcan weş. Say, İstanbul, 2016, r. 25.
[52] Demir, h.b. r. 91.
[53] Maggie Humm, *Feminist Edebiyat Eleştirisi*, (amd.) Gönül Bakay, wer. Özge Altay, Gönül Bakay, Nuran Düzyol, Aylin Ecdaroğlu, Tuba Biret Ertan û y.d. weş. Say, İstanbul, 2002hb. r. 236-238.
[54] Neql. Demir h.b. r. 87.

li ser “jihevxistin”[55] ê disekinin. Dixwazin dijberiyên di ziman de rakin û wan bê wate bikin. Ji bo vê jî pêdiviya femînîstên postmodern bi “jihevxistin” ê hebû. Di navbera femînîzmê û jihevxistinê de deqek hevpar heye û ew jî metafora zayendê ye. Mary Poovey sê aliyên ku jihevxistinê li femînîzmê zêde kiriye wiha vedike: “1) Femînîzm li ser diyarkerên civakî, wek nîjad û çînê û dîrokê dixebite, jihevxistin jî têkiliyên ku hatine nepenîkirin ji nepeniyê zelal dike. 2) Jihevxistin, mantiqa ku hiyerarşî û dijberiyê rewa dike rexne dike û dualîzmê jihevdixe, ji hev vediçirîne. 3) Mafê fikrên “di navbera du tiştan” (in between) de dixe jiyanê. Ewilîn bi rêbaza jihevxistênê nêzîkatiyên heyî vediçirîne piştre jî hewil dide ku ne bi dijberiyên halî hazir lê bi rêya ku di navbera her duyan de (wek; jinîtî/mêrtî) derfetên fikarê derbikeve.”[56] Li gor femînîstên postmodern, pênase û sinifandinên li ser nasnameya zayendê ne encameke biyolojîk e di nava civakê de tê hilberandin. Ji ber vê jî van femînîstan nêzîkatiyên femînîstên ku cudahî dixistin navbera zayend û zayenda civakî red dikin. Çimkî li gor vê cudahiyê “zayend” rewşeke sirûştiye lê “zayenda civakî” rewşeke çêkirî ya civakê ye. Femînîstên postmodern li dij vê pênasekirin û cudatiyan derdiketin û bi ya wan meseleya zayendê bi xwe ji aliyê civakê ve hatiye derxistin. Zayend jî di nava sirûştê de heye û weke her rewşeke siruştê ye, lê civakê bixwe ev rewş ji bo jinan kirpandin. Yê ku zayend jî û zayenda civakî jî derxist/derdixe civak e. Butler, li ser nîqaşên cudahiya zayend û zayenda civakî pirs û nîqaşên nû dixe nav mijara femînîzmê. Eger zayenda civakî, ew tişta ku hemû wateyên çandî li ser bedena bi zayend barkirî be nayê gotin ku zayenda civakî ji zayendekî bi formekê der bûbe.[57] Scott jî balê dide ser ku di van salên dawî de ji

[55] Bi frensî “déconstructionism”, bi tirkî “yapısöküm/yapıbozum. Min peyva “jihevxistin”ê ya ku Derrîda felsefeya xwe li ser avakiriye, piştî hin nîqaşên qanihker ji Şengul Oxir wergirt. Pênaseyek bi yek alî û zelal li ser vê têgehê tune ye, ji ber ku ew li gor bikaranînê dikare biguhere. Jihevxistin: Avaniyek ku metin li ser çêdibe heye ewilî ev avanî ji hev tê xistin pişt re li hev jî tê xistin. Metin (text) bi halê xwe yê ewil nixumandî, nepenî ye. Derrida di nava metnê de li têgehekê digere, çimkî têgehên din li ser vê têgehê xwe zêde dikin û ji wê têgeha deqkirî metnê ji nû ve ji hev vediçirîne û metnê ji nû ve çêdike. Bi ya Derrida ev têgeh di nava metnê de hene lê veşartî ne, haya nivîskêr jî ji van têgehan tune ye û divê ev têgeh bên dîtin, metin ji nû ve bê veçirandin, ji hev xistin û li hevxistin. Derrida ji bo xwendinê nivîsandin dibêje ango bi ya wî xwendin nivîsandin bi xwe ye. Ji bo kûrbûn û fêmkirina bi têgeha jihevxistinê bnr: Jacques Derrida, Platon’un Eczanesi, Zeynep Direk (wer.) weş. Pinhan, İstanbul, 2014.

[56] Demir, h.b. r.103-104.

[57] Butler, di beşa ewil ya berhema xwe de li ser cudatiya zayend û civaka zayendî hin pirsên wiha dike: “Berî ku meriv bipirse bê ka zayend û zayenda civakî çawa û bi kîjan rêyan hatiye dayîn meriv dikare behsa ew zayenda ku “hatiye dayîn” ya jî zayenda civakî ya ku hatiye dayîn bike? Jixwe zayend çi ye? Rewşeke siruştî ye, anatomîk e, bi kromozoman re têkildar e ya jî ji hormona ye?

dêvela têgeha “jin”ê “zayenda civakî” tê bi kar anîn. Bi ya Scott, di bikaranîna zayenda civakî de mebest ew e ku her agahiyên di derbarê jinan de bivê nevê bi mêran re jî têkildar bibe; bi israr tê deqkirin ku jiyana jinan, perçeyek ji jiyana mêran e, jiyana jinan di nava jiyana mêran de û ji aliyê wan ve tê afirandin.[58] Bikaranîna zayenda civakî rewşeke şêlû ye ango xetereyên wê yên desthilatdariyê hene. Zayendî ne cudatiyek biyolojîk e bi desthilatdariyê ve hatiye çêkirin lewma zayenda civakî jî bi vê rewşê re têkildar e û ew jî çêkiriye.

## 1.3. Femînîzm û Jinên Kurd Ên Bakur

Li ser jinên kurd û cihê wan ê di nava femînîzmê de heta niha xebateke bi rêk û pêk û zelal nehatiye kirin. A rastî xebateke wilo ji gelek aliyan ve zehmet e. Berî her tiştî rewşa cografyayek parçekirî, astengiyên li ser zimanê kurdî û zaravayên wê, rewşa civaka kurdan a polîtîk, olî, perwerdehî, baviksalarî û hwd. xebateke wiha zehmettir dike. Wek ku Shahrzad Mojab jî tîne ziman: “Birastî jî rewşa bê dewletbûnê tesîra xwe li her her qadê jiyanê dike. Li van welatan xebatên li ser lêkolînên jinên kurd bi giştî zehmet e û carinan jî ne mimkun e.”[59] Mojab wiha dewam dike: “Li Rojavayê dinyayê di nava 20 - 30 salên dawî de zanîna li ser femînîzmê gihîşte lûtkeyekê. Di warê werger û teşebbusên herêmî de nêzîkatiyên femînîst berbelavî dinyayê dibin. Lê li ser teoriya femînîst tu xebat ji bo kurdî nehatine wergerandin; ligel ku zimanê kurdî di nav 6. 600 zimanê dinyayê de çilemîn zimanê ku herî zêde pê tê axaftin e. Ji bo ku lêkolînên li ser jinên kurd bên kirin hin astengî hene: Tu akedemisyeneke ku xebatên jinên kurd dike tune ye, xwendekarên

---

Naxwe rexnegirên femînîst divê van diyarde û îddîayên zanistî çawa binirxînin? Dîroka zayendê heye? Gelo ji bo her zayendekê dîrokek heye?” Butler her wiha derbarê pirs, nîqaş û dahurînên li ser vê mijarê û li ser desthilatdarî, avakirina bedenê, rexneyên li ser berhemên Kristeva, nêzîkatiyên Foucault ên ji bo zayendiyê, femînîzma lezbiyen, zimanê mêtiyê û gelek agahiyên berfireh dane. Judith Butler, *Cinsiyet Belası*, wer. Başak Ertür, weş. Metis, İstanbul, 2014, r. 50.

[58] Joan W. Scott, “Toplumsal Cinsiyet: Faydalı Bir Tarihsel Analiz Kategorisi”, dnd. *Feminist Bir Tarihin Peşinde*, (brh.) Fahriye Dinçer, Özlem Aslan, wer. Ayça Günaydın, Ayten Sönmez, Derya Demirler weş. bgst, İstanbul, 2013. r. 67.

[59] Shahrzad Mojab, “Devletsiz Olanın Yalnızlığı: Feminist Bilginin Sınırında Kürt Kadınları”, dnd. *Devletsiz Ulusun Kadınları Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, (brh.) Shahrzad Mojab, wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı,weş. Avesta, İstanbul, 2013. r. 27.

ku li ser vê mijarê gotaran dinivîse tune ye, koleksiyonên pirtûkxaneyan, bûrsên ji bo lêkolînê û derfetên weşanê tune ye.[60]

Ji ber ku naveroka teza me li ser hin romanên jinên kurmanc û rexneya edebiyata femînîst e em ê li vir nikaribin dîrokçeyek jinên kurd ên di serdemên modern de derxînin, lê em ê bi kurtasî qal bikin bê ka heta niha jinên kurd di çi merheleyan re derbas bûne. Tesîra polîtîkayên tevgerên kurd û neteweyî çi rê li ber wan vekirine û çawa xwe bi rêxistin kirine.

Cara ewil di sala 1913'an di kovara *Rojî Kurd* de Ergani Madenli Y.C. bi sernavê *Kürtlerde Kadın Meselesi* (Ligel Kurdan Meseleya Jinê), gotarakê lêdike. Nivîskar ji tevgera jinên ku li Rojavayê dinyayê belav dibe haydar e: "Vê kêliyê meseleyeke girîng heye ku tevahî Rojava, hinekî jî Rojhilat, dinyaya nivîsê û zanyarên civakê bi kurtasî herkesî bi her awayî mijûl dike heye: "Meseleya jinan". Heta li gor hin bîrewera ev dewr "dewra jinan" e." [61] Nivîskar di vê gotarê de behsa pêşketinên li ser mafên jinên li Ewrûpa, Emerîka û Japonyayê dike û dibêje ku pêşketinên li van welatan têsîreke mezin li ser Rojhilat û Asyayê jî dike. Lê balê dide ser rewşa jinên kurd ên di dewra Osmanî de. Behsa cahiliya civak û jinên kurd dike û ligel vê nezaniyê pesnê jinên kurd ên ji alî karakterî ve dide. Ji bo pêşveçûn û perwerdehiya jinên kurd hin dahurînên xwe vedike û şîretan dike. Bi kovara *Jîn*ê re haya me ji yekemîn rêxistina jinên kurd *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti* (Komeleya Pêşketina Jinên Kurd) çêdibe. Memduh Selim di nivîsa xwe ya bi navê "Du Eserên Xêrdar (İki Eser-i Mebrur)" de behsa vê komeleyê dike.[62] Ev komele sala 1919'an li Stenbolê ava dibe. Dîsa di kovara *Jîn*ê de tê nivîsîn ku di roja vekirina vê komeleyê de Encum Yamulkî axaftinekê li ser vê komeleyê dike û mebestên bi avakirina vê komeleyê dibêje: "Armanca komela me ev e ku, çiqas pîrek û zarûkên kurd ên muhtacê alîkariyê hene ji wan ra kar peyda ke, îdarexana veke, xwendegeh veke, pîrekên me yên ku dikarin ders bidin ew jî bê ucret mamostatiyê bikin. Ez dixwazim bêjim ku komele, qasê ku îmkan hebe dê alîkariya diravî û bedenî bike."[63]

[60] Mojab, h.g. r. 32.
[61] Ergani Madenli, "Kürtlerde Kadın Meselesi", dnd. *Di Sedsaliya Wê De Rojî Kurd*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul, r. 305.
[62] Ji bo agahiyên berfiher bnr. Memduh Selim, "Du Eserên Xêrdar", *Jîn*, j. 20.
[63] Memduh Selim,"Xanimên Kurd", *Jîn*, j. 14.

Meriv dikare bibêje ku di van salan de hin hewldanên jinên kurd û kêm be jî hişyariyek jinanî dest pê kiriye. Di nav jinên kurd de yekem car bi rêbazek modern û bi rêyek rêxistinî li Stenbolê jinên kurd beşdarî çalakiyên neteweyî dibin.[64] Dîsa di sala 1913’an de li Stenbolê kovareke jinan bi navê *Kadınlar Dünyası* derdikeve ku ev kovar hetanî sala 1921ê nêzî 194 hejmarên wê çap dibe. Ev kovar di nava jinên dewra Osmanî de dengeke bilind derdixe.[65] Hin hejmarên vê kovarê cih dide mijarên li ser jinên kurd û di hejmara 122. de jineke kurd bi navê Fato Nalî jî nivîsekê lê dike.[66] Lê divê em bi bîr bînin ku ev nivîs jî ne bi kurdî ye. Ji aliyê rêxistinî û avakirina komikên jinên kurd ve piştî *Kürt Kadınları Teali Cemiyeti* (1919), rêxistina jinên serbixwe KOMJIN ava dibe lê ev rêxistin jî li Almanyayê ye. “Xebatên ji bo avakirina KOMJIN’ê di sala 1979an de dest pê dike.”[67] Di sala 1989 an de “KOMJIN –Yekîtiya Jinên Kurdistan” bi awayeke fermî ji nû ve tê avakirin. Bi KOMJINê re kovara Jiyanê bi nivîsên kurdî û tirkî dest bi weşanê dike. Di hejmara 10. a vê kovarê de di derheqê pêvajoya rêxistinên jinên kurd de agahiyeke wiha heye: “Piştî Kürt Tealî Cemiyetî, heta salên 1960 î serdemeke pasîf derbas bû. Bi pêşketinên li dinyayê re paralel, salên 1960an li Tirkiyeyê û Kurdistanê jî bi bûyerên polîtik re, di tevgera rizgariya netewî ya Kurd de jî candariyek hate xuyanîn. Jinên kurd jî tev li xebatên van tevgeran bûn. Bi van pêşketinan re, gava ewil ya ji bo “rêxistîbûna serbixwe” rêxistina jinê KOMJINê avêt.[68] Weke ji vir jî diyar dibe piştî dawiya salên 70’yî hêj nû jinên kurd bi aweyeke xweser û serbixwe, di bin sîwana komik û rêxistinên jinan û li dora kovaran dibin yek.

Piştî salên 1980yî bi tevgera azadiya kurdan re bi girseyî derdikevin qadan û êdî zêdetir tên xuyanîn. Lê xuyakirina jinên kurd di serê ewil de ne ji bo mafên zayenda xwe û nasnameya jinê bû. Derketina wan ji bo nasname û azadiya wan a

---

[64] Rohat Alakom, “Yirminci Yüzyılın Başlarında İstanbul’daki Kürt Kadınları”, (brh.) Shahrzad Mojab, h.b, r. 75.
[65] Alakom, h.g. r. 85.
[66] Alakom, h.g. r. 87.
[67] Aslı Davaz Mardin, *Kadın Süreli Yayınları Bibliyografyası: 1928- 1996 Hanımlar Alemi’nden Roza’ya,* weş. Kadın Eserleri Kütüphanesi ve Bilgi Merkezi Vakfı - Türkiye Ekonomik ve Toplumsal Tarih Vakfı, İstanbul, 1998. r. 480.
[68] Davaz Mardin, h.b. r. 349.

netewî bû. Jixwe yên ku li ser pêyan bûn ne tenê jinên kurd bûn, jin û mêr tev bi hev re bûn. Yanî jinên kurd yekser ji bo xwe daxwaza tiştekî nedikirin belkî fikreke wilo ji bo wan di wan salan de daxwaziyek luks jî bû. Di van salan de ji ber rewşa şer jinên kurd bi zêdehî di zindanan de bûn ya jî dayikên kurdan li ber deriyê girtîgehan li benda aqubeta zarokên xwe bûn. Di atmosferek wiha de jinên kurd bi nasnemaya nijadî û netewî derdiketin pêş. Îmajên ku jina kurd teswîr dikir jî zêdetir wek "dê", "siyasetmedar", şervan" bûn.[69] Herçiqasî ev îmajên jina kurd ên ku bi tevgera azadiyê re bi pêş ket ji gelek aliyan ve hêzeke xurt dabe polîkaya jinên kurd û ew di nava qamûyê de heta di nava cîhanê dabin naskirin jî, aliyê wê yê li ser pêşketina ziman, parastina çand û nirxên kurdewarî zêde nedihat xuyanîn. Li ser vê rewşa jina kurd Alan di gotareke xwe de wiha nivîsiye: "Ew siyaseta ku bi bernameyên girseyî jinên kurdan "sewk û îdare" kirin, şûna ku pêşiya zimanê wan ê dewlemend û rewan û têr-mecaz vekin, di nav çend gotinên "em bariş dixwazin", "em demokrasî dixwazin" de vebêjeke rij, biyanî û sînorkirî li wan ferz kirin. Ji aliyekî ve jina kurdîzan, hate di asta jinên bajarî yên asîmîlebûyî de sef girt. Pêşketina polîtîkî mixabin ji bo ziman bû "windabûn"ek.[70]

Îdeolojiya femînîst doza jinê dike lewma di her qadê jiyanê de dikare hebe û ji ber ku doz dike ango xwediyê têkoşînekê ye dibe tevgera polîtîk jî. Îcar ku em li jinên kurd binêrin em ê bibînin ku ew ji du aliyan di nava dozeke polîtîk de dimîne. Aliyek jê doza wan ya li ser azadiya nasnameya wan a netewî ye aliyê din doza nasnameya wan a jinîtî ye. Kîjan li kû, kengî û bi çi rewşî giran dibe bi me pîvaneke vê yê sabît tune ye, lê ji bo ku tevgerên siyasî û partiyên kurd jinên kurd û parastina mafên wan jî di bin ala xwe de mimkûn dibînin û jinên kurd jî bi piranî azadiya xwe di serê ewil de di azadiya neteweyî de dibînin, meriv dikare vê gotina Mojab "li hemû herêmên Kurdistanê azadiya netewî, azadiya jinan di bin siya xwe de hiştiye" bi giranî qebûl bike.[71]

[69] Ji bo zêdetir agahiyên li ser îmaja jinên kurd ên ku bi tevgera kurd re piştî salên 80yî derdikeve binêrin: Handan Çağlayan, *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar Kürt Hareketinde Kadınlar ve Kadın Kimliğinin Oluşumu,* weş. İletişim, İstanbul, 2014. r. 25.
[70] Remezan Alan, *Bendname*, weş. Peywend, İstanbul, 2013, r.152.
[71] Mojab, h.b. r. 25

Di nav xebatên zanistên civakî yên li Tirkiyê jinên kurd wek “Jinên Anatoliya Rojhilat û Başûrê rojhilat” ya jî wek “jinên gundewarî” dihatin binavkirin û di nav berhemên girîng ên li ser jinên li Tirkiyê jinên kurd tune bûn.[72] Femînîzma ku li Tirkiyê bi pêş diket xwe bi bayê moderniteyê û îdeolojiya Kemalîzmê ve li qadên bilind didît lewra aliyê wê yê netewperest jî xurt dibû. Di nava vê rewşê de tevgerên jinên kurd bi nêrîna wan tevgereke biçûk, polîtîk û ne medenî bû û di serê peşî de “kurd” bûn. Bi salên 90î re êdî xwiyaye ku Femînîstên Îslamî, femînîstên kurd, femînîstên Kemalîst, femînîstên sosyalîst, femînîstên radîkal, jinên gundî bi kurtehî hemû jin di bin navê “xwişktiya hemû jinên cîhanê” de ne mimkun e ku bigihên hev.[73] Lê hê jî hêviyek ji aliyê jinên kurd li hemberî femînîstên li Tirkiyê hebûn ku em ji nivîseke kovara Jujîn’ê de pê hay dibin: “Werin em jî ji dêvela ku bêjin femînîzm ji bo jinên kurd nabe; ma femînîzma kurd? Birastî jî em li hemberî vê rewşa ku li welatê me tê pêşxistin bisekinin.” Bi zimanek rexneyî û bi gazind, di nivîsê de qala têkiliyên hiyeraşîk ên di navbera jinên kurd û tirk tê kirin. Li ser vê têkiliyê mînakên ji nav femînîstên spî û reşik, serdestiya femînîstên gewr (Rojavayî û burjûva) jî tên dayîn. Em ji vê nivîsê (gotar) fêm dikin ku jinên femînîst ên tirk bi nêzîkatiyek serdest û nîjadî li hemberî jinên kurd ne rast in û wan wek femînîst jî qebûl nakin. Lê jinên kurd wan bangî bihevrebûnek jinanî û femînîzmek rast dikin. Di berdewamiya nivîsê de behsa femînîzma kurd jî wiha tê kirin: “Jinên kurd beriya ku bibin femînîst jî û piştî wê jî hewil didin ku bi her awayî piran (kuprî) ava bikin û bi wan piran re xwe bigihînin jinên li her derê cîhanê.”[74]

Femînîzm li gor şert û mercên civak û welatan rengekî cihê digre. Ev nayê wê wateyê ku doza wê diguhere lê li her herêmî, li gora çand, netew, ol û diyardeyên din pêdivî û qadên ku doza xwe lê kûr dike diguhere. Meriv nikare bibêje ku femînîzm bêyî ku ji derfetên xwecihî îstîfade bigre bi pêş dikeve.[75] Her çiqas

---

[72] Di heman berhema xwe de Çağlayan, balê dide ser pênaseyên li ser jinên kurd ên di berhemên lêkolînan û berhemên edebî de û gelek mînakên ku di wan de jinên kurd wek “Rojavayî, gundî, cahil û hwd. hatine temsîlkirin û biçûkxistin. Ji bo mînak û agahiyên berfireh bnr: Handan Çağlayan, *Kürt Kadınların Penceresinden,* weş. İletişim, İstanbul, 2013.r. 45-59.

[73] Meltem Ağduk, “Cumhuriyet’in Asil Kızlarından 90’ların Türk Kızlarına... 1990’larda bir “Türk Kızı”: Tansu Çiller”, dnd. *Vatan Millet Kadınlar*, (brh.) Ayşe Gül Altınay, weş. İletişim, İstanbul, 2013, r. 307

[74] Canan , *Kadınların Birliği ve Şu Köprüler Meselesi*, dnd. *Jujin,* İstanbul, Gulan 1999. j. 8-9, r. 4-6.

[75] Sylvia Walby, “Kadın ve Ulus”, (brh.) Ayşe Gül Altınay, hb. r. 61.

meriv nikaribe bêje ku di nava jinên kurd de tevgereke şênber ku navê wê femînîzm e hebe jî xebatên jinên kurd li gor derfet û îmkanên xwecih xwedî rengekî ye. Her ku tevgerên femînîst li pêş dikevin wilo jî ber bi xwecihiyê ve diçin lewma li her cih, civak û çandê de li gor pêdivî û pirsgirên jinên li wir rengê xwe yê taybet diyar dike. Li her netewî tevgerên femînîst bi ziman û rengên xwe bang dikin lê ligel vê femînîzm ji netewê wêdetir e. Lewra di nav femînînîstên dinyayê de tevgerên navnetewî hene û ev femînînîst bi hev re di nava danûstendinê de ne. Bihevrebûn û têkiliyên jinên femînîst ên li cîhanê piştî rexneyên li ser femînîstên spî û desthilatdariya wan ên li ser jinên reşik û ên din xurttir dibe. Ji ber ku tevgerên femînîst ewil li welatên Ewropî şax dan û ji wir belav bûn di navbera femînîstan de jî hiyerarşiyek peyda bû. Çawa ku me li jor mînaka di kovara Jujînê de da ku jinên femînîstên tirk xwe serdestê femînîstên kurd didîtin/dibînin, heman rewş di navbera jinên Afro-Emerîkî û Emerîkî, jinên spî û reşik, jinên dinyaya sêyem de jî tê dîtin. Lê bi pêla sêyem ya femînîzmê re, ji bo şikestina van nêzîkatiyên hiyerarşîk xebat û têkiliyên xurt di navbera jinên dinyayê de dest pê bûn. Bell Hoks, di berhema xwe ya navdar *Femînîzm Herkes İçindir* de, li ser vê mijarê rexneyên xwe hişyarî û hêviyên xwe zêdetir dike: "Siûda me heye; her roja ku em dijîn em hinekî din ferq dikin ku xwûşktiya jinan bi awayek şênber pêk tê û hê jî bi hêz e.[76]

Bi salên 1990î re rêxistinên jinên kurd yên li dora komele, komik û kovaran bi du aliyan dikarin bên pênasekirin: 1) Komikên jinên femînîst ên kurd ku xwe ji partiyên siyasî û saziyan serbixwe birêxistin kiribûn. Ev komên "serbixwe" zêdetir li Stenbolê xebatên xwe dimeşandin. Piştre heta dawiya salên 90î hebûna xwe bi kovarên wek *Roza, Jujîn, Jin û Jiyan* û hw. domandin. Mînak, *Koma Jinên Serbixwe* (1990). 2) Saziyên jinên kurd ên ku bi "Tevgera Kurd" re dimeşiyan. Ev kom jî di serê ewil de li Stenbolê xebatên xwe meşandin. Ligel ku her carê zext û qedexeyên dewletê li ser van koman çêdibû jî ev kom bi navên cuda li Stenbolê û bajarên din xebatên xwe domandin.[77]

---

[76] Hooks, hb. r. 31.

[77] Münevver Azizoğlu Bazan, "Türkiyede Kadın Hareketlerinin Farklı Şehirlerde Karşılaştırılması" Araştırma Projesi Raporu, http://www.fb12.uni-bremen.de/interkulturelle-bildung/forschung/frauenbewegungen-im-innertuerkischen-vergleich/arastirma-sonuclari.html 26.06.2018

Di sala 1990î de jinan ewilî *Koma Jinên Serbixwe* ava kir. Jinên di vê komeleyê de xwe weke komek femînîstên kurd didan naskirin û bi vê taybetmendiyê, hem xwe ji jinên tirk û hem jî ji rêxistênên polîtîk cihê dikirin... Di nav dîroka femînînîzma jinên kurd de, jina kurd cara yekemîn sînorên navbera xwe û ya din (a dina xwe) diyar dikirin.[78] 8ê Adara sala 1997an jinên femînîst ên tirk û jinên kurd li Stenbolê bi dirûşmeya "Di Roja Jinên Cîhanê de Êdî Birêxistin" re, bi hev re dest bi meşê kirin. Lê ji ber ku di sala 1998an de jinên kurd biryara ku wê mêr jî bi wan re tevlî meşê bibin didin tifaqa wan xira dibe. Bi salên 2000î re navbera femînîstên tirk û jinên kurd ên polîtîk bi çalakiyên hevpar û biryarên siyasî re xurt dibe.[79]

Di sala 1996an li Bakur kovareke jinan bi navê *Roza* derket. Nivîsên di vê kovarê de bi giranî bi tirkî bûn lê di her hejmarekê de du-sê nivîsên bi kurdî jî hebûn. Mijarên kovarê dualî bûn; aliyek jê li ser pirsgirêkên neteweyî û jinan, aliyê din jî li ser lêgerîn, pirs û bersivên wan bû.[80]

Femînîzm tevgereke polîtîk e lewma jî bi hemû qadên jiyanê re eleqedar e. "Tiştê ku şexsî ye polîtîk e", ev rêgezeke femînîzmê bû û qesta ji vê rêgezê ew e ku her qadeke jiyanê mijara polîtîkayê ye. Meseleya jinê jî bi meseleyên netewe û dewletê ve girêdayî ye, lewma divê ev mesele bibin mijarên polîtîkayê jî. Bi vê nêrînê pirsgirêka jinên kurd bi bêdewletbûnê, neteweyê, civakê û hwd. ve zêde girêdayî ye.

Herçiqas zehmet be ku meriv ji bo tevgera jinên kurd bêje femînîst e îddîayeke mezin e ku meriv bêje ne femînîst e jî.[81] Hişmendiya femînîst, jinan pê dihesîne ku ew di nava komeke bindest de ne û di bin neheqiyê de ne, lê ev neheqiya li ser wan ne rewşeke siruştî, rewşeke civakî/çandî ye.[82]

---

78 Esra Altun, "Nezelalbûna 'Em' ê û li ser Şopên Kovara Rozayê Femînîzma Postkolonyal", *Zarema*, j. 4, 2015, r. 58.
79 Melike Gül Demir, *1980'lerden 2000'lere Siyasal Kürt Kadının İnşası*, weş. Belge, İstanbul, 2015, r. 93.
80 Altun, hg. r. 57.
81 Aksu Bora, *Feminizm Kendi Arasında*, weş. Ayizi kitap, 2014, r. 25.
82 Fatmagül Berktay, *Tarihin Cinsiyeti*, weş. Metis, İstanbul, 2015, r. 88.

Di van salên dawî de jinên ji tevgera kurd xwe dispêrin îdeolojiyeke nû “jineolojî” yê[83]. Di kovara *Amargi* yê de jina kurd Figen Aras, li ser cudahiya femînîzmê û jineolojiyê wiha dibêje: tevgera jinên kurd ên Bakur wiha dibêje: Femînîzmê nirxên mezin afirandiye û em femînîzmê ji bo xwe wek mîrateyê dibînin... Em ne li dijî femînîzmê ne, lê em di wê îddîayê de ne ku jineolojî îdeolojiyeke ku dikare femînîzmê bihundirîne... Jineolojî, femînîzmê rexne dike (bi îddîaya ku femînîzm tevgereke teorîk e û di pratîkê de xwe di nava jiyanê de ava nekiriye) û ji femînîzmê wêdetir e.[84]

Li ser femînîzma jinên kurd ên Bakur bi giştî meriv dikare encameke wiha derbixe:

1) Hin jinên kurd xwe wek “femînîstên kurd” pênase kirine. Wek jinên ku li dora kovara Rozayê xwe bi rêxistin kiribûn û Koma Jinên Serbixwe.

2) Bi girseyek mezin jinên kurd di bin îdeolojiya tevgera azadiyê de bi aliyê polîtîk ve bi pêş dikevin û xwe wek “femînîst” pênase nakin. Li gor paradigmayeke nû, “jineolojî” yê xwe bi rêxistin dikin.

3) Jinên ku him ji tevgerên jin ên polîtîk û him jî ji îdeolojiya femînîzmê dûr in.

4) Jinên ku hişmendiya jinanî bi wan re heye lê ne di nava tevgereke jinan de ne.

---

[83] Jineoloji: “Zanista jinê”. Ji bo xwe bigihîne metodên zanist û zanînê bi nêrîna jinê li jêderka zanînê digere. Li ser jinê, civakê, gerdûnê û hemû jiyanê zanîna ku heta niha hatine bidestxistin bi perpektîfa jinê jinûve şîrove dike. Ji bo zêdetir agahiyên li ser jineolojiyê bnr: Jineoloji Akademisi, *Jineolojiye Giriş*, weş. Aram, Diyarbakır, 2015, r. 159-179.

[84] Aras, Figen, “Kürt Kadın Hareketi ve Feminizm” dnd. *İstanbul-Amargi Feminizm Tartışmaları*, (amd.) Esen Özdemir, Sevgi Bayraktar. weş. Amargi, İstanbul, İstanbul, 2012, rr. 74-82

# BEŞA DUYEM

# DI EDEBIYATÊ DE FEMÎNÎZM Û EDEBIYATA JINÊN KURD

Edebiyata femînîst, encama tevgerên femînîzmê ye. Piştî ku tevgerên femînîst derketin, jinên femînîst ber û bala xwe dan berhemên edebiyatê. Femînîstan di berhemên edebî de li ser temsiliyeta jinê ya di edebiyatê de dest bi pirs û lêkolînan kirin. Femînîstan berê xwe dan gelek qadên civakî, çandî, hunerî, zanistî û xwestin ku ji nû ve qodên zayendî yên ku ji aliyê mêran ve derbasî wir bûne deşîfre bikin. Di qada edebiyatê de jî li ser temsîla jinê sekinîn. Berhemên nivîskarên mêr ji nû ve xwendin û di van berheman de li şopên pergala baviksalariyê geriyan. Bi ya wan jin di berhemên edebî û di nava edebiyatê de jî di cihê talî de ne û hatine paşguhkirin. Li ser bikaranîna ziman û zayendiya zimanê berhemên edebî jî xebatên xwe kirin. Xebatên ku li ser edebiyatê ne tenê bi berhemên nivîskarên mêr re sînorkirî mane her wiha xebatên li ser berhemên nivîskarên jin jî xurt bûn. Lewma bi ya wan di destpêkê de, nivîskarên jin jî di berhemên xwe de teqlîda nivîskarên mêr dikirin û feraseta civaka baviksalar derbasî berhemên wan jî dibûn.

Edebiyata femînîst, bi perspektîfa nêrînên jinê, li civaka zayendperest, hiyerarşiya desthilatdar a di navbera her zayendan de û pergala baviksalar dinêre. "Edebiyat, divê edebiyateke ku pirsgirêkên jinê bi awayeke hişmendî der bîne û ev yek jî di edebiyata jinê de 'serhildanekê' pêkbîne."[85] Edebiyata femînîst, bi vê nêzîkatî û hişmendiyê re xwe di rexneya femînîst de xurt dike. Em ê di vê beşê de rexneya edebiyata femînîst, hin rêbazên vê rexneyê binasin û di dawiya vê beşê de em ê li ser edebiyata jinên kurd hin nîqaşan bikin.

## 2.1. Rexneya Edebiyata Femînîst

Di sedsala 20. de rexne bû mijara edebiyatê.[86] Rexneya femînîst bi pêşketina tevgerên femînîst re di salên 1960î û 1970yî de derketiye. Bi saya çanda rexneya femînîst û pîvanên analîtîk ên ku vê çandê bi xwe re anî hate îspatkirin ku rexneya edebiyatê nikare şert û mercên dîrokî û civakî paş guh bike; ji bo têgihiştina

[85] Hülya Argunşah, *Kadın ve Edebiyat Kendini Yazmak*, weş. Kesit, İstanbul, 2016, r. 22.
[86] Terry Eagleton, *Eleştirinin Görevi*, wer. İsmail Serin, weş. Ark, Ankara, 1998, r. 101.

metnên edebî, xwendin, dahûrandin, nirxandin û şîrovekirina wan divê têkiliya cihê wan ên dîrokî û îdeolojîk li ber çavan bên girtin; naverok û şêwe ji hev nikarin bên qetandin.[87]

Tevgera femînîst berê xwe dide edebiyatê û edebiyat ji bo rexneya femînîst dibe amûreke bingehîn. Lewra bi xwendinên berhemên edebiyatê re him di metnên mêran de û him di yên jinan de nerîneke zayendperest ferq kirin. Baviksalariya di nav jiyana rojane de derbasî edebiyatê dibe, di roman, çîrok, helbest û cureyên din de jin tên biçûkxistin, pasîf kirin û wek objeyên ku mêr serdestê wan in tên pêşkeşkirin. Piştî ku femînîzm derbasî qada edebiyatê dibe berhemên nivîskarên mêr ji aliyê zayendperestî û zayendperestiya civakî ve tên deşifre kirin û di nav berhemên nivîskarên jin de jî li şopên ku di bin tesîra fikren mêr yên desthilatdar de hatine nivîsîn digerin û tevan derdixin holê.

Li gorî Maggie Humm rexneya femînîst di nava rexneya edebiyatê de bi çar kêşeyan re mijûl dibe: Ya ewil, mijara dîroka edebiyata nêr, jinûve lêkolînên li ser metnên nêr, bi van re tespîta hebûna baviksalariyê û tespîta bê ka di van metnan de temsîliyeta jinan ya li gor normên civakî, çandî û îdeolojîk çawa hatine bicihkirin. Ya duyem, paşçav kirina nivîskarên jin digre dest. Ya sêyem, rexneya femînîst rêbazên nû û pratika rexneyek ciyawaz pêşkêşî xwendevanan dike û bi vê re jî li rastî kêşeya "xwendevana/ê femînîst" tên. Ya çarem, rexneya femînîst bi derxistina rêya nivîsek nû û xwendina hevgirtî dihêle ku em jî wek xwendevanên femînîst di nava kiryarê de bin.[88] Di vê xebatê de em ê hewil bidin ku ji van nêzîkatiyên rexneya femînîst ya duyem û sêyem bikar bîbin. Ya duyem ji bo me pir girîng e ji bo ku heta niha nivîskarên jin ên kurd û berhemên wan hatine paşguhkirin. Ya sêyem jî wê bibe mînakek ji rêbaza xwendina femînîst. Bi ya me berhemên wan her çawa be, karê rexneya femînîst ew e ku piştevaniya nivîskarên jin bike û berhemên wan ên ku nehatine dîtin û berê rojê nedîtine derxin ronahiyê.

[87] Jale Parla, "Kadın Edebiyatı Neyi Gerçekleştirdi", dnd. *Kadınlar Dile Düşünce*, (amd.) Sibel Irzık, Jale Parla weş. İletişim, İstanbul, 2014, r. 19.
[88] Humm hb. r. 26.

Me di beşa yekem de jî bi dirêjayî behs kiribû ku cureyên teoriyên femînîst zêde ne. Li vir jî em ê bibînin ku rexneya femînîst jî cur bi cur in. Rexneya mît, rexneya marksîst femînîst û sosyalîst femînîst, rexneya femînîst a Frensî, rexneya psikanalîtîk, rexneya femînîstên reşik, rexneya postbinyadger û postmodern, rexneya femînîst a lezbiyen, rexneya femînîst a dinyaya sêyem. Em naveroka cureyên van rexneyan venakin. Jixwe li gor teoriyên femînîst û pêlên femînîzmê yên ku me di beşa yekem de nîqaş kiribûn meriv dikare nêzîkatiyên van rexneyan jî hinekî fêm bike. Rexnegirek ne mecbûre xwe bi cureyekê sînor bike lewra dikare rexneya sosyalîst jî û ya lezbiyen jî bike û heta çend cureyên din jî bi hev re bike. Dikare bi nêrîneke eklektik jî nêzîk bike. Çawa ku cureyên teoriya femînîst û edebiyatê hene û femînîzm êdî navdîsîplîner e, rexneyên femînîst jî li gor van berfireh û pir dibin. Divê em ji bîr nekin ku cureya rexneya edebiyata femînîst her çi be û çawa be li ser edebiyatê, ziman û metnan e.

Lêkolînên li ser edebiyata femînîst, bi gelek aliyên xwe ji lêkolînên zanistî û civakî cihê dibin û bi serê xwe dibin qadeke nû, navdisîplîner û xweser. Hin taybetiyên lêkolînên femînîst ku ji lêkolînên din ên civakî cuda ne ev in: 1- Qebûlkirina lênerîneke femînîst û lêhûrbûna li ser têkiliyên zayenda civakî. Di vê xalê de ya girîng ew e ku, hêz û pozîsyona di navbera jin û mêr de bê deşîfrekirin. 2- Berevajî kirpandinên rêbazên zanista kevneşopî, qîmetdayîna jiyana rojane û tecrûbeyên şexsî. Tecrûbeyên jinê, di nava zanistên civakî de nehatiye bi cih kirin û bêqîmet mane, lewma ev rêbaz li hember vê nêzîkatiyê serhildaneke girîng e. 3- Redkirina hîyerarşiya di navbera lêkolîner û yê ku dibe mijara lêkolînê de. Di lêkolînên femînîst de ya esas ew e ku, pêvajoya lêkolînê ji hiyerarşiyê û otorîteyê dûr be. Lêkolîner ne alîgir be lê hest û fikrên xwe jî bikaribe raste rast ragihîne. 4- Di nav mebestên lêkolînê de daxwaza azadiya jinan û ji holêrakirina newekheviyên civaka zayendî. Pêwîste lêkolînên femînîst ne tenê rewşa heyî rave bike; lazim e ku bi wê lêkolînê re di nav têkiliyên zayenda civakî de guherînan pêk bîne. Di pêvajoya lêkolînên femînîst de ev taybetî wek temamên parçeyekê ne. Ji aliyê nêzîkatiyên siyasî, teorîk û epîstemolojîk de cihêbûnek di navbera lêkolînan de hebe jî, pêvajoya lêkolîna ku çarçoveya teorîk ya femînîst diyar dike, ji taybetiyên hevpar yên

lêkolînên femînîst pêk tên.[89] Ji lêkolînerên femînîst tê xwestin ku bi van hessasiyetan xebatên xwe bikin, lewra ew bi xwe dibin parçeyeke ji vê xebatê û di nava vê xebatê dibin subjeyên aktîf. Di vê xebatê de heta ji destê me bê em ê jî li gor van taybetî û hessasiyetan tevbigerin.

Rexnegira edebiyata femînîst Maggi Humm dibêje ku di navbera rexneya femînîst û rexneya edebiyata femînîst de cudahiyek zelal nebe jî, eşkereye ku nabin wekhev û di heman wateyê de nayên bikaranîn. Ligel ku rexneya femînîst berê xwe dide îdeolojiyên civakî û pratîkan, rexneya edebiyata femînîst bala xwe dide van îdeolojî û pratikan bê ka teşeyek çawa li ser metnên edebî datînin. Lê him rexneya femînîst û him jî rexneya edebiyata femînîst bala xwe didin ser zayendiyê lewma jî ev her du teorî xwediyê taybetmendiyên hevpar in.[90] Rexneya edebiyata femînîst ji aliyekî ve bi tespîta hêmanên zayendperest yên di nav metnan de derdixe ku jin di nav dinyaya edebiyatê de jî di rola duyem de ne û ji aliye din ve him ji aliyên din ve jî hewl dide ku berhemên jinan yên ku di nava dîroka nêrî de hatine hepiskirin yek bi yek derxîne holê.[91]

## 2.2. Rêbaza Rexneya Femînîst

Rêbazên rexneya femînîst berê xwe dan bersivên van pirsan: 1- Civak, rolên zayendî li ser mirovan çawa dide qebûlkirin? 2- Di zêdebûna zurriyeta mirovan de nêzîkatî û polîtîkayên ne wekhev yên li ser jin û mêran çawa tên meşandin? 3- Cure û formên nivîsên ku nivîskarên jin bi pêş xistine çi ne? 4- Nivîskarên jin sembolên çawa dixin nava hîmên berhemên xwe? 5- Berhemên nivîskarên jin di nav nêrînên xwendekarên jin û rexnegirên jin de çawa dikarin bên dahurandin? 6- Ji bo ku di nava berhemên edebiyatê de cudahiya zayendî û ne wekheviya jin û mêran dernekeve meriv çawa bibe asteng? 7- Di berhemên edebiyatê de meriv çawa hay ji hêmanên wekî polîtîkayên zayendî, ziman û şêwaz pê bixe?[92] Weke ku ji van pirsan jî diyar dibe rexneya edebiyata femînîst berê xwe dide berhemên nivîskarên jin û

[89] Ece Özkan, "Feminist Araştırmalar ve Yöntem", (amd.) Feryal Saygılıgil, hb. r. 277
[90] Humm, *Feminist Edebiyat Eleştirisi*, h.b. r. 11.
[91] Gülben Kocabıyık, *Tomris Uyar Öykülerinin Feminist Eleştirisi*, (Teza Masterê ya çapnebûyî, Zanîngeha Celal Bayar, Enstîtuya Zanistên Civakî, Manisa, 2013.) r. 44.
[92] Aysun Erden, *Türk Edebiyatında Kadın Yazarlar (Kötücülük-Cinsellik-Erotizm)*, weş. hayal, İstanbul, 2011, r. 8

mêr. Di berhemên nivîskaran de him ziman û hişmendiya zayendî ya nivîskaran him jî civak û zayendperestiya civakî û kodên pergalên mêrserwer tên tespît kirin. Li dora mijar û nêrînên ku ji nivîskaran û berhemên wan derketin rexneyên femînîst tên kirin.

Berna Moran jî wek rexnegira femînîst a Emerîkî Elaine Showalter, nêzîkatiyên sereke yên rexnegirên femînîst bi du aliyan dabeş dike: 1- Bi navenda xwendevan, rexneya femînîst a berê wê li nivîskar. 2- Bi navenda nivîskar, rexneya femînîst a berê wê li jinê.[93]

### 2.2.1. Bi Navenda Xwendevan Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Nivîskar

Nêzîkatiya ewil yanî rexneya femînîst a ku xwendevana jinnavendî ye, li ser metnên nivîskarên mêr disekine. Di vê rêbazê de, berhemên nivîskarên mêr ji aliye xwendevana jin ve tê xwendin û dahurandin. Li gorî vê nêzîkatiyê xwendin û nirxandinên li ser berheman, li gor xwendevana jin û mêr diguhere. Ji ber ku nêrîn û dahurandinên xwendevana jin dikare kodên zayendperest ên ku di nava metnê de veşartîne çêtir bibînin û metnên nivîskarên mêr ên ku bi rêya edebiyatê re zayendperestiya di nava civakê de xurttir dikin deşîfre bikin. Lê di vir de qest ne ji bo her jina xwendevan e. Lewra jinanî ne bi tene cudahiyek biyolojik ya zayendê ye; ew hişmendiya jinaniyê ye.[94] Xwendevana jin a ku bikaribe bi çavên jinê berhemên nivîskarên mêr bixwîne û dahurîne divê haya wê ji feraseta mêr û mêraniyê, desthilatdariya edebiyata mêran û dinyaya wan ya ku jin di wir de bindest in, ji civaka zayendperest, ji jinaniyê û hwd. hebe, da ku bikaribe bi xwendinên xwe re nêzîkatiyên nêrî yên ku derbasî nava edebiyatê bûne derbixîne.

Ji bo vê rexneya femînîst mînaka ewil di sala 1949'an ji Simone de Beauvoir tê. Berhema wê ya bi navê *İkinci Cins*, ji bo tevgera femînîst û rexneya femînîzmê hêzeke mezin bû û hê jî ev berhem bi gelek zimanan tê xwendin.* De Beauvoir di vê berhemê de, li ser zayendên jin û mêr û nêrina civakê ya li ser her du zayendan şîrove dike. Jin ji aliyê civakê ve çawa dibe zayenda duyem û bêqîmet dibe, bi

---

[93] Berna, Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, ç. 25, weş. İletişim, İstanbul, 2014. h.b. r.250

[94] Moran, h.b. h.r.

* Di derbarê çavkaniyê de, bnr. têbiniya rûpela 42.

mînakan nîşan dide. De Beauvoir, ligel teoriya rexneya edebiyatê, rêbazên teoriya biyolojik, Marksîst û psikanalîtîk jî bi kar tîne. De Beauvoir her weha kodên zayendperest ên di berhemên nivîskarên mêr de veşartîne derdixîne. Rêbaza *bi navenda xwendevan, rexneya femînîst a berê wê li jinê ye*, piştî berhema De Beauvoir (1969), bi berhemeke nû, *Cinsel Politika* ya Kate Millet re xwe di nav rexneya edebiyatê de xurt dike. Millet, rexneya edebiyata femînîst bi nirxandin û analîzên di vê berhema xwe de hêsan dike. Di vê berhema xwe de Millet li ser îdeolojiyên zayendperest û tesîra wan ên di edebiyatê de dahurandinan dike. Millet dibêje: “Zayendîtî, sinifandineke ku wesfekî polîtîk hildigre”.[95] Millet, di vê berhemê de rexneyên xurt li berhemên nivîskarên mêr dike û di berhemên wan de zimanê nêrî, zayendperestiya mêran, fikrê wan yên li ser zayendîtî û baviksalariya ku di nava metnên wan de der bûne derdixîne. Bi ya Millet, di pergala malbata baviksalariyê de, her ferdeke wê malbatê wek malê (kerese) bav tê dîtin û ji bo ku rolên zayendî yên di civakê de bên guhertin lazim e ku tesîrek mezin (wek şoreşeke zayendî) li ser pergala malbata baviksalar çêbibe.[96]

### 2.2.2. Bi Navenda Nivîskar Rexneya Femînîst a Berê Wê Li Jinê

Rêbaza duyem “bi navenda nivîskar rexneya femînîst a berê wê li jinê ye; berevajî rexneya li jor, berê xwe dide nivîskarên jin. Di vê nêzîkatiyê de di navenda rexneyê de nivîskarên jin û berhemên wan hene. Ew li pey van pirsan dikevin: Gelo edebiyateke nivîskarên jin ku ji ya nivîskarên mêr cihê ye heye? Di nav nivîskarên jin de ji aliyê tema, rêzebûyer û karakteran ve taybetmendiyên hevpar hene? Pêwendiya van bi şert û mercên ku bi pergala baviksalar re derketiye çi ne?[97] Li gorî rexnegirên vê nêzîkatiyê: Çandeke nivîskarên jin ku ji yê mêran cihê ye heye, seba ku jin di nava dîrokê de marûzî heman pêkûtiyan mane. Ji ber vê jî rewşeke siruştiye ku nivîskarên jin, jiyanê ji mêran cudatir bibînin lê ev cudahî ne bîyolojîk e, encama civaka zayendperest e.[98] Li gorî Elaine Showalter, mebestên bi vê rexneyê wiha ne: Çêkirina edebiyata jinê, di serê ewil de li ser berhemên nivîskarên jin ên ku xwe dane

[95] Millett, h.b. r. 45.
[96] Millet, h.b. r. 107.
[97] Moran, h.b. r. 255.
[98]Neql. Moran, h.b. r. 255.

qebûlkirin re lêkolînên ji nû ve, ligel van lêkolînan lêkolînên li ser nivîskarên jin û berhemên wan ên ku hatine jibîrkirin, paşguhkirin û yên ku nehatine ferq kirin. Bi vê rêyê re him edebiyata jinê û him jî teoriya rexneya edebiyata femînîst ava dibe. Rexneya edebiyata femînîst, bi nivîskarên jin û metnên wan re, bi dîrokê re bi cure û avaniyên edebiyata jinan re eleqedar dibe. Mijarên wê jî psîkodînamîkên afirîneriya mêtî; lînguîstîk û kêşeyên zimanê jinê, tarîxa edebiyatê û dahûrandinên li ser hin nivîskar û berheman e.[99] Hin nivîskarên jin bixwe li hemberî nivîskarên femînînîst ên ku teoriya "edebiyata jinê" avakirine derdikevin û vê cihêkirinê qebûl nakin. Bi ya wan edebiyat qadeke xwerû ye û di nava wê de ferqa zayendê tune ye. Ew xwe wek nivîskarên jin di nav edebiyatê de cihê nakin lewra ji bo wan cihêbûnek wilo di nava edebiyatê de têkçûyîna nivîskariya jinê bixwe ye. Nivîskar çi jin be çi mêr be karê edebiyatê dike. Bi ya wan ew ne tenê li ser mijarên zayenperestî, jin, baviksalarî û mijarên ku îdeolojiya femînîst eleqedar dike lê li ser hemû mijarên jiyanê dikarin binivîsin û ji bo herkesî dinivîsin. Li ser vê nêzîkatiya wan Hülya Argunşah vê reddîyetê wek encama serkeftina edebiyata jinê dibîne: Meriv dikare van nêzîkatiyan wek destkeftiyên tevgerên jinên ku qada edebiyatê ji bo mebestên xwe wek amûrekê bikar dianîn e. Edebiyat, di nav hewildanên femînîst de bi jinê re û ji bo derbirîna wê rolekê digire û her ku bi ser dikeve, bi awayekî sirûştî ji vê rewşê cihê dibe, vediguheze mebesta xwe, ango ber bi qada xwe ve diçe.[100] Çawa ku her xwendevana jin nabe femînîst û bi wê hişmendiyê naxwîne her berhema ku nivîskara wê jin be û mijara wê jî jin be nabe berhemeke femînîst. Berî her tiştî hişmendiya wê jinê (nivîskar an jî xwendevan), nêzîkatî û xwenaskirin û derbirîna wê girîng e.

Virginia Woolf, bi berhema xwe ya bi navê *Kendine Ait Bir Oda* re mînaka ewil ya rexneya li ser nivîskarên jin dide. Cihê jinê ya di nava civak û edebiyatê de, rewşa edebiyata ku tê de mêr serdest e, ya Îngîlîstanê, merheleyên pêşketina edebiyata jinê nîşan dide. Woolf di vê xebatê de, ji bo ku jin di nava edebiyatê de xurt bibin û

---

[99] Balcı, h.t. r. 81.
[100] Hülya Argunşah, *Kadın ve Edebiyat Kendini Yazmak*, weş. Kesit, İstanbul, 2016, r. 12.

edebiyat ji serdestiya mêran derkeve şîretan li jinên nivîskar dike. Li gorî wê berî her tiştî pêdiviya jina ku dixwaze binivîse bi odeyeke aîdî xwe û bi pereyan heye: "Eger berhemên çêkirî binivîse, divê perê jinê û odeyek aîdî wê hebe..."[101] Woolf "odeyê" wek sembolekî jî bi kar tîne; ode, dinyaya jinê, cihê ku di wir de bikaribe bibe "xwe" û li wir bi azadî binivîse. Woolf balê dikşîne ser mijarên nivîskariya mêr û jinan û dibêje "bi qasî ku mêr li ser jinan dinivîsin, jin li ser mêran nanivîsin..."[102] Ji ber vê jî gava ku karaktera xeyalî li nav refikên pirtûkxaneyan digere ku li ser edebiyata jinê bixebite, ferq dike ku ew refik bi berhemên ku mêran li ser jinan nivîsandine dagirtîne. Woolf balê dide nêzîkatî û gotinên hin mêrên siyasetmedar, akademîsyen, fîlozof ên li ser jinê û nîşanî me dide ku tev neyînî ne. Bi kurtasî, Woolf di vê berhemê de dahurînên xwe yên li ser edebiyata jinê, nivîskariya jinan û mêran dibêje û tîrên rexneyên xwe dibe ser jinên ku di nav karên malê de, nivîskara di dilê xwe de dikûje, jinên ku bi ya dilê xwe nanivîse û hîn ne xwediyê pere û odeyeke aîdî xwe ye.

Rexneya ku berê xwe dide nivîskarên jin û berhemên wan, ji aliyeke din jî li gotarên jinê dinêrin. Rexnegirên wek Helene Cixous, Luce Irigaray, Julia Kristeva, Monique Wittig, teoriyên xwe li ser zanistên wek psîkanalîz, zimannasî û biyolojiyê ava dikin û fikrên xwe dispêrin Derrida û Lacan.[103] Paşxaneya van rexnegiran femînîzma postmodern e û li ser hin têgeh û diyardeyên postmodern berê xebatên xwe didin rexneya femînîzmê. Ev teorî li Fransayê pêş dikeve û teorîsyenên wê jî zêdetir ji wir in. Ev rexnegir li ser têkiliya ziman û çanda baviksalariya ku jinê biçûk û bê nirx dike disekinin. Bi ya wan li hemberî zimanê ku serdestiya mêran xurttir dike divê zimaneke jinanî bê avakirin û ev mimkûn e. Mebesta wan çêkirina teoriya jinaniyê ye û rêya vê jî bi zimanekî jinanî û nû ye. Lewra zimanên heyî di xizmeta mêran de ne û tev bi kodên baviksalar, şîddet, hurafeyên li dij jinan ve dagirtîne. Di vê zimanî de dualîzmek hiyerarşîk heye û wek peyvên "mêr-jin" peyva ewil serdestê peyva duyem e.

Hin rexnegirên ku li ser vê mijarê û bi vê rêbazê xebat kirine ev in; Janet Kaplan, Ellen Moers, Elaine Sholwalter, Sandra Gilbert, Susan Gubar, Annis Pratt.

---

101 Virginia Woolf, *Kendine Ait Bir Oda*, weş. Pirtûkxaneya Remzi, İstanbul, 2015. r. 6.
102 Woolf, h.b. r. 31.
103 Moran, h.b. r. 259

## 2.3. Edebiyata Jinên Kurmanc: Ligel Berhemên Jinan, Bêdengiya Rexneya Femînîst

Jinên kurd di edebiyata nivîskî de berî çîrok û romanê berê xwe dane nivîsandina helbestan. Hejmara helbestvanên jin û berhemên wan ji roman û çîrokên wan zêdetir in[104]. Bi ya helbestvana kurd Fatma Savci hin sedemê vê rewşê hene; jin xwediyê hestên narîn û tîr in, ji ber hêza xwe ya zayînê ve nêzîktirî siruştinê û dilê jinê gerduniye.[105] Bi ya Woolf jinan encax di odeyeke ku aîdî wan bûya dikarîbû helbest binivîsanda ji ber ku nivîsandina helbestan ji ya romanan zêdetir hewcetî bi baldarî û lêhurbûnê dixwest. Meyla ewilîn ya nivîsandina jinan li ser helbestê bû, li İngilîstan û Frensayê helbestvanên jin beriya romannûsên jin dihatin lê dîsa jî hejmara helbestan li gor roman û cureyên pexşanê kêmtir bû.[106]

Çima jinan ewilîn berê xwe dan helbestê û di nava edebiyata jinên kurd de helbest zêdetir û li pêştir e nîqaş û xebateke bi serê xwe dixwaze. Lê bi ya me hestên jinan li derekê sedemên dîrokî, zanistî, siyasî, aborî û herî zêdetir jî sedemên tecrûbeyan hene ku jinên kurd berê xwe didan helbestê. Tecrûbeyên ku li dora jina kurd hebûn kilam, dûrik, lorik, zêmar û cureyên din ên edebiyata devkî bûn. Helbest nêzîktirî van cureyên, ku jinan ji mêj ve digotin û gelek caran tecrûbe dikirin, bûn. Li dora wan û di mîrateya wan a dîrokî de cureyên romanê û edebiyata modern tune bûn. Ger hebûna jî haya wan zêde bi wan nebû û hay hebe jî xwendin û nivîsandina hejmara jinan pir kêm bû. Ji bo ku jinan helbest binivîsandina pêdiviya wan bi xwendina dibistanên bilind an jî odeyên aîdî wan nedibû; quncikek malê, serê girekê, beravek, deştek, beriyek... têr dikir ku bi tenêtiya xwe û hestên dilê xwe bimana. Tişta herî hewce bi zimaneke bêsînor û azad bû; pişt re jî bi civakek azad bû/e. Lê ji bo nivîsandina romanekê hewcetî elbet zêdetir dibûn. Pêdiviyên jina kurd ji bo nivîsandinê zêdetir bû lê ne tiştên luks bû. Îro eger em li ser "odeya" Woolf bifikirin,

[104] Her çiqas li ser helbestên jinên kurd xebatên akademîk ên ku meriv bikaribe ji aliyê statîstîk danberheviyekê bike tune be jî hin antolojî û setên ku berhemên helbestên jinên kurd tê de bi cî bûne fikrekê li ser wan dide meriv. Ji bo mînak bnr: Anatolojiya Helbesta Kurdî ya Nûjen (Helbestvanên Jin), *Fixana Pênûsên Nazik*, weş. Ronahî, (amd.) Evîn Şikakî, Diyarbakır, 2012.
Şahmaran Kürt Kadın Yazarları Seti, weş. Avesta,

[105] Ji bo xwendin û sedemên berfirehtir bnr: Fatma Savcı, "Şiir Yüreğin Dili ve Doğal Yaşamın İfadesidir", (brh.)Vecdi Erbay, *İnatçı Bir Bahar*, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2012, r. 345-346.

[106] Woolf, hb. r. 74-75.

beriya odeyekê zimanek azad ji jina kurd re hewce bû/ye. Ji ber vê jî gelek berhemên bi kurdî ên ku beriya salên 1990î hatine nivîsin ji diyasporayê derketine. (Romana ewil a jina kurd Zarîfe Demir, Kela Bilind jî li diyasporayê hatiye nivîsandin û weşandin.) Îcar ku em civaka baviksalar, oldar, xwedî eşîret jî têxin ser astengiyên li hemberî nivîsandina jinên kurd wê zehmetiya nivîskariya wan, şert û mercên ku tê de ne çêtir bên fêmkirin.

Berî her tiştî divê em ji bîr nekin ku beriya van deh salên dawîn jinên kurmanc ji aliyê nivîskariyê ve ne di wê rewşa afirîneriyê de bûn. Gelek sedêmên vê rewşê hene ku hin ji wan ev in:

Hejmara jinên kurd ên ku xwendin û nivîsandina wan (tirkî) hebûn an di dibistanan de dixwendin kêm bûn. Di civaka me de heta van salan jî malbatên (desthilatdarên malbatê; “bav”) ku keçên xwe nadin xwendin hene. Beriya xwendin û nivîsandina bi kurdî xwendina di dibistanên fermî yên li Tirkiyê hewce bû lewra ji ber ku tu dibistanên kurdan tune ne, rêya xwendin û nivîsandinê ji wir derbas dibe.

Piştî ku qedexeyên li ser xwendin û nivîsandina zimanê kurdî rabû bi jî, ji aliyê xwendin û nivîsandina bi kurdî derfetên baş çênedibûn ku jinên kurd xwe bigîhînin asta nivîskariya bi kurdî. Hînbûna elfabeya zimanê kurdî encax bi rêya kursên kurdî yan jî bi meylên şexsî pêkan bû.

Jinên kurd ji aliyê hişmendî, nasnameya jinîtî û netewî ve bi pêş diketin lê, ev pêşketin zêdetir di qadên polîtîk de çêdibûn. Di vê qadê de jî ziman gelek caran wek amûreke polîtîk dihat bikar anînin û jinên kurd zêdetir nêzîkî zimanên serdestên xwe dibûn û entegreyî vê çanda serdest dibûn. Di qadên polîtîk de jin zêdetir wek qehreman, siyasetmedar, leheng û hwd. dihatin pênasekirin û jinên di wê qadê de gelek caran ji nasnameya xwe ya jinîtî dûr diketin.

Derfetên wan ên aborî kêm in û hêj gelek jinên kurd bi malbata xwe re dijîn ango ji aliyê aboriyê ve girêdayî malbatê ne ya jî girêdayî mêrên xwe ne. Ev aliyê aborî nahêle ku jin ji xwe re derfetên lêhûrbûnê bibînin, xaniyek ya jî odeyeke ku tê de bibin xwe û bi xwebûna xwe binivîsin.

Pêşdaraziyek wiha bi jinên kurd re çêbibû: Hemû qadên ku tê de zanîn û zanist hebe aîdî mêran in. Ji ber ku heta niha kesên ku di dibistanên bilind de perwerde dîtibûn mêr bûn, mela mêr bûn; kesên ku di nava civakê de wek aqilmendên civakê dihatin dîtin mêr bûn; ên ku pirtûkên wan hebûn û qala wan dibû mêr bûn lewra nivîsandin jî qadeke mêran bû.

Di zanîngehan de, tu xebat, ders an jî beşên lêkolînên li ser jinên kurd û zayenda civakî tune ne. Cihên ku jinên kurd li hev bicivin û tecrûbeyên xwe ji hev re parvebikin û ji aliyê zanistî û edebiyatê ve xwe li pêş bixin tune ne.

Di bin tesîra van sedeman de ji aliyê xwebawerî, hişmendî, wêrektiya ku bikaribe bê endîşe binivîse û heger nivîsên wê hebin lê bikaribe wan biweşîne ne pêkan bû.

Ji ber van sedeman îro ne pêkane ku em behsa edebiyateke ku paşxaneya wê dewlemend e bikin û bi hejmarên zêde berheman rêz bikin. Lewma ger em rewşa îro, pêşketinên di warê edebiyatê û rexneya edebiyatê bidin ber çavên xwe û bi van rastiyan li xebatên li ser berhemên nivîskarên jin binerin, em ê valahiyeke mezin bibînin. Berhemên wan ji aliyê xwendevanên kurd ve zêde nehatine xwendin, di warê edebiyatê de, di nav xebat û gotarên rexneyî de, danasîn û qîmeteka wan bi qasî berhemên nivîskarên mêr çênebûne. Xebatên rexneyî li ser berhemên jinên kurd bi hin gotaran ve sînorkirî mane.* Bi têkiliyên me yên bi nivîskarên jin re, di çarçova vê xebatê de, me fêm kir ku haya van nivîskaran ji berhemên hev zêde tune ne yan jî berhemên hev nexwendine; di navbera wan de têkilî û danûstendinên xurt ên ji bo edebiyata jinê çênebûne.

* Haşim Ahmedzade û İbrahim Seydo Aydogan li ser nivîskariya jinên kurd û berhemên wan gotarên rexneyî nivîsandine. Lê di berhema Ahmedzade de, bi qeneeta me ji ber tarîxa nivîsandina xebatê ve romanên jinên kurmanc cih negirtine. Ji bo edebiyata jinên kurd û rexneyên li ser berhemên wan ev her du gotar dikarin bên xwendin: İbrahim Seydo Aydogan, “Di Metbexa Ziman û Wêjeyê de Jina Kurd”, (dnd.) *Guman 2, Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî,* weş. Rûpel, Stenbol, 2014. rr. 179-202. Haşim Ahmedzade, “Cîhana Romanên Jinên Kurd”, (dnd.) *Romana Kurdî û Nasname*, weş. Avesta, Stembol, 2011, rr. 149-177.

Gelo di serê ewil de rexneyên xurt li ser van berheman bihatina kirin wê îro berhemên jinên kurmanc ne di rêyekê xurt û dewlementtir de bûna? Sedemên vê bêdengiyê û paşguhkirina li hemberî berhemên nivîskarên jin çi ne? Wê ev rewş çawa bê çareserkirin? Berî ku bi nêzîkatiyek pêşdarazî xwendevan û lêkolîner berê xwe ji berhemên jinan bidin aliyeke din û berhemên wan ji warê edebiyatê dûr bimînin divê bê pirsîn bê ev berhem çi dibêjin? Ango jin bi rêya nivîsên xwe dixwazin çi bêjin? Rexneyên ku ew li civaka mêrane dikin çi ne, yan jî kêmasiyên metnên wan çi ne? Divê ev bên tespîtkirin û pişt re dest bi xebatên li ser vê qadê bên kirin. Bi van rastî û kêmasiyan heta ji destê me bê, em ê hewil bidin ku ji bo edebiyata jinê xebatên xwe pêşkeş bikin. Di vê xebatê de bêyî ku em berê xwe bidin çawaniya berhemên edebî ya jinan em ê guhê xwe bidin jinên di van berheman de, pirsgirêkên van jinan û sekna nivîskara jin a di van berheman de. Lewra gotina Collin û Kaufer, rêbaz û mebesta me nîşan dide: “Berhema jinekê berî her tiştî berhemek e û bêyî ku hêjatiya wê ji pêş de bê diyarkirin, di qada temsîlî de tê wateya raperîneke girîng. Ev ne tenê ji bo jinan ji bo her kesekî wilo ye.”[107]

Destpêka nivîsandina pexşanên kurdî ên jinên kurmanc di sedsala 20. de bi kovarên kurdî, kurdî-tirkî re dest pê dike*. Di beşa ewil ya vê xebatê de me behsa hin kovarên ku jinên kurd li dora wan kom bibûn kiribû. Ew kovar ji bo destpêka nivîsandina jinên kurd cihekî girîng digrin lê ji bo nivîsên bi tirkî ên di wan kovaran de bi ya me meriv nikare bibêje ew ji kaniya edebiyata jinên kurd in. Ku em têkiliya di navbera edebiyatê û ziman de bidin ber çavan wê qesta me bê fêmkirin. Edebiyata ku aîdîyeta neteweyekê nîşan bide encax bi zimanê wê netewê mimkun e. Lewma qesta me ya bi edebiyata jinên kurmanc jî ew xebat û berhemên ku bi kurmancî hatine danîn. Qaîdeya me ya sereke jî di vê xebatê de ev e. Bi zimaneke serdest wê edebiyateke xweser a jinên kurd ne pêkan be lewra ew nabin ji berhemên edebiyata kurdan jî.

---

[107]Collin, Kaufer, h.b. r. 142

* Di kovara *Hawar*ê hejmara 27. an û 28. an de du gotarên Rewşen Bedirxan bi navê “Kebanî û Mamoste” û “Jin û Bextiyara Malê” hene. Weke gelek hejmarên *Hawar*ê ev hejmarên wê jî li Şamê, sala 1941ê çap dibin. Rewşen Bedirxan di her du gotarên xwe de şîretan li jinên kurmanc dike, behsa rolên jinan ên li ser perwerdehiya zarokan, dêtiyê, têkiliyên wan ên bi mêrên wan re û hwd. dike.

Em dixwazin li vir hinekî behsa berhemên jinên kurd bikin. Lewra armanca bi rexneya edebiyata femînîst yek jê jî danasîna berhemên nivîskarên jin e. Em ê jî bi kurtehî behsa berhemên nivîskarên jinên kurd bikin û bi vê yekê re him navê wan û him berhemên wan binasin: Di warê edebiyata jinên kurd de cara ewil bi kurmancî berhema çîrokan ya Sîma Semend çap dibe. Çîroka Semend, *Xezal*[108], cara ewil di sala 1961ê de li Êrîvanê, bi elfabeya kirîlî dertê. Bi elfabeya latînî çapa wê ya ewil li Stockholmê (1996), çapa duyem jî li Stembolê (2015) dibe. Leheng û serlehengên çîrokên Semendê axlebe jin in. Ev berhema Semend yekemîn berhema çîrokan ya jina kurmanc e. Li Tirkiyê heta salên 1991ê li ser zimanê kurdî qedexe û qanûnên hişk hebûn. Piştî van salan weke ku me li jor jî qal kiribû, jinên kurd ên ku di hin kovarên tirkî-kurdî de çîrok dinivîsîn hebûn. Lê weke pirtûk heta sala 2007an jî tu berhemek çapbûyî derneketiye. Di sala 2007an Lorin S. Aydoğan pirtûkek çîrokan bi navê *Kirasê Teng*[109] derdixe. Ji aliyê berhemên çîrokan ve seyr wiha didome: Lorîn S. Aydoğan, *Destên Vala*[110] (2012), Fatma Savcı, *Ristiya Morîkan*[111] (2012), Kîbar Krîstîn Ozbey, *Sorxêlî*[112] (2014), Suzan Samanci, *Ew Jin û Mêrê bi Maske*[113] (2015).

Ku em hinekî behsa van çîrokan bikin: Mijarên çîrokên di *Kirasê Teng* de şerr û zilma li ser kurdan ên di salên 80yî û 90î, jinên ku bê mêr û bê bav dimînin, jinên bi êş û bêdeng, şermkirina ji ber xwîna kamiliyê, namûs, kuştinên "meçhul" in. Ev çîrok bi devê jinê hatine gotin ango vebêjer jin e/nivîskar e. *Destên Vala* li ser zarokên kurd ên ku di nava şer de mezin dibin. Di her du berhemên çîrokan ên Lorîn S. Doğan de ligel mijarên polîtîk û bûyerên ku li dor vê atmosfera polîtîk de qewimîne, mijarên rojane yên li ser jinan, zarokan, dayikan jî cihê xwe bi zimaneke zelal girtine. Di *Ristika Morîkan* jinên zana, jinên bi sêhr, dayikên li pey cendên zarê xwe, jinên qehreman hene. Di berhema *Sorxêlî* de lehengên çîrokan hema hema tev jin in. Ji aliyekê jin û dayikên bi hesreta welat û zarên xwe hene ji aliyê din jinên ku di nava jiyana bajêr de li rastî xayintiya mêran hatine hene.

---

108 Sîma Semend. *Xezal*, Avesta, Stembol, 2015.
109 Lorîn S. Doğan, *Kirasê Teng*, weş. Avesta, Stembol, 2007
110 Lorîn S. Doğan, *Destên Vala*, weş. Avesta, Stembol, 2012
111 Fatma Savci, *Ristika Morîkan*, weş. Avesta, Stembol, 2012
112 Kibar Krîstîn Ozbey, *Sorxêlî*, weş. J&J, İstanbul, 2014.
113 Samancı, Suzan, *Ew Jin û Mêrê Bi Maskê*, weş. Avesta, Stembol, 2015.

Kurtaj, eşq, zewacên şaş temayên din ên van çîrokan in. Temaya çîrokên *Ew Jin û Mêrê Bi Maskê*, jinên kurd ên ku bi hêviya jiyaneke nû û di rêya zewacê de çûne welatên Ewrûpayê lê li wir jî gelek caran starek nedîtine. Li gor xwendinên me yên bi van çîrokan re em dikarin bibêjin ku di van çîrokan de ligel ku babetên polîtîk û nasnameya nîjadî derdikevin pêş, nasnameyek jinanî, li dora bûyeran bicihkirina sekna jinên kurd jî li ber çavan in. Ev jin ji nav civak û çanda kurdan in lê bi du aliyan dikarin bên nirxandin; jinên bajarî û modern, jinên nayif û bêdeng.

Di edebiyata jinên kurmanc de bi saya Rojîn Zarg em dikarin behsa cureyeke din jî bikin: Serpêhatî. Berhema wê ya bi navê *Fîdo*[114], ji serpêhatiyên zilamekî ku wek feylesofekî diaxive, wek siyasetmedarekî tevdigere, bi tecrûbe û zana pêk hatiye. Em dikarin ji bo cureya "ceribandin"ê jî mînakekê bidin ku ev cure jî daxilî nav edebibiyata jinên kurmanc bûye; *Şewq û Payîz*[115] a Fatma Savci. Rojbîn Özkan, bi berhema xwe ya bi navê *Zarokên Heskîfê*[116], çîrokên nûjen ji bo zarokan nivîsandiye.

Romannûsiya jinên kurmanc ên Bakur jî di sala 2008an bi romana Zarîfe Demir *Kela Bilind* dest pê dike û seyr wiha didome: Gulgeş Deryaspî *Tariya Bi Tav* (2010), Çidem Baran *Li Peravên Torê Torên Evînê* (2011), Çidem Baran "*Lerizînên Tenêtiyê*" (2012), Gulgeş Deryaspî *Xezal* (2013), Çidem Baran *Li Dû Siya Sêwiran*(2014), Yildiz Çakar *Gerîneka Guernicayê* (2016), Eqîde Tok *Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê* (2016), Aynur Aras *Leylana Kesk* (2016).

Gava ku em van hejmarên roman û çîrokên jinên kurmanc dinêrin em dibînin ku sal bi sal ev hejmar zêdetir dibin. Ji bo ku em bikaribin bêjin edebiyata jinên kurmanc heye bi ya me ev berhem û naveroka wan bes in. Lê em ê di beşa dawî ya vê xebatê bi rêya karakterên jin ên di romanên wan de, bi babetên wan ên sereke û bi şêwaza nivîskaran re, binêrin bê ka ev edebiyateke çawa ye, derba xwe li romanê çawa xistiye.

---

[114] Rojîn Zarg, *Fîdo*, weş. Aram, Diyarbakır, 2012.
[115]Fatma Savci, *Şewq û Payiz*, weş. Avesta, Stembol, 2011.
[116]Rojbîn Özkan, *Zarokên Heskîfê*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2012.

# BEŞA SÊYEM

# DI ROMANÊN JINÊN KURD DE KARAKTERÊN JIN

Di her du beşên ewil de em li ser teoriya femînîst û rexneya edebiyata femînîst rawestiyan û me gotibû ku em ê bi rêbaza rexneya feminîst a ku berê wê li jinê ye li romanên nivîskarên jin binêrin û jinên di van romanan de analîz bikin. Di berhemên jinan de dayîna karakterên jin û babetên li ser jinê ji bo nêrîna nivîskara jin ya li jinê bê dîtin derfeteke girîng e. Di romanê de, "leheng, him amûr e him mebest e: Amûr e, çimkî motîfan bi hev girê dide lewra dibe sedem ku di vegotinê de hevgirtinek çêdibe. Mebest e; çunkî sedema hebûna gelek romanan e."[117] Ji bo rexneya femînîst jî karakterên (leheng, kes) berhemên nivîskaran weke amûrekê ye, bi saya wan nêrîna nivîskar ya li jinê di romanê de derdikeve. Lewra di vê beşa dawî de em ê li ser karakterên jin ên romanên nivîskarên jin rawestin û di dawiyê de em ê bi çend babetan mijarên ku di van romanan de derketine pêş û bi jinê re eleqeder in bigrin dest. Em ê binêrin bê nivîskarên jin di romanên xwe de jin çawa dîtine, ew bi xwendevanan çawa dane nasîn û ew di nava civakeke çawa de nîşan dane.

Ji bo xwendin û fêmkirina karakterên jin ên di romanan de hêsan bibe û naveroka romanan bê zanîn em ê di destpêka her romanê de şîrove û dahurandinên xwe binivîsin. Piştre em ê karaktera sereke û karakterên din ên jin, di nava rexneya femînîst de analîz bikin. Bi vê yekê re em ê di çavên nivîskarên jin de li jinê, binêrin. Di dawiya vê beşê de em ê bi çend babetên sereke yên ku bi jinan re têkildar in û di van romanan de bi karakterên jin re derketine pêş dahurînin û rexneyên xwe binivîsînin.

Em ê li gor kronolojiya dîroka romanan wan rêz bikin. Ev dîroka kronolojîk wiha ye; Zarife Demir *Kela Bilind,* Çidem Baran *Lerizînên Tenêtiyê*, Gulgeş Deyaspî *Xezal,* Yildiz Çakar *Gerineka Guernicayê,* Aynur Aras, *Leylana Kesk.*

---

[117] Mehmet Tekin, *Roman Sanatı Romanın Unsurları*, weş. Ötüken, İstanbul, 2017, r. 95.

## 3.1. ZARÎFE DEMÎR[*] - *KELA BILIND*

Zelîşa ji gundê Kela Bilind û Hesancan dil dikevin hevdû lê li ber wan astengiyek mezin heye; lewra Zelîşê bêşkirtmeya kurê xalê xwe ye. Hesencan zilamên malbata xwe dişîne mala bavê Zelîşê û bavê Zelîşê Şerefxan û dêya wê Siltanê bi hatina wan ya cara sêya re li hemberî adetan radibin û Zelîşê didin hezkiriyê wê Hesencan. Ji vê zewaca evîndaran du keçên cêwî tên dinyayê; Berfîn û Zerîn. Piştî bi salan Berfînê dibe bijîşk û Zerînê jî dibe parêzer. Her du xwişk di nav bûyerên salên 90î de dibin şahidê gelek bûyerên siyasî, kuştin, lêdan, zilm, bêdadî û hwd. Ligel van bûyeran ew dibin şahidên jinên di bin pêkûtiya mêran û pergala baviksalar de mane, jinên ji ber adet û toreyan bi darê zorê zewicandin.

### 3.1.2. Karakterên Jin

Di vê romanê de du jin wek karakterên sereke xuyanî dibin. Di beşa ewil ya romanê de Zelîşê, di beşa din û heta dawiya romanê jî karaktera Berfînê li pêş e. Di romanê de navê pênç jinan derbas dibin; Zelîşê, Berfînê, Ezîme, Siltanê, Zerîn. Em ê li jêr bibînin bê Zarîfe Demîr di romana xwe de ev jin çawa pêşkeşkirin.

#### 3.1.2.1. Zelîşê

Karaktera sereke ya yekemin Zelîşe ye. Di destpêka romanê de Zelîşê vebêjer e û mîna ku em li destanekê guhdar bikin behsa wê kêlîka ku evîndarê xwe dibîne dike. Lê hêj di serê diyalogê de ew jina ku evina xwe bê fedî û bê tirs eşkere dikir bi carekê re li hemberî Hesencanê dildarê xwe diguhere:

"Lo Hesencano por reşo, birû qeytano, bejn ziravo, navê min xwe re dernexe tu di ber derê bavê min re mere... Ez beşîkkertma lawê xalê xwe me." (r.5)

---

[*] Zarife Demir, di sala 1955an de, li gundê Şokrîgê ku girêdayî navçeya Pertekê ya bajarê Dêrsimê ye, ji dayik bûye. Demîr, di sala 1989an diçe welatê Swêdê û bi qasî em dizanin heta niha jî wî welatî ye. Di derbarê Zarîfe Demîr de agahiyên li ber destên me pir kêm in lewra me ji bo vê xebatê jî xwest ku bi ser şopa wê vebin lê me tu rê nedît û em bi ser rêya wê venebûn.

Zelîşê di nav tirs û endîşeya civakê de ye û ev hevok jî me ber bi wê derê ve dibin. Di nav adetên kurdan de ku navê jinekê bi mêrekê re derket ya jî hinekan ew bi hev re li derekê dîtin ew jin hew dikare stara xwe bike, heta hetayê di nava civakê de wê stûxwar be û heta bi vê sucê xwe yê mezin, malbata xwe, ya rastî mêrên di malbatê de, stûxwar dike. Eger ku ji zarokatiya xwe ve dergûşa wê bi qedera wê ve girê dabin û jê re "beşîkkertmeyek"* dîtibin ev rewş du qatan girantir dibe. Bi vê tirsê peywira jina kurd ya ewil ew e ku bav û birên xwe, ap û xalên xwe li hemberî civakê stûxwar neke! Lewma Zelîşê jî di romanê de yek ji wan jinan e û bi vê endîşeyê dixwaze evîndarê wê biçe û wê ji bîr bike. Zelîşê bêyî ku bi dê û bavê xwe re li ser meseleya beşikkertmeyê biaxive û serî li ber wan rake xwe mehkûmê qederê û eşîretê dibîne:

"...Çawa ku ez hatime dinê ez beşîkkertme me. Qedera min ne di destê min û ne jî bi dilê min e, bi dev û destê bavê min û eşîra wî de ye." (r.6)

Di van hevokan de em razîbûnekê li hemberî qedera ku malbat û eşîr ji jinê re xêz dike dibînin. Razîbûnek heye ji ber ku Zelîşê ji mêj ve adetên civaka xwe dizane û eger jinek li ber van adetan rabe dibe ku fermanê kuştina xwe jî bide.

Piştî çend carên xwestinê dê û bavê Zelîşê soza beşikkertmê xira dikin û Zelîşê bi yê dilê xwe re dizewice. Ji bo vê zewaca bi dilê xwe yekane berxwedana ku Zelîşê dike ew e ku ji Hesencanî re dibêje were min bixwaze.

Nivîskar di romanê de bi devê Zelîşê û Hesencan çend caran vê hevokê bi bîra xwendevanan dixe. Zelîşê jî li hemberî hin rewşan (wek beşikkertmê) stûxwar û di nav qederê de tê dayîn lê wekî din xwediyê vê gotina li jor e û dixwaze li hemberî adetên kevin û nebaş bisekine.

* Di romanê de peyva "beşîkkertme" bi vî rengî dersbas dibe. Di derbarê beşîkkertmeyê de di destên me de zêde agahî tune ne û îro di nava kurdan de şopa çandeke wiha ne berbiçav e. Di berhema Mela Mehmûdê Bayezîdî de di derbarê beşîkkertmeyê de hin agahî hene û di jêrenota vê berhemê de jî agahiyeke wiha heye: "Beşikkertme: Soza dergûşê. Peyv Tirkî ye ji Beşik yanî dergûş û laneya zarokan û Kertmek yanî birrîn û qutkirin, birrîna sozê, hatiye bihevxistin. Ev adet hîn jî di nav hinek kurmacan heye. Ji zaroktiyê de du zarokan (kur û keç) li hev mar dikin. Jixwe ev adet dibe sebeba gelek serêşiyan di pêşeroja her du zarokan de. Li nav beşekî ji Kurdên Sûrî dibêjin *hûçikbirrî!* Rodenko dibêje ku ev adet gelekî li ba Kurdên Êzdî û Misilman heye. Ji bo zêdetir agahiyan bnr: Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye,* (lêkolîn) Jan Dost, weş. Nûbihar, İstanbul, 2012,r.18-19.

Li dor van xwendinan em dikarin bibêjin ku lehenga jin Zelîşê bi awayek giştî ne lehengeke xurt e, her çiqas li hemberî hin adaten derketibe jî ev yek ne bi tena serê xwe lê zêdetir bi tesîra lehengê mêr (Hesencano) re çêbûne. Tenê di mînaka ku di şeva ewil de derdikevin bexçeyê bi serê xwe li hemberî xurafeyan derdikeve. Zelîşê jineke serî tevlihev e. Zû biryarên xwe dide û zû jî diguherîne. Xwendin û nivîsandina wê heye û zimanê wê di rengê dengbêjiyê de ye. Zarîfe Demir bi karaktera Zelîşê re kirpandina guhertina jinê ya bi pêş ve kiriye. Jin dikare bi demê re, biguhere û li hemberî paşvemayînên civakî jiyaneke nû ava bike.

### 3.1.2.2. Berfînê

Karaktera sereke ya duyem e lê di romanê de cihê girîng digre. Berfînê, keçika Zelîşê ye. Ew jineke di nava civakê de ye, xwenda û zana ye, xwediyê hişmendiyeke civakî ye. Di kongreyên navnetewî de diaxive, kêmasiyan rexne dike û bi berpirsyarî tevdigere. Berfînê li nexweşxaneya bajarê Amedê dixtor e. Berfînê li nexweşxaneyê dibe şahidê pirsgirêkên jinan. Ew bi devê xwe ji xwişka xwe re behsa bûyerekê ku li nexweşxaneyê dibe dike. Jineke ku li nexweşxaneyê karê paqijiyê dike bi hinceta ku ew jinebîye lewma wê ehlaqê kesên li wir xirab bike ji kar tê derxistin. (r.62) Dîsa jineke ku li nexweşxaneyê sekreteriyê dike ji bo ku teklîfa hevaltiya dixtor qebûl nake, bi derewa ku wê pere dizîye ji kar derdixin. “Hemû personel dizanin ku serokbijîşk merivekî bêexlaq e, çavê wî tim li keç û jinan e...” (r.62) Dayikên kurd ji ber kuştin û girtinên zarê xwe bi derd û kul in û Berfînê li derdora xwe van jinan jî dibîne. Rojekê gava ku diçe nexweşxaneyê dibîne ku dîsa hêzên ewlekar ên dewletê li dora wir kombûne û xortên kuştî anîne nexweşxaneyê. Li ber deriyê nexweşxaneyê dayik ji bo zarên xwe digrîn û dilorînin: “Hoy xwedêyo bila aştî were, xwîna ciwanên me nerije.” (r.64) Ev dayik jî li rastî şîddet û copên hêzên dewletê ên ewlekar tên. Berfînê di rojnemayê de dixwîne ku keçikek 16 salî dane zilamek 60 salî ji bo qelendê. Keçik jî ji malê direve xwe li xaltîka xwe digre axirê xaltîka wê starê lê dike. ( r.71) Berfînê li ser vê nûçeyê wiha dibêje: “... De were nemire. Ev çi bav e, çi edelet e, çi dîn e, çi merivatiye ku qebûl dike?... Ev çi edetên rezîl in. Dunya li ku em li ku?” (r.71) Rojekê keçeke ku ji destê bav û birê xwe ji lêdanê birîndar bûye tînin nexweşxaneyê. Sedema şîddetê jî şîddeteke din e; malbatê xwestiye wê bi lawê apê re bizewicînin lê keçikê nexwestiye lewra hezkiriyê

keçikê yekî din e. Li ser vê bûyerê Berfînê wiha dibêje: “Xezal li ber xwe bide, jiyan ne tenê ji bo te bêbext e; bi hezaran keç û jinên di rewşa te de hene. Li ber xwe bide û serê xwe metewîne. Li ser piyên xwe bisekine. Divê meriv li dij edetên pîs û xerabên demê be.” (r.85) Demir, bi van hevokan re sekna xwe ya li hemberî adetên paşvemayî eşkere dike û wan red dike.

Di serê romanê de, di kongreya ku dixtorên cîhanê lihev civiyabûn rojnamevanek frensî Viktor û Berfînê hev du naskiribûn. Viktor ji wê naskirinê ve dilê xwe berdabû Berfînê û her carê bi mahneyekê telefonê mala wê ya jî cihê wê yê kar dike ya jî dîsa bi mahneyekê diçe bajarê Amedê ji bo ku Berfînê bibîne. Di van telefon û hevdîtinan de dilê xwe ji Berfînê re venake çara eşkerekirina dilî di nameyê de dibîne. Nameya Viktor him mikurhatina dilê wî ye him jî daxwaza zewacê ye. Bersiva di nameya Berfînê de wiha ye:

“...Pêwîst e ku ez li ser vê rewşa nazik û girîng dûr û dirêj bifikirim. Ev ne tişteke weh hêsa ye ku meriv bi lez û bez qebûl bike. Ez berê dixwazim dê û bavê xwe re bêjim. Ez û tu ne mêrivên welatek, netewek, kultur û olekê ne. Ev rewşeke giran û zehmet e...” (r.33)

Piştî vê nameyê bi demekê bersiva Berfînê ya ji bo zewacê di vê nameya jêr de ye:

“...Ez ji dûrehiya welat nafikirim û ne keçeke oldar im. Baweriya min bi însanan heye, ne bi olê. Ez çûm gund cem dê û bavê xwe. Min ji wan re got. Ew dibêjin tu dizanî. Lê ez ji bo zewacê ne amade me. Ez hêvîdar im ku tu ji min eciz nebî û nexeyîdî...”(r.38)

Em dixwazin nakokiyên di nava van herdu nameyan de bidin berhev û li ser van nakokiyan xwe bigihînin encamekê. Ji bo ku em herdu nameyan pey hev re binivîsin û balê bidin ser wan me behsa çûna gund ya Berfînê û bertekên endamên malbata wê nekir. Berfînê pêşî ji dêya xwe Zelîşê re meseleyê vedike. Bersiva Zelîşê wiha ye: “...Li ber evînê sînor û qedexe tune ne. Evîn miletan jî nas nake. Bi dîtina min ya rastî ev e...” (r.34) Bavê Berfînê Hesencan: “...Evîn û jiyan yên te ne. Tu hez dikî û bawer dikî ku merivekî baş e, hûn dikarin bi bextewarî bijîn, bêje belê û bi Vîktor re bizewice. Tu keçeke xwenda, zana û xama yî. Tu bi xwe biryara xwe bide.” (r. 35) Di nameya ewil de endîşeyên Berfînê yên malbatî hebûn û va ye me dît ku ev endîşe xilas bûn. Dîsa di nameya ewil de behsa olê dike lê di nameya duyem de ew bi

xwe dibêje ku ‘ez ne keçeke oldar im.’ Yanî ne wekheviya olê ya di navbera wan de jî ne pirsgirêkek e. Naxwe dimîne endîşeyên welatî/netewî û çandî. Yên ku serê Berfînê tevlihev dike ev mesele ne lewra em dizanin ku Berfînê jineke bi ax û çanda xwe ve girêdayî ye. Sedema ku xwestibû rojnamevanê Frensî Viktor jî nas bike ew bû ku Viktor di nûçeyên li welatê xwe de behsa rewşa kurdan a di bin zilmiyê û welatê wan ê ku hatiye dagirkirin bike. (r. 27-28) Lê dîsa jî ev rewş tenê sedemên dudiliyên Berfînê yên li ser zewacê nabersivînin. Ji ber ku Berfînê ji aliyê dilî ve jî hêj ne temam e. Piştî demeke dirêj Berfînê bersivên telefon û nameyên Viktor nade lê rojekê rûdinê û nameyekê ji wî re dişîne û ji wî dixwaze ku ji bo zewacê hevdu nas bikin. Berfînê derî ji evîndarê xwe re vedike, lê nivîskar dîsa karaktera xwe di nava êş û xemên neteweyî de nîşan dide. Berfînê di nameyeke din de rewşa welatê xwe û yê Viktorî dide ber hev:

“...Lê li welatê me ne kar heye, ne dawerî û ne jî wekhevî û azadî heye. Hovitî heye. Ez dîsa jî ji welatê xwe hez dikim. Kêm be jî, ji gelê xwe re xizmet bikim, ez pê dilşa dibim. Divê em di nav gelê xwe de bin û ligor hêza xwe têbikoşin. Ez baş bawer dikim ku dê rojkê ji rojan gelê kurd jî wek gelê din li welatê xwe serbest û azad bijî. Di nav aramî û aştiyê de bijî...” (r. 60)

Zarife Demir, bi dayîna van nameyên karaktera Berfînê re bala xwendevan tim dibe ser hest û fikrên Berfînê yên di derbarê xemxuriya wê ya li ser welat û gelê wê. Nivîskar, ji daxwaza azadiya jinê zêdetir, daxwaza azadiya welat û gelê kurd derdixîne pêş.

Nivîskar bi karaktera Berfînê û carinan jî bi karakterên din rewşa bindestiya kurdan, pirsgirêkên neteweyî û zextên li ser zimanê kurdî dibêje. Carinan nivîskar Berfînê li ber televizyonê datîne û nûçeyên dinyayê yên bi şer bi çavên Berfînê neqil dike. Nivîskar di romanê de bala xwendevan gelek caran dibe ser mijarên polîtîk û rewşa gelê kurd û Kurdistanê û hin fikrên xwe yên li ser pisgirêkên polîtîk bi eşkereyî dibêje.

Sibehekê Berfînê gava nûçeyên rojnameyê yên li ser Iraqê dixwîne bi kuştina rojnemavanê Frensî Viktor dihise. Piştî mirina Viktor malbata Berfînê wê dibin gund, çend rojan dimîne û dîsa tê mala xwe û ser karê xwe. Lê Berfînê nikare zêde li ber xwe û rewşa derûniya ku tê de ye bide rojekê naçe kar heval û xwişka wê bi tirs diçin mala wê, lê li malê wê nabînin. Berfînê winda dibe û tu kes bi ser şopa wê

venabe.

#### 3.1.2.3. Ezîme

Xesûwa Zelîşê ye. Ezîme pîrejineke bi adet û kevneşopiyên civakê re girêdayî û şopdareke wan adetan e. Sibeha ku Hesencan û Zelîşê *çarşefa namûsê* naşênin û birazavayê Hesencan ji Ezîme re dibêje "Xaltîka Ezîme, Hesencan van edetên weha paşvemayî naxwaze." (r.21) Ezîme xemgîn dibe her çiqas di vir de Zeynelxanê mêrê wê vê yekê bi bertekek erênî û mînakên baş rave dike jî Ezîme wiha dibêje:

"Ma rakirina edetên kevn ên ne baş bi me destpê bike, dê gundî çi bêjin. *Bi rastî em rezîl bûn."* (r.21)

Ji vê bertek û gotina Ezîme em pê derdixin ku tirs û derdê wê, berî her tiştî ji gotinên civakê ye. Ew adetên civaka ku Zelîşê jî di serê ewil de kiribû bin tirsa xwe aniha jî dihêle ku Ezîme xwe bi wan "rezîl" bibîne. Bi vê pîrejinê re endîşeya "wê gundî çi bêjin?" li pêş e. Ji bo ku gundî fesadiyan nekin, gotinên xirab neynin serê wan Ezîme dixwaze çarşefa namûsê ya bûka xwe bibîne û bi xwîna li ser wê çarşefê serê xwe li ber gundiyan bilind bike. Zarîfe Demir balê dide ser adetên ku pergala baviksalariyê, li ser namûsa jinê ava kiriye û xwe li ser wan adetan bilind dibîne. Bi demê re jinên wê civakê jî dibin kevneşopparêz û ew bi xwe adetên ku jin bi wan tên biçûkxistin diparêzin.

#### 3.1.2.4. Siltanê

Dêya Zelîşê ye. Di romanê de tesîra wê ya mezin li ser xirakirina soza beşikkertmeya Zelîşê çêdibe. Gava ku mala bavê Hesencan tên Zelîşê dixwazin û bavê Zelîşê ji wan re dibêje keça min beşikkertmeya lawê xwe ye lewma em nikarin bidin, Siltanê* bi Şerefxanê mêrê xwe re li ser vê rewşê wiha diaxive:

"Şerefxan tu dizanî ku dilê Zelîşê ji lawê xalê xwe re tune. Dilê Zelîşê ji Hesencan re heye. Tu qeziyê bi wan nede, keçikê bextreş neke. Bila keça me bi dilê xwe bizewice..."(r.10)

Li ser van gotinan Şerefxan dixwaze bi eşîra xwe re bişêwire lê Siltanê dîsa gotinên xwe dibêje:

“Qet ne hewce ku tu tiştek bêjî. Dê û bav ez û tu ne û em biryar didin. Em bi edetên kevn bikin keçikê bi zindî dikin gore. Ji bo jiyana keça xwe pîn li wan edetên kevn ên paşvemayî bixe.” (r. 11)

Siltanê ligel ku jineke gundî ye, di nava kevneşop û adetên gund de maye jî piştî salan li hemberî beşikkertmeya keça xwe derdikeve û piştevaniya keça xwe dike. Nivîskar bi vê karakterê re, hêviyên li ser şikestina adetên ku qedera jinê ji pêçekê ve tîne xurt dike. Di xeyala nivîskar ya bi karaktera Siltanê re derdikeve holê ku jineke gundî jî dikare adetên xirab biguherîne. Jina ku bikaribe biguhere, dikare adetan jî biguherîne û ji bo jinên din berê qedereke nû veke. Di guhertina jinê û pêşketina wê de sal û mekan ne girîng e ya girîng avakirina jiyaneke ku jin û mêr wekhev bin û jin bi îradeya xwe tevbigerin.

#### 3.1.2.5. Zerîn

Zerînê, keça Zelîşê ye. Di romanê de zêde behsa wê nayê kirin. Ew parêzer e li bajarê Amadê û di nava karê xwe de şahidiya bûyerên li ser zilma dewletê, bêdadiya li hemberî kurdan dibe. Carinan ew û xwişka xwe Berfînê li hev rûdinên û behsa zehmetiyên karên xwe dikin. Zerînê ji xwişka xwe re qala rewşa dadgehan û zagonên siyasî dike:

“Xwişkê li vî welatî karkirin, jiyan zehmet e. Ku meriv kurd be xirabtir e. Ne însanetî, ne mafê merivan, ne demokrasî tu tiştek nemaye.” (r. 53)

Zerînê û xorteke parêzer dil dikevin hev û dixwazin bizewicin. Zerînê vê mesela zewacê bi xwiha xwe Berfînê re parve dike. Zerînê bi van hevokên li jêr evîndarê xwe re dide nasîn:

* Di rûpelên 10. û 11. ên romanê de navê Siltanê bi şaşitî Ezîme hatiye nivîsîn lê li gora tevahiya romanê em pê derdixin ku ew divê Siltanê be.

“Ew ji Cizîra Botan e. Birayê heft xwişkan e. Di bandora eşîrê de filan nîne, bi xwe biryara daye du xwişkên xwe daye xwendin. Sê xwişkên wî mamoste ne, du dixtor û du jî ekonom in.” (r. 61)

Di van derbirînên Zerînê de tê xuyanîn ku, ji bo karaktera Zerînê evîn û zewac ne tenê bi evîndariyê ve girêdayî ye. Lewra ne behsa hestên xwe ên di derbarê evîndarê xwe de dike; behsa sekna wî yê li hemberî eşîretê û perwerdehiyê, malbata wî, rewş û statûya jinên di malbata wî de dike. Meriv dikare bibêje ku Zerînê ji hestên evîndariyê wêdetir li ser qaîdeyên zewacê û rewşa mêr a li hemberî jinê disekine û bi vê nêrînê mêrê xwe dibijêre. Nivîskara romanê di dayîna vê karakterê de du tiştan derdixîne pêş: Yek, jin bixwe tercîha mêrê ku pê re bizewice dide, ya din, jin di vê tercîhê de li sekna mêr a li hemberî jinê, civakê, perwerdehiyê dinêre û bi van esasan biryara zewacê dide. Lewma jî Aras, di romanê de bi van hevokan li ser fikrên karaktera Zerînê yên di derbarê tercîha mêrê ku pê re bizewice disekine.

Di romana *Kela Bilind* de, karakterên jin bi aliyên xwe yên erênî ve li pêş in. Zelîşê, Berfînê, Zerînê, Siltanê ev her çar jin jî di romanê de li hember klîşeyên civaka zayendperest serî hildidin. Zarîfe Demîr, bi dayîna van karakteran re bi me dide hîs kirin ku jin bi dû nasnemaya xwe ya jinanî de ne û di nava civakê de bi perwerde û pêşketinan ve dikarin bibin subje. Lê nivîskar ligel pêşketinên jinan, behsa piştgiriya mêran û guhertinên mêrên di civaka zayendperest de jî dike. Bi vê yekê re jî bi bîra me dixe ku guhertinên li ser zayenda civakî û pirsgirêkên jinan bi mêr û xwe guhertina mêran re jî têkildar e.

# 3.2 ÇÎDEM BARAN* - *LERIZÎNÊN TENÊTIYÊ*

Roman bi nameya ku Şevînê ji keça xwe Stêra re dinivîse dest pê dike. Ji xeynî cihên ku vebêjer radigihîne, bûyerên di romanê de û jiyana Şevînê tev bi rêya nameyan û bi devê Şevînê hatine dayîn. Şevînê dest bi zanîngehê dike û dil dikeve xortekî bi navê Serwer. Serwer û Şevînê dev ji adet û zordariyên malbatê berdidin, serî li ber wan natewînin û bi hev re direvin bajarê Stenbolê. Li wir dizewicin û keçek ku navê wê Stêra datînin çêdibe. Cîraneke wan, mêreke eraq vexwar û doxînsist bi kaxiz û peyamên telefonan Şevînê tacîz dike. Rojekê Serwer peyamên telefona Şevînê dixwîne û bêyî ku rastiyê ji wê bibihîse lêdanê dike, radihije Stêra çend mehî û ji malê derdikeve. Şevînê ji aliyê mêrê xwe ve ji keça xwe tê dûrxistin û heta dawiya umrê xwe çavên wê careke din bi keça wê nakeve. Salên Şevînê bi hesret û bêriyan di nav tenêtiyê de derbas dibe lê ew ji bo ku rojekê keça wê bi sedemên dûrketina wan bizanibe û li ber çavên keça xwe Stêra reş nebe, bi nameyan hemû jiyan û serpêhatiyên xwe ji wê re dinivîsîne. Lê ji ber ku navnîşanek keça wê li cem wê tuneye ev name heta roja ku Şevînê koça xwe ya dawîn dike di odeya wê de weke wê bêxwedî dimînin. Bi mirina Şevînê re keça wê Stêra ku navê wê bûye Rojînê van nameyan bi dest dixe. Haya wê ji hemû jiyana dêya wê çêdibe û dêya xwe dibe dispêre axa gundê wê.

## 3.2.1. Karakterên Jin

Di vê romanê de karakterên ku em ê analîz bikin ev in; Şevînê, Dayika Şevînê, Leyla, Stêra/Rojbîn, Pîrê.

### 3.2.1.1. Şevîn

Karaktera sereke ya romanê ye. Şêvînê di zanîngeha Amedê de beşa wêneyê de dibe xwendekara zanîngehê. Li wê zanîngehê Serwer nas dike, dilê wan li hev dikele û dibin evîndarê hev. Malbata Serwer, piştî mirina birayê wî dixwazin jinbira

*Çidem Baran, di sala 1985'an, li gundê Kerboranê/Bamezrut hatiyê dinyayê. Zarokatiya wê li Batmanê derbas bûye. Demeke dirêj di kargeha Hunerên Bedew a Fewzî Bîlge de perwerdehiya wêneyê dibîne. Li Zanîngeha Dîcleyê beşa wêneyê xwendiye. Heta niha sê romanên wê çap bûne. Her wiha helbest, çîrok û ceribandinên wê jî hene.

wî lê mehrkirin ji ber vê jî Şevînê û Serwer bi hev re direvin diçin Stenbolê. Li tenişta xaniyê Şevînê xaniyê mêrekî çavpîs heye. Her gava ku Şevînê derketiba hewşa xênî ya jî derketibe taxê ji bo lazimiyekê di bin tacîza vî mêrê çav kotî de dimîne. Şevînê ji tirs û neçarî diçe qereqolê û giliyê vî mêrî dike. Jina ku ji tirs û aciziya tacîza mêrekî xwe avêtibû bextê ewlehiya dewletê li wir jî rastî desthilatdariya dewleta mêrserwer tê. Lewra ji gotin û giliyên wê re tu delîl tune ne û jinaniya wê careke din binpê dibe. Şevînê ji tirsa ku mêrê wê şaş fêm bike ti carî behsa vê meseleyê û vî cîranê çavpîs nake. Nivîskar di vir de bala me dibe ser sedema van tirsan û bêdengiya Şevînê û berê me dibe binhişiya zaroktiya wê:

"Ez ditirsiyam bêjim...Tu yê bêjî qey dema ez kirinên nebêriyan vebêjim, ne ew ez ê xerab bibim. Gava ez kûr difikirim têdigihêjim ku ev bêziravî ji malbata min ji min re mîrate maye. Ji ber ku di temenê me yî biçûkatî de her tim dengê me ji hêla mezinan ve dihat birîn û kesî em bi baldarî guhdarî nedikirin. Her tim bi peyva zaroktiyê fikrên me nedihesibandin û peyvên me di qirika me de, bi me didan jibîrkirin..." (r. 210)

Nivîskar hewl daye ku sedema bêdengî û tirsên wê bi du aliyan ve girê bide: Yek jê binhişiya zarokatiyê ku di nava malbatê de gotin û fikrên zarokan bê qiymet bûn û ew tim dihatin huşkirin bû. Ya din jî ji tirsa şikestina baweriya Serwer (mêr) bû. Lê nivîskar di sedemeke din ya girîng ji bîr dike. Ew jî tesîra nêzîkatî û nêrînên civaka zayendperest ya ku di binhişê Şevînê de dibûn sedema xisarên mezin. Civaka ku tê de bû, malbata wê, bav û bira û dayika wê tev bi kodên zayendperestiyê ve girêdayî bûn. Ev rewş him derbasî tevger û nêzikatiyên Şevînê bibûn, him jî Şevînê kiribû mexdûra vê rewşê.

Rojekê Serwer di telefona Şevînê de peyamên vî mêrî dibîne û bobelateke mezin tîne serê Şevînê. Gava ku peyaman dixwîne bêyî ku ji Şevînê bipirse ya jî guhdariya wê bike, li Şevînê dixe û nahêle ku carekê jî biaxive. Mêrê Şevînê Serwer, wê rojê radihije Stêra û diçe.

Di romanê de Şevînê gelek caran li rastî tacîzên mêran tê. Cara ewil hê di zaroktiya wê de ji aliyê sîxureke ku hatibû mala wan û Şevînê ji bo pirsan xistibû odeyekê hatibû tacîzkirin. (r. 169). Piştî zewacê ji wî mêrê fehş ê ku bibû cîranê wan û bi her hal û tevgerên xwe Şevînê tacîz dikir û di dawiyê de jî bibû sebebê ku mala

Şevînê xirab bibe. (r. 44) Mêrê hevala wê Leylayê (Zibeyro) bi awirên xirab li Şevînê dinêre û carekê jî destên wê digre. (r. 132)

Şevînê karaktereke bêdeng û bi endîşe ye. Di fikir û tevgerên xwe de ne azad e, ew tim xwe girêdayî mêr hîs dike. Di tevahiya romanê de Şevînê di fikrên xwe de bêbiryar e, bi nakok e û dudiliyan dike. Şevînê nêzî bîst salan e ku keça xwe nedîtiye lê ji bo ku wê bibîne jî tu tiştek ber bi çav mekiriye. Tim di nava dudiliyan û nakokiyan de ye. Nivîskar karaktera xwe ewqasî bê çare û mexdûr nîşan dide ku bi dayîna karaktera xwe re dikeve nav nakokiyan. Şevînê ne tenê ji bo ku li keça xwe bigere di nav dudilî û nakokiyan de ye. Her wiha ji bo ku wêneyên xwe pêş keça cîrana xwe Dilvînê bike jî bêbiryar e. (r.174) Ev bê biryarbûn û sekna wê ya dudil dibe sebebê ku wê tu caran keça xwe ya ku ewqasî nêzîkê wê bû nebîne.

Çidem Baran, weke karaktera Şevinê wênesaz e û ligel vê nivîskara kurdî ye. Ji ber vê meyl û hûnerê di romanê de navên hin wênesazên navdar, nav û berhemên hin nivîskaran derbas dibin. Lê tişta ku bala me li ser dimîne him wênesazên navdar û him jî nivîskar û helbestvanên ku di romanê de navê wan derbas dibin hemû mêr in. Ji navên jinan bi tenê navê wênesaza navdar Frida Kahlo heye lê navê wê jî ne bi wêne û huneriya wê, bi birûyên wê yê ku bi qasî navê wê tê zanîn yanî bi teşeyeke bedenî derbas dibe. Nivîskar di navbera birûyên Kahlo û yên Stêra de şibihandinek kiriye. (r. 12). Navên wênesazên ku di romanê de derbas dibin ev in; Fewzî Bîlge, Van Gogh, Alfred Sisley, Frida Kahlo, Leonardo da Vinci. Nivîskar helbestvan û çîroknûsên ku di romanê de navên wan û navên hin berhemên wan derbas dibin jî ev in; Fewzî Bîlge, Louis Aragon, Arjen Arî, Rênas Jiya, Ehmed Ronîar, Bilge Sumer, Qedrî Can. Şevînê ji xwendinê hez dike û xwendevanek e lewma çêdibe ku navê nivîskar û helbestvanan û berhemên wan derbas bibe. Ev cihê şanaziyê ye jî. Lewra bi vê romana jina kurd re em him xwendevaniya jina kurd, him jî nivîskariya wê dibînin. Lê meriv dikare bipirse ma gelo çima nav û berhemeke nivîskar, helbestvan ya jî çîroknûseke jin derbas nebû ye? Ma berhemek ya jî helbestek jinê nexwendî ye; ya jî yek ji wan biqasî van berhemên nivîskarên mêr li ber çavên nivîskara romanê bi qîmet nebûye? Tişta ku di vê romanê de awarte ye û bi ya me neyîniyek mezin dide romanê cihê Fewzî Bîlge ye. Meriv dibîne ku ji serê romanê heta dawiya romanê jî navê wî, huneriya wêneyên wî, navê berhemên wî bi pesindarî derbas dibe û heta berga pêş a romanê bi xwe jî wêneyeke wî ye.

Şevînê herî dawî bi eşkereyî dibêje ku di bin tesîra berhemên wî de dimîne: “Ez zû bi zû di bandora pirtûkan de namînim û va ye ez li xwe mikûr têm ku di binê bandora pirtûkêm wî de dimînim...” (r. 69)

Îcar ger em bên ser femînîstbûna karaktera Şevînê, em ê di romanê de wê peyvê (lê tenê weke peyvekê) tenê di hevokekî de bibînin:

> “Di zanîngehê de sala min a duyan bû û hêdî hêdî meylên min yên ‘feminîstî’ çêbûbûn.” (r. 19)

Nivîskar, piştî vê hevokê behsa wan meylên femînîstî nake. Gelo ew meylên ku wek femînîstî didîtin çibûn haya me ji wan çênake. Hevoka xwe lê dike û bi carekê re derbasî mijareke din dibe û behsa pêşengeha Fewzî Bîlge dike. Şevînê bi hevalên xwe re yekem car diçe ‘pêşengaha Fewzî Bîlge a ku li galeriya şaredariya mezin a Amedê hatibû lidarxistin.’ Ewqasî di bin tesîra wan wêneyan de dimîne ku ji heyraniya xwe ya li ber wan wêneyan meriv dibê qey ji ser hişê xwe diçe.

“Ne qîzikên ku min didîtin nola yên wî wênesazî bedew bûn, ne dîmenên ku mîna tabloyên wî bi aram bûn...” (r. 193)

Şevînê ewqasî heyrana wan wêneyan bûye ku êdî dîmen û rastiyên li dora xwe naecibîne. Heta tê wê radeyê ku ‘qîzikên’ li dora xwe jî bi qasî jinên di wêneyan de naecibîne. Di vir de meriv dikare du rexneyan bike; yek ji ber peyva ‘qîz’ê ye ku civaka me peyva ‘qîz’ê di maneya ‘jinên azib, ên nezewicandî’ ango ‘bakîre ya jî xama’ de bi kar tînin. Lê “jin” û “jinanî” ne bi zewacê re çêdibe her keça zaro ku gihîştî dibe jin e û heta dawiya emrê xwe jî jin e. Çawa ku kurikek/lawikek piştî ku gihiştî dibe ‘mêr’ e û bi zewacê re naveke din lê bar nabe, jin jî çi zewicî çi nezewi be jin e. Meriv dikare vê jî lê zêde bike ku peyva “xort” jî ji bo mêrên ciwan re tê gotin û vê yekê fêm bike. Lê di peyva “qîz” ê de bikaranînek veşartî heye lewra ne ji bo jinên ciwan tê gotin. Yanî du peyvên “qîz û xort” ne di heman mehsûmiyetê de ne. Lewma nivîskar di bikaranîna vê peyvê de li xwe mikur tê ku xwe ji zimanê civaka zayendperest xilas nekiriye. Yanî beravajî meylên femînîstî tesîra zimanê zayendperest li ser nivîskar xurttir e. Rexneya din jî ev e; jina ku qaşo behsa meylên femînîst kiribû di cih de behsa Fewzî Bîlge dike û pesnên wêneyên wî, wênesaziya wî dike. Di vir de ne ku em li dij hostetiya hunermendekî mêr derdikevin û heyrantiya jinekê ya li hember hunera wî ecêb dibînin lê îtîraza me ji vê ye; nivîskara ku karaktera xwe femînîst nîşan dide, dîsa bi çavên karaktera xwe, jinên ku di wêneyan de dibîne, ji jinên ku bi can û candarî li dora xwe dibîne xweşiktir dibe û

hewcetiyê bi danberheviyeke wiha dike. Berevajî sekneke femînîst, Şevînê karaktereke têkçûyî, jineke ku xwe ji tesîra feraseta mêrserwer rizgar nekiriye û îtaetkar e. Jixwe ne di jiyana Şevînê de û ne jî di sekna wê de em rewşeke femînîstî nabînin. Şevînê tenê di salên zanîngehê de gava ku evîndar dibe hinekî serhildêr e. Ew jî ji bo evîna wê ye û serê xwe li hemberî malbata xwe hildide. Wekî din Şevînê karaktereke bêdeng, têkçûyî û pasîf e.

Şevînê dayikeke ku keça xwe qet nedîtiye û di wê tirsê de ye ku keça wê bê ku haya wê ji rastiyê çêbibe tu caran ji wê hez neke û wê wek dayikekê nebîne. Ji ber vê jî Şevînê biryarê dide ku her tiştî di nameyan de ji keça xwe re binivîse.

Çend sedemên ku Şevînê ber bi nivîsandina van nameyan dibe ev in: Sedema ewil a ku Şevînê bi xwe dibêje û wek yekane sedem dibîne endîşeya dêtiyê ye. Sedema duyem tenêtî û aciziya ji vê tenêtiyê ye. Şevînê dixwaze bi rêya nivîsê bi keça xwe ya di xeyalên xwe de têkiliyekê deyne, bi wê re him bibe dê him bibe heval.

“Bi saya nameyên xwe ez ê te bikim şirîkê jiyana xwe ya ku ez ê jî bi te re lê vegerim.” (r. 9)

Sedema sêyem jî endîşeya nivîskar bi xwe ye. Di serê romanê de nivîskar bi rêya karaktera Şevînê endîşeyên xwe ên derbarê nivîsandinê bi xwendevan re parve dike:

“Ez hîn di serî de lêborîna xwe ji te dixwazim û xeletiyên min li pêş çavên te mezin nebin. Belkî ez nikaribim serê pênûsa xwe zevt bikim. Carinan pênûs serî ji mirov distîne, li gorî bayê serê xwe diçe û mirov nikare bibe serwerê hefsarê wê... Ez ê nameyên xwe çiqas nebaş û çiqasî karibim binivîsim nizanim lê ez ê weke wênesazekî ku bûbe muptelayê tual û firçeya xwe, ez ê jî bixwazim bibim muptelayê rûpelên xwe...” (r. 9-10)

Weke ku me li jor bi çend xalan diyar kir, her çiqasî nivîskar bi rêya nameyan re xwestiye karaktera xwe bigihîne keça wê jî, bi ya me endîşeya nivîsandinê ji endîşeya dêtiyê li pêştir e. Ji ber ku Şevînê (nivîskar) ji lêgerîna keça xwe wêdetir di nav lêgerîna nivîsandineke baş de maye; nivîs bûye tercîheke mayinde ya nemiriyê lewma jî di dawiya romanê de karaktera Şevînê dimire lê tişta ku ji wê dimîne nivîsên wê ne.

### 3.2.1.2. Dayika Şevînê

Di romanê de naveke wê tune ye. Nivîskar navê wê bi rola wê ya dêtiyê da ye. Di nêrîna nivîskar de ew tenê dayikek e weke din ne subjeye û ne xwediyê navekê ye. Bi kar û barê malê, karên zeviyan, xwedîkirina zarokan re mijûl e. Baweriya wê bi xurfeyan heye û tim behsa sihûda reş, şens û qederê dike. Rojekê li nav serê Şevînê li sipêhan digere ji bo ku sipêhan di nav serê wê de nabîne xemgîn dibe û wiha dibêje:

"Ger sipeh bikevin serê kesên li derdora wan û nekevin serê wan, ew kes bêsihûd in. Xwezî te girîngiya sihûdê zanîbûya...[119]" (r. 143) Bi rêgezên civakê, adet û kevneşopiyên wê ve girêdayî ye. Ew jî di nava civaka baviksalar de mezin bûye û nêzîkatiyên zayendperestî bi wê re jî kok vedane. Cudahiya di navbera jin û mêran de, zarokên keç û kur de li bal wê jî weke ya civakê ye.

Ji aliyekê ve bi hîssên dayiktiyê keça xwe li hemberî şîddeta lawê xwe diparêze lê ji aliyê din ve şopdarê adetê civakê ye û hemû nêrînên ku civaka baviksalar li jinê bar dike bi wê re jî heye. Gotin û şîretên wê, sixêf û nifirên wê hemû temsîliyeta hişê mêrane û civaka mêrserwer dike. Her çiqas Şevînê bi pirsên xwe nakokiyên di nêzîkatiya civakê û malbata xwe yên li ser jinê tîne ziman û dixwaze dayika wê li ser wan bifikire jî ev pirs ji bo dêya wê pirsên "ji rê derketinê û beredayî" ne. Dê, weke ku di van gotin û nifirê wê de jî diyar in keçên xwe dikin qurbaniyên lawên xwe. Ji bo dê, zarokên keç namûsa bav û bira ye û eger navê keça wan di nava civakê de bi bê ehlaqî derkeve bav û bira li ser vê rewşê bênamûs û bêşeref dibin, dilewitin, serê wan ditewe û heta nikarin serê xwe li ber civakê rakin. Lewma jî ji bo ku mêr baş bin û ser bilind bin divê ku jin tim di bin siha wan, qaîde û rêgezên wan de bin.

---

[119] Ev baweriyeke gelêrî ya kurdan e. Li gor vê baweriyê kesên ku sipeh bikevin serê wan bi şens û sihûd in.

### 3.2.1.3. Leyla

Cîrana Şevînê û tekane hevala wê ye. Leylayê jineke polîtîk e û di nav xebatên polîtîk de cih digire. Beşdarî civînên partiyê dibe.

Em ji devê Şevînê pê hay dibin ku navê Leylayê berê Fesfûrilya ye, lê wê ti caran ji wê navê ku diyariya bavê wê bû heznekiriye. "Heta ku Leyla Zana bi kesk, sor û zera di serê xwe de di meclîsê de bi zimanê xwe peyivî. (r. 89) Bi guhertina navê xwe Leylayê him bavê xwe yê ku tu caran jê heznekiribû bi xwe dide ji bîr kirin û ji aliyeke din ve bi wî navê nû nasnameya ku ew dixwaze ji xwe re ava dike. Guhertina nav di vir de nîşaneya vejîneke nû ye. Nivîskar Leylayê weke karaktereke xurt nîşan dide, lewra ew navê xwe yê ku bavê wê lê kiriye diguherîne û naveke bi dilê xwe li xwe dike. Ev guhertineke girîng e ji ber ku bavê wê mêreke xirab, Paşvemayî û desthilatdar e, tu qîmeta navê ku li Leylayê kiriye tune ye. Nivîskar bi navguhertina karaktera jin re esas kirpandina li nasnameyeke nû dike.

### 3.2.1.4 Rojbîn ya jî Stêra

Keça Şevînê, xwediyê nameyên bê navnîşan e, ya rastî ew Stêra ye. Ew di romanê de bi navê Rojbînê, bi hevaltiya layê Leylayê, Barano re xuya dibe.

Rojbînê bernameyekê ji bo pêşangeha wêneyan amade dike û dixwaze ku zêdetir wêneyên jinan tê de bên pêşandin. Navê Şevînê û pesna wêneyên wê jî ji Baranî bihîstibû lewma xwestibû ku wêneyên Şevînê jî di wê pêşengehê de cih bigre. Dîsa bi heyecanekê em li bendê ne ku ew rasthatin, ew mûcîze çêbibe û Şevînê keça xwe bibîne lê heta dawiyê jî Şevînê wêneyên xwe pêş wan nake û li rastî Rojbînê nayê. Rojekê Robjînê li mala Leylayê ye û Dilvînê haya Şevînê pê dixe ku wê êvarî Rojbînê li cem wan be lewma ji Şevînê dixwaze ku eger bikaribe wêneyên xwe pêş Rojbînê bike lê Şevînê ji bêbiryarî û dudiliyên xwe dîsa rê nade wan ku bên li wêneyên wê binêrin. Li ser vê yekê jî Baran û Rojbînê bihev dikevin û nîqaşan dikin. Baran bêziraviya Şevînê rexne dike û laqirdiyan dike lê Rojbînê dest bi parastina jinan dike:

“ Çima ji te re her jin bêzirav tên xuyakirin? Çima tu bêçareyî û bêziraviyê dike yek? Her du ne heman tişt in. Ji bo bêçareyiya wê tu nikarî wê bêzirav bibînî. Divê tu li wê bigerî û bibînî bê ka çima ketiye wê rewşê. Diyar e ji bêçareyiyê nikare daxwaza me bi cih bîne. Ma kî naxwaze berhemên xwe şanî mirovan bide. Te îro wek her mêrî rûyê xwe yî rastî yê li hember jinê derxist holê. Dawiya dawî mêraniya te û kevneperestiya te jî serî hilda. Min qet ev hêvî ji te nedikir. Lê divê min bikira. Erê erê divê min bikira. Ne gengaze ku kevneperestiya di serê her mêrî de tune be. Di serê her mêrî de heye lê ya hinekan zêde zêde ye...” (r. 71)

“ Ji bo ku tu û bavê min î mîna te kevneperest dixwazin pora xwe berdim ez naxwazim berdim. Kêfa min jî ji pora min re dihat lê ji ber ku we nedixwest jê bikim min jê kir û min li hember we serî netewand. Ez rê nadim we. Ger ew kes bavê min an jî xoşewîstê min jî be. Ger em li ber xwestekeke we serî bitewînin wê dawiya fermanên we axayan qet neyê... (r. 72)

Nivîskar bi karaktera Rojbînê re pirsên ku li ser tirsonekiya Şevînê, endîşe û nakokiyên wê yên di hişê xwendevanan de bibersivîne. Meriv dikare bibîne ku Rojbînê di romanê de parêzeriya Şevînê dike. Ew dibe dengê bêdengiya Şevînê. Bi aliyê din ve jî temsîliyeta jineke serhildêr ku mafê jinan diparêze dike. Lewra ew li ser navê xwe jî li hemberî nêzîkatiyên evîndarê xwe û bavê xwe derdikeve. Kevneşopiyên ku ji hiş û pergala mêrane derketiye red dike û bi sekneke têkoşînêr xuya dike. Beramberî karaktera Şevînê ya ser tewandî, Rojbînê serhildêr e.

Rojbînê tu caran dêya xwe nas nake û wê nabîne. Roja ku dêya wê ango Şevînê dimire haya wê ji dêya wê çêdibe. Odeya dêya xwe û nameyên ku jî wê mane dibîne. Ew êdî Stêra ye.

Di dawiya romanê de Stêra ji Baranî re nameyekê ji gundê Bêtahmê dişîne. Laşê dêya xwe aniye spartiye axa gundê wê û li ber serê gora wê jî dareke benavê çandiye.

Xwestekên wê yên ku di saxiya xwe de nikarîbû bi dest bixista bi cih aniye û ji bo ku dêya xwe fêm bike li nav axa wê digere. Nameyên dêya xwe dide Fewzî Bîlge: "... ji bo ew jî bixwîne û bi pênûsa xwe ya ku xwendevanan dike muptelayê nivîsên xwe, jiyana wê bike mijareke çîrokekê."(r. 228)

Wêneya dêya xwe ya ku nîvco mabû bi alîkariya Fewzî Bîlge re diqedîne bi tevahî wêneyên wê li şaredariya Amedê têxe pêşangehê dîrokê jî diyar dike. Heta dawiya romanê jî tesîra Fewzî Bîlge didome. Stêra jî êdî dikeve bin bandora wî.

#### 3.2.1.4. Pîrê

Navê wê Eyşê ye lê nivîskar tim wê bi navê Pîrê dixe nava romanê. Jineke extiyar, cirnexweş, pitpitok û xesîs e.

Şevînê bi bedêla mehaneyeke kêm hemû kar û xizmeta wê dike. Lê Pîrê bi çavên xulamtiyê tim li Şevînê dinêre, wê piçûk dike, gotin û heqaretên kirêt lê dike. Jineke Tirk e û ji bo ku mala cîrana wê Leylayê kurd in û carinan polîs bi ser mala wan ve digre ji wê malê heznake: "Çavên Pîrê qet ferdên mala Leylayê ranedikirin. Gava ku bi çav hin ji wana diket wek bi çav neyarê bavê xwe bikeve hêrs dibû. Gava çav Baran ketibû dîsa çavnebargirtinê canê wê zeft kiribû. Digot û dibiland 'ev kurê qominîstan hatiye cem me çi..." (r. 34)

Di romanê de carekê tenê Pîrê (ew jî ji bo çend rojan) di roleke baş û erênî de derdikeve. Sedema başbûna Pîrê jî "evîn" e. Bi sedema başbûna Pîrê yê bi carekê re nivîskar behsa çîroka Pîrê dike. Şevînê li ser çîroka wê hewqas bi bandor dibe ku xirabiyên wê bi rabirdûya wê û jinbûniya wê ve girê dide. Nivîskar, her carê bi jinên romanên re derdixe pêş ku jina xirap tune ye, jiyan û qedera reş dibe sebeb ku jin ne baş xuyanî bibin. Nivîskar di nêrîna xwe ya jinan de pir henûn û dilnizm e. Lewma heta bi Pîra cirnexweş jî li ber çavên nivîskar jineke baş e.

## 3.3.GULGEŞ DERYASPÎ[*] – *XEZAL*

Roman li bajarê Tetwanê derbas dibe. Di romanê de karakter bi piranî jin in. Karaktera sereke Xezalê ye. Xezalê ji civaka xwe ya baviksalar ku jinên li wir jî li gor wê pergalê bi rê bûne û ketine nav wê ferasetê aciz e, lê ji aliyekê ve jî girêdayî wê civakê ye. Piştî zanîngehê bi Nêçîrvan re dizewice. Hevala wê Zelalê xwe û zarokên xwe dikûje. Ji ber vê mirina wan Xezalê xwe sûcdar dibîne lewma jî bi mehan derûniya wê xirab dibe û xwe ji jiyanê vedikşîne. Rojekê di konferansekê de li rastî hevalê xwe yê ku di lîseyê de bi tevahî wê tu kesî ji wî heznekiribû tê û piştî wê rojê her tim li ser wî (Zana) difikire. Dibe ku dil berdabû wî lê tu caran li xwe mikur nayê û heta mirina mêrê wê Nêçîrvan jî, Zana tim di hişê wê de ye. Di şaredariya bajêr de karê şêwirmendiya jinê dike. Şevekê xebera mirina Nêçîrvan tê ji Xezalê re. Piştî wê şevê bi salan dîsa Xezalê nayê ser hişê xwe. Bi salan ji ber ku di mirina Nêçîrvan de keça xwe sucdar dibîne li rûyê keça xwe jî nanêre. Piştî mirina Nêçîrvan êdî ne Zana ne jî hevala wê ya di girtîgehê de, tu kes ne di xema wê de ye. Rojekê nameya ku Zana beriya bi salan ji wê re nivîsandibû dikeve destên wê. Di nameyê de Zana li evîna xwe ya li hemberî Xezalê mikur hatibû lê xatira ji vê dinyayê jî ji wê xwestibû. Zana jî xwe kuştibû. Piştî vê nameyê dixwîne û haya wê ji xwekuştina Zana çêdibe careke din dikeve nav derûniyeke reş û xirab. Biryarê dide ku xwe û keça xwe bikûje û weke hevala xwe Zelalê ji vê dinyayê xilas bibe lê di dawiyê de fêmdike ku heta niha neheqî û elemek zêde daye keça xwe û ji nû ve biryara jiyaneke nû dide.

[*] Gulgeş Deryaspî, di sala 1978'an de li gundê Ximêçûr ku girêdayî Bitlîsê ye hatiye dinyayê. Di sala 2007'an dest bi nivîsandinê kiriye. Heta niha du romanên wê çap bûne. Li Zanîngeha Mûş Alparslanê di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de dixwîne. Li Tetwanê dijî.

### 3.3.1. Karakterên Jin

Di vê romanê de karakterên jin pir in. Heta em dikarin bêjin ku di romanê de her tim zayenda li pêş jin e û hemû çîrokên di romanê de li dora jinan diqewimin. Bi rêya karakterên jin ên di vê romanê de nivîskar bi gelek pirsan ve dihêle ku xwendevan li ser pirsgirêka zayenda civakî, jinên bindest, jinên di bin tesîra mêran de, bi rexneyên piralî kûr bibin.

Em ê li jêr cih bidin van karakterên jin ên ku di romanê de zêdetir derketine pêş; Xezal, Newal, Dayika Xezalê, Sibhiye Xanim, Çavşînê, Sewqê, Gulbinewş.

#### 3.3.1.1. Xezal

Karaktera sereke ya romanê ye. Xezalê di nava malbatake ku tim behsa fesadiyên xelkê û zêdetir jî fesadiyên jinan tê de dihat qalkirin de bû. Di nava malê de serdestiyek xwiha wê Newalê li ser bi bandor bû. Xezalê tim di bin awirên wê de xwe dîlgirtî hîst dikir. Ji ber vê jî Xezalê dixwest ku wek xwiha xwe Newalê zanîngehê qezenc bike û ji bindestiya xwiha xwe xilas bibe. Xezalê bi her alî ve di bin qontrola malbatê de ye. Malbata wê nahêlin ku Xezalê bi hevalê xwe yên dibistanê re bigere û ji xêncî çûna dibistanê derkeve derve. Bi ya wan keç divê sergiranbûna û li derve tolazî nekirina, bi tu kesekî re negeriyabana.

Nivîskar dixwaze rewşa jinan a li derve, di nava civakê de nîşan bide. Mekanên derve ji bo jinan ciheke xetermek e lewra ew xeterî ne di mekanan de ye, di civaka mêrserwer de ye. Li gora civakê jina ku bi mêrekê re biaxive û bigere ne di rê de ye û ew “bênamûs” e, ji rê derketiye.

Xezalê ji bo ku maleke wê yê ku tê de azadbûya çêbibe dixwest ku bizewice. Wê di mala xwe de bi serê xwe be û ji nav gotinên malbata xwe û ji bindestiya wan rizgar bibe. Çawa ku nivîskar hê di serê romanê de diyar kiribû ku jinên vî bajarî zewacê ji bo xwe wek xilasiyekê dibînin qet nebe bi wê hêviyê ne, Xezalê jî di nava van fikran de ye. Zewac heta radeyekê xilasiya ji saziya malbata baviksalar e. Ji bo jineke xwende û li ser lingên xwe jî ev rewş derbasdar e. Lewra jineke ku wek Xezalê zanîngeh bi dawî kiriye û karekê jî dike nikare xwe ji gotin û nêrînên civakê azad bike.

Piştî zanîngehê Xezalê ne ew jina bi tirs û bêdeng a di lîseyê de ye. Êdî di nava malbatê de dengê xwe li hember neheqiyan bi rehetî derdixe, serhildêr û ji xwe bawer e. Xezalê civaknasî xwendiye lê weke ku ji civakê fêm nekiribe di nava nakokiyên civakî de ye. Li çareseriya civaka baviksalar û desthilatdar digere, lê nizane bê wê çi bike. Hêza ku bi civakê re têbikoşe di xwe de nabîne. Him li dij nêzîkatiyên desthilatdar e, dixwaze civak biguhere him jî rêbaza rast çi ye, civak kî ye, çawa guhertin pêk tên, doza jinan di vir de divê çawa be, nizane. Ger bizanibe jî di romanê de li ser van xalan nehatiye sekinandin. Xezalê gelek caran di tevger û biryarên xwe de bi carekê re diguhere. Bi xeyd e, betilî ye û qehrok e.

Xezalê dixwest xwe bi her alî biguherîne, xwe ji bin tesîra malbata xwe û ezberên ku heta niha pê dabûn qebûlkirin rizgar bike. Bertekên wê radîkal û bi carekê re ne û ji saziyên wê jî peyamên wek hev dihatin:

“Êdî bibe, bi xwe, nebe tu kesî” (r. 58)

Bê ku destûrê ji malbata xwe bixwaze rojekê diçe bajarê Ankara ji bo konferansa civaknasan. Berteka malbata Xezalê û mala xezûrê wê yê ku navê “axa”tiyê li ser bû, didin nîşan ku jinek nikare ji bo ku xwe pêşbixe, bi biryara xwe biçe konferansekê. Sixêf û hekaretên bav nîşan dide ku bav, zarokên xwe, wek milkê xwe dibîne û dikare wan ji malê biqewrîne jî. Bav desthilatdarê malê û xwediyê namûsa keçên xwe ye. Xezûr jî di heman rolê de ye.

Malbata Neçîrvan tên mêvandariya mala bavê Xezalê ji bo ku li ser kar û barê dawetê biaxivin. Nivîskar li ser rewşa jin û mêrên ku wê şevê li malê ne, rewşa giştî ya ku cudahiya jin û mêr ê di nava mekanê malê de eşkere dike bi van hevokan dibêje:

“Dîsa mêrên qapanbilind li odeyek bûn û jinên kuncejiyan jî di odeyek biçûk de bi dengê nizim dipeyivîn. Dengê mêran çiqas bilind dibûya bila bubûya pê mezin dibûn. Hebûna xwe, hêza xwe carkî din mor dikirin. Jinên ku hebûna wan di nav civakê de rûreşiyek mezin bû bi dengê nizim diaxiviyan ku mêr dengê wan nebihîsin.” (r. 202)

Xezalê dîsa li ser rewşa jinên di civatê de bûn difikire. Xesûya wê ya ku bi çenteyê çermê tîmsehê forsa wê li pêş bû, dayika wê ya ku xwe bi forsa xesûya keça xwe, bi dewlemendiya wan şanaz didît, sohbetên wan ên li ser tiştên maddî û rojane difikire.

Nivîskar bi me dide fêm kirin ku jinên ku di nava pergala baviksalar de bê perwede, bê tercîh, bê azadî mane û bi gelek aliyan ve hatine sînorkirin û hepskirin bi şikl û xweşikiyên maddî kêfa xwe tînin, ango xwe bi van tiştan dixapînin. Lewma tiştekî din ê ku bikin nemaye, rêyeke din ku bibînin, sohbeteke din ku bikin nehiştine:

" ... Ew jinên ku axaftin ji wan re hatiye qedexekirin, ger dîsa wisa hatiye qedexekirin, çûyîna mala bavê, derketina derve û bi kurtasî jiyan li wan hatiye qedexekirin çi şîq maye li ber wan? Tu şîqek jî tuneye. Yan dê xwe bikûştana û yan jî dê xwe bi hinek tiştan bixapandana... (r. 20

Nivîskar dibêje ku mêrên van jinan tim çavlider bûn. Mêrên bi jin û zarok yên wî bajarî tim li cem dostikên xwe bûn, kêf û şahiya xwe bi wan dikirin.

"Jinên ku xwe zana dihesibandin hew qebûl dikirin lê mêrê wan berîka wan tijî dikir dengê wan dibirî..." (r. 278)

"Zewac bi serê xwe bûbû kerxaneyek mezin. Di wan kerxaneyan de zarok mezin dibûn, civak ava dibûn" (r.289)

Nivîskar dixwaze bibêje ku jinên vî bajarî yê herî zana jî bi pereyan qanih dibûn, bêdeng dibûn û serî ji mêran re ditewandin!

Jinên ku di romanê de derbas dibin gelek ji wan bi pirsgirêkên aborî derdikevin pêş. Ew ne şixulkar û xwedî karekî madî ne, lê çavên wan tim li pereyan û tiştên madî ne.

Xezalê di saziya şaredariya bajarê Wanê de karê Şêwirmendiyê dike. Ji ber karê xwe gelek jinan û pirsgirên wan nas dike.

"Wekî her derê, jinên vî bajarî jî nexweş bûn. Di emrê ciwaniyê de dizewiciyan. Ciwaniya xwe, delaliya xwe, huner û hezkirina xwe tev didan hevserê xwe." (r.278)

Lê Xezalê ji karê xwe yê şêwirmendiyê aciz dibe. Jinên ku dihatin cem wê her yekê bi derdekê bûn û Xezalê ne yeka bi sebir û çareser e. Ji ber karê ku dike: "Baweriya xwe û jiyanê, hezkirinê evînê winda kiribû" (r. 286). Jixwe ji serê romanê heta dawiyê jî Xezalê ji sohbetên jinan û guhdarkirina derd û fikrê wan gelek caran aciz e. Her çiqas derdora wê tev jin be û karê wê jî şêwirmendiya wan bû Xezalê gelek caran nedixwest guhdariya wan bike. Piştî ku ducanî jî dibe dev ji karê xwe berdide.

Xezalê şevekê li malê li ba keça xwe Lîsayê ye û xebera reş jê re tê. Nêçîrvan di bin berfa serê avahiyekê de dimîne û dimre. Piştî mirina Nêçîrvan rewşa derûnî ya Xezalê xirab dibe. Çawa ku piştî mirina hevala xwe Zelalê xwestibû ku bimre û bi mehan di nava derûniyek xirab de mabû, piştî mirina Nêçîrvan jî xirabtir dibe. Di mirina hevala xwe de xwe sûcdar dîtibû, di mirina Nêçîrvan de jî keça xwe Lîsa sûcdar dibîne lewma jî nedixwest nêzîkî Lîsayê bibe. Lîsayê jî ji jiyanê hişê xwe birî bû û ew ê jî bihîstibû ku di wê kêliya ku telefonî bavê xwe kiribû bavê wê miribû. Ji wê rojê ve wek dêya xwe bi kesekî re nediaxivî. Lîsayê wek şîzofrenekê tim bi xeyalê bavê xwe re diaxive. Mirina Neçîrvan bi telefona keça wî Lîsayê qewimî bû. Nêçîrvan wê şevê çûbû mala hevalê xwe û xwestibû hinekî derdên xwe bi hevalê xwe re parve bike lê ew jî nekiribû û rêya malê girtibû. Di rê de Lîsayê telefonî bavê xwe dike Nêçîrvan jî ji bo ku bi rehetî biaxive xwe ji ber ba û baranê dide binya avahiyê û bi carekê re topa berf û qeşaya ser avahiyê bi ser serê Nêçîrvan re tê xwarê û dimire. Piştî sal û mehan parêzerê Nêçîrvan qutiyeke wî yê ku li cihê karê wî bû anîbû ji Xezalê re. Zana ew name ji Xezalê re şandibû lê ketibû destên Nêçîrvan. Di nameyê de Zana evîna xwe eşkere kiribû û pê re xatirê li vê dinyê ji Xezalê xwestibû. Zana jî xwe li ser evîna Xezalê û êşa vê evînê kuştibû. Xezalê dîsa li mirinê difikire û Zelalê û zarokên wê tîne bîra xwe. Bi saetan di nava mitalayan de dimîne. Dixwaze xwe û keça xwe bikûje. Lê nivîskar romanê berê karaktera Xezalê dide jiyanê. Xezalê, keça xwe himbêz dike û ji nû ve dest bi jiyaneke nû dike.

Jinên li wî bajarî jî qet naguherin û tim di nav lepên mêran de, di bin tesîra wan de bi her êş û neheqiyên xwe jî tu dozekê nadin û xwe bi ber bayê desthilatdariya mêran re berdidin. Jinên ku hatibûn kuştin jî çêdibin, ên ku xwe dikûjin jî, lê her tim sedemên êş û mirina wan mêr û civaka “bi namûs” e. Çawa ku ew di nava romanê de wek siyekê ne, di jiyana xwe de jî siyek in û gelek caran pasîf û ser tewandî ne. Jinên di romanê de derbas dibin tev di bin bandora civaka baviksalar de, di nava kar û derdên rojane de wextên xwe dibuhirînin. Jinên vî bajarî qurban û fedayên mêr û civaka mêrane ne. Di nava malê de mexdûr û bindestên bav û birên xwe ya jî mêrên xwe ne. Jinên ku di malbatên wiha de mezin dibin bi hêviya parek hezkirinê û azadiyê li zewacê dinêrin. Hêviya wan ew e ku li bal mêrê xwe hezkirin û azadiya ku li bal bav û birayê xwe nedîbûn bibînin.

### 3.3.1.2. Newal

Xwiha Xezalê ye. Zanîngeh xwendiye û mamoste ye. Lê ew ji adet û nêzîkatiyên civak û malbatê dûr neketiye. Weke berê tim dixwaze di rola keça baş a dê û bavê xwe de bimîne. Ji bo ku xwe bi dê û bavê xwe şêrîn bike tim kêmasiyên xwişkê xwe û zêdetir jî yên Xezalê dibîne û giliyê wê tim li cem dê û bavê xwe dike. Gava ku li malê ye tim bela xwe li Xezalê dide. Di heman odeyê de ne lê di nava odeyê de jî tim xwe zêdetir xwediyê wê odeyê dibîne û xwişka xwe Xezalê wek mêvanekê dibîne. Di nava malê de tim serdestiyeke wê li ser Xezalê heye; ew dixwaze ku xwişkên wê weke wê bin, di bin emrê wê de bin, li gor nîzama malbatê û civakê bin.

Newalê keça bav û dêya xwe ye û ew tam jina li gor civakê ye. Hemû tevger û sekna wê li gor adetên civakê ye. Jina ku di nava civakê de “xanim” û “xatûn” e. Nivîskar xwestiye wê wek tîpeke “jina maqûl” ya civakê nîşan bide. Malbat û derdora wê bi şexsiyet û tevgerên Newalê re serbilind in. Newalê bi sekna xwe, tercîhên xwe, ehlaq, zanabûn û giranbûna xwe ya jinanî ve di nava civaka xwe de sembola jina maqûl e.

### 3.3.1.2. Dayika Xezalê

Jineke li gor adet û kevneşopiyên civakê ye. Hemû xem û tirsa wê namûsa keçên wê ne. Di wê heyrê de ye ku keçên wê bê ku naveke ne xêr bê ser wan mezin bibin, û bizewicin. Tim fesadiya jin û keçên cîranên xwe dike. Lomeyan ji rewşa keçên wan dike. Bi ya wê di kirinên xirab ên jinan de dayikên wan jî bi qebhet bûn:

“... Ger diya wê kesek bihemd bûya dê qîza wê jî vî tiştî nekira.” (r. 19)

Dayika Xezalê ji aliyê jinanî û dêtiyê ve her çiqas di roleke neyînî de be jî, nivîskar berê me dide sedema vê paşxaneya xirab. Sedemên wê yên ku ew ber bi fikrên zayenperest, hîs û nêrînên xirab ên li hemberî jinan ve dibir hene lewra ev karakter divê di nava wan sedeman de bê nirxandin:

“ Diya wê jî jinek ku di ciwaniya xwe de bê daxwaza xwe bi dilê malbatê di temenê xwe yê biçûk de zewicî bû. Temenê wê yê biçûk di perwerdeya ku civak li hemî jinan bar dikir de bibandor bû. Niha ew jî wek hemî jinên ku di temenê xwe yê biçûk de dibûn xwediyê dergûş, dev ji jiyana xwe berdabû. Wek mîtên jiyanê nîçîriya jinên biçûk dikir. Dixwest ku hemî jinên dinyayê wek wê bê dilê xwe bizewicin, bê dilê xwe bijîn, bê dilê xwe rabin, rûnên û tev bigerin. Dixwest ku heyfa jiyana wê ya jê hatibû dizîn, ji jinên biçûk bistîne. Jinên mezin jixwe wek wê bi kîna nava xwe ya ku ciwaniya wan ji wan hatibû stendin dijiyan...” (r. 28)

Nivîskar di vir de dixwaze balê bikşîne ser nêrîna civakê yên di derbarê jinên ku li gor wan ne di rê de bûn. Jinên ku ketibin girtîgehê û jinên ku xwe dikuştin li dij civakê ne. Ew “ên din in” û cihê wan di nava civakê de tune ne. Dayika Xezalê her çiqasî karaktereke jin be jî, di nava civakeke baviksalar de bibû wek mêrekî; zayendperest, desthilatdar û serî ji hemû qaîdeyên civakê re tewandibû, niha jî dixwest ku hemû jin weke wê bin.

Dayika Xezalê bi du rolan di nava romanê de ye. Ew him dayik e him jî xesû ye. Weke ku di dêtiya xwe de desthilatdar bû û dixwest ku tim zarokên wê di bin emrê wê de bin, di xesûtiya xwe de jî li hemberî bûka xwe desthilatdar e. Di dêtiya wê de çawa be jî hîsên wê yên dêtiyê û hezkirinek mezin li hemberî zarokên wê hebûn, lê di xesûtiyê de li hemberî bûka xwe bi hîsên zikreşî û xirabî ye. Nivîskar sedema van hîs û tevgerên wê yên xirab dîsa bi paşxaneya rabirdûya wê, civak û malbata ku tê de mezin bûye ve girê dide. Xesûya ku xêr ji xesûya xwe nedîbû, ji salên xwe yên çûyî nedîbû aniha jî dixwest hemû rewşên xirab ku tê re derbas bibû jinên din jî bikşînin. Çavnebariya wê ya ji bûka wê jî ev. Ya din jî wê weke dayikên din ên ku ji wan hîn bibû, zarokên xwe û nexasim jî lawên xwe wek milk û sermiyanên xwe didît. Law ji bo wê her tişt bûn, lewra zarokên keç dizewicîn û dibûn ji kesên din re lê zarokên kur ji wan re dima.

Yên ku wê xwedîtî li dêya xwe kiribûya zarokên kur bû, yê ku wê bi wan piştrast bûya dîsa ew bûn. Ji ber van sedeman jî bûk ew jina ku şirîkê lawê wê bû, ji bo wê tim gefek mezin û bi talûke bû.

### 3.3.1.3. Sibhiye Xanim

Xesûya Xezalê ye. Weke ku ji navê wê jî xuya ye nivîskar ew weke xanimekê teswîr kiriye. Ew ji aliyê cil û bergan, sol û çenteyan ve weke xanimeke nîv modern û bi fors e; lê ji aliyê fikir û tevgerên xwe ve ew wek jineke xwedî eşîr kevneşopî,

giran û cîddî ye. Ji Xezalê û malbata wê hez nake. Ew xwe xatûn û dewlemend dibîne lewma malbateke feqîr û bûkeke xeşîm layiqê mala xwe, merivantiya xwe nabîne.

### 3.3.1.4. Çavşînê

Hevala Xezalê ya ji zanîngehê ve ye. Ew di girtîgehê de dikeve nav tevna romanê. Jineke tirk e lê li ser doza kurdayetiyê û mafên kurdan li zanîngehê di nava xebatên siyasî de cî girtiye. Di romanê de bi tenê Çavşînê di temsîleke jina tirk de ye lê wê jî di nava têkoşîn û siyaseta kurdan de cihê xwe girtiye.

Ji Xezalê re nameyan dinivîse û dişîne. Nameyên wê polîtîk û bi perwerdeyî ne. Di nameyan de dîroka avabûna şaristaniyê, netew-dewletan, şerên li ser ax, zeviyan dibin mijar. Meriv dibê qey nivîskêr xwestiye ku bi nameyan xwendevên perwerde dike. (r. 178)

Nivîskara ku di romanê de vebêjer e, fikrên xwe yên polîtîk, hinekî jî bi şêwazeke propagandayî di karaktera Çavşînê de bi rêya nameyên wê re eşkere dike.

Nivîskar bi karaktera Çavşînê re xwestiye ku xwendevanan bi aliyeke fireh yê polîtîk ve bibe, wan li ber deriyên girtîgehan, li ser maseyên girtiyên jin û dayikên kurd ên bi êş bigerîne.

Çavşînê her çiqasî girtiyeke siyasî be û di romanê de sekneke wê ya saxlem, bi hêvî, bi biryar û hwd. hebe jî, ji aliyeke din ve di nav hîsên neçarî û neyînî de ye:

"Halê min jî qet tu halek nîn e. Ez evîndar ez dilbirîn û ez pepûk... Ez a neçar, ez a bextreş tu ji min re çi dibêjî? Ez evîndar im û demek dirêj e min evîna xwenedîtiye... Dilê min li derve ruhê min li derve lê ez dê li vir bimirim belkî jî..." (r. 219)

Di berdewamiya vê axaftinê de dîsa berê xwe dide gotinên bi hêz û erênî:

“Lê pêwîst e ku meriv hinek pozîtîf be.” (r. 219)

Di nava vê axaftinê de bi carekê re em Şînê him bi hal û gotinên wê yên mexdûr, bêçare û reşbîn dibînin, him jî gotin û şîretên wê yên li ser jiyanê û başbûnê. Şînê jî karaktereke ku ji aliyê hîs û sekna xwe de di nava nakokiyan de ye. Ji ber zêdebûna hîssan û rewşa hiş yê mirovan helbet her hîs dikare li dilê meriv biqelibe û meriv bikeve nava nakokiyan jî, lê di nava van pêvajoyan de wextek heye. Axaftina Şînê di heman kêlîyê de ye û ev hevok ji devê wê li ser hev rêz dibin. Lewra meriv dibîne ku nivîskar di dayîna rewşa hîssiyatên karakterê de pir ecele kiriye.

### 3.3.1.5. Sewqê

Cîrana mala dêya Xezalê ye. Nivîskar wê wek jineke pozbilind û qure nîşan dide. Ji serdestiyê, hêz û forsê hez dike. Vebêjer radigihîne ku Sewqê di ciwaniya xwe de jineke pir xweşik e lê piştî ku zarokan çêdike ev xweşikbûna wê (yê bedenî) diguher e. Lê ji ber ku ji xweşikiya laşê xwe bi guman e laşê xwe bi cil û bincilên bangî hestên erotîk ên mêrê wê bike li xwe dike. Sewqê laşê xwe ji bo mêrê xwe di destê xwe de bigre wek amûrekî dibîne. Ya rastî nêzîkatiya estetîka nêrî ya ku xweşikahiya jinê bi hin formên laşî ve dibîne Sewqê jî dibe ber bi wê aliyê ve lewma laşê xwe li gor qaîdeyên xweşikahiya di çavên mêran de bi cilan dixemilîne:

“Zêde pîr nebibû lê piştê bîst salan, çar zarokan bedena wê ya tenik a ku balkêş bû bi bejn û bala xwe niha hinek çermixî bû, hinek filitî bû xwarê sist bûbû. Ew jî bi bincilên jinane bedena xwe diguherand. Bincilên wê tev bi tenteneyên balkêş bûn. Lê bala hevserê wê jî êdî bincilên balkêş nedikişand, jinên ku bedena wan hişkê wek kevir bû, çermê wan sist nebûbû, çiçikê wan nefilitîbû nafteng û zikê wan ji bizarokbûniyê nefilitîbû xwarê dikêşand. Û a herî qirêjtir jî jinên wisa di jiyana wî de hebûn.” (r. 273)

Di van hevokan de him feraseta mêrên ku laşê jinê tenê wek laş/goşt dibînin û xweşikahiya jinê li gor qaîdeyên xweşikbûna pergala mêrane dibînin him jî feraseta jinên ku di nava vê pergalê de dibin xulam û objeyên arezûyê heye. Di nêrîna mêrê ku di nava civak û îdeolojiya baviksalar (ku kapîtalîzm jî tê de ye) de mezin bûye û jin, ji bo wî laşê ku xwe pê têr bike, zarokan jê re çêke, karê malê bike û hwd. hemû

xizmetên wî bike. Jina ku hînî xulamtiyê bûye û bi çavên mêr li xwe dinêre jî dikeve nava lêgerînên xweşikahiya çêkirî, ji bo ku di awirên mêr de jina arezûyê be. Ji bo ku li ber çav û devên mêr laşeke dilbijîner be. Karaktera Sewqê jî di roleke wiha de ye. Nivîskara romanê bi peyvên *"a herî qirêjtir"* sekna xwe eşkere dike û vê rewşa mêrê Sewqê qirêj dibîne. Lewra ew mêrê ku êdî qîma xwe bi laşê jina xwe nayne û ji xwe re li laşê jinên din digere ji serî heta binî ji bo jinê û civakê qirêj e.

Bi ya nivîskar xilasiya jinê ji destê vî mêrî tune ye û ne malbata wê ne jî civaka ku tê de ye wê ji rewşa mêrê wê re dengê xwe dernexistibûna. Lewma jî tiştekî ku Sewqê bikarîbûya bikira tunebû.

"Ya herî zêde ku qala namûsê dikirin jî ji van celeban bûn. Mêrên ku îxanetî li jina xwe dikirin zêdetir qala namûsê dikirin..." (r. 274)

Nivîskar dîsa weke gelek caran nêzîkatiyên mêr û civaka zayendperest eşkere dike û li hemberî vê reng û rexneyên xwe tûj dike. Bi ya wê namûs di devê mêrên ku herî zêde li dij wê tevdigerin de bi tenê gotinek e derewîn e.

Nivîskar civaka mêrane û nêzîkatiyên mêran ên derbarê jinan de rexne dike, ev deşîfrekirina civaka zayendperest hewildaneke femînîstî ye. Lê ligel van rexneyên, ji bo jinên ku dibin qurbanên wê civakê bêyî ku sedema tevgerên wan di nava encama nêzîkatiyên civakê de binirxîne, weke ku di karakter û meylên wan jinan de çewtî hebin, wan jinan rexne dike. Lewma jî tevgerên Sewqê yên ku nîşaneya sersariya li hemberî nêzîkatiyên mêrê wê tên xuyanîn bi sekna wê û fikrên wê re têkildar dike.

### 3.3.1.6. Gulbinevş

Cîrana mala bavê Xezalê ye. Rewşa wê ya di nava malê de wiha ye:

"Diya wê tenê pitapit dikir, tajang dikir, wê dipiçixand. Bavê wê wek ku qirêj bû lê mêze dikir. Nedihişt derkeve derve, bi hevalekî re biaxive. Bavê wê jiyanê lê kiribû zindan... Gelek caran bavê wê kemera xwe derxistibû her derê bedena wê reş kiribû. Diya wê jî ji tirsa bavê wê nedihişt ku ji kuncika malê derkeve..." (r.292)

Di nava malbateke paşverû de mezin bûye, lewma jî fikrên wê li gor hişmendiya wê malê teşe girtiye. Bi kar û barê malê, bi çêkirina alavên cihêzên jinan re mijûl dibe. Nêrîna wê ya li ser jinan jî ji neynika dê û bavê wê wêdetir neçûye. Di derbarê xwendin û perwerdehiya jinan jî gotinên dê û bavê xwe dubare dike.

"Diya min digot dê bixwîne çi bibe? Bavê min wek diya min digot qîza ku bixwîne dibe orispî. Belkî jî rast dibêjin, tu van bibînî, van keçikên ku ji dibistanê tên çawan in?..." (r. 229)

"Ew mêr e. Tu nizanî tiştek bi mêran nabe. Ew qumaşê reş in. Lê jin? Jin wisan in qey? Ji qumaşê spî ne. Pêwîst e yek her tim merheza wan bike. Ger ku tişt bê serê jinê dê çawa be? Dê û bavên wê, malbata wê, esil û esasê wê tev rezîl bibin. Lê mêr wisa nîn e. Çi bike bila bike, tiştek jî nabe... Çima jin wisa nîn in? Diya min jî wisa digot, jin bi hemle dimîne rûyê her kesî reş dike." (r. 129- 130)

Çawa ku nêzîkatiyên dê û bavê wê bi zayenda civakî ve girêdayî bûn û di wir de tu mafê jinê weke ya mêr tune bû, nêzîkatiyên Gulbinevş ên ku di nava wê malbat û civakê de çêbibûn jî nêzîkatiyek zayendperest bû. Jiyana wê û nasnameya wê li gor qaîdeyên bav û civakê reng vedabûn.

Ligel van fikran ew di bin tesîra baweriya ji olê ya ku ne wê bixwe xwendibû û hînbûbû yên ku dîsa ji derdora xwe û gotinên wê derdorê jiber kiribûn bûn. Baweriya wê bi gotinên melayan ên di derbarê cil û porê jinan hatibû lewma bi ya wê jina ku laşê wê xuyanî be, cilên wê vekirî be, diçûn cehnemê:

"Çi zanim dibêjin di dînê me de li me heram e. Melayê me yên olê wisa dibêjin..." (r. 232)

Ji van hevokan jî diyar dibe ku aqilê vê karakterê ji kîsê malbata baviksalar ê ku zextên xwe yên li ser zayenda jinê bi nirxên olê ve girêdidin û xwe bi heq dibînin.

Fikrên wê yên li hemberî jinan ji aliyeke din ve jî li gor gotinên melayên olê, baweriya malbat û civakê ne. Lê ew bi xwe qaîdeyên baweriya olê nas nake, haya wê tenê bi qasî gotinên ku hatine ber guhên wê ji olê heye. Weke ku di mînaka karaktera Gulbinevşê de derdikeve holê, mêr û civaka baviksalar ji bo pêkutîyên xwe yên li ser jinan rewa bibînin û jinan têxin bin destên xwe, nirxên olê ji xwe re wek amûrekê dibînin û pişta xwe bi vê yekê qewîn dikin. Ji bo wilo jî em dixwazin gotina

felsefevan Hilde Heinê li vir zêde bikin: “Peyva olê bixwe, ji bo merivan her çiqasî aliyên wê yên bi nirx hebin jî, bi saziyên baviksalar, nirxên ku berberî hev bûne û bi hiyerarşiyê re ewqasî hatiye lewitandin ku, nişmîtiya herî femînîst jî nikare şûna vê lewitandinê paqij bike.”[120]

Rojekê Gulbinevş û xortek dil dikevine hev. Malbata evîndarê wê çend caran tên wê dixwazin lê malbata Gulbinevşê wê nadin, lewma jî ew û evîndarê xwe bi hev re direvin diçin mala hevalekî Serhed (evîndarê wê). Dayika hevalê Serhed malbata Gulbinevşê nas dike û gazî wan dike. Birayên Gulbinevşê tên wê dibin malê lê piştî çend rojan laşê mirî yê Gulbinevşê tê dîtin. Yanî bav û birayên wê Gulbinevşê dikûjin ya jî didin bi kuştin. Di vir de du diyarde li ber çavên me dikevin. Yek kuştina li ser namûsê, ya din ixaneta jinê. Gulbinevşê ji bo ku ji mala bavê xwe bi evînadarê xwe re direve tê kuştin. Lê yê ku giliyê wê dike, cihê wê ji bav û birê wê re dibêje jin bixwe ye. Jina ku îxanetê li jina din dike qest her çi be jî ji aliyekê ve ew jî dibe sebebê kuştina wê. Lewra jinên di nava wê civakê de dizanin ku gava jinek ji mala baveke wiha bi zext û zordest, feodal û paşvemayî bireve û mala bavê bi ser şopa wê ve vebin wê tiştên xirab derkevin. Deryaspî di romanê de bal nekişandiye ser jina xayîn û fikrên xwe di derbarê vê yekê de nenivîsandiye. Lê di nêrînên wê de bi tevahî derdikeve ku ew rexneyên xwe zêdetir li jinên wiha dike. Deryaspî di gelek deverên romanê de li ser jinên ku alîgiriya mêran û civaka mêrserwer dikin, jinên ku ji tirsa mêran dengê xwe nakin ya jî dikevine şûna mêran û weke wan tadeyê li jinan dikin tim rexne dike.

Di nava vê civakê de yên ku naxwazin pergala desthilatdar biguhere ne tenê mêr in, lewra jinên ku bi salan di bin vê pergalê bi rê ve bûne û hînî qaîdeyên pîroz (namûs, şeref û hwd.) bûne jî şopdarên vê çerxê ne. Jinên ciwan (Xezalê di romanê de mînaka ji van jinan e) ku hinekî ketine nav lêpirsîna civakê û mafên jinê ne di nava vê ferasetê de ne lê bi piranî jinên ku bi ser temenekî ve bûne dixwazin hemû jinên din jî li gor civaka ku tê de bijîn û li dijî civakê tevnegerin. Gava ku li dora xwe pêjna jinên li dij ehlaqa civakê dikirin bi fesadî û lomeyan, bi gazind û biçûkxistin ew jin tawanbar dikirin. Ji ber ku di çavên mêr de ew bibin jinên baş û nêzîkî wan mêran bibin serdestî li jinên din dikirin. Ferqa van jinan ji mêran nedima. Çiqasî nêzîkî desthilatdariyê (mêr) bibin wê ewqasî xwedî hêz bibin.

120 Fatmagül Berktay, *Tek Tanrılı Dinler Karşısında Kadın*, weş. Metis, İstanbul, 2016, r. 217.

## 3.4. YILDIZ ÇAKAR[*] – *GERÎNEKA GUERNICAYÊ*

Nivîskar ev roman ji aliyekê ve bi sembolan dagirtî ye, lê ji aliyê din ve cih daye gelek bûyerên reel jî. Lîsayê di zaroktiya xwe de di nava malbateke kurd û siyasî de ye. Hin salên Lîsayê di romanê de nepenî ne. Weke ku ew û bavê xwe çûbin jor (çiyê) û hatibin û niha jî hêzên ewlehî yên dewletê li pey Lîsayê ne. Wilo ku Lîsayê birîndar bûye, ji nexweşxaneyê tê revandin û diçe heta bajarê Stembolê. Li wir di nava neçarî û tenêtiyê de zilamek wênesaz û kurd bi navê Abraham ji Lîsayê re dibe starek. Lîsayê dibe evîndarê wî. Di dawîyê de Abraham Lîsayê dixapîne û Lîsa dîsa li ber têkçûn û gerîneke din berê xwe dide bajarê xwe. Di dawiyê de Abîde, ji cama televizyonê jî derdikeve û li deriyê mala Dayê Şaxê dixe, Lîsa dibe Abîde, Abîde dibe Lîsa û vedigerin heqîqeta xwe.

### 3.4.1. Karakterên Jin

Di romanê de navê du jinan hene; Lîsa û Abîde. Bi xwendina romanê re em jê derdixin ku her du nav heman kes in. Xwediyê van navan di serê romanê de zarokek e, pişt re jineke ciwan e û di dawiyê de dîsa li zaroktiyê vedigere. Em ê di vir de wê bi ciwaniya wê bibînin û analîz bikin. Jineke din ku di romanê de ji hin aliyan ve li pêş û girîng e jina bi navê Dayê Şaxê ye. Li jêr bi rêzê em ê her du jinan û nêrîna nivîskar a li jinê analîz bikin.

#### 3.4.1.1. Lîsa ya jî Abîde

Lîsa di romanê de karaktera sereke ye lê sembolîk e. Lîsa û Abîde heman kes in Lîsa Abîdeyê di televizyonê de dibîne û roman bi wê destpêdike ku em pişt re fam dikin her du heman kes in.

“Jinek nîvtazî di nava toz û dûmana barûdê de bi zorê gavên xwe diavêt. Eniya wê ya doq, porê wê yê xelek xelekî û ew xêliya sor î li gerdena wê daliqandî, wek tabloyek nîvcomayî dixuya.” (r. 11)

---

[*] Yildiz Çakar, di sala 1978’an de li Amedê hatiye dinyayê. Endama Avakar a Komeleya Nivîskarên Kurd e û her wiha endama Pena Kurd e. Heta niha berhemên wê yên bi navên *Goristana Stêrkan, Ala, Derî, Amed* û *Leylanaok* derçûne. Di kovar û rojnameyan de gotaran dinivîsîne.

Sekna Abîdeyê ya jî sîtava Lîsayê ya di neynikê de jinên di tabloya Guernicaya Pablo Picasso de tîne hişê me. Di tabloya Picasso de gelek jin, zarok û dayik hene. Di rewşên şer de yên ku herî zêde zirarê dibînin jin û zarok in lewra şîroveyên li ser jinên di tabloya Picasso de bi piranî wiha ne. “Picasso di vê tabloyê de drameke gerdûnî tîne ziman: drama şer, şîdeta çavsor, zarokên mirî, dayikên ku hêsran dibarînin.”[123] Di romanê de jî mekanên şer hene û di nava şer de jin û zarokên ku êşê dikşînin hene. Bi van dîmenan re nivîskar berê me dibe ser Paplo Picasso û tabloya wî Guernîca*.

Mekanê ku karaktera romanê lê ye Amed e û di ekrana televizyonê de jî mekan Kurdistan e û dîmenên şer hene. Lê tişta ku di vir de bala me dikşîne ne tenê mekanê erdnîgarî ye. Di neqla ku me li jor ji romanê kiriye de nivîskar, di navbera Abîde (ku ew jî Lîsa ye) û erdnigariya Kurdistanê de têkilî daniye. *“Ya na ewqas mirin û xwîn ê çawa bibe Abîde”* bi vê hevokê re nivîskar sehneya şer a ku li Kurdistanê ye û Abîdeyê dike yek. Kurdistan bedena jina bi navê Abîdeyê (Lîsa) ye. Her wiha di romanê de Lîsayê birîndar e û nivîskar birînên li ser laşê wê dişibîne nexşeya Kurdistanê:

“Laşê min wek nexşeya welatekî ye. Di her derê wê de bîrînek heye, berxwedanek heye, vejînek heye.” (r. 202)

Her çiqas nivîskar di vê hevokê de navê Kurdistanê negotibe jî, di hevokên ku me beriya vê neqil kiribû de nivîskar bedena karaktera Lîsayê û axa Kurdistanê wek hev dîbû. Lewra laşê Lîsa ya ku bi birîn e, dişibe nexşeya welatê wê. Welatê wê (Kurdistan) jî wek dîmenê ku di cama ekrana televizyonê de xuya dibe di nava şer de ye, jin, zarok û her tiştên li wir di nava êşê de ne.

---

[123] Mehmet Emin Kahraman,“Sanat ve Siyaset İlişkisinde Sanatçı Misyonerliği”, *Akademik İncelemeler Dergisi,* j. 1, 2016, r. 238.

*Guernica, tabloya Pablo Picasso ya herî navder e. Di sala 1937’an de Almanya Naziyan bajaroka Ispanya’yê bomberan dike û di encama vê bomberanê de bi hezaran însan jiyana xwe ji dest didin û birîndar dibin. Pablo Picasso piştî vê êrîşê tabloya Guernicayê xêz dike. Di tabloyê de tenê rengên reş û spî hene. Di tabloya Guernica de mirov û heywanên ku êşê dikşînin, avahiyên hilweşiyayî hatine şayesandin. Li ser Guernicayê û şîroveyên vê tabloyê ji bo agahiyên berfireh binêrin: https://www.arthipo.com/pablo-picasso-guernica-tr-tr.html 16.02.2018

“Payîzên Amedê dişibin jineke yetam. Ku ev jina yetam her di vê demsalê de dibe baran û li xwe dibare... Ji bilî vê axê tu axeke din, min nakişîne ber bi dilê xwe ve... (r.39)

Nivîskar bi van hevokan re fikrên xwe yên li ser jin û axê eşkere dike. Bi van hevokan re em dibînin ku nivîskar têkildayîna ax (mekan) û jinê xurttir dike lewra ne tenê erdnigarî her wiha demsal û rewşên hewayê û demsalan jî dişibîne jinê. Ax, ezman, payîz, baran, demsal hemû bi rewşên jinê re têkildar in. Lê ev têkildarî bi tenê li mekanê ku jin xwemaliyê wir in, aîdê wê axê ne dikare pêk were. Li gor nivîskar ne mimkin e ku li mekaneke din aîdiyek çêbibe.

Koçberiya Lîsayê û malbata wê ne ji kêfê an ji ber tercîhekê ye, wan ji mecbûrî rêya çûnê dane ber xwe:

“ Neheqiya ku bi barbarî li me hatibû kirin, hovîtiya ku bi destê mirovan li mirovan hatibû kirin û hêna jî tê kirin bûye parçeyek ji jiyana min... di nava ewqas hovitiyê de, mirov xwe, laşê xwe û heta jinbûna xwe jî dikare ji bîr bike. (r.108)

Jinên ku li rastî pêkutî û hovitiyên giran tên, ji ber êş û rewşên giran hebûna xwe jibîr dikin. Ev hevoka ku me ji romanê kirpandi ye, nivîskar wek îspata vê rewşê li ber me radixîne. “Jinbûn” ji nasnameyeke zayendî û laşeke biyolojîk wêdetir, ji bo nivîskar di maneyeke girîng deye. Lewra jinek jinbûna xwe tenê bi hovitiyên zilmê re dikare jibîr bike. Lîsayê jî di rewşeke wiha de ye, eger ne ji ber vê rewşê be, bi ya nivîskar “jinbûn” jibîr nabe.

Neynik di romanê de sembola bîrê ye. Nivîskar her cara ku Lîsayê dibe ber neynikê wê dixe nava gerînekên di hiş û bîra wê de. Bi ya me du sedemên beralîkirina bi neynikan re heye. Yek jê, nivîskar naxwaze Lîsa êşa axa xwe, gelê xwe, serpêhatiyên xwe û sehneyên reş (şer) ên li bajarê xwe jibîr bike. Jixwe her ku bîra wê li ber sîtava wê ya ni neynikê de kûr dibe tabloya Guernica’ya ku dişibihand rewşa bajarê tê ber çavên wê û bi vê yekê re gerînekên wê dest pê dikin. Neynik, hafizeya bîra Lîsayê ye. Sedemeke din jî ev e ku nivîskar Lîsayê bi saya neynikan re, bi wê re rû bi rû dike.

Neynik amûreke hesabdayînê ye; gava ku di neynikê de Abîdeyê (ew zaroka ku li ber televizyonê di xew ve çûye) dibîne bi wê re (bi xwe ya winda) re dikeve nava hesab û pirsên li ser hebûna xwe. Neynik lêgerîna nasnemeya wê ya winda ye, her ku li wir dinêre bi rastî û şaşitiyên xwe re rû bi rû dibe. Neynika Lîsayê perdeyên li ber çavên wê vediçirîne. Axirê nivîskar bi van neynikên Lîsayê re xwendevanan bi qedera axa wan re rû bi rû dike, wan di nava gerînekên bîrê de gêj dike, ji hev dixe û di dawiyê de li hev dipêçe. Lê ya girîng ku bala me dide karaktera romanê jinbûna wê ye. Nivîskar ji çav û hişên jinê van radigihîne, lewra li ser axa ku şer lê heye ên ku herî zêde êş û rastiyê bar dikin jin bi xwe ne.

Di nava tenêtî, neçarî û bê cih û wariyê de, xwe li stara zilamekî bi navê Abraham digre. Abraham ji van rojên wê yên tarî re ronahiyek e.

Lîsa dilê xwe berdide Abraham. Bi ya me ev dil berdan jî hesteke sexte ye. Ji ber ku Lîsa ne li ser axa xwe ye, hest û hîsên wê jî bi guman in lewra ew jî bê reh û bê bingeh in. Lîsa bi evîna xwe ya sexte re dixwaze her tiştî bi carekê jibîr bike. Bi carekê re raboriya wê, bîra wê, qedera axa wê, şerê li welatê wê, çîrokên dayika wê bê qîmet dibe li ber çavên wê. Bi sermestiya evînê re êdî tenê Abraham li ber çavên wê bi qîmet e weke din jiyan, ji bo wê ne cihê xemê ye. Lîsaya ku xemxura axa xwe ye dibe xemxura mêrekî û evîneke sexte.

Dinyaya ku Lîsayê dixwaze êdî tenê odeya Abraham e.

"Tenê vê dinyaya ku ji odeyekê, textekî razanê, maseyekê, televizyoneke vekirî, paceyek bi perde, tabloyeke bi dîwêr ve û ji çavên Abraham pêk tê ve tiştekî din naxwazim." (r. 144)

" Xwestekek xerîb bi min re çêbibû. Ji niha ve min dixwest ew tenê yê min be. Tenê yê min be!" (r.176)

Di hevoka ewil de encama ji hestên evîneke sexte û rewşa jina di xefika hepsa mêr de heye. Lewma jina ku bi evînê re xwe di qefesa mêr de azad bibîne di nava jiyaneke sexte de ye. Di hevoka duyem de, pirsgirêka milkbûnê heye. Lîsayê dixwest Abraham bibe ya wê tenê. Di encama evînên sexte de, hîsên milkî û zikreşiyê ava dibin. Evîn dibe laşek (objeyek) û li ser wê laşê evîndar xwe xwediyê wê laşê dibînin. Evîndar dixwaze evîna ku di laşekê de dibîne tenê aîdê wê/wî be. Bi piranî

ev hest bi mêran re ava dibe lê di vê romanê de xwediyê van hestan jin e. Jiber ku di nava jiyaneke sexte de ye hestên wê jî di nava maddiyatekê de ne.

Lîsayê hestên dilê xwe bi tevahî bîranînên zaroktiya xwe bi rêya nameyekê ji Abraham re dinivîsîne. Di nameya wê de em dibînin ku wê di navbera Brahîm pêxember û Abraham da şibihandinek çêkiriye. Gotinên dayika xwe yên li ser pêxemberê Braham neqlî nameya xwe dike:

"... Dema Braham pêxember derketa rê, ewil li stêrkan dinihêrt, piştre derdiket rê. Braham tu car bi kerwana xwe li çolê nema. Stêrkan ew tu car nexapand..." (r. 142)

Nivîskar radigihîne ku Abraham li ser deriyê atolyeya xwe, heft stêrk neqişandibûn . Stêrkên Abraham ne li ezmanan e û stêrkên çêkirî ango yên sexte ne. Lê dîsa jî di çavên Lîsayê de Abraham di asta pêxemberekê de ye. Evîn çavên Lîsayê kor kiriye lewma mêrê ku jê hez kiriye li ber çavên wê di şûna pêxemberekê de ye. Di romanê de her carê tê derxînin ku peykera çavên wê girtî Abîde ye, Abîde Lîsa ye û Lîsa jî çavên xwe ji evînê re girtiye lewra reşahî li ber çavên wê daketiye.

Lîsayê Abraham mîna pêxemberekî dîtibû. Abraham li wê bajarê tenêtiyê bi destên wê girtûbû, lewma baweriya Lîsayê jiwî çêbibû. Ta roja ku Lîsayê, Abraham bi destgirtiya wî re dibîne û Abraham ji Lîsayê re dibêje daweta me heye ev bawerî bi carekê re dişikê:

" Erê, ketibûm erdê û bi soleke qilêrî ya mêrekî hatibûm heciqandin. Sedema mayina min a li vê odê, li vî bajarî nemabû êdî. Destpêka qedera mirov li ku bûya gerek mirov vegeriyaya wir." (r. 192)

Piştî ku Abraham destên xwe ji hêviyên wê berdide, Lîsa careke din fêm dike ku xilasiya wê encax li axa wê mimkûn e.

Piştî ji wî bajarî (Stenbol) ber bi bajarê xwe (Amed) ve diçe, ji wan hestên xwe yên ku Abraham wek milkê xwe dîbû û xwestibû tenê yê wê be, poşman dibe û ji ber wan hestan xwe neheq dike:

" Ruhê min xwestibû bibe xwediyê ruhê Abraham. Ma çawa mirov dikare bixwaze ku bibe xwediyê ruhê yekî? ... Ma ruhê Abraham alavek bû qey? Na, bo ji vê zincîrê xilas bibim, gerek ji hemû hestan xilas bibim, ku ruhê min bi dest xistine.

Divê hestên daxwaz û arezûyê bi temamî ji ruhê xwe vemalim. Heta bi heta divê ez vê hestê bikujim. Ger ez daxwaz nekim û arezûyeke min tune be, ez ê ji vê bîra tarî rizgar bibim, ji esareta malokên hiş jî.” (r.193)

Weke di van hevokên li jor jî diyar dibe, di hestên Lîsayê de hevsengiyek tune ye, ya her tiştî bi carekê re red dike ya jî bi carekê re her tiştî dixwaze; geh xwe li ser hest û arezûyên xwe dibîne û xwedîtiyê li wan dike, geh jî dixwaze hest û arezûyên xwe tune bike. Ji ber ku xwestibû li ser Abraham xwedîtiyê bike, wî bi her halî di bin milkê xwe de bibîne hest û arezûyên xwe sûcdar dibîne. Lê li gor peyamên ku ji tevahiya romanê derdikeve, ji ber ku Lîsayê ne xwemaliya axa ku lê bû, hestên wê jî bi guman bûn. Lewma xwesteka wê yê niha jî “*Divê hestên daxwaz û arezûyê bi temamî ji ruhê xwe vemalim.”* ev e û bi ya me ev jî bi qasî ya din bi problem e. Lewra li gor vê hevokê nivîskar hemû hestên daxwaz û arezûyê bi evîn û têkiliyên zayendî ve girê dide û weke ku di dawiya hemû hestên evînî û arezûyê de wê xwesteka milkbûnê derkeve, van hestan sûcdar dibîne. Lê di tevahiya gerînek û tevliheliyên hişî yên Lîsayê de nivîskar bi me dihesand ku sedema wan zêdetir bi ax û xwemalîbûna axê re, bi cih û warbûnê re girêdayî ye. Lewma di dawiya romanê de jî Lîsa vedigere bajarê xwe û li wir dibe xwe.

“Ez ê li vir vegerim rastîya hebûna xwe. Ev der malzaroka dayika min Şaxê ye. Hemû hestên hebûna min li vir hatine rêstin – wek qenevîçên wê yên rengo rengo.” (r. 207)

Malzaroka dê ji bo zarokekê cihê herî bi ewle ye. Lê nivîskar bi van hevokan re axa bajarê Lîsayê (Amed) dişîbîne malzaroka dêya wê û di navbera axê û malzarokê de têkiliyekê datîne. Di serê romanê de ax (welat) û bedena jinê bi hev re têkildar bûn, di vir de jî têkiliyeke bi vê re girêdayî heye. Welat dîsa bedena jinê ye lê vê carê malzaroka jinê ango nava dayikê ye. Nivîskar malzaroka dê (welat), rengo rengo, mîna qenevîçên dayikê şayesandiye, ev yek him pir rengî û candariya malzarokê (welat), him jî têkiliyeke dayiktî û niştecihî datîne. Welat, dayik e, dayik ew kesa ku pirrengiyê dineqişîne. Lîsayê xwe li bajereke din, li ser axeke din tim kêm û parçe parçe didît lewma vegera li axa temambûna wê ye. Vegera li bajêr di heman demê de vegera li malzaroka dê ye ku ew der *“rastiya hebûnê”* ya Lîsayê ye. Bi vê yekê re nivîskar karaktera xwe vedigerîne ser axa wê ango malzaroka dayikê.

Roja ku Lîsa vedigere bajarê xwe ji alî leşkeran ve tê girtin. Gava ku leşkara jin birînên Lîsayê dibîne xwê digre, dilerize û destên wê diricife lê sekna Lîsayê lehengî ye:

"Ax Picasso! Xwezî tu niha li vir bûya û te bidîta ku apolet jî nikarin li dij berxwedêrekê xwe rabigirin. Santîmek laşê min neliviya..." (r. 202)

Lîsaya ku li bajarên xerîbiyê bê taqet, dil biçûk û têkçûyî xuya dibû, piştî li axa xwe vedigere li hemberî leşkeran bi sekneke wêrekî û lehengî ye. Bi ya me sedema vê dîsa bi axê, bi xwemalîbûnê re girêdayî ye. Lîsa li ser axa xwe ye, xwe spartiya axa xwe, ango ew mekanê malzoraka dêya wê; ew cihê herî bi ewle ye, parêstgeh e, lewma li wê deverê mirin jî hebe êdî bi wêrek e û bêtirs e. Cara ewil ji axa xwe ji tirsa kuştin û girtinê reviyabû lê vegera wê sekna wê ya li dij van hestan nîşanî me dide.

### 3.4.1.2. Dayê Şaxê

Dayika Lîsa ango dayika Abîdeyê ye. Dayê Şaxê him çîrokbêj e him dengbêj e. Kilamên kurdî ji qasetan guhdarî dike. Jineke li ser çand û jiyana netewî ya kurdî ye. Di romanê de navê Dayê Şaxê tim bi rola dayiktiya wê re derdikeve. Nivîskar Dayê Şaxê di çavên Lîsayê de di şûna axa welat de bi cih dike. Yanî di romanê de him di rola dayika Lîsayê de ye him jî bedena wê (malzaroka wê) axa welat (niştiman) sembol dike. Meriv dikare bêje ku Dayê Şaxê ligel jinbûn û dayikbûna xwe di heman demê de jî "mekanek" e. "Birastî jî gava ku meriv li ser navê jinan û qedera wan difikire, ji zeman, bûyîn ya jî dîrokê ve wêdetir, ew mekanê ku însên diafirîne û şikil dike tîne bîra xwe."[125] Di nava edebiyata kurdî û civaka kurdan de gelek caran "welat" weke bedena jinê tê şayesandin û ew beden ya jî jin gelek caran dikeve şûna "dayikê". Di navbera "bedena jinê", "welat" û "dayik"ê de têkilî hatine dayîn. Civaka baviksalar a ku jinê weke namûsa mêr dibîne, di navbera namûsa jinê û namûsa welat de jî heman têkiliyê datîne. Gelek caran dagirkirina welat (axa netewî) weke destdirêjahiya li namûsa jinê hesibandine lewma jî lê xwedî derketina li welat û parastina namûsa jinê weke hev dîtine.

[125] Kristeva, Julia, "Kadınların Zamanı", *Defter*, wer. İskender Savaşır, j. 21, Bihar 1994, r. 9.

Çağlayan, di derbarê vê yekê de dibêje ku; weke civakên din ên Rojhilata navîn, li ba kurdan jî bedena jinê wek sembola namûsa malbatê ya jî eşîretê tê nîşandan. Di nivîsandina dîroka netewperweriya kurdan de îmaja jinê ligel “dayika neteweyê” wek “namûsa neteweyê” jî hatiye bikaranîn.[126] Di edebiyata kurdan ya nivîskî de jî, nivîskarên mêr ji vê xetê dûr neketine û mînakên vê pir in. Welat him jina ku tê hezkirin e him jî jina dayik e. Di romana *Hewarîya Heciyê Cindî* de “welat jî jin jî namûs e.”[127] Di romana *Meryema* ya Sebrî Silêvanî de, nivîskar di navbera welatê Kurdistanê û jinê de têkiliyeke namûsê datîne û dibêje; “Ma tu ferq di navbera welat û keçê de heye.”[128] Meriv dikare van mînakan zêde bike lê ji bo qesta me bê fêmkirin ev mînak bes in. Nêrîna li welat, bedena jinê û namûsê bi vê rewşê derbasî edebiyata nivîskarên mêr ên kurd bûye. Lê di romana nivîskara jin Yildiz Çakar de kirpandina li ser namûsê tune ye. Welat weke bedena jinê (Lîsa), û malzaroka dayikê (Dayê Şaxê) hatiye sêwirandin, lê di vê sêwirandinê de fêhmeke namûsê tune ye. Lewra di vê romanê de bedena jinê û axa welat (mekan) bi têgeha namûsê re ne girêdayî ye. Di vê romanê de em dibînin ku nêrîna li welat û jinê ya nivîskara jin ji nivîskarên mêr cudatir e. Nivîskara jin zêdetir meyla me daye ser têkiliya axa welat û dayika stargeh.

Najmabadî ji bo edebiyata Îranê dibêje: “Welat di edebiyata welatparêz a mêran de wek evîndar (jina ku dihat hezkirin) û dayik bi du maneyan cihê xwe diparast; lê di nivîsên jinan de welat, gelek caran dayikek e.”[129] Ev rewşa ku Najmabadî li ser nivîskarên jin ên di edebiyata Îranê de tespît kiriye, em di nivîskariya Yildiz Çakar, ango nivîskara jina kurd de dibînin. Di vê romanê de nivîskara jin welat bi bedena jinê re lê zêdetir bi malzaroka dayikê re têkildar kiriye; dayik di şûna mekanê de ango axa welat de şayesandiye. Li ser vê nêzîkatiyê jî em dikarin bêjin ku di nivîsên jina kurd de ji aliyê nêrîna li jinê ve cudahî û xweseriyek derdikeve.

---

[126] Ji bo mînakên di nivîsên dîroka kurdan de têkiliya îmaja beden, welat, dayik û namûsê bnr: Çağlayan, h.b. r. 82

[127] Nurgül Ay, *Îmaja Jinan Di Hewarîyê De*, dnd. Wêje û Rexne, hejmar: 9/10, 2017, r. 152.

[128] Sebrî Silêvanî, *Meryema*, weş. Lîs. Ankara, 2011. r. 51

[129] Afsaneh Najmabadi, “Sevgili ve Ana Olarak Erotik Vatan: Sevmek, Sahiplenmek, Korumak”. dnd. *Vatan Millet Kadınlar*, amd. Ayşe Gül Altınay, weş. İletişim, İstanbul, 2013, r. 132.

Dayê Şaxê ji xêncî vê îmaj û sembola axa welat di roleke şênber de jî cih digire. Di rola dayiktiya biyolojîk de xwedî sekneke erênî û karîger e. Dayê Şaxê him di nava malê de him jî li derve di nav komên jinan de tê xuyanîn; di nava derdê zar û mêrê xwe de, bi êşa dayika xwe û birînên malbata xwe di nava xem û mitalayan de derdikeve.

## 3.5.AYNUR ARAS* - *LEYLANA KESK*

Serlehenga romanê Keskê ji zarokatiya xwe ve dikeve nava romanê. Bi çîroka Keskê re çîroka Guliyê jî dest pê dike, lê çîroka Guliyê ji paş ve dest pê dike û hêdî hêdî diçe destpêka çîroka wê.

Keskê li bajarê Enqerê dest bi xwendina zanîngehê dike. Sala ku zanîngehê xilas dike bi Bager re dibin destgirtiyê hev. Ji bo ku bizewicin jî li benda karê stajeriya Keskê dimînin. Keskê ji bo salekê stajeriya xwe bike dîsa diçe bajarê Enqerê û ligel parêzerekî tirk ku navê wî Hemîd e dest bi karê stajeriyê dike.

Şevekê Keska ku Hemîd di nav hişê wê de bibû Bager û Hemîd bi hev şa dibin. Keskê di encama wê pevşabûnê de ducanî dibe, lê zaroka xwe ji ber xwe nake. Keskê dibe paqijvan û çavdêriya jineke pîr dike. Hetanî roja ku diwelide dinivîse û di dawiyê de romana xwe xilas dike. Lawek ji wê re çê dibe û navê wî dike Bager, lê di nav êşa piştî zayînê de ji ser hişê xwe diçe. Sax dimîne ya dimire ne diyar e.

Guliyê hê di nav pêçekê de dibe pêşkertmeyê Seyîdxanê lawê hevalê bavê xwe. Piştî bi ser hemdê xwe dikevin bi hev re dizewicin. Xesûya Guliyê ji roja ewil de ji Guliyê hez nake û tim li wê mahneyê digere ku kurê wê dev ji Guliyê berde. Piştî ku Guliyê ji ber tirs, gef û gotinên xesûya xwe ker û gêjî dibe, Seyîdxan Guliyê vedigerîne gund mala bavê wê. Guliyê her roj ji ber hesreta zarokên xwe dixwaze ji gund bireve û xwe bigihîne zarokên xwe lê her carê bav û birayên Guliyê bi lêxistinên giran wê ji rê vedigerînin. Di dawiyê de Guliyê ji malê baz dide, lê tu kes nizane bi kû ve çûye û çi bi serê wê hatiye.

---

* Aynur Aras, di sala 1972'an de li gundê Meleosman ku li ser navçeya Qereyaziya Erzeromê ye hatiye dinyayê. Ji sala 1993'yan vir ve li Swêdê dijî. Ji xêncî romana wê berhema wê ya helbestan *Xemla Rondikan* heye.

### 3.5.1. Karakterên Jin

Di vê romanê de jinên ku em ê bi tevahî nêrînên nivîskar jî analîz bikin ev in; Keskê, Gulî, Delal, Senem, Jina Hemîd.

#### 3.5.1.1. Keskê

Keskê di serê romanê de zarokeke keç e lê ji lîstikên kurikan hez dike. Nivîskar gava ku behsa cudahiya lîstikên keç û lawan dike karaktera Keskê nêzî lîstikên kurikan dike:

Keçikên hemsalên wê, wan jî wekî kurikan bi daran an keviran ji xwe re leyîstok çêdikirin. Leyîstokên wan, bûk û malhoçik bûn. Belkî ji ber vê yekê ye ku dibêjin; "Law radibin darê bavê hildidin, keç radibin teşiya dê dirêsin. Lê bala Keskê ne li ser teşiyê bû, ne jî zêde li ser wan bebek û bûkên ku hevalên wê pê re dileyistin bû. Bala wê hê bêhtir li ser leyîstokên kurikan bû..." ( r. 9)

Weke ku di van hevokan de jî xuya ye, di nava civaka zayendperest de lîstikên zorêkên keçik û kurikan jî ji hev cuda dibin. Rengê cilê wan, şiklê lîstikên wan û hwd. ji hev cihê ne. Zarok di nava civakê de ji roja ku tê dinyayê heta hetayê, xwe di nava van cudahiyên zayendî de dibîne. Rolên xwe yên zayendî jî, li gor çand û perwerdehiya ku ji civakê li ser wî/wê ferz dike bi cih tîne. Di nava civaka kurdan de jî zarok bi cureyên lîstik û pêlîstikên xwe ji aliyê zayendî ve ji hev cihê ne. Li ser vê yekê Mehmet Bayrak mînakekê ji zarokên civaka kurdan dide: "... zarokê kurik bi parçeyên text û têlan ereboka xwe, zaroka keç jî bi heman amûran bebeka xwe çêdike."[130] Zarokek ji zaroktiya xwe ve ji xencî zayenda xwe ya biyolojîk hînî zayenda xwe ya civakî jî dibe. Zarok jî di nava civaka xwe de hînî cudahiya zayendî dibin û van cudahiyan qebûl dikin. Lê di vê romanê de meyla karaktera Keskê zêdetir li ser lîstokên kurikan e, lewra vebêjer radigînîne ku hevalên wê yên zêdetir kurik in. Dîsa nivîskar Keskê û hevalên wê yên keç dide ber hev, cesareta Keskê dişibîne ya kurikan û wê ji hemzayendê wê (keçikan) dûr û cihê dike.

"Di wî temenî de, keçikên hevalên wê, newêrîbûn nêzîkî hespan bibûyana, wê bi wê bejna xwe ya biçûk ve, xwe bi zorê diavête ser pişta hespê û siwarê hespê bû." (r.10)

---

130 Bayrak, h.b. r. 325.

Nivîskar bi israr dixwaze wê nêzîkî zayenda mêr bike û bi vê yekê wê wêrek, zana û bêtirs nîşan bide. Weke ku nivîskar ji berê de kurikan/mêran, bi tevger û mijûliyetên wan, wek leheng dibîne û dixwaze karaktera xwe jî bi tevger û meylên mêrane weke kurikan bi lehengî nîşan bide. Bi qasî em dizanin di nava gundekê de tirsa hespa ne bi zarokên keç ne jî bi yên kurik re hene. Zarokên gundan, çi yên keç çi yên kur, hînî siwariya hesp an jî ker û dehşikan dibin ji ber ku hesp û siwariyên din heywanên kedîkirî yên gundiyan in. Nivîskar siwariya Keskê ya li hespê, wek qehremaniyê nîşan dide, lewra ev nêzîkatî jî tesîra zayendperestiya civakî ya li ser nivîskariya Aynûr Aras nîşan dide.

Piştî ku nivîskar behsa meylên Keskê yên weke kurika dike behsa têkiliyên wê yên bi xwezayê re jî dike: *"... wê pir ji xwezayê jî hez dikir."* (r. 10) Di tevahiya romanê de hezkirina Keskê ya li hember xwezayê li pêş e, lê ev hevok û ev daçeka "jî" yê dîsa cudahiya zayendîtiyê tîne bîra me. Keskê ji lîstikên kurikan hez dike, zêdetir bi hevalên xwe yên kurik re dilîze, ji bebek û bûkan pir heznake, ji siwariya hespan hez dike... ligel evqas aliyên wê yên ku dişibiya kurikan (li gor nivîskar), ew hevoka ku bi carekê re Keskê bi xwezayê û hîsên xwezayî ve têkildar dike girîng e. Bi vê têkildarkirin û nêzîkkirina bi xwezayê re meylên wê yên jinanî jî tên vegotin. Lewra di nava civaka zayendrest de mêr wekî sembola aqil, wêrekî, hêz û hwd. tiştên xurt tê dîtin, jin jî; bi xweza, hestyarî, dilnizmî û rewşên xwezayî ve tên pênasekirin. Ev yek ji ber rolên ku civak ji zaroktiyê ve li zayendiyê bar dike derdikeve û zarok jî dibin domkarên van rolên ku ji civakê girtine.

Modela Keskê kurapê bavê wê Riza ye, ango yekî mêr e. Keska ku ji zaroktiya xwe ve nêzî kurikan e, ji bo rol-modelekî jî apê xwe Riza mînak dibîne. Tê xuyanîn ku li wê civakê yên li pêş û hêzdar mêr in û nivîskar

jî dixwaze karaktera Keskê weke wan, bi hêz bike û li pêş bixe. Ji bo ku karaktera jin bigihîne wan hêzên ku tenê bi mêran re heye xwendin û kareke maddî lazim e. Lewra wê Keskê berê ewil biçe xwendina zanîngehê.

Li gundê wan dibistana seretayî heye lê ji ber neçariyê gelek zarok ji xwendinê mehrûm dimînin. Zarokên keç cihê dê digrin, hînî karên dayikan dibin, zarokên kur jî cihê bav digrin û hînî karên bavan dibin. Bi vê yekê re karbeşiya

zayendî ya di nava civakê de xwe berdewam dike.

Malbata Keskê ji aliyê aborî ve baş in, lê xwendina Keskê ne tenê ji ber başbûna aboriya malê ye, lewra bavê Keskê ne mêreke zayendperest û kevneperest e:

“ Li ber dilê wî kur û keç hempar in, ewî tu wextê ferq nekiriye û nake navbera cinsê kur û keçikan.” (r.17)

Bavê Keskê ji bo xwendina wê per û bask e. Bavê Keskê wê dişîne gel xalê wê Mêrsînê ji bo xwendinê. Yanî rewşa aborî û sekna bav ji bo xwendina Keskê du diyardeyên sereke ne.

Keskê dinivîsîne, nivîskar e di romanê de:

“... di jiyana Keskê de, nivîsandinê jî, cihê xwe yê mezin girtibû, wê her çi binûsanda, piştî ku hevokên xwe diqedand, wekî teyreka ku li baskên xwe vedike, xwe ew qas sivik aram û rehet hîs dikir.” (r. 211)

Keskê bi navê xwe yê fermî Nîgar li gel parêzerekî bi navê Hemîd dest bi stajeriyê dike. Bi hev re li ser doz û dewayan dixebitin. Rojekê dewayeke xwişka hevalekî Hemîd derdikeve û dîsa ew û Keskê bi hev re şopa dewayê dikin. Dewa jî li ser jinekê ye. Jineke ku bûka maleke eşîretê ye, ji aliyê xezûrê xwe yê ku serokeşîr e bi salan hatiye îstîsmarkirin. Xezûr, dest dirêjahiya wê kiriye lê bûkê ji tirsa xezûr bi salan dengê xwe nekiriye. Zaroka wê ya biçûk jî ji xezûrê wê ye. Roja ku dewaya vê jina mexdûr qezenc dikin û zilamê ku tecawîzî wê kiribû (xezûr) cezayê hepsê distîne Keskê, jina mexdûr (bûk), zarokên wê û birayê wê tev li mala Hemîd şevbihêrka xwe dikin. Piştî ku her kes vedigere malên xwe, jina mexdûr xwe li odeya mala ku bi birayê xwe û zarokê xwe re lê diman bi dar ve dike û dimire. Wê şevê Keskê xeberê distîne û diçe ser cenazeya jina ku xwe kuştibû. Keskê li ser xwedaliqandina jina mexdûr dikeve nav rewşeke xedar lê nivîskar li ser fikrên Keskê tiştekê nabêje. Gelo li ser tecawîza xezûr, mexdûriyeta jinê, xwedaliqandina wê çi fikiriye em nizanin. Lê hal ew e ku berteka Keskê ruhê wê tê dibe. Keskê li wê derê dikeve nava şoqekê û ji qidûm dikeve. Hemîd ji ber rewşa Keskê wê dibe mala wê lê Keska ku di tesîra travma û şoqê de dilerize xwe dispêre laşê Hemîd. Wê şevê di nava hallisunasyonan de ye, Hemîd li ber çavên wê dibe Bager û bi hev şa dibin. Keska ku ne li ser hişê xwe ye, di nava ta û lerzê de tê dayîn, bi zimanê binhişiyê her carê vê hevokê dûbare dike:

" Bila li ser paçikê spî be." (r. 234)

Ji Keskê weye ku şeva wê ya dawetê ye û ew ê li cem Bager e. Nivîskar binhişê Keskê bi me re parve dike lê di vê binhişê de tişta ku dixwaze bê kirpandin û derxistin pîroziya bekaretê ye. Nivîskar karaktera xwe bi nêrînê civaka zayendperest xemilandiye. Dixwaze ji hişê wê vê derbixe; jinek her tiştî dikare ji bîr bike lê pîroziya xwîna keçkaniyê, ango bekaretê jibîr nake. Karakter di nava halusinasyonan de ye, ji ser hişê xwe çûye, xeyalan dibîne lê bekaret tim di hişê wê de ye. Wateya bekaretê (keçkaniyê) ewqasî pîroz û di ciheke kûr de ye ku jinek tu caran wê ji bîr nake.

Keskê hestên xwe yên zayendîtiyê taloq dike lewma divê ku aniha wan hestên xwe têxe bin kontrolê ango xwe ji hestên xwe û zayendîtiyê biparêze. Keskê dixwaze him ew him jî evîndarê wê hestên xwe yên zayendîtî bitepisînin ta roja zewacê. Lê rewş wiha nabe û Keskê jî ligel ku di şoqê de ye û serê wê tevlihev e jî xwe nêzîkî laşê Hemîd dike. Ji ber ku hestên zayendîtiyê yên di binhêşê wê dipişkivîn Keskê qontrola xwe ji dest berdide. Li gor Reich, binhişî, hawiza navajoyan (içgüdü) e, di wir de hemû tembîhên tepisandî kom dibin. Miroveke li ser xwe van tembihan wek pêdiviya zayenditiyê fêm dike, lê mirovên nevrotik vê rewşê di hişê xwe de vediguhezînin endîşe û êrîşkariyê.[131] Keskê, jineke li ser xwe ye, lê bi ya me di tepisandina hestan û pîrozdîtina bekaretê de hişmendiyeke şexsî tune ye. Civakê çi emir kiribe divê wilo be, lewma Keskê bi xwe li ser zayendîtiyê û bekaretê fikrên xwe nabêje.

Li gor civakê jin û mêreke ku ji hev hez dikin, nikarin beriya zewacê nêzîkî hev bibin, bi hev şa bibin. Çimkî li gor feraset û rêgezên ehlaqa civaka baviksalar, bekareta jinê divê hetanî wê rojê bê parastin. Karaktera Keskê jî jineke ji wê civakê ye û ew jî domkara rêgezên civakê ye. Nivîskar ji aliyê parastina bekaretê û hestên zayendîtiyê ve karaktera Keskê ewqasî xurt nîşan daye ku "dikare xwe jî û evîndarê xwe jî biparêze". Tişta ku tê parastin jî "bekaretî ye". Bekareta jinê ewqasî girîng e ku ji hişê wê tu caran dernakeve. Lewma jî di nava wî halê ku Keskê ne li ser hişê xwe ye tişta ku ji hişê wê naçe bi tenê "paçika spî" ye.

Em vegerin ser wê şeva ku ji hişê Keskê tenê bekaretî maye. Piştî ku Keskê bi êşa xwînê re hinekî tê ser hişê xwe, fêm dike ku ew ne Bager e, Hemîd e û ne şeva daweta wê ye lê keçkaniya wê berî wextê xwe çûye, dikeve nav şoqeke din û bi mehan di nexweşxaneyê de dimîne. Dixtorên nexweşxaneyê vê bûyerê û wê nexweşiya Keskê wek “qezayek”ê bi nav dikin. Bi ya wan wê travmaya ku Keskê ketibûyê di navbera Hemîd û Keskê de qezayek çêkiribû. Lewma jî navê vê bûyerê û sedema nexweşiya Keskê kiribûn “qezayek”. Hemîd jî di nava qezayê de ye lê di romanê de Hemîd di wê kêliya ku Keskê di nava ta û tirsê de bû ew li ser hişê xwe bû. Ligel ku li ser hişê xwe bû navê vê rewşê çawa dibû qezayek û her du dibûn berpirsyarê vê qezayê! Nivîskar di romanê de qet behsa sucdariya Hemîd nake, lê beriya wê bi xwendevanan re parve dike ku Hemîd dilê xwe bijandibû Keskê. Lewma jî em romanê û vê bûyerê bi rengeke din dixwînin. Bi ya me nivîskar di vir de parastina mêrê sûcdar dike. Lewma bi xwendina me; mêrê  ku ji bo alikariya jinê (Keskê) bike hatibû mala wê ji nexweşiya wê fersend dîbû û tecawîzî bedena wê kiribû. Keskê teslîmî binhişê xwe yê ku li wir hestên zayendîtî hatibûn tepisandin û ne li ser hişê xwe bû, lê rewşa Hemîd baş e û li ser hişê xwe ye. Lewma di nêzîkatiya wî de konetî û sûdperstiyek heye. Lê nivîskara romanê Hemîd bi heft avan dişo, bi ser de dixtorên nexweşxaneyê jî vê rewşê normal dibînin lê Hemîd sûcdar nabînin.

Keskê piştî wê şevê ji Hemîd du canî dibe û psîkiyatrê Keskê (Hidir) ji bo ku ew zaroka di nava xwe de ji ber xwe neke bi zimaneke qanihker pê re diaxive. Axaftin û nêzîkatiyê dixtorê psîkaytrê yê li ser jineke (Keskê) ku bi ya me di encama tecawizê du canî bûye dûrî aqila ye. Bi ya me di vir de jî nivîskar bi hemd ya jî bê hemdê xwe piştevaniya aqilê mêr kiriye. Keskê jî zaroya di nava xwe de ji ber xwe nake û vê bersivê dide Hidir:

“Ne gunehê diya min heye, ne jî gunehê dayiktiya min, lewra jî, ez ê him ji bo diya xwe, him jî ji bo dayiktiya xwe bijîm!” (r. 242)

Keskê xwe dike qurbaniya zaroka nava xwe. Keçkaniya pîroz çûbû lê di bedêla wê de zaroyek pîroz hatibû.

---

[131] Neql: Juliet Mitcel, *Psikanaliz ve Feminizm*, wer: Ayşe Kurtulmuş, weş. Yaprak, Ankra, 1984. r. 210.

Jina ku xwe kiribû qurbana bekaretê, vê carê jî dike qurbana zaroka di nava xwe de. Lê nivîskar asta dayiktiyê jî bi qasî bekareta jinê pîroz dike. Karaktera jin a ku bav û apê wê jê re rêber bûn û nivîskar ew nêzîkî hêza mêr (bav, ap, dergistî, Hemîdê Parêzer) dikir, bi carekê re nêzîkî dêya xwe (jinê) bibû. Piştî ku di nava wê de zarokek şîn hatibû, jin vediguhezî dêya xwe û dikete rola dayiktiyê. Keskê karaktereke zeîf e, di derbarê pirsgirêkên jinan û rewşa wan a di nava civakê de, civaka baviksalar, mêrên zayendperst û êrîşkar tu hişmendiyeke wê zanebûneke wê tune ye. Nivîskar her çiqasî ew bi hêz, xwedî îrade, xwedî armanc, bi perwede dabe jî, ew hêz û îrade di rastiyê de daxwaza bi destxistina hêza mêr e. Nivîskar dixwest ku karaktera Keskê bigihîne hêz û zanebûna apê wê Riza ango ew hêza ku di nava civakê de tenê bi destên mêran diket. Lewma jî Keskê ji hişmendiya jinaniyê bêpar e. Haya wê ji kambaxiyên mêrên kirêt tune ye. Keskê jineke saf û dilpak e. Jiyana wê û bendewariyên wê jî li gor vê ye, lewra li hemberî bûyera jina ku xwe dikûje têk diçe. Tu îradeyekê, fikrekê, cesaret û dozeke jinanî nîşan nade. Meriv li bendê ye ku Keskê piştî jina ku xwe dikûje, li ser sebebê xwekuştina wê têkeve nav hewildaneke jinanî û li hemberî mêrên tecawizker li bal jinan cihê xwe bigre. Lê nivîskar karaktera xwe li dij vê tevnê datîne. Keskê dixe şûna jineke ku bi kevneşopiyên civaka zayendperest dorpêçkirî ye û domkarê van kevneşopiyan e. Lewma Keskê pêşî dibe qurbana perdeya keçkaniyê, dû re jî dibe qurbaniya hîssên dayiktiyê. Diyar e ku rola dayiktiyê di bin barê pîroziyan de tê dîtin. Axaftinên Keskê û dixtorê psîkiyatrê li ser vê pîroziyê ye. (r. 242)

Piştî ku Keskê ji nexweşxaneyê derdikeve û şopa xwe ji ber çavên bav û Bager nebedî dike, kar û cihekî ku lê bimîne peyda dike. Keskê dibe paqijvan û nihêrvanek. Nivîskar dixwaze vê peyamê bide ku jinek dikare bi hêza dayiktiya xwe li ser lingên xwe bimîne. Keskê muhtacî mala bavê nabe lê Keska ku zanîngeh xilas kiriye ji bo ku stara xwe di malekê de bike karê paqijvaniyê û pîrejinekê dike.

Di dawiyê de Keskê zaroyekî “kurik” tîne dinê, navê wî “Bager” e. Lê Keskê li nexweşxaneyê dîsa di nava halusînasyonan de ye. Di nav wê rewşa xirab de dîsa nivîskar hişê karaktera Keskê bi berzkirina mêr re der dike. Keskê Hemîd bi sakoyê parêzariyê dibîne û ji Hemîd re wiha dibêje:

“ Ev sakoyên avukatan xweşiktir li bejna mêran tên.” (r. 253)

Nivîskar di vir de jî karê parêzeriyê wek karê mêran dibîne. Lewra bi dîtina wê cilên parêzeriyê encax bi mêrekê dikeve. Lê Keskê stajeriya xwe xilas nekiriye û layiqî karê ku wek karê mêr dihat dîtin bi cih neanî ye.

### 3.5.1.2. Delal

Dayika Keskê ye. Di romanê de ne bi navê xwe bi dayiktiya xwe derbas dibe. Tenê di cihekê de nivîskar wê bi nav dike. Kaktereke ji nava civakê ye, jineke kevneşopî ye. Li gund bi kar û barê malê û zarokan re mijûl e. Di serê ewil de ji ber ku tenê dibistana seretayî li gund heye lewma jî Keskê nikare berdawamî dibistanên jortir bike bavê Keskê pir li ber wê û xwendina wê dikeve. Lê berteka dayika Keskê her carê neyînî lewra jineke kevneşopî ye û şopdara çanda baviksalariyê ye.

Di romanê de bi giştî dê (jin) li hemberî xwendinê û derketina derve ya jinan e lê bav (mêr) bi xwendina keçên xwe di rolekê erênî de ne.

### 3.5.1.3. Gulî

Gulî hê di derguşê de dibe bûk. Gulî û Seyîdxan ji zaroktiya xwe de dizanin ku ew pêşkertmeyên hev in. Gulî û Seyidxan di temenê hevdeh salî de dizewicin lê dêya Seyîdxan li hemberî Guliyê bi hestên xirab e û ji wê qet hez nake. Şeva ku dizewicin dêya Seyidxan li benda paçika bi xwîna sor e. Ji ber ku Gulî û Seyidxan bi adetên civakê dizanin vê jî wek peywirekî dibînin û bê îtîraz bi cih tînin. Nivîskar li vir jî tu şîrove yan jî îtîrazek nekiriye. Bertek û tevgerên karaktera jin li gor adetên civakê bi cih kiriye. Gulî jî karaktereke kevneşopî ye.

Guliyê di odeyeke wek koxikê de di nav kar û barên mal û gund de zarokan tîne. Malbata Seyîdxan diçin Stenbolê û piştî wan jî ji feqîrî û neçarî Gulî û Seyidxan. Li wî bajarî jî bi tenê ye û xesûya wê tim madê xwe lê tirş dike. Guliyê her cara ku diçe mala xwesûyê, bi gef û lomeyên giran ji wir tê qewirandin. Her carê ji bo ku zewaca wan xirab bibe, xwesûya Gulî bi hesab û dolaban tevdigere.

Rojekê dîsa Guliyê diçe mala xwesûya xwe û ew çûn dibe çûna wê ya dawiyê. Ji wê roja ku xwesûya wê gotinên xirab lê barandin Guliyê bêdeng dibe û ji mêrê xwe jî tiştekî nabêje. Her carê ew gotina xwesûyê dihate bîrê û wê jî ew gotin xwe bi xwe dubare dikir:

“ Ez ji şitlê porê xwe hetanî nenûkên lingê xwe tev de xirabî me.” (r. 140)

Li hemberî gotinên xwesûyê karaktera Gulî êdî dikeve şûna dîneke bêdeng. Ligel ku xwezûrê wê û mêrê wê li ber digerin ji bo ku derdê xwe ji wan re bibêje jî Gulî ji tirsa xwesûyê û ji tirsa ku wê zewaca wê xirab bibe dengê xwe nake, derdê xwe nabêje.

Karaktera jin ewqasî pasîf û bê îrade ye ku li hemberî gotinên xwesûyê dikeve nava tirseke mezin û hew diaxive. Lê ev bêdengî û bê bertekbûna wê dihêle ku him zewaca wê xirab bibe him jî ew ji zarokên xwe dûr bikeve.

Seyîdxan rojekê bi mahneyekê Gulî dibe gund wê li mala bavê wê dihêle û vedigere Stenbolê. Zarokên Guliyê jî li bajêr dimînin. Wê rojê û her roja ku Guliyê qala zarokên xwe û çûyîna Stenbolê dike ya jî dixwaze bi dizîka bireve biçe gel zarokên xwe bav û birayên Guliyê lêdanê lê dikin. Gundî jî tenê li wan temaşe dikin û di nava xwe de diaxivin lê yek ji wan jî midaxeleyî vê şîddet û zilmê nabe. Her çiqas hin ji wan gundiyan li ber vê rewşê diketin jî dengê xwe dernedixistin. Di çavên piraniya gundiyan de Guliyê, ji ber ku mêrê wê ew şandiye mala bavê wê jineke xirab e, sûcdara herî mezin e.

“Gava jinê mêr kir û çû mala mêrê xwe, çi dibe bila bibe, divê ew jin xwe li rê bibe, mala mêr çiqasî zordestiyê lê bikin jî, divê ew daqultîne û di ser mala bavê de newe vegerandinê.” (r. 13)

Bav û birayên Guliyê tev li ewqas şîddet û zilma xwe de dîsa xwe mexdûr dibînin ji bo ku keçeke wilo ew hetikandibûn. Bavê Guliyê ew du carên din jî dabû mêr lê Guliyê ji nav destê wan mêran jî reviya, li mala bavê vegeriyabû. Li ser van du vegerên ji mala mêr hê zêdetir sûcdar hatibû dîtin.

Bavê Guliyê ji bo ku qelena wê bixwe wê dide kal û pîremêran. Bav keça xwe wek sermayê dibîne û her carê bedena wê bi zewaca zorê difroşe mêreke. Guliyê li mala mêrê kal ê ku herî dawî ew dabûnê pir kêm dimîne û direve tê gundê xwe

mala dê û bavê xwe. Di dawiyê de Gulî rojekê ji gund direve û tu kes şopa wê hew dibîne.

"Gulî jineka malwêran kesayetiyeka bi tenê" (r. 13)

Nivîskar rewşa karaktera Guliyê bi van hevokan der dike. Lê yê ku Guliyê xistiye vê rewşê pergala baviksalar û kevneşopiya malbat û civakê ye. Nivîskar bi destê xwesûya wê zewaca wan xirab kiriye ango xwestiye xwesûyê yekane sebebê xirakirina (malwêraniya) zewaca wê bide nîşan. Lê bi ya me di vir de jî dîsa mêr hatiye parastin. Mêrê Guliyê ne bêguneh e lewra xwesû tenê nikare bibe sebebê malwêraniya Guliyê. Guliyê ji roja ku bavê wê di dergûşê de kiribû bûk heta roja ku mêrê wê ew anîbû mala bavê wê, mexdûra mêran û pergala mêrserwer e. Xwesûya wê her çiqas bi hestên cinawirî û bêwicdanî tevgeriya be jî, ji ber ku tu rexneyek ji mêrê wê re nehatiye kirin nêzîkatiya nivîskar di çarçoveya civaka mêrserwer de maye. Hemû guneh li jinan hatiye barandin lê dest neçûye ser nêzîkatiyên mêran.

### 3.5.1.4. Dayika Guliyê

Dayika Guliyê jî weke ya Keskê, girêdayî karên gund, xwedîkirina zarokan e. Ew jî di rola jin û dayika di nava civaka baviksalar û kevneşopî de ye.

Dayika Guliyê jineke di bin emrê mêrê xwe de ye û keçikan wek qurbaniya mêran dibîne. Gava ku Guliyê hê di derguşê de ye û bavê wê dike pêşkertmeya lawê hevalê xwe Seyidxan, ewilîn şaş dibe û dudil bibe jî di dawiyê de gotina wê wiha ye:

" ... Hema qîzek e bila qurbana Seyîdxan be, madem ku te û bavê wê, wisa minasîb dîtiye û ew biryar daye, gotin li min nakeve û Xwedê mirazê wan bi hevdu bike." (r. 40)

### 3.5.1.5. Senem

Xesûya Gulî ye. Navê wê Senem e. Lê Bedoyê mêrê wê tim ji wê re dibêje "jinik". Gava ku vebêjer jî qala wê dike dibêje "jinik". Aynur Aras him di dayîna karaktera Delal de him jî di ya Senemê de navê wan li paş dihêle û bi zimanê mêrên di romanê de xîtabî wan dike. Aras di dayîna karakterên jin de hesasiyeta jinanî û zimanê jinê paşguh dike. Lewma di romanê de bi rehetî peyva "jinik" bikartîne.

Guliyê hêj di derguşê de dibe bûka vê jinê. Xesûya Guliyê, gava ku dibihîse Guliyê kirine pêşkêrtmeya lawê wê ew jî weke dayika Guliyê wiha dibêje:

“ De Xwedê bixêr û xweşî bike madem we wisa minasîb dîtiye, gotin li min nakeve.” (r.43)

Bi devê xwe wiha dibêje. Lê em di berdewama romanê de dibînin ku ev gotin ne bi dilê wê ye. Wê tenê ji bo ku biryara mêran xira neke ango nikare li hemberî biryara mêrê xwe derkeve ev yek qebûl kiriye. Dayika Seyîdxan ji Gulîyê hez nake û her carê dixwaze vê soza pêşkêrtmetiyê bide xira kirin. Piştî zewaca wan jî bêdiliya wê ya ji bo vê zewacê didome û tim li benda mahneyan e ku bi ser Guliyê de gazinan û pite pitan bike.

Xesûya Guliyê di romanê de behsa hîsên dayiktiyê dike. Lê em yekem car dayikeke di roleke xirab û hîsên xirab de dibînin. Bi vê karakterê re em di romanê de yekem car jineke xayîn, bê merhemet, bê star, bi gef, bi kîn û hîlebaz dibînin. Jina ku ji aliyê dêtiya layê xwe ve dikare ruhê xwe bide, li hemberî jina layê xwe ango bûka xwe di roleke cinawirî de ye. Ligel ku tu sebeb tune ye, bi çavên dujminatî li bûka xwe dinêre. Jineke durû ye lewra li pêş çavên layê xwe (mêrê Guliyê) qaşo dilê xwe bi halê Guliyê dişewitîne û xwe dixe şûna dê û xesûyeke baş, hestyar û dilnizm, lê gava ku lawê wê ne li balê ye, hezar fen û dolaban li serê bûka xwe Guliyê digerîne. Durûtiya wê ne tenê li bal lawê wê ye, li bal cîranan jî derewan dike. ji bo ku cîran li hemberî Gulîyê bikevin şiphan ji wan re dibêje “hinekan ew ji rê derxist.” (r. 145)

Piştî ku Seyidxan Guliyê dibe mala bavê wê datîne û vedigere, dêya wî jineke din ji wî re tîne lê malbata bûka nû bi serboriya Guliyê, neheqiya xesû û mêr dihisin. Ji bo çavên wan bitirsînin ku tiştên bi serê Guliyê anîbûn neynin serê keça wan rojekê xwediyên bûkê tên dêya Seyîdxan jî tê de li hemû endamên mala wan dixin û gefên giran li wan dikin. Piştî bûka nû xwesûwa Guliyê dikeve nava rewşeke kambax:

“ Wê çi anîbû serê Guliyê, sê qat dibû û dihate pêşiya wê, wê çavên xwe ji nexweşî, kul û derdan venedikir.” (r. 185)

Her çiqasî nivîskar bi vê encamê re xwestiye ku weke romanên klasîk karaktera sûcdar ceza bike jî, di bûyera Gulî û xwesûwa wê Senemê de nêrînên

nivîskar, parastina zayenda mêr kiriye û tenê xesû ango jin sûcdar dîtiye. Aras, di dawiyê de karakterên mêr û xirab bi ceza nekiriye lê ya jin bi ceza kiriye. Nêrîn û nêzîkatiyên Aras ên li ser jinên romanê bi giştî di vê çarçoveyê de mane.

#### 3.5.1.6. Jina Hemîd

Nivîskar wê wek "jina Hemîd" bi nav dike. Ji vê binavkirinê jî xuya ye ku nivîskar mêr û navê mêr li pêş dibîne; jin û navê jinê jî bi merivantî û têkiliya bi mêr re derdixîne pêş. Ev jin, bi Hemîdê parêzer re dikeve nava romanê. Ne karaktereke li pêş e, lê ji ber ku ne wek jinên din ên di romanê de ye ji bo me di roleke girîng de ye. Ev karakter, ne jineke kevneşopî ye lewma nêrînên wê ji jinên din ên di romanê de cuda ye. Karê wê yê di romanê de hemşîretî ye. Li ser têkiliya Hemîd û Keskê ya ku wek 'qezeyek' hatibû binavkirin berteka jina Hemîd wiha ye:

" Em ewqas sal in bi hevdû re ne. Te hetanî niha tu îxanet û bêrêzî, li hemberî min nekiriye. Ez di nexweşxaneyê de kar dikim, dikarim rewşa we ya wê şevê fêm bikim, ger tu bixwazî, ez jî û tu jî, em ê vê meselê ji binê ve jibîr bikin." (r. 237)

Jina Hemîd weke wî tirk e. Nivîskar ew weke jineke fahma û zana nîşan daye. Lewra li ser têkiliya ku di navbera Hemîd û Keskê de derbas dibe nêzîkatiya wê bi zimaneke sebrê û bi feraseteke fahma ye. Bi sekna vê karakterê re nivîskar, ji aliyê nêzîkatiyên li ser bekaret, têkiliyên zayendî, nêrîna li namûsê ve jinên kurd û tirk ji hev cihê dike. Ji bo jinên kurd ên di romanê de bekaret, namûs û her tiştên ku li civaka wan pîroz in, ji bo wan jî pîroz in. Lê jina Hemîd weke wan nafikire û ligel ku mêrê wê di nava bûyerê de derbas dibe ew ji mêrê xwe û ji Keskê bi bawer e. Bi ya wê têkiliya wan ya wê şevê ne bi îradeya wan û bi hişê wan bû lewma jî ew ne sûcdar bûn.

Di romanê de nivîskar cudahiya di navbera "jinên tirk" û "jinên kurd" gava ku behsa karakterê apê Keskê Riza jî dide digre dest.

" Riza jî wekî gelek xortên xwenda yên kurd, da keçên kurd ên nexwendî û cahil, layiqên xwe nedîtibûn û bi keçên tirkan re dizewicîn, wî jî di dibistanê de, ji keçikeka tirk hez kiribû. Ew layîqê xwe dîtibû. Pê re zewicî bû, keçik ji malbateka zana û çepê Tirkan bû, her gav û wextê darê pişta Riza bû. Gava ku bi Riza re dihat

gund, wê hîn ji Riza bêtir bi derdê xelkê herêmê re dişewitî, xwe li wan dipêça, kesên herêmê jî, pir jê hez dikirin û hembêza xwe jê re vedikir rêz û siyaneteka mezin didanê.” (r. 152)

Rizayê ku di romanê de zana, xwende, girêdayî çanda xwe, warê xwe û zêdetir jî zimanê xwe dihat behskirin jineke tirk layiqî xwe dîtibû. Nivîskar sedema vê jî bi cahilî û nezaniya jinên kurd re dibîne. Jinên kurd di romanê de bi cahilî, nezanî, dilsoz, reben, mexdûr, kevneşopî hatine pêşkeşkirin. Lê ligel van di romanê de du jinên tirk derbas dibin û her du jî di rolên erênî de ne. Jinên tirk weke ku pir medenî, pêşketî û zana ne hatine dayîn. Her çiqas bi karakterê Keskê re xwestiye ku ji nav jinên kurd jî mînakên zana û xwende derbixe jî ev yek bi giştî pêk nehatiye. Lewra Keskê girêdayî kevneşopî û baweriyên civakê maye û bûye mexdûrê feraseta namûsê.

## 3.6. NIRXANDINA BABETÊN DI VAN ROMANAN DE DERKETINE PÊŞ

Di her pênc romanan de him karakterên sereke him jî karakterên din bi piranî jin in û tevna romanê li dora van jinan digere. Bûyerên di van romanan de ji devên karakterên jin an jî nivîskaran ve hatine dayîn. Zêdebûna karakterên jin, vebêjerên jin, pirsgirêkên li dora jinan, pirsgirêkên li ser zayenda civakî tev nîşaneya edebiyateke jinan e. Babetên ku di van romanan de li pêş in ev in; jin û pirsgirêkên jinan, zayendperestî û civaka zayendperest, namûs, pîrozdîtina bekaretê, kevneşopî û xurafeyên civakî, tacîz, bê cih û war bûn û koçberiya bi zorê, kurdbûn û netewebûn, zimanê kurdî û qedexeyên li ser zimên, welat û dayiktî, heps û sirgûnî. Nivîskarên jin, mijarên romanên xwe, ji nava civakê bijartine, mekanên wan jî bajarên kurdan e. Di pergala baviksalariyê de jin li gor mêran di asteke jêr de, di bin pêkûtî û desthilatdariya mêr û hemû saziyên ku ji destê mêran ava bûne de ye. Nivîskarên jin ên kurd, bi her awayê behsa jinan kirine lewra jinên di romanê de; bi perwerde û bê perwerde, kevneşopî û femînen, gundî û bajarî, dayik û xwesû, azib (bekar) û zewicandî, tenê û bêkes, mexdûr û têkçûyî, bi îrade û bê îrade, dilsoz û xapînok û hwd. bi rolên xwe cih digirin. Aniha em ê li ser çend babetên sereke ên ku di romanên nivîskarên jin de bi karakterên jin re derketine pêş binêrin û li ser nêzîkatiya nivîskariya jinên kurd dahurînên xwe binivîsin.

### 3.6.1. Jin û Femînîzm

Nivîskarên jin di romanên xwe de bi dayîna karakterên jin û pirsgirêkên jinên li derdora wan re bala me dibin ser femînîzmê. Di encama xwendina me ya li ser karakterên van romanan me tabloyek bi dest xist. Lê divê em balê bidin ser bikaranîna gotina "meylên femînîst". Di her pênç romanan de jî me karaktereke tam femînîst nedît. Karaktereke femînîst, diviyabû ku him di jiyana xwe de di nava feraset û nêrîneke femînîst de be û him jî ji bo hemû jinan di nava nêzîkatiyek û hewildaneke femînîst de be. Jineke femînîst di wê fikrê de ye ku hemû jinên li dinyayê di bin pêkûtî û bindestiya pergala mêrserwer de ye, ji ber vê jî him ji bo xwe him jî ji bo hemû jinên dinyayê li hemberî pergala mêrserwer bi hişmendiyeke jinanî tevbigere ya jî bi vê hişmendiyê li jiyanê binêre. Lê her sê karakterên ku me di tabloyê de wek "jinên bi meylên femînîst" nîşan dane, di romanê de tam ne femînîst in. Ligel ku bi hin tevger û hewildanên xwe, di têkiliyên xwe yên bi civaka

baviksalar û têkiliyên bi mêran re di nava meylên femînîst de ne jî di romanê de nivîskaran ew di nava hişmendiyeke femînîst de nîşan nedane.

**Tablo 1**: Di pênç Romanan de Rewşa Femînîstiya Jinan

| **Roman** | **Jinên Bi Meylên Feminist** | **Jinên Kevneşopî** | **Jinên Di Navberê De** |
|---|---|---|---|
| Kela Bilind | Berfîn | Ezîme, Siltanê | Zelîşê |
| Lerizînên Tenêtiyê | Rojbîn (Stêra) | Dayika Şevînê | Şevînê, Leyla, |
| Xezal | Xezal | Dayika Xezalê, Sibhiye Xanim | |
| Gerîneke Guernicayê | - | Dayê Şaxê | Lîsa (Abîde) |
| Leylana Kesk | - | Gulî, Dayika Keskê, Dayika Gulî, Xwesûya Gulî | Keskê |

Berfîna di romana Zarîfe Demîr de, her cara ku dibîne neheqiyek li jinekê dibe, bi vê yekê aciz dibe, vê rewşê bi civaka baviksalar girê dide û hin fikrên xwe yên li ser jinan di romanê de vedibêje. Lê di romanê ev mînak parçe parçe hatine dayîn lewma jî fikir û hişmendiya Berfînê yên li ser jinan bi zelalî nehatiye dayîn. Di Rojbîna (Stera) romana Çidem Baran de, Rojbînê li hemberî nêzîkatiyên mêrane yên evînadarê xwe serî hildide, li ser nêzîkatiyên bavê xwe û feodalîteya wî rexneyên wê hene. Di romanê de bi fikir û tevgerên xwe alîgiriya jinan dike lê mînakên vê pir kêm in û ji ber ku ne karaktereke sereke ye di romanê de zêde cih nagire. Ji ber van sedeman jî me ew ne wek jineke femînîst, lê jineke bi meylên femînîst nîşan da.

Di romana Gulgeş Deryaspî de karaktera sereke Xezal bi gelek aliyên xwe ve di romanê de bi meylên femînîst cihê xwe digre. Xezalê, di nava malbat û civakeke baviksalar de ye lê tim li hemberî malbat û civakê sekneke wê ya dijberî heye. Xezalê serê xwe li hemberî zextên malbatê û nêrînên civakê natewîne. Lê Xezalê tenê ji bo xwe femînîst e, ji bo xwe bi hêz e. Li hemberî asaxên ku dêya wê li bûkê (jinbira wê) dike îtîrazên wê hene lê ji bo jinên din ên li dora wê heman refleksê nîşan nade. Gelek caran jinên li dora wê ji wê re derd û mexdûriyetên xwe yên ku ji destê mêran kişandine û dikşînên dibêjin ya jî dixwazin bibêjin lê Xezalê ya tenê bi guhekê guhdariya wan dike ya jî ji wan dûr dibe. Heta hevala wê Zelalê li ser ku ji mêrê xwe şîdetê dibîne, gelek êş û derdên wê hene, gelek caran dixwaze ku Xezalê ji halê wê re çareyekê bibîne û alikariyekê bi wê re bike. Lê Xezalê guhdariya Zelalê jî nake û di dawiyê de Zelalê xwe û zarokên xwe dikûje.

Piştî xwekuştina Zelalê, Xezal xwe sûcdar dibîne lê sekna wê ya li hemberî jinan naguhere. Mesela Xezalê di şaredariyê de karê şewirmendiya jinan dike lê diyalogên wê yên bi jinan re ne di nava çaredîtinê di nava rexne û biçûkkirinê de ye. Meriv dikare vê rewşa Xezalê ji aliyekê ve fêm bike lewra gelek jinên li dora wê teslîmî civaka baviksalar û mêran bûne û ji ber vê rewşa wan ya têkçûyî û îtaatkar jî Xezalê dixwaze ji wan dûr bikeve. Jinek bi tena serê xwe elbet nikare li hemberî pirsgirêkên jinan di nava civakeke baviksalar de şoreşekê li dar bixe û jinên wê civakê rizgar bike. Bi ya me heta ku jin bi girseyî ne di nava pêvajoyeke azadiya jinê de bin, femînîst bi tena serê xwe nikarin jinan azad bikin. Karaktera Xezalê di romanê de, neheqiyeke zayendîtî li ser xwe qebûl nake, tim dixwaze ku di biryar û

tevgerên xwe de azad be, nasnameyeke xwe ya jinanî ava bike lewma jî di nava hewildaneke femînîst de tevdigere lê di rêbaz û nêzîkatiyên wê yên di çareseriya pirsgirêkan de şaşitî hene. Him li hemberî malbata xwe, him li hemberî heval û jinên li dora xwe tevgerên wê hişk in û ne li gora hişmendiyeke gihiştî ne. Lewma jî bi ya me Xezalê jî ne tam femînîst e lê jineke bi meylên femînîst e.

Jinên ku di romanê de bi rolên dayiktî û xwesûtiyê ve li pêş in jinên kevneşopî ne. Ev jin bi piranî di nava kar û barê malê de, bi xwedîkirina zarokan re mijûl in. Li hemberî civaka baviksalar û kevneşopiyên civakê û neheqiyên li ser jinan dengê xwe dernaxin û ew bi xwe jî di nava vê ferasetê de tevdigerin, lewma jî dibin parçeyek ji vê pergalê. Bi gelek aliyan ve rol û sekna wan li gor adetên civakê ne, di nava civakê de fêrî çi bûne wê dişopînin û dixwazin her jin jî weke wan bin. Di nava van jinan de tenê Dayê Şaxê xwendin û nivîsandina wê heye û kevneşopiya wê ne bi aliyek paşvemayî ye; ew zêdetir wek jineke li ser çand û adetên baş ên civaka kurd di romanê de xuyanî dibe. Meriv dikare bêje ku ew şopdareke folklora kurdan e. Lê ji aliyê rolên wê yê di nava malbat û civakê de jineke kevneşopî ye. Em ê li jêr li ser rolên van jinan ên dayiktî û xwesûtiyê bisekinin.

Jinên di navberê de jî ne bi meylên femînîst in ne jî jinên kevneşop in. Di navbera her du kategoriyan de ne. Di romana Zarîfe Demîr de Zelîşê di serê romanê de jineke kevneşopî ye lewma adetên civakê (pêşkertmeyî, biryarên eşîrtî) qebûl kiriye, lê piştre bi beralîkirina evîndarê xwe li hemberî adetên paşvemayî derdikeve û dixwaze adatên civaka baviksalar ên ku tadeya wan digihê jinan bi tevger û îtîrazên xwe ji holê rake. Li gund di nava kar û barê malê de ye. Haya wê ji mafê jinan û femînînîzmê tune ye, zêdetir ji aliyê civakî ve hin rexneyên wê hene. Di romana Çidem Baran de Şevînê, ji civaka baviksalar ne razî ye, di salên zanîngehê de xwe wek femînîstekê dibîne lê pişt re em dibînin ku tim di nava mexdûriyetekê de, bi feraseteke kevneşopî û têkçûyî tevdigere. Li hemberî neheqiyan bêdeng dibe, fikir û tevgerên wê di hin aliyan de dibine wek ên dê û dapîra wê, lewma jî nêrînên wê di çarçoveya baweriya ji “sihûd”, “qeder” û “şens”ê de dimîne. Herçiqas haya wê ji jinê, mafê jinan hebe jî Şevînê jineke betilandî, bêxîret, bê îrade û bê hêvî ye. Dîsa di vê romanê de karaktera Leylayê ji aliyekê ve jineke kevneşop e, bi mêreke bêdilê xwe û beredayî re zewicandiye û ji bo xatirê zarokên xwe bi wî re diqedîne. Zêdetir bi aliyê xwe yê siyasî ve li pêş e û fêhma wê ya jinanî jî bi meylên wê yên siyasî re avabûne.

Di romana Yildiz Çakar de temaya jinê heye lê mijarên romanê raste rast ne li ser hebûna jinê, pirsgirêkên jinê ye. Lîsa ya di romanê de ne jineke li ser xwe û li pêş e. Têkiliyên wê yên bi mêr re di serê ewil de kevneşopî ye. Lewma dixwaze ku mêr aîdî wê be û ew jî aîdî mêr be ango evîndarê xwe. Nêrîna wê li ser milk û aîdîyetê ye lê pişt re Lîsayê bi xwe ji ber vê nêrîna xwe, xwe rexne dike û ji vê meyl û nêzîkatiyê dûr dikeve. Nêzîkatiya mêr ya li hemberî jinê xirab dibîne lewma dibêje ku; "Erê, ketibûm erdê û bi soleke qilêrî ya mêrekî hatibûm heciqandin". (r. 192) Di romanê de Lîsa tim têkiliya jinê, dayikê bi axê û welat re datîne. Jinên di nava sehneyên şer de mane tim li ber çavên wê ne. Di romanê de kirpandineke li ser nasnameya jinaniyê jî heye. Lewra Lîsayê li hemberî nêzîkatiya leşkerên jin wiha dibêje: "Jinika leşker ya li ber min sekinandî, wek mêrekî li reşikên çavên min dinihêrt. Yê nizanîbûya wê bigota qey hinan ev jinik ji jinantiyê sinet kirine, loma ewqas bê hest û dervî jintiyê tevdigere..." (r. 201) Gava meriv li van fikir û nêzîkatiyên Lîsayê dinêre meriv pê derdixe ku haya wê ji nasnameyeke jinanî, ji mafên jinan, cudahiya tevgerên jin û mêran heye lê ji aliyeke din ve ku meriv dinê re Lîsayê jî him di aliyê têkiliya bi mêr re him jî bi pîrozdîtina xwîna bekaretê re kevneşopî ye. Lîsayê xwe ji tesîra civaka baviksalar rizgar nekiriye.

Di romana Aynur Aras de karaktera Keskê, jineke xwende ye û nivîskar e; parêzerî xilas kiriye, hestên wê yên li hemberî jiyanê, xwezayê xurt in. Careke şahidî mexdûriyeta jinekê dibe û gelekî li ber halê wê jinê dikeve. Haya wê ji mafê jinan û tadeya li ser wan heye. Lê ji bo ku li ser bekaretê tabûyên wê weke civakê ye, keçkaniyê pîroz dibine, di dawiya romanê de xwe dike qurbana vê ferasetê. Lewma jî ji aliyê fêhm û tevgerên jinanî ve jineke kevneşopî ye.

Jinên din ên di romanê de derbas dibin, tev mexdûr in. Heta jinên di vê tabloyê de jî tev mexdûrê pergala baviksalariyê, pergala dewletê û civaka mêrserwer in. Di nava van pêkûtî û mexdûriyetan de kêm jinên di vê tabloyê de meylên femînîstî bi wan re hene û li hemberî van pêkûtiyan di nava hewildanekê de ne. Ev rewş jî bi me dide xuyakirin ku nivîskarên jin, rewşa jinên kurd ya di nava civaka kurd de bi karakterên jin ên di romanên xwe de li gor realîteya civakê dane. Nêrîna nivîskarên jin ên li ser dozeke jinanî ango femînîstî ji hin aliyan ve digihên hev lê ji hin aliyan ve ji hev cuda dibin.

### 3.6.2. Jin Û Civaka Baviksalar

Zayenda biyolojîk (nêr û mêtî) wek rewşeke sirûştî bi zayînê re dest pê dike, lê civak vê cudahiya biyolojîk bi awayeke çandî û kevneşopî li zayendê bar dike. Ji zaroktiyê ve ji bo zarokên keç û yên kur (law) rolên zayendî yên ne wekhev di nava civakê de hazir in û zarok di nava vê civakê de hînî rolên xwe yên zayendî dibin. Ev rolên zayendî hîyerarşiyeke zayendî jî bi xwe re derdixîne. Argunşah li ser vê yekê dibêje ku civak, zarokên keç her tim hînî tiştên ku divê nekin dike, di encamê de jî, ji zaroktiyê ve ji bo zarokên kur rewşeke bêminet ava dibe.[132] Zarokên keç bi gelek aliyan ve girêdayî qaîdeyên ku civaka zayendperest ji bo wê qedexe kirine dimîne û heta mezin dibe jî van qaliban jiber dike lewma ew bi xwe êdî dibe şopdarê van rolên zayendî. Di civaka kurdan de jî rolên zayendî ji zaroktiyê ve ji bo keç û kurikan cuda ne. Di nava van cudahiyan de hiyerarşiyek eşkere heye ku zarokên kur li gor yên keçik di asteke jor de, xwedî statuyekê ne.

Di romana Zarîfe Demîr de karaktera Zelîşê li gundekî eşîrane û pêşkertmeya lawê xalê xwe ye, lê bi xîreta evîndarê xwe, bav û dêya xwe vê pêşkertmeyê red dike û bi evîndarê xwe re dizewice. Dîsa di vê romanê de jineke (bênav e) ku malbata wê xwestiye wê bi lawê apê wê re bizewicînin lê wê ji yekî din hez kiriye, bi lêxistina bav û birayê xwe birîndar dibe. Di romana Çidem Baran de, karaktera sereke Şevînê, ji bo ku bi evîndarê xwe re dest di dest e li kûçeyên Amedê geriyaye, birayê wê û dêya wê gotin û heqaretên xirab lê dikin, wê tawanbar û sûcdar dikin. Şevîna ku bi xortê dilê xwe re baz dide û bê destûra malbata xwe dizewice û piştî vê zewacê jî mêrê wê terka wê dike, malbata wê heta dawiya emrê wê deriyê mala xwe li wê heram dikin. Leylaya di romanê de bi darê zorê ya bavê dibe berdêliya bavê xwe. Piştî ku zarokên Leylayê çêdibin jî ji ber fediya civakê û zarokên xwe Leylayê bi mêreke ku layiqî xwe nabîne û hal û tevgerên wî xirab in emrekî dibuhirîne. Gulgeş Deryaspî bi dayîna karakterên xwe yên jin re rewşa jinê civaka baviksalar rave dike. Karakterên jin ên di romana Deryaspî de him bi zêdebûna hejmara wan, him jî bi pirbûna pirsgirên jinên di nava civaka mêrserwer de anatomiyeke jinan xêz dike.
Lewra li wê civakê ji bo jinan gelek tişt eyb û qedexe bûn. Nivîskar geh bi fikrên

---

[132] Argunşah, h.b. r. 62.

xwe, geh jî bi nêrînên Xezala ku di romanê de karaktera sereke ye, rewşa jinên ku li wî bajarî di nava pêkûtî û bindestiya civaka zayendperest de mexdûr dibûn û piştî demekê jî ew jin bi xwe dibûn parçeyek ji pergala vê civakê li ber çavên me radixe. Hemû jinên ku di romanê de derbas dibin ji vê pergala baviksalariyê para xwe stendine. Xezalê ji ber ku weke jinên civakê li hemberî mêran serî natewîne her tim di bin pêkutiyên malbat û civakê de dimîne. Gulbinevşa ku di perwerdehiya malbateke bi kevneşopiyên baviksalariyê mezin bûye ji bo jinan her tiştî qedexe û eyb dibîne. Di dawiyê de evîndarê xortekî dibe û bi wî xortî re direve. Li ser ku ew reviya ye, ji destên bav û birayên xwe ve tê kuştin. Bav û birayên wê kuştina wê wek paqijkirina namûsa xwe dibînin.

Yildiz Çakar her çiqasî dûrî vê mijarê sekinîbe û romana wê ne karakter roman be jî, gotineke Lîsayê bi ya me şahidiya nerazîbûna nivîskar ya ji civaka baviksalar eşkere dike: “Ger niha ez mêrekî qerase bûma, niha herkesî wê guhdariya min bikirana.” (r. 92) Ji vê hevokê jî diyar e ku di civaka ku Lîsayê tê de ye qîmeta gotina jinan tune ye, lê gotina mêran li wir derbasdar û bi qîmet e. Lîsaya ku xwîna keçkaniyê pîroz didît û Abraham ango mêrek li ber çavên wê di asta pêxemberiyê de dîbû, kodên civaka zayendperest ên li ser hiş û tevgerên jinan dide dest me. Karakterên jin ên di romana Aynur Aras de jî di nava civaka baviksalar de ne. Di romana wê de jin bêdeng û bêhêz in, lê beravajî wan mêr xwedî gotin, zane û bi hêz in. Serpêhatiya karaktera Guliyê di vê romanê de nîşaneya encama xirab a pergala baviksalariyê ye. Bavê Guliyê gava ku hêj Gulî di pêçekê de ye wê dike pêşkertmeyê lawê hevalê xwe. Her çiqasî Gulî û pêşkertmeyê wê ji hev hez dikin û dizewicin jî, piştî ku Guliyê vedigerînin mala bavê wê Guliyê dibe amûreke kirîn û firotinê. Bavê wê ji bo pereyan keça xwe bi bedêla qelendan du caran wê bi zorê dide mêrên extiyar. Lê her cara ku Gulî ji gundê xwe baz dide û dixwaze biçe cem zarokên xwe bav û birayên Guliyê lêxistinên giran lê dikin. Gundî jî dengê xwe dernaxin û di çavên gelekan de jina ku li mala bavê vegeriya be jineke xirab e.

Bi ya me ji bo tesîra civaka baviksalar a ku di romanên nivîskarên jin de derbûne bê dîtin ev mînak têra xwe hene. Ji van nivîskaran Gulgeş Deryaspî zêdetir bala xwe daye ser newekheviya jin û mêran a di nava civakê de û sekna xwe ya li hemberî pergala zayendperest ya civakê eşkere vegotiye. Bi karaktera Xezalê re Deryaspî li hemberî klîşeyên pergala baviksalar serî hildaye. Aynûr Aras, bi karaktera Gulî re rewşa civakê girtiye dest û rexneyên xwe kêm zêde di romanê de

eşkere kiriye. Lê Aras ligel ku mekana wê heman gund e jî, di dayîna karaktera sereke Keskê re berê me ji bo jinan daye rewşeke erênî. Lewra bavê Keskê merivekî fahma û ne zayendperest e, ji bo xwendin û pêşketina keça xwe her derfetî diafirîne. Heman rewş di romana Zarîfe Demîr de jî heye. Dê û bavê karaktera Berfînê û Zerînê ne weke civaka wan in, ew jî ne zayendperest û kevneşopî ne, lewma her du jin di tevger û tercîhên xwe de ji aliyê şexsî ve azad in. Ji romana Aynur Aras û Zarîfe Demîr ev encam derdikeve ku, her çiqas di nava civaka kurd de hukmên baviksalarî û kevneşopî derbasdar bin jî hemû malbat ne di vê nêrînê de ne û guhertinên erênî mimkin in.

Her pênç nivîskaran jî karakterên xwe (jin) ji nava civaka kurdan bijartine. Hemû karakterên jin bi pirsgirêkên ku di civakên baviksalar û zayendperest de hene hatine avakirin. Em dikarin bêjin ku romanên van jinan neynika civaka baviksalar a kurdan e. Zext û pêkutiyên li ser jinên di romanê de bingeha xwe ji vê pergala baviksalariyê girtine. Her çiqasî nivîskarên jin karakterên jin ên di romanên xwe de wek mexdûrên pergala vê civakê nîşan dabin jî, di romanan de îtîrazeke wan ya berbiçav nexuyaye. Di dayîna karaketerên wan û mexdûriyetê wan de zimaneke neçariyê heye. Karakterên wan bi piranî bêhêvî ne û îradeye wan, têkoşîneke wan ya xurt ne li pêş e. Carina jî nivîskaran berê rexneyên xwe birine ser rewş û xirabiya jinan. Ji bo vê mînaka herî xurt ya ku me di romanan de dît, karaktera di romana Aynur Aras de ye. Di romana Aynur Aras de, nivîskar mexdûriyeta karaktera Guliyê tenê bi xwesûya xirab re girêdaye û hemû sûc di xwesûyê de dîtiye lê rola mêran di vir de bêguneh nîşan daye.

### 3.6.3. Jin û Evîn

Temaya evînê di her pênç romanan de bi giranî heye. Di romana Zarîfe Demîr de Berfînê ji aliyê hestên evîniyê ve di nava nakokiyan de tê xuyanîn. Ew û mêreke Frensî (Viktor) ji hev hez dikin û Viktor dixwaze bi hev re bizewicin. Lê Berfînê di navbera dilê xwe û rewşa welatê xwe de dimîne. Ji aliyekê ve naxwaze ji welatê xwe dûr bikeve, ji aliyekî din li ser rewşa welatê xwe û gelê xwe yê ku di nava şer de ye difikire. Di nava dudiliyan de dimîne û di dawiyê de, piştî ku Viktor tê kuştin Berfînê nebedî dibe. Li gor hizra ku nivîskar bi me re çêdike Berfînê rêya çiyê girtiye û tercîha xwe ji bo doza mafê kurdan û welatê azad daye.

Çidem Baran karaktera Şevînê di nava evîndariyê de xurt dike. Şevînê tenê di

nava hestên evîndariyê de bi cesaret e, xurt e û bi biryar e. Yanî tişta ku wê xurt dike evîndarî ye lewma bi evîndarê xwe re direve û dizewice. Piştî ku evîndarê wê terka wê dike Şevînê jî terka xwe dike, dev ji jiyana xwe diqere û di nava jiyaneke bêkes û tenê de dimîne. Meriv dikare bêje ku Şevînê bi evîndariya mêrekî re hebû. Rojbîn an jî Stêra jî di romanê de evîndar e, lê evîndariya wê ne hêza wê ye, fikrên wê yên li ser evîndarî û têkiliya bi mêr re weke ya karaktera Xezalê (romana Deryaspî) bi pirsyar û femînen e. Rexneyên wê ji bo civaka baviksalar û mêrên feodal e. Karaktera Xezal ya Gulgeş Deryaspî jî hêj di emreke pir ciwan de evîndar dibe. Lê

piştî bi salan li ser evîndariyê, zewacê û têkiliyên di navbera jin û mêran de dikeve nava pirsyariyan. Fikrên wê yên li ser evînê diguherin û zêdetir li ser jinaniyê û pirsgirêkên jinan disekine. Bi ya Gulgeş Deryaspî evîn û zewac jin dikirin koleyên xwe lewma jî diviyabû ku Xezalê tu caran nekeve bin tesîra mêr û civaka mêrserwer. Lê bi soza xwe ya ku ji dergistiyê xwe re daye jî girêdayî ye û ji aliyê din ve jî zewacê wek xilasiya ji malbata baviksalar dibîne lewma jî dizewice.

Ji karakterên sereke yên her pênç romanan, karaktera Xezalê di zewaca xwe de jî jineke têkoşer û femînen e. Karaktera sereke ya romana Aynûr Aras jî di emreke pir ciwan de evîndar dibe û heta dawiyê jî dilsoza evîna xwe ye. Di dinyaya evîndariya wê de pirsîn tune ye tenê evîndarek e û heyraniyek wê li hemberî evîndarê wê heye. Karkatereke din ya li pêş di romanê de Gulî jî dildarê pêşkertmeyê xwe ye. Li ser evînê hestên wê sivik û ji rêzê ne, jineke dilsoz û sadiq e. Lîsaya di romana Yildiz Çakar de, di emreke ciwan de dikeve nav hestên evîniyê. Lê evîna wê ji karakterên romanên din cudatir e. Evîndariya wê ji mecbûriyeta stara mêrekî ya jî merivekê ye. Evîna Lîsayê zêdetir heyraniyeke li hember mêr û pêdiviya starekê ye. Lîsayê û evîndariya wê ji aliyê zayendîtiyê jî ji karakterên romanên din cudatir e. Di karakterên romanên din de têkiliyên zayendîtî tenê piştî zewacê mimkin dibe lê di ya Lîsayê de şerteke wiha tune ye, lewra Lîsayê di romanê de bêyî ku bizewice, ew û evîndarê xwe bi laşên hev şa dibin. Kirpandina xwîna pîroz ango pîrozdîtina bekaretê di Lîsayê de jî heye. Lê nivîskarê romanê her du rewş di Lîsayê de bi hev re daye. Nivîskar bi dayîna van her du rewşên ku wek nakokîyê xuya dibin du tiştan dibêje: Pevşabûn ne tabûyek e, jinek dikare beriya zewacê jî bi evîndarê xwe re bibe. Ya din jî, her çiqasî pevşabûna beriya zewacê ne tabûyek be jî, di binhişê jinê de gava ku bekareta wê xira dibe, vê weke windahiyekê, parçebûnekê dibîne.

### 3.6.4. Jin û Rewşa Dudilî

Jin ji gelek aliyan ve di bin bandora civaka zayendperest û pergala mêrserwer de ne. Di nava jiyana rojane de biryarên jinan bi piranî di destên mêrên li dora wan de ye. Ji ber vê rewşê jî jin gelek caran di diyarkirina tercîh an jî biryarên xwe de bi nakok in û li benda erêkirina mêr dimînin. Ji aliyê azadî û daxwazan de di nava du sînoran de dimînin. Bi ya Eunkyung Oh, di romana ku karaktera jin di dawiyê de bi pêş dikeve jin di lêgerîna nasnameyê de bi ser dikeve; lê di romanên ku bi têkçûna jinê bi dawî dibin bi tenê rewşa ku jin tê de ye tê dahurandin û rexnekirin.[133] Bi ya me ev tespît heta radeyekê di cih de ye. Lê divê em li zêde bikin ku her sekin an jî her bêdengî nayê wateya têkçûnê lewra carinan bêdengiya karakterên jin jî berteka herî xurt nîşan dide. Di têkçûn an jî bêdengiya wan de dij derketinek veşartî heye. Di navbera daxwaza îradeyek azad û zextên civaka mêr de ya bêbiryar û bêdeng dimînin an jî bêdengiya xwe weke bertekekê bi kar tînin. Helbet jinên ku bi giştî têkçûyî û pasîf jî dimînin hene. Di berhemên nivîskarên daxilî vê xebatê de jî ev bêbiryarî û bêdengî xwe bi rêya nivîsê de der dike. Nivîskarên jin ên di vê xebatê de karakterên jin ên di romanên xwe de bi van aliyan ve honandine. Hin nivîskarên van romanan di dawiyê de karakterên jin ji nava vê rewşa bêbiryar û pasîf rizgar kirine û ber bi çêkirina nasnameya jinaniyê de birine û hinan jî ew di nava wê mexdûriyetê de têkçûyî nîşan dane. Di her pênç romanan de jî karakterên sereke (jin) ne xwediyê îradeyeke netbûyî ne. Ev karakter gelek caran di dayîna biryarên xwe de di navberê de dimînin. Karakterên jin ên di van romanan de, di dayîna biryarên xwe yên di derheqê tercîha jiyana xwe, evîna xwe, malbata xwe, fikrên xwe û hwd. de gelek caran dudil, bi nakok û bêbiryar in. Di nava erê nayê de diçin û tên. Di dawiya vê erê nayê de hin karakter hene ku tercîha xwe bi aliyê erênî û diyariyê de didin û biryara doza jiyanê didin lê hin karakter heta dawiya romanê jî di nava nediyariyê de winda dibin û ji jiyanê dûr dibin. Di romana *Kela Bilind* de Berfînê di navbera evîn û doza gelê xwe de dimîne û di dawiyê de ber bi nediyariyê ve diçe.

Şevîna romana *Lerizînên Tenêtiyê*, ji bo li şopa keça xwe Stêra bigere û wê bibîne tim bêbiryar dimîne û her carê di nava dudilî û mahneyan de ye. Ji bo wêneyên ku xêz dikir rojekê nîşanî keça cîrana xwe bike jî bêbiryar e. Di şêwaza nivîsên xwe de, li hemberî neheqiyên ku lê dibûn di mafê liberabûna van neheqiyan de û hwd. ji

---

133 Eunkyung, Oh, Feminist Eleştiri Bağlamında XX. Yüzyıl Türk ve Kore Romanında Kadın, weş. Ürün, Ankara, 2016. r. 268.

gelek aliyan ve di navberê de ye. Di dawiya romanê de jî bê ku tu biryareke xwe bi cih bîne dimire. Di romana *Xezal* de karaktera Xezalê jî di evîn û zewaca xwe de bêbiryar dimîne. Di gelek fikrên xwe de di navbera dengên dilê xwe de dimîne. Di dawiya romanê de, di navbera biryara jiyan û mirinê de dimîne lê axirê Xezalê tercîha xwe ji jiyanê ji têkoşîna jiyanê datîne. Lîsaya di romana *Gerîneka Guernicayê* de di navbera vegera li bajarê xwe û mayîna li xerîbiyê de bêbiryar dimîne ji ber ku vegera wê ya bi girtin ya bi mirina wê ye, lê mayîna wê jî jiyaneke nîvmirî ye. Lîsayê jixwe tim di navbera malokên hişî de diçe û tê lewma ji gelek aliyan ve di navberê de ye. Lê di dawiya romanê de Lîsa vegera li axa xwe tercîh dike bi ya wê jiyan ew der bixwe ye lewma ew dibe xwe, dibe Abîde. Di romana *Leylana Kesk* de karaktera Keskê, di biryara mirinê ya jî jiberkirina zaroka di nava xwe de û mayîna li jiyanê yanî saxiya zaroka di nava xwe de wexteke pir kurt bê biryar dimîne lê di dawiyê de biryara jiyanê ango zarok anînê dide. Lê di dawiya romanê de Keskê sax dimîne ya dimire ne zelal e. Di vê romanê de rewşa dudiliyê li gor romanên din qels e ji ber ku biryarên Keskê û fikrên wê di romanê de zêde nehatine dayîn. Ji aliyê din ve tenê di meselaya kurtajê de ji bo kêliyeke pir kurt di navberê de dimîne lê weke din mînakên li ser vê rewşê yên berbiçav tune ne. Gulgeş Deryaspî û Çakar di dayîna karakterên sereke de di encama bêbiryarî û rewşa navberî de biryara jiyanê û lêgerîna nasnameyê didin. Bi ya me ev biryar, di encama lêgerîna nasnameyê de, bidestxistina nasnemeya jinê ye lewma êdî biryara wan diyar e, zelal e. Di romanên her du nivîskaran de karakterên jin ên sereke bi îradeya xwe astengiyên li ber xwe têk dibin û dest bi jiyaneke nû dikin. Lewma em dikarin vê bêjin; ligel ku di her du roman de rewşeke navberî û dudilî heye jî di dawiyê de ev vediguheze rewşeke erênî, bi biryar û serkeftiniyê. Çîdem Baran bi karaktera sereke Şevînê re têkçûna jinê nîşan dide. Di romana Zarîfe Demîr de aqûbeta karaktera sereke ne diyar e, lewma ew li hemberî jiyanê û astengiyên wê qels e. Encama lêgerîna wê ya di rêya nasnameya jinê de bi guman e. Meriv dikare rewşa karaktera romana Aynûr Aras jî di heman astê de binirxîne. Lewma em dikarin bêjin ku di van her sê romanan de karakterên jin heta dawiya romanê jî di navbera de mane. Ji ber vê jî nediyarî û têkçûyîna karakteran heye.

### 3.6.5. Jin, Dayiktî û Xesûtî

Jinên ku di rola dayiktiyê de ne di her pênç romanan de hene. Di romana Zarîfe Demîr de dayika Hesencano (xwesûya Zelîşê) Ezîme'yê jineke gundî û

kevneşopî ye. Bi adet û qaîdeyên berê ve girêdayî ye. Siltanê (dayika Zelîşê) jineke gundî ye, di nav kar û barê mal û gund de ye lê ne jineke kevneşopî ye. Siltanê berevajî Ezîmeyê berê wê li pêş e, li hemberî kevneşopîyên paşvemayî dengê xwe derdixe, gotinên wê li gel mêrê wê bi tesîr û bi qîmet in. Ezîmeyê li hemberî pêşkertmebûna keça xwe jî derdikeve. Ji aliyê dayiktiyê ve li gor Ezîmeyê hineke din têkiliyên wê bi keçên wê re xurt û germ in. Lê dîsa jî navê wan di romanê de zêde derbas nabin. Mêrê wan wek "jinik" bang li wan dike. Nasnameya wan a jinanî ne li pêş e.

Di romana Çidem Baran (*Lerizînên Tenêtiyê*) de dayika Şevînê di roleke kevneşop de ye. Navê wê jî derbas nabe tenê dayik e. Dayika Şevînê li gor adetên civakî û pergala baviksalariyê tevdigere, ango ew jî bûye jineke stûxwar û li hemberî pergala civakê îteatkar e. Naveke wê tune ye di romanê de. Di navbera zarokên keç û kur de cudahiyan rewa dibîne. Têkiliyên wê bi keça wê Şevînê re ne xurt e. Şevînê jî dayik e lê dayiktiya wê tenê di nameyên wê de, di hestên nivîsên wê de ne. Ji ber ku heta mirinê jî keça xwe nabîne. Nivîskara romanê ji bo Şevînê rola nivîskariyê li hemberî rola dayiktiyê xurttir daniye. Meriv dikare bêje ku di romanê de Şevînê jî li hemberî dayiktiyê tercîha xwe ji nivîsnadinê daniye. Lewma doza wê ne ji bo dîtina keça xwe, ji bo nivîsên baş e. Di vê romanê de dayikeke din Leyla'yê ye. Rola dayiktiya Leylayê jî zêdetir polîtîk e. Ew dayika şehîdan e.

Di romana Deryaspî (*Xezal*) de, dayika Xezalê jî bê nav e, tenê dayik e. Di roleke kevneşop de ye. Weke dayika Şevînê jineke li gor adetên paşverû yên civakê tevdigere. Li gor wê zarokên keç ya jî jinên di civakê de divê li gor rolên xwe yên civakî tevbigerin. Lê ji bo lawê wê û mêrên di civakê de tu qaîdeyên wê tune ne. Yanî dayika Xezalê li hemberî keçên xwe û jinên din weke mêr ango bavekî tevdigere. Ji aliyê din ve dayikeke dil birehm e, lewma dilê wê li ser zarokên wê diêşe û êşa zarokên xwe dikşîne. Di romanê de dayiktiya karaktera Zelalê girîng e. Lewra Zelalê ji ber êşkêşiya ji destê mêrê xwe dibe kûjera xwe û zarokên xwe. Di vê romanê de Zelalê dayikek e neyînî û kûjer e. Karaktera sereke Xezalê jî di dawiya romanê de dibe xwediyê rola dayikî. Xezalê ji aliyê rola dayikî ve di serê ewil de di roleke erênî de ye lê piştî mirina mêrê xwe li hemberî keçika xwe hestên wê diguherin. Lewra di mirina mêrê xwe de keça xwe sûçdar dibîne, bi wê re bi salan naaxive lê piştî ku berê xwe li jiyanê vedigerîne fêm dike ku neheqiyek mezin li keça xwe kiriye û rehma xwe dibe ser keça xwe.

Di romana Yildiz Çakar (Gerîneka Guernicayê) de Dayê Şaxê di rola dayikeke bi çand û folklora kurdî ve girêdayî derdikeve. Navê wê heye û li pêş e ango nasnameyeke wê ya jinanî heye. Dayikeke çîrokbêj û dengbêj e. Li ser keça xwe Lîsayê (Abîde) tesîreke kurdewarî dihêle. Di romanê de nivîskar ji aliyekê ve wê wek sembola welat dibîne. Ew di rola rehmê, malzarokê û axê de ye. Dêtiya wê him biyolojîk him jî sembolîk e û di şûna mekan ango axa welat de ye.

Di romana Aynur Aras de dayika Keskê, dayikeke kevneşopî ye, gundî û nezan e. Li hemberî xwendina zarokên keçik derdikeve. Ligel ku mêrê wê yekî li pêş e û ferqê di navbera zarokên keç û kur de nabîne, ew weke civaka xwe bi fikrên zayendperestî tevdigere. Têkiliyên wê bi keça wê re germ û bi rehm e. Di nava karê malê de û berpirsyariya zarokan de cihê xwe digre. Di romanê de Gulî jî di rola dayika fedakar û êşkêş de ye. Ew tim bi hesreta zarokên xwe ye li ser dayiktiya xwe tim şîdetê dibîne û di dawiyê de di rêya dîtina zarokên xwe de diçe. Karaktera sereke Keskê jî di dawiya romanê de dibe xwediyê rola dayiktiyê. Keskê ne bi dil û tercîha xwe ducanî dibe lê piştî ku ducanî dibe dixwaze ku zaroka di nava xwe de bîne dinyayê. Nivîskara romanê bi carekê re Keskê di nava hîsên dayiktiyê de dide û karaktera xwe di nava roleke dayiktîyê de derdixîne. Bi ya me ev diyarbûna tesîra civaka baviksalariyê û qebûliyetên ku dinyaya mêrserwer li ser jinan ferz kiriye nîşan dide. Pîrozdîtina rola dayiktiyê ya civakê derbasî karakterê Keskê jî bûye, lewma Keskê ji bo ku vê rola pîroz bigre dest, xwe dike mexdûra nava (rehîm) xwe. Jina femînîst û fîlozof Irigaray li ser vê wiha dibêje: “Dinyaya baviksalar, dinyayeke ku jinê tîne ser dayiktiyê. Jin heta ku bi nava xwe re mijûl bibin, encax wê bi nava xwe dakevin.”[134] Aynûr Aras di romanê de karaktera Keskê tim bi heyraniya mêr pêşkeş dike. Lewma di dawiya romanê de Keskê zarokeke kurik tîne dinyê û navê wî dike Bager (navê dergistiyê wê ye).

Di du romanan de rola xwesûtiyê li pêş e: *Xezal* û *Leylana Kesk*. Di her du romanan de jî xwesûtiya jinan neyînî ye. Di romana *Xezal*ê de dayika Xezalê li hemberî bûka malê tim bi zext û gotinên xirab derdikeve. Xesû xwe li ser bûka malê weke sermiyan dibîne û li hemberî bûkê bi hestên dijminahî tevdigere. Li hemberî bûkê, bi dek û dolab e. Bi qasî ku ji lawê xwe hez dike ewqasî jî ji bûka xwe nefretê

[134] Luce Irigaray, *Ben Sen Biz, Farklılık Kültürüne Doğru* wer. Sabri Büyükdüvenci, Nilgün Tutal, weş. İmge, Ankara, 2006, r. 140.

dike. Di romanê de di rola xwesûtiyê de jineke din Sibhiye Xanim e. Sibhiye Xanim jî xwesûya Xezalê ye. Sibhiye Xanim jî jineke kevneşopî û li hemberî bûka xwe desthilatdar e. Tim dixwaze ku Xezalê di bin qontrola wê de be, ji gotin û şîretên wê dûr nekeve. Lê ji ber ku Xezalê jineke serhildêr e û li hemberî zext û tevgerên zayendperestî yên li hemberî jinê serî hildide navbera wê û xwesûyê tim xirab e. Sibhiye Xanim her çiqasî bixwaze rola xwe ya xesûtiyê bi dilê xwe bilîze jî ev pêk nayê. Di romana *Leylana Kesk* de xesûya karaktera Guliyê di roleke neyînî de ye. Xwesûya Gulîyê li hemberî bûka xwe bi hestên dijminatî tevdigere û ji bo ku lawê wê Gulî li mala bavê wê vegerîne çi ji destê wê tê texsîr nake. Di dawiyê de dibe sebebê Gulîyê û miradê xwe bi cih tîne. Her du nivîskaran (Deryaspî û Aras) di van romanên xwe de rola xesûtiyê neyînî û xirab nîşan dane. Di her du romanan de nêzîkatiya her du xesûyan jî kaniya xwe ji heman jêderkê girtine. Lewra bûk ew jina ku lawê wan ji wan dûr xistiye û stendiye. Bûk ji bo wan neyarên mezin in çunkî ew li ser keda wan ya bi salan rûniştiye. Lewma jî di nava derûniyeke wiha de ne ku li gor wan lawê wan ji wan hatiye dizîn, jineke xerîb û ne ji xwîna wan hatiye li ser nanê wan û semyanê wan rûniştiye. Ji aliyê din sedema ku ev xwesû zilimkar in wiha ye: Di civakên baviksalar de yên ku bi hêz û li pêş in mêr in, lewma gotin û hebûna jinê zêde ne bi qîmet e. Piştî wextekê jin vê cihê xwe yê di nava civakê de qebûl dikin û ew bi xwe dibin şopdarê vê pergalê. Di her du romanan de derdikeve holê ku jinên di bûkaniya xwe de ji destê xesûyê zilm dîtibin piştî ku ew bixwe dibin xwesû heman zext û zilmîtiyê tînin serê bûkên xwe. Lewma bi ya wan tiştên ku wan di bûkaniyê de kişandine lazim e ku bûkên wan jî bikşînin. Desthilatdariya mêr qebûl kirine û xwesû li ser bûk û keçên xwe dibin desthilatdar. Yanî berberiya wan ji bo hemzayenda wan e. Jin li hemberî zayendên xwe di nava berberiyekê de ne. Di her du nivîskaran de jî ev tema li pêş e, lê di romana Aras de hemû sûc li ser xwesûyê hatiye barkirin lewma bi ya me nivîskar di romana xwe de cihê mêr (mêrê Gulî û xwezûrê Gulî) û statuya wan di asteke jor de parastiye, ew neheq nedîtiye û hemû guneh li jinê (xwesûyê) bar kiriye.

### 3.6.6. Jin, Perwerdehî û Kar

Di çar romanan de karakterên sereke (jixwe hemû karakterên sereke di van romanan de jin bûn) ji aliyê perwerdehiyê ve li pêş in. Tenê di romana *Gerîneka Guernicayê* de asta perwerdehiya Lîsayê ne kifş e. Tenê di romanê de carekê tê qalkirin ku Lîsayê di karê redekteyê de dixebite, helbestan dinivîsîne. Di romana

*Kela Bilind* de Berfînê, di romana *Lerizînên Tenêtiyê* de Şevînê, di romana *Xezal* de Xezalê, di romana *Leylana Kesk* de Keskê zanîngeh xwendiye. Ji van pênç karakterên sereke ya ku zanîngeh neqedandiye Şevînê ye. Şevînê li bajarê Stenbolê pêşî di karê tekstîlê de karkir e, piştre jî dibe paqijvan û nêhirvana pîrejinekê. Ligel ku du salan di zanîngehê de xwendiye û qabiliyeta wê ji xêzkirina wêneyan re heye jî nivîskar berê Şevînê dide van karan. Xizmeta jineke tirk, cirnexweş û extiyar dike. Her çiqas di romanê de nivîskar xwestiye ku karaktera xwe ji ber nexweşiya wê û bê malbûna wê mecbûrî vê karê dîtîbe jî, bi ya me karaktera Şevînê di van tercîhên xwe de nîşaneya têkçûnê, pasîfî û bêteqetiyê ye. Çi lêrasthatine ku Aynur Aras jî di dawiya romanê de karaktera Keskê jî di nava heman karî de bi cih kiriye. Keskê jî piştî ku parêzeriyê dixwîne û xilas dike ji ber bûyera ku tê serê wê xwe mecbûrî malekê û karekê dibîne lewma ew jî dibe paqijvan û nêhirvana jineke extiyar.

Li gor tabloya jêrîn encamên di destên me de wiha ne: Pirsgirêka xwendin û nivîsandina karakterên sereke û li pêş tune ne. Karakterên sereke heta zanîngehê jî xwendine. Her çiqas di romana Yildiz Çakar de asta perwerdehiya karaktera jin (Lîsa) ne diyar jî be, li gor ku hevalên Lîsayê li Stenbolê ji wê re di kovarekê de karê redakteyê dîtine (r. 134) ew jî ji aliyê perwerdehiyê ve di asteke baş de ye. Lê bi qasî ku ji romanê diyar dibe Lîsayê vî karî nake û di romanê de bê kar xuyanî dibe. Di her çar romanên din de karakterên sereke perwerdehiya zanîngehê dîtine. Yanî karakterên di romanê de her çiqasî di nava civakeke baviksalar de bin jî, ji aliyê şandina dibistanê ya jinan ve pirsgirêk dernexistine. Lê em vê jî bi bîr bixin ku van karakteran perwerdehiya bi zimanê tirkî dîtine. Ji aliyê perwedehiya kurdî û zimanê kurdî de tu perwerdehî nedîtine. Li gor salên ku di roman tê de derbas dibin û şer û mercên li Tirkiyê yên ji aliyê derfeta perwerdehiya bi kurdî û dibistanên bi kurdî rewşeke wiha ne mimkûn e. Lê divê em li vir zêde bikin ku ji bilî karaktera romana *Xezal* (Xezalê), karakterên her çar romanên din ên sereke di romanan de berhemên bi kurdî dixwînin û ew bi xwe bi kurdî dinivîsin.

Nexasim Şevînê û Keskê di romanê de di heman demê de nivîskariyê dikin. Her wiha Lîsayê helbestan dinivîsîne.

**Tablo 2**: Di Pênç Romanan de Asta Perwerdehiyê û Karê Karakterên Sereke

| Roman | Karakterên Sereke | Asta Perwerdehiyê | Karê Karakteran |
|---|---|---|---|
| Kela Bilind | Berfîn | Zanîngeh | Dixtor |
| Lerizînên Tenêtiyê | Şevîn | Zanîngeh | Paqijvan, Nêhirvan |
| Xezal | Xezal | Zanîngeh | Civaknas |
| Gerîneka Guernicayê | Lîsa | Ne diyar e | Bê kar |
| Leylana Kesk | Keskê | Zanîngeh | Paqijvan, Nêhirvan |

Ji bilî karakterên sereke û çend karakterên din, di van romanan de pirsgirêka perwerdehiyê ya jinan heye. Di *Kela Bilind* de, Ezîme û Siltanê xwendin û nivîsandina wan tune ye. Di *Lerizînên Tenêtiyê* de Dayika Şevînê û Leylayê xwendin û nivîsandina wan tune ye. Di romana *Xezal* de, Dayika Xezalê, Sibhiye Xanim, Gulbinewş, Sewqê, Jina Xelîl û du jinên ku hatibûn şêwra Xezalê ya dibistan nexwendine ya jî tenê dibistana seretayî xwendine. Di *Leylana Kesk* de, Gulî, Dayika Gulîyê, Dayika Keskê, Xesûya Gulîyê xwendin û nivîsandina wan tune ye. Bi qasî xwendina me ya li ser van romanan, li ser ne xwendin û nivîsandina van jinan du sedem derdikevin pêş: Jinên ku di romanê de bi emir in û di rolên dayik û xesûtiyê de ne li gundan mezin bûne û bi qasî em jê derdixin li gundên wan di zaroktiya wan de dibistan tune ne. Sedemeke din jî malbatên ku zêde oldar û feodal in zarokên xwe yên keçik ne şandine dibistanê. Ji bo vê jî mînaka herî berbiçav rewşa malbata Gulbinewş e.

### 3.6.7. Jin û Şîdet

Heyeta Giştî ya Welatên Yekbûyî, di Danezana Derbarê Ji Holê Rakirina Şîdeta Li Hemberî Jinê de (20'ê Berfanbara 1993'yan) şîdeta li hemberî jinê wiha pênase dike: "çi di nava gel de (qamû) çi jî di nava jiyana şexsî de qewimî be, tevgerên ku ji aliyê fizîkî, zayendî ya jî psîkolojîk ve êşê dide ya jî dikare êşê bide jinê; tevgerên ku xwe dispêrên zayendiyê ya jî bi van tevgeran re gef avêtin, zext

kirin, mehrûmkirina ji azadiyê (bi aweyeke kêfî).”[135] Weke ji vê pênaseyê jî diyar dibe her cûre êş û pêkutiyên li ser jinê di nava şîdetê de tê dîtin. Di van pênç romanan de karakterên jin him ên sereke him jî ên din di nava şîdetê de ne. Yên ku şîdetê dikin bi piranî mêr in lê jin jî bi aweyeke devkî û hestyarî ve şîdetê li jinên din dikin. Di romanan de mêrên ku wêrekî û hêza xwe ji pergala baviksalariyê û pergala dewletê girtine li hemberî jinan tim bi şîdet in. Li ser gelek karakterên jin ên di romanê de ji gelek aliyan ve şîdeta psîkolojîk, fizîkî, hestyarî, devkî û aborî heye. Ligel van şîdeta ku ji nav mekanîzmayên dewletê jî tên heye. Bi kurtehî em dikarin bêjin ku di romanên her pênç nivîskaran de şîdeteke piralî ya li hemberî jinê heye. Bi xwendina rewşa karakterên jin re meriv cureyên şîddetê û tesîrên wê dibîne.

### 3.6.8. Jin, Bêcihûwarbûn û Pirsgirêkên Netewî

Di her pênç romanan de nivîskaran karakterên xwe ên jin di nava pirsgirêka nasnameya netewî de honandine. Di romana Zarîfe Demîr de karaktera Berfînê tim behsa welatê Kurdistanê, pirsgirêkên wê û ne azadbûna wê dike. Rewşa Kurdistanê ji aliyê mêtingehî ve bi welatên din re miqayese dike. Berfînê li ser vê rewşa neyînî ya welatê xwe ewqasî bi xem û bi êş e ku ev ji bo evîna wê jî astengîyê derdixe. Berfînê ji bo xwendina bilind û karê xwe yê dixtoriyê bike ji gundê xwe derdikeve û li bajarê Amedê bi cih dibe. Di romana *Lerizînên Tenêtiyê* de malbata Şevînê ji bo ku qirocîtiya dewletê qebûl nakin, gundê wan tê şewitandin û li bajarê xerîbiyê bi dû nanê xwe dikevin. Di romanê de nivîskar bi pelan behsa qirocitiya bi zorê, êşkenca dewletê û rewşa gundiyên kurd ên ku koçî bajarên xerîbiye kirine û mexdûriyeta mezin dikşînin dike. Di romanê de Şevînê bi vê gotina xwe: “Ez wek her zarokeke kurd di warê xwe de li ser axeke ne azad hatibûm ser rûyê dinyayê.” (r. 45) rewşa kurdan û axa wan rave dike. Di romana *Xezal* de jinên ku li ser axa xwe ji bo azadiya xwe di girtîgehê de ne û jinên ku li ber deriyê girtîgehan li benda zarokên xwe ne pir in. Nivîskara romanê Gulgeş Deryaspî bi rêya nameyên karakteran re li ser rewşa netewî ya kurdan û welatê wan xwendevanan agahdar dike. Di romana *Leylana Kesk* de, nivîskar ji devê karaktereke mêr (Apo Riza) ve pirsgirêka neteweya kurd,

[135] Sutay Yavuz, “Kadına Yönelik Şiddet ve Suçların Sosyolojisi: Türkiye Örneği” dnd. *Suç Sosyolojisi,* (amd.) Fuat Güllüpınar, weş. Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2017, r. 199.

qedexeyên li ser zimanê kurdî û rewşa welatê wan vedibêje. Di romana *Gerîneke Guernicayê* de, Lîsa û malbata wê ji ber rewşa salên 90î yên Tirkiyeyê û zextên li ser neteweya kurd koçî bajarên xerîbiyê dibin. Nivîskar him bi nûçeyên ku di ekrana televizyonê de ji devê pêşkeşvana porzer û lêvmor dihatin xwendin him jî bi serpêhatî û jiyana Lîsayê ve rewşa axa kurdan li ber çavê xwendevên radixîne. Di her pênç romanan nivîskaran rewşa kurdan û welatê wan di nava realîteyê de rave kirine û karakterên jin jî di nava vê realîteyê de honandine. Di van romanan de jin bi du aliyan ve di nava mexdûriyetê de ne. Ji ber nasnameya xwe ya jinanî û ji ber nasnameya netewî.

### 3.6.9. Jin û Nivîs

Di derbarê nivîskarîya jinê û peywenda bi edebiyatê re Simon de Beauvoir wiha dibêje: "Rewşa ku jin tê de ye, wê ji bo xilasiyê ber bi lêgerîna huner û edebiyatê ve dibe."[136] Jin pêdiviyê bi derbirîna xwe dibîne û dixwaze dengê xwe di jiyaneke çêker ya nivîsê re derbixe. Di romana Çidem Baran de karaktera Şevînê, ji ber rewşa bindestî û mexduriyeta xwe, ji ber bêdengî û tenêtiya xwe tim dinivîsîne. Nivîskara romanê bi rêya karaktera Şevînê esas behsa daxwaz û pêdiviya bi nivîsandina xwe dike. Di romana Aynur Aras de Keskê dest bi nivîsandina romanê dike û piştî bûyera ku bi serê wê de diqewime hemû bal û mijuliyeta xwe dide ser nivîsandina vê romanê. Di romana Yildiz Çakar de Lîsayê, di romana Zarife Demir de Berfînê helbestan dinivîsîn. Di her pênç romanan de jî nivîsandina nameyan derdikeve pêş. Nivîskarên van romanan bi saya van nameyan hestên karakterên xwe bi eşkereyî û wêrekî bi xwendevanan re parve dikin.

### 3.6.10. Rewşa Hundirîn a Karakteran

Ji xeynî babetên li jor, rewşa hundirîn ya karakterên di van romanan de jî hêjayê nirxandinê ye. Ev rewş di monolog, name û rojnivîskên karakteran de derdikeve pêş. Em ê li jêr li ser van xalan rawestin.

---

[136] Simone de Beauvoir, *Kadın "İkinci Cins" Bağımsızlığa Doğru*, wer. Bertan Onaran, weş. Payel, İstanbul, 2010. r. 140

## Monolog

Nivîskaran karakterên xwe yên jin di nava monologan de dane. Di romana Zarîfe Demir de Berfînê kêm caran be jî bi xwe re diaxive û li ser rewşên ku şahidiya wan dike pirsan ji xwe dike: “Berfînê li rewşa heyî temaşe kir û xwe bi xwe got. ‘di serdema me de stran jî qedexe ne, way li min ê. Behsa demokrasiyê û mafê merivan tê kirin. Dê bi vî halê xwe bibin endamê Yekîtiya Ewropa ne?’” (r. 66) Di romana Çidem Baran de Şevînê carinan li hemberî gelek neheqiyan xwe neçar dibîne û bêdengiyê tercîh dike û carinan jî ji bêkesî di nava xwe de bi xwe re diaxive: “Mirina ji mirinê xirabtir qey ev e. Va ye ji bêçareyiyê min kirasekî ji agir ku min tu car nedipejirand li bejna xwe kiriye. Li min nayê lê belê ma ka ez çi bikim? Ez dikarim çi bikim? Ji wî kirasî derkevim û wek berê serî hildim, dibe gelo?..” (r. 67) Di nav monologan de ji xwe hesaban dike, pirsan dike û li bersivên xwe digere. Di romana Gulgeş Deryaspî de Xezalê tim bi dengên dilê xwe re diaxive. Di gelek deverên romanê de Xezalê di nava monolog û dengên hundirê xwe de ye. Nivîskar ji van dengan re dibêje “peyamên saziyan”. (r. 26) Di romana Yildiz Çakar de, Lîsayê jî ji serê romanê heta dawiya wê, gelek caran li hemberî neynikan bi xwe re diaxive. Bikaranîna teknîka monologê herî zêde di vê romanê de heye. “Gelo li vî bajarî, ez xwe çawa hîs dikim, çi hîs dikim?” (r. 40) Lîsa jî weke karakterên din gava ku bi xwe re diaxive, zêdetir ji xwe pirsan dike û li bersivên pirsên xwe digere. Di romana Aynur Aras de jî Keskê carinan xwe bi xwe diaxive, li ser vê rewşa wê vebêjer wiha dibêje: “Wê gelek caran bi xwe, li ser xwe şîrove dikir û bi xwe re diaxivî.” (r.215) Di karakterên sereke yên her pênç nivîskaran de monolog heye. Gava meriv li rengê monologên wan dinêre, dibîne ku di axaftinên wan ên bi xwe re de, di nava pirsan û hesaban de ne. Her pênç karakterên sereke jî di jiyana xwe de, di nava civakê de bi tenê ne. Hevalên wan pir kêm in, kêm caran diaxivin lê gelek caran bêdengiyê tercîh dikin an jî xwe bi xwe diaxivin. Her carên ku bi tenê dimînin an jî xwe di nava tenêtiyê de dibînin monologên wan û bi wê re jî bêdengiya wan zêdetir dibin. Carinan jî di nava vê tenêtî û bêdengiyê de nivîsandinê tercîh dikin. Nivîskar van karakterên jin di nava monologan de derdixin pêş ji ber ku tenêtiya wan a di nava civak û malbête zêdetir bê xuyanîn. Di her pênç nivîskaran de tenêtiya jinê û bi vê tenêtiyê re axaftina xwe bi xwe di jinên romanên wan de der dibin.

### Name û Rojnivîsk

Nivîskarên jin di van romanên xwe de cih dane name û rojnivîskan. Bi saya bikaranîna van teknîkan, em di van romanan de tecrûbeyên nivîskarên jin, hiş û derhişê wan ji nêz ve dibînin. Li gor ku Argunşah jî radigihîne, “di metnên edebî de, lênûskên bîranînan, name û rojnivîsk, wek sîtava hesasiyeta jinê hatine dîtin û zêdetir jî ji aliyê nivîskarên jin ve hatine bikaranînin, ji ber vê sedemê jî ev şêwaz wek bikaranîna “jinane” tên nirxandin.”[137] Di romana Zarife Demir de, Berfînê ligel ku dikare bi rêya telefonê jî bi hezkiriyê xwe Viktor re biaxive, nameyan ji wî re dinivîsîne. Ev tercîh barê karaktera romanê yê hestyarî siviktir dike. Di nameyên xwe de rehettir dikare hest û fikrên xwe bi Viktor re parve bike. Di romana Çidem Baran de Şevînê ji keça xwe re nameyan dinivîsîne lê esas ew name rojnivîsk in lewra Şevînê bi rojane serpêhatiyên xwe dinivîsîne û him behsa jiyana xwe ya berê him jî behsa rojên xwe yên têde ye dike. Rojnivîsk û name her du teknîk bi hev re ne di vê bikaranînê de. Şevînê van name rojnivîskan ne tenê ji bo keça xwe Stêra dinivîsîne, di heman demê de bi fikra ku wê rojekê bên weşandin jî dinivîsîne. Şevînê bi xeyal û fikra ku wê rojekê ev name/rojnivîskên wê bigihêjin berdestê keça wê dinivîse lê ji aliyeke din ve gelek caran em Şevînê di nav fikra ku rojekê ev name bibin çîrok an jî bên weşandin dibînin. Ger em karaktera Şevînê wek nivîskareke di romanê de binirxînin, em dikarin bêjin ku nivîskara di romanê de (Şevînê) bi daxwaza ku rojekê jiyana wê (a ku di van rojnivîsk û nameyan de dihat qeydkirin) ji aliyê her kesî ve bê xwendin û dîtin dinivîsîne. Nivîskara romanê Çidem Baran debirînên xwe yên li ser daxwaza nivîskariya jinê û endîşeyên wê bi rêya karaktera Şevînê re xistiye nava romanê. Ew jina bêdeng û têkçûyî, bêçare û bêkes ango Şevînê, rojnivîsk û nameyên xwe ji bo xatirê ku rojekê dengê xwe bigihîne derve, bêkesiya xwe eşkere bike, bêçareyiya xwe bide xwendin dinivîsîne. Berktay jî dibêje: “Qeyda rojnivîskan û fikra ku rojekê ew bên weşandin di hişê nivîskar de derketina nav gel e.”[138] Di dawiya romanê de karaktera Stêra ango Rojbînê jî nameyekê dinivîsîne. Ev name ji nameyên Şevînê cudatir e ji ber ku nav û navnîşaneke wê heye û digihêje xwediyê xwe. Di romana Xezal de Gulgeş Deryaspî jî cih dide nameyan. Nameyên di romana

[137] Argunşah, h.b. r. 199.
[138] Fatmagül Berktay, *Tarihin Cinsiyeti*, weş. Metis, İstanbul, 2015, r. 171.

Xezal de di navbera du jinan de ye. Çavşîna ku di girtîgehê de ye û hevala wê Xezal nameyan ji hev re dinivîsin. Nivîskar di romanê de fikrên xwe yên li ser rewşa kurdan a siyasî, welatê wan û parçebûna wê, zextên li ser gelê kurd û zimanê kurdî bi rêya van nameyan der dike. Yanî nivîskar ji bo ku van fikrên xwe bi xwendevan bide xwendin rêya nameyan tercîh dike. Di romana Gerîneka Guernicayê de Lîsa ligel ku nêzîkî Abraham e jî, hestên xwe yên di derbarê evîna wî de bi rêya nameyan eşkere dike. Lîsayê ligel ku ji aliyê pevşabûnê ve li hemberî evîndarê xwe bi wêrek e, ji alî vegotina hestên xwe ve rêya nivîsê tercîh dike. Bi ya me nivîskar di vir de dîsa bi bîra me dixe ku jin di eşkerekirina hestên xwe de, nivîsê, nivîsandina nameyan tercîh dikin. Di romana Aynur Aras de tenê carekê karaktera Keskê ji ber ku nikare û naxweze bi bavê xwe dergistiyê xwe re rû bi rû bibe ji wan re du kurte nameyan dinivîsîne.

### 3.6.11. Jin û Zarokatî

Di van romanan de xaleke din ku bala me dikşîne zarokatiya karakterên sereke ên di romanê de ne. Di romana Zarîfe Demîr, Kela Bilind de zarokatiya karakterên jin tune ne, ew di romanê de bi emrê xwe yê ciwan derdikevin pêş me. Di romana Gulgeş Deryaspî Xezalê de, karaktera Xezalê di emrê xwe yê lîseyê ango pir ciwaniyê de dikeve nava romanê. Lê di romanên her sê nivîskarên din de karakterên jin bi zarokatiya xwe di nava romanê de cih girtine. Di romana Çidem Baran de Şevînê bi rêya nivîsandina nameyan bi hurgilî behsa salên zarokatiya xwe dike. Di van salên zaroktiyê de bîranînên bi êş û kêfxweşî di nava romanê de derbas dibin. Lê nivîskar zêdetir li ser serpêhatiyên travmatîk ên zaroktiya Şevînê dike. Lewra zarokatiya Şevînê zû xilas dibe, sirguniya ji gund, bajarên xerîbiyê, feqîrî û bêkesî, meseleyên siyasî û hwd. di salên zarokatiyê de ji bo Şevînê bîrên xirab hiştine. Lê ligel van rewşên neyînî, çend salên beriya sirgûniyê, li gundê xwe bi kêf, bi heval e Şevînê û li gundê wê jiyaneke bi aram heye. Di romana Yidiz Çakar Gerîneka Guernicayê de, Lîsa di serê ewil de zarokek e, piştre dibe jineke ciwan û di dawiyê de dîsa li zarokatiya xwe vedigere ango roman diçe destpêkê. Zarokatiya Lîsayê jî ne zarokatiyeke bi kêf û rehet e, ew jî di nava bûyerên siyasî, sehneyên şer, zexta hêzên tarî, koçberî, bajarên xerîbiyê û hwd. bûyerên xirab de derbas dibe. Di romana Aynur Aras de, karaktera sereke Keskê di serê romanê de zarokek e li gundê xwe, di nava

lîstikên zarokatiyê de, jiyaneke bi aram û kêfxweş derbas dike. Di zaroktiya Keskê de bûyerên siyasî, koçberî, şer û rewşên xirab ên weke her du karakterên li jor (Şevînê û Lîsayê) tune ne. Li gor ku ji romanê derdikeve sedema vê ev e ku gundê ku Keskê tê de ye nayê şewitandin û ji zextên dewletê dûr e. Ji ber ku sirgunî an koçberî tune ye zarokatiyek parçebûyî nayê xuyanîn. Zarokatiya meriv, heta dawiya emrê meriv jî bîra herî kûr û bingeha herî xurt li ser karakterê meriv bar dike. Meriv her tim bi bîranînên zarokatiyê re heye. Sîtavên vê rastiyê di berhemên edebî de derdikeve pêşberî me. Li gor Simon de Beauvoir, "li gor nivîskarên mêr, nivîskarên jin zêdetir di berhemên xwe de behsa zarokatiyê dikin û sedema vê jî bi azadiya di zarokatiyê de û stara bav de dibîne."[139] Lê gava em li van sê romanên nivîskarên jin ên ku zarokatiya karakterên tê de derbas dibe dinêrin, tenê di karaktera Aynur Aras, Keskê de zarokatiyeke azad û ligel hebûna bav heye. Di her du karakterên romanên din de zarokatiyek hêsîrî heye lewma meriv nikare behsa salên di nav azadiyê de bike. Lê bi aliyekê ve em wiha dinirxînin: Her çiqasî zarokatiya Şevînê û Lîsayê ne di nava jiyaneke azad de bin jî, nivîskar di gelek deverên romanê de bîra karakteran dibe rojên xweş ên zarokatiyê de. Ew salên ku hêj ji axa xwe, ji warê xwe ne dûr in û bi çîrok û kilamên dayikên wan ve dagirtîne. Şevînê tim xeyalên li ser gundê zarokatiya xwe dike, gotinên kal û pîrên xwe tîne bîra xwe. Lîsayê tim çîrokên dayika xwe tîne bîra xwe û ji wan bîranînan xilas nabe. Ji ber ku karakterên jin ên di van her du romanan de ji jiyana xwe ya mezinatiyê de ne razî ne, ne azad in û ji her alî ve di nava dinyayeke hepsî de ne.

[139] Simone de Beauvoir, *Kadın "İkinci Cins" Bağımsızlığa Doğru,* wer. Bertan Onaran, weş. Payel, İstanbul, 1993, r. 50.

# ENCAM

Bingeha vê xebatê, femînîzm û nivîskarên jinên kurd bû. Di her du beşên ewil yên vê xebatê de me teoriya femînîzmê û rexneya edebiyata femînîst nas kir. Di vir de me xwest ku bê dîtin bê femînîzm û rexneya edebiyata femînîst bala xwe didin ser çi û kîjan mijaran, li berhemên edebî çawa dinêre û bi vê yekê re bê fêmkirin bê çima di van romanan de me hin têgih û mijar derxistine pêş. Di nava van her du beşan de, bi hin agahiyên ku me berhevkiribûn û bi rêya hin pirs û nîqaşan re, em li ser rewşa edebiyata jinên kurd sekinîn. Bi van nîqaşan re derkete holê ku di edebiyata kurdî (kurmancî) de, him hejmara nivîskarên jinên kurd, him jî xebatên li ser nivîskarên jinên kurd û berhemên wan pir kêm in. Di beşa sêyem de, di pênç romanên nivîskarên jin de, me karakterên jin û cihê wan a di nava civakê de bi rêbaza rexneya femînîst analîz kir. Her wiha em li ser babetên ku di van romanan de derketin pêş sekinîn û me xwe gihand hin encaman. Encamên ku ji vê xebatê derketin em ê li jêr bi çend xalan destnîşan bikin.

- Yek ji van encaman ew e ku romannûsên jin ên kurd karakterên xwe yên sereke ji nav zayenda jinê bijartine. Ligel karakterên sereke karakterên din ên ku di romanê de derbas dibin jî bi piranî jin in. Ev jî tê vê maneyê ku nivîskarên jin ên kurd bala xwe di edebiyatê de zêdetir dane ser jinê û pirsgirêkên jinên kurd.

- Ji ber ku ev roman ji nava civaka kurdan in rewşa jinên civaka kurd di romanan de derketine holê. Li gor vê, civaka kurd bi gelek aliyan ve civakeke baviksalar e lewma jî jinên di vê civakê de li gor zayenda civakî bi cih bûne. Di civakek zayendperest de, jin di şûna objeya namûs û ehlaqê de ye. Maf û daxwazên wê ji aliyê pergala baviksalariyê ve hatine sînorkirin. Biryara zewaca wan, xwendina wan, derketina wan ya derve û hwd. di destê mêrên malbatê de ne. Lê hin malbatên karakterên sereke yên di van romanan de ji aliyê xwendin û karê derve de keçên xwe azad hiştine û ji bo derfetên xwendinê rê li ber wan vekirine.

- Karakterên jin ên di van romanan de ne femînîst in, lê Berfînê, Rojbînê (Stêra) û Xezalê bi meylên femînîstî, di romanan de cih girtine. Bi van

karakteran re hişmendiyeke jinanî, doza lêgerîna li ser mafên jinan derketine pêş. Di van romanan de jinên ku di navbera hişmendiyeke femînîstî û kevneşopî de mane zêdetir in. Ji rewşa van karakteran jî xuya dibe ku nivîskarên jin yên van romanan ji aliyê edebiyateke femînîst û hişmendiya femînîstî ve ne xurt in.

- Encameke din ew e ku ji xêncî çend îstîsnayan, karakterên jin ên di van pênç romanan de kurd in. Di romana Lerizînên Tenêtiyê de karaktera Pîrê, di romana Xezal de karaktera Çavşînê, di romana Aynur Aras de jina Hemîd û jina Apo Riza jinên tirk in. Di van romanan de tenê karaktera Pîrê bi hal û tevgerên xwe di rola jineke cirnexweş û xirab de ye û ji kurdan hez nake. Lê her sê jinên din ên tirk bi aliyên xwe yên erênî, li pêş, zana û fahma hatine dayîn û têkiliyên wan ên bi kurdan re baş hatine dayîn.

- Her wiha me dît ku di van romanan de, karakterên jin zêdetir bêdeng û di nava xwe de ne. Ji bêdengiya van jinan û monologên wan derdikeve ku ev jin di nava civakê de bi tenê ne û zeîf in. Ji ber vê jî hestên xwe zêdetir bi rêya name û rojnivîskan vegotine. Ji xêncî karaktera Xezalê, karakterên sereke ên di van romanan de bi nivîsandinê re mijûl in. Nivîsandin ji bo wan weke xilasiya ji êş û tenêtiyê ye.

- Jinên di van romanan de him ji ber nasnameya netewî him jî ji nasnameya zayendî ve di nava mexdûriyetê de ne. Ji ber kurdbûna xwe; ji perwederhiya zimanê xwe mehrûm in, di nava zext û qedexeyên siyasî de ne, ji gund û bajarên xwe hatine sirgûnkirin; bîra zarokatiya wan ji ber van sedeman parçe parçe ye, lêgerîna wan a li ser nasnameya netewî berdewam e. Ji ber jinbûna xwe; di nava pergala baviksalariyê de him ji civakê de him jî di nava malbatê de, li rastî pêkutiyan tên, di bin tadeya mêran de ne û li gor zayenda mêr di asta duyem de ne. Him ji destê pergala dewleta baviksalar him jî ji destên mêrên li dora xwe rastî şîddetê hatine.

- Nivîskarên jin di van romanan de, karakterên jin bi piranî weke mexdûr nîşan dane û bingeha romanên xwe li ser mexdûriyeta wan, zext û zilma li ser wan ava kirine. Ligel ku karakterên jin weke yên mêr di nava civakê de ne xwediyê heman derfetan e û di nava pergala baviksalar de, di bin şîdet û asaxan de ne, îtîraza wan kêm maye. Karakteran bi piranî dengê xwe dernexistine û nivîskarên jin jî di nava romanê de fikrên xwe û dengên xwe li hemberî vê rewşê dernexistine.

Gulgeş Deryaspî û karaktera romana wê Xezal dengên xwe di nava romanê de xurt kirine û serî li hemberî pergala baviksalariyê rakirine. Lê di vir de jî ev îtîraz tenê bi karaktera Xezalê re sînorkiriye û îtîraza Xezalê jî tenê bi kêrî wê hatiye, weke din bandora wê li ser jinên din zêde nebûye.

- Di van romanan de nivîskaran hin karakter ji aliyê hişmendiya jinanî û doza mafên xwe de bi hêz nîşan dane. Berfînê, Xezalê û Rojbînê, di van romanan de jinên bi hêz in. Yildiz Çakar, Lîsaya di romanê de di serê ewil de bê hêvî û bêqewet nîşan dide, lê di dawiya romanê de him li hemberî xapandina mêr him jî li hemberî zextên dewletê Lîsayê serî hildide û rêya têkoşînê dibijêre. Lê ev yek bi şertê ku li welatê xwe vedigere mimkin dibe. Hin jinên di van romanan de bi piranî pergala baviksalariyê qebûl kirine, bêhêvîne û ji dozeke jinanî destên xwe şûştine. Meriv dikare bêje ku ev jin bi piranî entegreyî civaka baviksalar bûne û bûne domkarên vê pergalê.

- Di van romanan de jinên ku berberiyê bi hevre dikin jî hene. Ev jin carinan xwişkên hev in, carinan cîranên hev in, carinan jî bûk û xwesû ne. Him bi aliyên baş û him jî bi aliyên xirab hatine dayîn. Hin ji wan jî di romanê de ya tim xirab in ya jî tim baş in. Di romana Zarîfe Demîr de Zelîşê, Berfînê, Zelalê tim di rolên baş de ne. Di romana Çidem Baran de Pîrê tim di roleke xirab de ye. Di romana Aynur Aras de Gulî û Keskê tim baş in; xwesûya Gulî tim jineke xirab e. Jinên din jî him bi aliyên xwe yên xirab û him jî bi aliyên baş ve di nava romanê de ne.

- Di analîza van romanan de derkete holê ku edebiyateke jinên kurd heye û di nava edebiyata kurdan de xwedî ciheke xweser û cuda ye. Ji bo rexneya edebiyata jina kurd têra xwe berhem û malzeme hene. Nivîskarên jin bi rêya van romanan dengê jinan, tadeyê û pêkutiyên li ser wan bi gelek aliyan ve nîşan kirine û dengvadane. Ev edebiyat ligel kêmasiyên xwe bi rêya xebatên baş û lêkolînên li ser wan wê xurttir bibe.

Di vê xebatê de îddîaya me ne ew e ku em nivîskarên jin wek femînîst; berhemên wan jî wek berhemên femînîst nîşan bidin. “Berhemên nivîskarên jin ne ji bo ku bê diyarkirin bê ka ew “mêtî” an jî “femînîst” in, lê ji bo ku piştgirî bê dayîn û hebûna wan a di nava dinyaya hevpar a hunerê de were parastin û bi eleqeyî bên

şopandin, karê me yê rexnegir, zimannas, ya jî bi xwe şopdarên femînîst û xwendevanan e."[140] Lazim e ku dîrokek, hiş û edebiyateke jinan hebe, lewra civak ne bi tenê ji cinsekî pêk tê. Ji bo vê jî me dil heye ku ev xebat bibe arşîvek ji edebiyata jinên kurmanc re.

Ev xebat ku li ser rexneya edebiyata femînîst û edebiyata jinên kurd destpêkek e di heman demê de hewldaneke ji bo rê li ber vekirina lêkolînên derbarê edebiyata jinên kurd. Wekî her destpêkê wê xwediyê kêmasiyan be. Lê tê de enerjîyek armancek û îddîayek heye, wekî ku E. Said jî gotiye, "tespîtkirina wê tişta ku dibe destpêk, bi radeyek zêde, nîyeta rêyekê ye."[141] Bi vê xebatê re kêşeyên edebiyata jinên kurd çareser nabin, lê qet nebe me hewl da ku rêyeke nû li ber edebiyata jinên kurd û rexneya edebiyata jinê vekin.

---

[140] Collin, h.b. r.154.
[141] Edward W.Said. *Başlangıçlar. Niyet ve Yöntem*, weş. Metis, Stenbol, 2009, r. 35

# ÇAVKANÎ


Ağduk, Meltem, “Cumhuriyet’in Asil Kızlarından 90’ların Türk Kızlarına... 1990’larda bir “Türk Kızı”: Tansu Çiller”, dnd. *Vatan Millet Kadınlar* (amd.) Ayşegül Altınay, weş. İletişim, İstanbul, 2013, rr. 297-325

Ahmedzade, Haşim, *Romana Kurdî û Nasname*, weş. Avesta, Stembol, 2011

Alakom, Rohat, “Yirminci Yüzyılın Başlarında İstanbul’daki Kürt Kadınları”, dnd. *Devletsiz Ulusun Kadınları Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar/Feminist Bir Yaklaşım*, (amd.) Shahrzad Mojab, wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı, ç. 2. weş. Avesta. İstanbul, 2013. rr. 75-100

Alakom, Rohat, *Di Folklora Kurdî de Serdestiyek Jinan*, weş. Avesta, Stembol, 2013.

Alan, Remezan, *Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê,* weş. Peywend, İstanbul, 2013.

Altun, Esra, “Nezelalbûna ‘Em’ ê û li ser Şopên Kovara Rozayê Femînîzma Postkolonyal”, *Zarema,* j. 4, Gulan-Pûşber-Tîrmeh-Tebax, 2015 rr. 50-61.

Aras, Aynur, *Leylana Kesk*, weş. J&J, İstanbul, 2016.

Aras, Figen, “Kürt Kadın Hareketi ve Feminizm” dnd. *İstanbul-Amargi Feminizm Tartışmaları*, (amd.) Esen Özdemir, Sevgi Bayraktar. weş. Amargi, İstanbul, İstanbul, 2012, rr. 74-82

Argunşah, Hülya, *Kadın Ve Edebiyat Kendini Yazmak*, weş. Kesit, İstanbul, 2016.

Ay, Nurgül, “Îmaja Jinan Di Hewarîyê De”, *Wêje û Rexne*, j. 9/10, bihar-havîn-payîz-zivistan, 2018, rr. 149-162.

Aydogan, Îbrahîm Seydo, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, weş. Rûpel, Stenbol, 2014.

Balcı, Sezgi, “Feminist Eleştiri Yöntemiyle Ayla Kutlu’nun Öyküleri Üzerine Bir Araştırma” (Teza masterê ya çapnebûyî, Eskişehir Osmangazi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü) Eskişehir, 2011.

Baran, Çidem, *Lerizînên Tenêtiyê*, weş. Ronahî, Amed, 2012.

Baran, Çidem, *Li Dû Siya Sêwiran*, weş. Ronahî, Amed, 2014.

Baran, Çidem, *Li Peravên Torê Torên Evînê*, weş. Ronahî, Amed, 2011.

Bayezîdî, Mela Mehmûdê, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, ç. 2. Trans. Jan Dost, weş. Nûbihar, İstanbul, 2012.

Bayrak, Mehmet, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını,* weş. Özge, Ankara, 2002.

Bayrak, Mehmet, *Kuşatmayı Yaran Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara, 2015.

Bayrak, Mehmet, *Osmanlı’da Kürt Kadını*, weş. Özge, Ankara, 2010.

Beauvoir, Simone De, *Kadın, “İkinci Cins” Evlilik Çağı*, wer. Bertan Onaran, c. 2, ç. 8. weş. Payel, İstanbul, 2010.

Beauvoir, Simone De, *Kadın “İkinci Cins” Bağımsızlığa Doğru*, wer. Bertan Onaran, c. 3, ç. 8, weş. Payel, İstanbul, 1993.

Beauvoir, Simone De, *Kadın “İkinci Cins” Genç Kızlık Çağı*, wer. Bertan Onaran, c. 1, ç. 7, weş. Payel, İstanbul, 1993.

Bedirxan, Rewşen, “Jin û Bextiyara Malê”, dnd. Hawar, j. 28. weş. Belkî, ç. 2. Stenbol, 2012. r. 475.

Bedirxan, Rewşen, “Kebanî û Mamoste”, dnd. Hawar, j. 27. weş. Belkî, ç. 2. Stenbol, 2012. r. 452.

Berktay, Fatmagül, *Kadın Olmak Yaşamak Yazmak*, weş. Pencere, İstanbul, 1998.

Berktay, Fatmagül, *Tarihin Cinsiyeti*, weş. Metis, İstanbul, 2015.

Berktay, Fatmagül, *Tek Tanrılı Dinler Karşısında Kadın, Hristiyanlıkta ve İslamiyette Kadının Statüsüne Karşılaştırmalı Bir Yaklaşım*, weş. Metis, İstanbul, 2016.

Bora, Aksu, *Feminizm Kendi Arasında*, weş. Ayizi kitap, Ankara, 2014.

Butler, Judith, *Cinsiyet Belası Feminizm ve Kimliğin Altüst Edilmesi*, wer. Başak Ertür, ç. 4, weş. Metis, İstanbul, 2014.

Canan, "Kadınların Birliği ve Şu Köprüler Meselesi", *Jujin* j. 8-9, Gulan- Pûşper, İstanbul, 1999, rr. 4-6.

Collin Françoise, Kaufer Iréne, *Feminist Güzergah*, wer. Gülnur Acar Savran, weş. Dipnot, Ankara, 2016.

Çağlayan, Handan, *Analar, Yoldaşlar, Tanrıçalar Kürt Hareketinde Kadınlar ve Kadın Kimliğinin Oluşumu,* weş. İletişim, İstanbul, 2014.

Çağlayan, Handan, *Kürt Kadınların Penceresinden Resmi Kimlik Politikaları, Milliyetçilik, Barış Mücadalesi,* weş. İletişim, İstanbul, 2013.

Çakar, Yıldız, *Gerîneka Guernicayê*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2016.

Davaz, Aslı - Mardin, *Kadın Süreli Yayınları Bibliyografyası: 1928- 1996 Hanımlar Alemi'nden Roza'ya, Bibliyografya: 1928-1996*, weş. Kadın Eserleri Kütüphanesi ve Bilgi Merkezi Vakfı & Türkiye Ekonomik ve Toplumsal Tarih Vakfı, İstanbul, 1998.

Demir, Melike Gül, *1980'lerden 2000'lere Siyasal Kürt Kadının İnşası*, weş. Belge, İstanbul, 2015.

Demîr, Zarîfe, *Kela Bilind*, weş. Apec, Stockholm, 2007.

Demir, Zekiye, *Modern ve Postmodern Feminizm*, weş. Sentez, İstanbul, 2014

Derrida, Jacques, *Platon'un Eczanesi*, wer. Zeynep Direk, weş. Pinhan, İstanbul, 2014.

Deryaspî, Gulgeş A., *Tariya Bi Tav*, weş. Do, İstanbul, 2010.

Deryaspî, Gulgeş A., *Xezal*, weş. J&J, İstanbul, 2013.

Doğan, Lorîn S., *Destên Vala*, weş. Avesta, Stembol, 2012.

Doğan, Lorin S., *Kirasê Teng*, weş. Avesta, Stembol, 2007.

Donovan, Josephine, *Feminist Teori*, wer. Aksu Bora, Meltem Ağduk Gevrek, Fevziye Sayılan, ç. 8, weş. İletişim, İstanbul, 2014.

Düzkan, Ayşe, "İkinci Dalga Feminizm" dnd. *İstanbul Amargi Feminizm Tartışmaları*, (amd.) Esen Özdemir, Sevgi Bayraktar. weş. Amargi, İstanbul, 2011, rr. 175-192.

Eagleton, Terry, *Eleştirinin Görevi*, wer. İsmail Serin, weş. Ark, Ankara, 1998.

Engels, Friedrich, *Ailenin Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökeni*, wer. Kenan Somer, ç. 15, weş. Sol, Ankara, 2010.

Erden, Aysun, *Türk Edebiyatında Kadın Yazarlar (Kötücülük-Cinsellik-Erotizm)*, weş. Hayal, İstanbul, 2011.

Erden, Aysun, *Türk Edebiyatında Kadın Yazarlar (Kötücülük-Cinsellik-Erotizm)*, weş. Hayal, İstanbul, 2011.

Hekman, Susan J., *Toplumsal Cinsiyet ve Bilgi Postmodern Bir Feminizmin Öğeleri* wer. Bekir Balkız, Ümit Tatlıcan, weş. Say, İstanbul, 2016.

Hooks, Bell, *Feminizm Herkes İçindir Tutkulu Politika*, wer. Ece Aydın, Berna Kurt, Şirin Özgün, Aysel Yıldırım, weş. Bgst, İstanbul, 2016.

Humm, Maggie, *Feminist Edebiyat Eleştirisi*, (amd.) Gönül Bakay, wer. Özge Altay, Gönül Bakay, Nuran Düzyol, Aylin Ecdaroğlu, Tuba Biret Ertan, Sebile Günoğlu, Zehra İsmet Gürmeriç, Belkıs Kılınç, Banu Mutafçılar, Sanem

Yazıcıoğlu Öge, Yasemin Temizarabacı, Devrim Yılmaz, Berrin Oktay Yılmaz, weş. Say, İstanbul, 2002.

Irigaray, Luce, *Ben Sen Biz, Farklılık Kültürüne Doğru* wer. Sabri Büyükdüvenci, Nilgün Tutal, weş. İmge, Ankara, 2006.

Irzık, Sibel, Parla, Jale, *Kadınlar Dile Düşünce, Edebiyat ve Toplumsal Cinsiyet* weş. İletişim, İstanbul, 2014.

Jineoloji Akademisi, *Jineolojiye Giriş*, weş. Aram, Diyarbakır, 2015.

Kahraman, Mehmet Emin, "Sanat ve Siyaset İlişkisinde Sanatçı Misyonerliği", *Akademik İncelemeler Dergisi,* j. 1, c. 11, 2016, rr. 225-251

Kocabıyık, Gülben, "Tomris Uyar Öykülerinin Feminist Eleştirisi", ( Teza masterê ya çapnebûyî, Zanîngeha Celal Bayar, Enstîtuya Zanistên Civakî) Manisa, 2013.

Kristeva, Julia, "Kadınların Zamanı", *Defter*, wer. İskender Savaşır, j. 21, Bihar 1994, rr.7- 29.

Mackinnon, Catharine A., *Femînîst Devlet Kuramına Doğru*, wer. Türkan Yöney, Sabri Yücesoy, ç. 2, weş. Metis, İstanbul, 2015.

Madenli, Ergani Y.C., "Kürtlerde Kadın Meselesi", dnd. *Di Sedsaliya Wê De Rojî Kurd*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, rr. 305-307

Millett, Kate, *Cinsel Politika*, wer. Seçkin Selvi, ç. 3, weş. Payel, İstanbul, 2011.

Mitcel, Juliet *Psikanaliz ve Feminizm*, wer. Ayşe Kurtulmuş, weş. Yaprak, Ankara, 1984.

Mojab, Shahrzad, "Devletsiz Olanın Yalnızlığı: Feminist Bilginin Sınırında Kürt Kadınları", dnd. *Devletsiz Ulusun Kadınları Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, (amd.) Shahrzad Mojab, wer. Fahriye Adsay, Sema Kılıç, Ekin Uşaklı, ç. 2. weş. Avesta. İstanbul, 2013. rr. 13-40.

Moran, Berna, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, ç. 25, weş. İletişim, İstanbul, 2014.

Naiman, Joanne, *Marksizm ve Feminizm İki Ayrı Kuram*, wer. Saadet Özkal, weş. Amaç, İstanbul, 1988.

Najmabadi, Afsaneh, "Sevgili ve Ana Olarak Erotik Vatan: Sevmek, Sahiplenmek, Korumak" dnd. *Vatan Millet Kadınlar*, (brh.) Ayşe Gül Altınay, weş. İletişim, İstanbul, 2013, rr. 129-165

Oh, Eunkyung, Feminist Eleştiri Bağlamında XX. Yüzyıl Türk ve Kore Romanında Kadın, weş. Ürün, Ankara, 2016.

Ozbey, Kibar Krîstîn, *Sorxêlî*, weş. J&J, İstanbul, 2014.

Özkan, Ece, "Feminist Araştırmalar ve Yöntem", dnd. *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları,* (amd.) Feryal Saygılıgil, weş. Dipnot, Ankara, 2016 rr. 271-291.

Özkan, Rojbîn, *Zarokên Heskîfê*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2012

Parla, Jale, "Kadın Eleştirisi Neyi Gerçekleştirdi?", dnd. *Kadınlar Dile Düşünce* (amd.) Sibel Irzık, Jale Parla, weş. İletişim, İstanbul, 2014, rr. 15-56.

Peker, Hazal, *Kürt Kadını Amazonlar*, weş. Evrensel Basım Yayın, Ankara, 2015.

Said, Erdward W., *Başlangıçlar. Niyet ve Yöntem*, weş. Metis, İstanbul, 2009.

Samancı, Suzan, *Ew Jin û Mêrê Bi Maskê,* weş. Avesta, Stembol, 2015.

Savcı, Fatma, "Şiir Yüreğin Dili ve Doğal Yaşamın İfadesidir", dnd. *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, (brh.)Vecdi Erbay weş. Ayrıntı, İstanbul, 2012, rr. 345-346.

Savci, Fatma, *Ristika Morîkan*, weş. Avesta, Stembol, 2012.

Savci, Fatma, *Şewq û Payiz*, weş. Avesta, Stembol, 2011.

Savran, Gülnur, "Feminizmler", dnd. *Feminizm Kitabı Osmanlı'dan 21. Yüzyıla Seçme Metinler,* (amd.) Hülya Osmanağaoğlu, weş. Dipnot, Ankara, 2015, rr. 174-204.

Scott, Joan W., “Toplumsal Cinsiyet: Faydalı Bir Tarihsel Analiz Kategorisi” dnd. *Feminist Tarihin Peşinde*, (brh.) Fahriye Dinçer, Özlem Aslan, wer. Ayça Günaydın, Derya Demirler, Fahriye Dinçer, Özlem Aslan, Öykü Tümer , weş. Bgst, İstanbul, 2013. rr. 61-104.

Selim, Memduh, “Du Eserên Xêrdar” *Jîn*, j. 20. Trans. M. Emîn Bozarslan, c. 1. weş. Deng, Upsala- Sweden, 1985. r.58.

Selim, Memduh, “Xanima Kurd”, dnd. *Jîn*, j.14. Trans. M. Emîn Bozarslan, c. 1. weş. Deng, Upsala- Sweden, 1985. r. 15.

Semend, Sîma, *Xezal*, Trans. Şefik Kaya, weş. Avesta, Stembol, 2015.

Sevim, Ayşe, *Feminizm*, weş. İnsan, İstanbul, 2005.

Silêvanî, Sebrî, *Meryema*, weş. Lîs. Ankara, 2011.

Şemo, Ereb, *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2015.

Şerbetçi, Didem, “Postkolonyal Feminizm Balamında Küresel Kızkardeşlik Kavramının İncelenmesi”, (Teza Mastirê ya çapnebûyî, Zanîngeha Adnan Menderes, Enstîtuya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Têkiliyên Navneteweyî) Aydın, 2013

Şikakî, Evîn (brh.), *Fîxana Pênûsên Nazik – Antolojiya Helbesta Kurdî Ya Nûjen (Helbestvanên Jin)*, weş. Ronahî, Amed, 2012.

Tekin, Mehmet, *Roman Sanatı Romanın Unsurları,* ç. 15. weş. Ötüken, İstanbul, 2017.

Temo, Fû’ad, “Çîrok”, dnd. *Di Sedasaliya Wê De Rojî Kurd,* (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013, rr. 155-156.

Tok, Eqîde, *Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê*, weş. Aram, İstanbul, 2016.

Vogel, Lise, *Marksist Teoride Kadın*, wer. Mine Öngören, weş. Pencere, İstanbul, 1990.

Walby, Sylvia “Kadın ve Ulus”, dnd. *Vatan Millet Kadınlar,* (brh.) Ayşe Gül Altınay weş. İletişim. İstanbul, 2013, rr. 35-63.

Walters, Margaret, *Feminizm*, wer. Hakan Gür, weş. Dost. Ankara, 2009.

Woolf, Virginia, *Kendine Ait Bir Oda*, wer. ç. 3, Handan Saraç, weş. Pirtûkxaneya Remzi, İstanbul, 2015.

Yavuz, Sutay, “Kadına Yönelik Şiddet ve Suçların Sosyolojisi: Türkiye Örneği” dnd. *Suç Sosyolojisi*, (amd.) Fuat Güllüpınar, weş. Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2017, rr. 197-215.

Yazıcı, Çiğdem, “Felsefede Toplumsal Cinsiyet ve Feminizm”, dnd. *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları* (amd.) Feryal Saygılıgil, weş. Dipnot, Ankara, 2016.

Zarg, Rojîn, *Fîdo*, weş. Aram, Diyarbakır, 2012.

Zetkin, Clara, “II. Uluslararası Komünist Kadınlar Konferansının Görevleri Üzerine”, dnd. *Kadın Sorunu Üzerine Seçme Yazılar & Clara Zetkin Üzerine*, (brh.) N. Krupskaya, W. Pieck, wer. İsmail Yarkın, ç.3, weş. İnter, İstanbul, 1996, rr. 48-96.

**Çavkaniyên Dijîtal**

Bazan, Azizoğlu Münevver, “Türkiyede Kadın Hareketlerinin Farklı Şehirlerde Karşılaştırılması” Araştırma Projesi Raporu, http://www.fb12.uni-bremen.de/interkulturelle-bildung/forschung/frauenbewegungen-im-innertuerkischen-vergleich/arastirma-sonuclari.html (26.06.2018)

Dikici, Erkan, “Feminizmin Üç Ana Akımı: Liberal, Marxist ve Radikal Feminizm Teorileri” https://www.jasstudies.com/Makaleler/1376569194. (13.03. 2016)

# BI RÊBAZA REXNEYA FEMÎNÎST LÊNERÎNEK LI ROMANÊN JINÊN KURD

*Yazar* Songül Doğan

**Gönderim Tarihi:** 05-Eki-2018 06:13PM (UTC+0300)
**Gönderim Numarası:** 1014497529
**Dosya adı:** BI_R_BAZA_REXNEYA_FEM_N_ST_L_NER_NEK_LI_ROMAN_N_JIN_N_KURD.doc (992.5K)
**Kelime sayısı:** 53520
**Karakter sayısı:** 245880

# BI RÊBAZA REXNEYA FEMÎNÎST LÊNERÎNEK LI ROMANÊN JINÊN KURD

ORIJINALLIK RAPORU

| %2 | %2 | %1 | %1 |
|---|---|---|---|
| BENZERLIK ENDEKSI | İNTERNET KAYNAKLARI | YAYINLAR | ÖĞRENCI ÖDEVLERI |

BIRINCIL KAYNAKLAR

| | | |
|---|---|---|
| 1 | eski.artuklu.edu.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 2 | www.artuklu.edu.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 3 | Submitted to Koc University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 4 | Submitted to Baskent University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 5 | Submitted to Ege Üniversitesi<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 6 | www.netkurd.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 7 | kisi.deu.edu.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 8 | www.kitap2.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |

| | | |
|---|---|---|
| 9 | acikarsiv.ankara.edu.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 10 | Submitted to Ankara University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 11 | Submitted to Istanbul Kultur University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 12 | binnurcelebi.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 13 | urunyayinlari.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 14 | Charlotte Binder, Aslı Polatdemir, Yasemin Karakaşoğlu. "Zur (Un-)Möglichkeit von Solidarität und Bündnis zwischen Frauenbewegungen in der Türkei", Feministische Studien, 2015<br>Yayın | <%1 |
| 15 | www.pirtukakurdi.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 16 | www.laylazami.net<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 17 | sites.google.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 18 | Submitted to Canakkale Onsekiz Mart University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| 19 | bilka.org.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 20 | ikiayayincilik.com.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 21 | dergipark.ulakbim.gov.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 22 | www.librabooks.com.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 23 | forum.memurlar.net<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 24 | www.erkekmuhabbeti.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 25 | Submitted to Bahcesehir University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 26 | Submitted to Bozok Ãniversitesi<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 27 | eren.com.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 28 | www.fb12.uni-bremen.de<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 29 | s5b33cdf930697ef6.jimcontent.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 30 | www.e-sarkiyat.com | |

| | | |
|---|---|---|
| | İnternet Kaynağı | <%1 |
| 31 | issuu.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 32 | Submitted to Erciyes Ãniversitesi<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 33 | Submitted to Suleyman Demirel University<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 34 | ELİUZ, Ülkü. "Cinsel kimlik paniği: Kadın olmak", TUBITAK, 2011.<br>Yayın | <%1 |
| 35 | Submitted to Ardahan Üniversitesi<br>Öğrenci Ödevi | <%1 |
| 36 | www.jasstudies.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 37 | acikerisim.selcuk.edu.tr:8080<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 38 | pt.scribd.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 39 | www.azadiyawelat.org<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 40 | ku.wikipedia.org<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| | kurgu.tv | |

| | | |
|---|---|---|
| 41 | İnternet Kaynağı | <%1 |
| 42 | www.kizilbas.biz<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 43 | acikarsiv.atauni.edu.tr<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 44 | www.ihaleciler.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 45 | courses.harvard.edu<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 46 | hayalyayinlari.com<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 47 | tr.wikipedia.org<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 48 | documents.tips<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 49 | d-nb.info<br>İnternet Kaynağı | <%1 |
| 50 | KESKİN, Necat. "Di Çarçoveya Teoriya Performansê de Nirxandina Vegotinên Gelêrî", Dicle Üniversitesi, 2016.<br>Yayın | <%1 |

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**FEMİNİST ELEŞTİRİ YÖNTEMİYLE**

**KÜRT KADIN ROMANLARINA BAKIŞ**

Songül DOĞAN

15711023

Danışman

Dr. Mustafa ASLAN

Mardin - 2018

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

# FEMİNİST ELEŞTİRİ YÖNTEMİYLE KÜRT KADIN ROMANLARINA BAKIŞ

Songül DOĞAN

15711023

Danışman

Dr. Mustafa ASLAN

Mardin - 2018